# ABDULLAH OCALAN.
# Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan

**Ezîz ê Cewo**

"… hizir û ramanên *Abdullah Ocalan* çiqasî bi felsefî giran bin jî, yek e, gelê sade wana têdigihîje, ji ber ku ew ne ku tenê anegorî hêvîyên wan ên dewr û zemanan in, lê, her weha, anegorî *têgihîştina hindurîn a nirxên rewanî* yên mirovî ne… "
(Ji pirtûka "Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka "windabûyî"...)" , Ankara, Weşanên "Aryen", 2017, rûpel 104)

**Weşanên "Welat ê Agir û Rojê"**

**s. 2023.**

# ABDULLAH OCALAN.
# Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan

**Ezîz ê Cewo**

"… hizir û ramanên *Abdullah Ocalan* çiqasî bi felsefî giran bin jî, yek e, gelê sade wana têdigihîje, ji ber ku ew ne ku tenê anegorî hêvîyên wan ên dewr û zemanan in, lê, her weha, anegorî *têgihîştina hindurîn a nirxên rewanî* yên mirovî ne… "
(Ji pirtûka "Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka "windabûyî"...)" , Ankara, Weşanên "Aryen", 2017, rûpel 104)

**Weşanên "Welat ê Agir û Rojê"**

**s. 2023.**

**Ezîz ê Cewo:**

**“Abdullah Ocalan. Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan”. Berevoka gotar, bîranîn, name, hevpeyvîn û nirxandinên bijarte.**

Her çiqas ev berevoka berhemên pênûsa xudanê pirtûkê yên dem û demajoyên cuda da ye, lê ya ku di nava rewş û bûyerên Kurdistanê yên dawîya sedsala XX û destpêka ya XXI wan hemûyan digihîne hev û watedar dike, ew kesayetîya Rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan û Tevgera Rizgarîxwaz a Kurdistanê ne...

Di vê berevokê da berhemên bijarte yên mamosta Ezîz ê Cewo yên di derbarê wê pêvajoyê da anegorî demnûsîyê (bi kronolojî) hatine tomarkirin ... – ji destpêkê heya rojên vê serdemê.

Ew bûyer, ên ku di derbarê wan da di vê berevokê da tê gotin, hemû jî, an bi beşdarbûna xudanê pirtûkê pêk hatine, an jî ew wê demê wek çavdêrekî li wira amade bûye. Û ewî timê jî bi çavê lêgerînerekî li wan hemûyan nihêrye, ew nirxandine û watedar kirine... Ango, hîç rêzek, hîç peyv û gotinek hema wisa nehatine nivîsîn, lewra jî, ev berevok dê ne ku tenê ji bo siyasetmederên pispor, lêgerîner û nivîskaran balkêş be, lê her weha, ji bo xwendevanê sade jî...

# NAVEROK


PÊŞGOTIN ....................................................................................................................................4

RÊBERÊ NEBÎNAYÎ YÊ GELÊ NEBÎNAYÎ! (Notên rêwîtîyê) ..............................................7

Rabin, dadgeh tê! ..................................................................................................................20

PIRSGIRÊKA KURDÎ …Cîhanê ji bo çareserkirina wê çi rêyan pêşnîyar bike? .........20

JANGLYORÊ NÛPEYDABÛYÎ DI QADA SIYASETÊ DA ....................................................31

CÎHANPENAHÊ MEZIN XEWNA XANÎYÊ MEZIN DISÊWIRÎNE (Name ji rêberê netewî Abdullah Ocalan ra) ....................................................................................................................37

KURD, CÎHAN Û RÊYÊN ÇARESERÎYA PIRSGIRÊKA KURDÎ ......................................39

…LI SER PÊLÊN KOMPLOYA NAVNETEWÎ .....................................................................43

DI NAVA TA Û BENDÊN KOMPLOYA NAVNET'EWÎ DA ......................................44

DÎROKÊ BEŞDARÊN KOMPLOYA NAVNETEWÎ DARIZÎNE .....! ..................................57

HEMÛ RÊ DIBIN AMEDÊ... -I- .........................................................................................61

HEMÛ RÊ DIBIN AMEDÊ... -II- ........................................................................................66

YEKÎTÎYA NETEWÎ YE ERÊNÎYA DEMÊ! ..........................................................................71

TAYBETMENDÎYÊN VÊ PÊVAJOYÊ Û PEYWIRA ME–KURDAN ....................................76

NAME YA VEKIRÎ ................................................................................................................79

JI BO KU EV BÊDADÎ BI DAWÎ BIBE! … .........................................................................79

NAME YA VEKIRÎ – Ji rewşenbîrên tirk ra .......................................................................81

DÊMOKRASÎ BI CUREYÊ TIRKÎYAYÊ ...............................................................................84

ABDULLAH OCALAN – 70!..................................................................................................88

JIYANA MIROVEKÎ HEBÛNA NET'EWEKÊ JI NÛVA WATEDAR KIRYE! ……88

KOMPLOYA NAVNETEWÎ Û DERSÊN WÊ! (Li şûna paşgotinê) ..................................91

PÊVEK ......................................................................................................................................96

Türk aydınlarına açık mektup ..............................................................................................96

XUDANÊ PIRTÛKÊ – JÎYAN Û BERHEMÊN WÎ.................................................................101

# PÊŞGOTIN

Îro di cîhanê da navê Abdullah Ocala pêdivîya xwe bi danasîn û şiroveyan nîne: dema di derbarê gelê kurd, mafê wî yê mirovî û netewî da, di derbarê Ramana azadîyê û Tevgera Rizgarîxwaz a gelê kurd da tê axavtin, destxweda navê vî Mirovê Mezin tînin zimên – Abdullah Ocalan, Rêberê gelê kurd!

Îro mirovahîya cîhanê ya pêşverû, mirovhez û azadîxwaz bi gelê kurd ra tevahî doza azadîya Rêberê vî gelê dilsoz û leheng didkin; îro gelek bajarên cîhanê bi biryara meclîsên xwe navê Hemwelatîya Rûmetê dîyarî birêz Ocalan kirine... Îro nivîskar, hûnermend, akadêmîsyan, kompozîtorên navdar û parlamênterên welatên cuda ên cîhanê piştgirîya doza gelê kurd û azadîya Rêberê wî dikin... Lê vê dawîyê kompozîtorê amêrîkî Natan Fêlîks opêrayek bi navê OCALAN dîyarî Rêberê gelê kurd kiryr!

Ev e rastîya îroyîn!...

Wek ku tê zanîn, di destpêka salên 90-î ên sedsala XX (sîh salî berê!), dema Tevgera rizgarîxwaz a bi rêberîya Serokê Partîya Karkrên Kurdistaê birêz Abdullah Ocalan hem di warê civakî da, hem di warê tevgerî-sîyasî da, hem jî di warê hêza parastina gel da, roj bi roj bi her qaran da rengê xwe dida rojeva cîhanê. Û hema wan salan jî ji mamosta Ezîz ê Cewo ra li hev tê, bi nêzîk va bi vê rêxistinê ra nas dibe, û pêwendîyên wî bi birêz Abdullah Ocalan ra pêk tên... Û ev pêwendîyên wan heya demên komploya navnetewî domayn...

Û hema di vê demajoyê da ji mamosta Ezîz ê Cewo ra, wek kurdekî, yê ku, her çiqas, di xerîbîyê da çavê xwe li cîhanê vekiribûye û gihîştibûye, lê kurdbûna wî ji bo wî wateyeke xwe ya taybet hebûye, û wê demê êdî wek lêgerîner-rojhilatzan, nivîskar û rojnameger pêk atibûye, li hev tê, ku biçe Welatê kal û bavan, bi nêzîk va Tevgera Rizgarîxwaz û rêberê wê birêz Abdullah Ocalan nas bike... Ev rêwîtî derfetê dide mamosta, ku ew rastîya welatê kal û bavan li ber çavên xwe bibîne. Û bi hevdîtinaên dema wê rêwîtîyê cîhaneke nû li ber wî vebe...

Û ji destpêkê heya van demên dawîyê mamosta hewl daye, ku wan hemûyan ji bo xwe binirxîne, hemû nirx û hêjahîyên netewî bi kûrahî derxe zanebûnê û wana bi heşmendî watedar bike. Û ev hewlên wî di demên cuda da bûne berhem û ji ber pênûsa wî derketine ronahîyê: wek *notên rêwîtîyê, gotar, şirove, hevpeyvîn, helbest* û yên dinê...

Di nava van hemûyan da ramana Ezîz ê Cewo timê têgihîştin û watedarkirina wan bûyeran geryaye, ewî tev bi zanistî nirxandine û bi wêjeyî teşe daye wan: ewî hewl daye, sedemên peydabûna vê rewşa dijmirovî, vê bêdadîya dîrokî derxe holê, ya ku îro para gelê kurd keteye. Ew rê û rêbazên çareserîya pirsgirêkên heyî geryaye, wî hewl daye, bi şêwazên cuda wan destnîşan bike, bala kurdan û civaka cîhanê bikişînim ser wan. Lê ya sereke – mamosta di nava wan hemûyan da têgihîştina fênomêna Rêberê gelê kurd birêz Abdulla Ocalan geryaye, wî hewl daye, ewê bi kûrahî tê bigihîje û bi şêwazekî wêjeyî wê watedar bike...

Û ji bo vê ewî ne ku tenê berê xwe daye berhemên vî Mirovê Mezin û destnivîs-bîranînên xwe yên demên cuda ji nûva li ber çavan ra derbaz kirine, lê, her weha, ew di nav gel da şop û berhemên vê fênomênê geryaye. Heya wî berê xwe daye cîhana kevnar jî, û li vira jî tiştekî balkêş ji bo xwe vekirye. Û wî ew di nava çarçoveya lêgerînên xwe yên di derbarê Zerdeşt Pêxember da tomar kirin. Weha, ew çi dinivîse:

*“... dema hinek di derbarê bîrûbawerîya zerdeştîyê û bîrdozîya Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî da diaxivin, ewana hinek têgihîştinên xwe yên bîrûbawerîya zerdeştîyê bi îdêolojîya Abdullah Ocalan şirove dikin...*

*Her çiqas, ew lêgerînên hinek kesên di vî warî da li ser bingeha wan hizir û têgehan pêk tên, ên ku di weşanên bi zimanên bîyanî da hene (ji ber ku, wergera kurdî ya wê*

*peykera nivîskî – ya "Avêstayê" hê nîne), dîsa jî, ji hêla weşanê û şiroveyên giştî va, di wana da tiştên balkêş hene û ew hêjayî baldarîyê ne…*

*Her çi jî hebe, xudanên wan nivîsan ji çi hêlê va jî nêzîkî pirsê bibin, yek e, ew delîl bê guman e, ku di nava civakê da têgehên bingehîn ên bîrûbawerîya zerdeştîyê tên govtûgokirin, û gelek normên exlaqî-toreyî û naveroka nirxên giştî yên mirovahîyê di nava wê govekê da tên şirovekirin, û ev jî, êdî di derbarê gelek tiştî da dibêje…*

*Lêbelê, dema mirov hinek binaxeyên bawerîya zerdeştîyê û îdêolojîya Abdullah Ocalan hemberî hev dike, û wana di nava govekekê da dinirxîne, dertê holê, ku:*

*– eger Zerdeşt Pêxember di dîroka mirovahîyê da cara yekem mafên wekehev ji bo mêr û jinê naskirye, lê Abdullah Ocalan ew bi zanistî ravekirye û bi praktîkî di jîyanê da pêk anîye; ew dibêje, eger mirov di derbarê azadîya gelekî da diaxive, wê demê, divê bizanibe, ku ew gel nikare azad be, eger nîvê wî gelî (jin!) bindestbe û, wek endamên heman civakê, xwedî heman mafan nînbe; û îro hemû rêxistin, sazî, rêvebirî û komeleyên kurdan, ên ku îdêolojîya Ocalan dipejirînin, hemû jî hevserokên xwe hene – bi nûnertîya jin û nêran va; li rex HPGê wisa jî Hêzên Jinan ên Parastina Gel (HJPG) hene, û hemû parleşkerên wan fermanên xwe ji Biryargeha Navendî ya HJPG distînin û pêk tînin; jin li ser asta here bilind beşdarî pejirandina hemû biryarên girîng ên siyasî, leşkerî, dîplomasî, çandî û darayî dibin. Ango, di vê civakê da bi rastî prînsîpa wekhevîyê pêkan e.*

*– Zerdeşt Pêxember kedkarîyê pîroz dibîne û ewê digîhîne heya asta xwedayî – wek şêwazekî xizmeta Xwedê li ser erdê. Anegorî bîrûbawerîya wî, cotkarî, xwedîkirina ajalan (rêncberî), avakarî û her şêwazekî karê dinê, yê ku ji bo jîyana mirov xurtkirina hebûna derfetan misoger dike, ew erka pîroz a mirov e di cîhanê da; lêbelê, ji bo Ocalan şêwazê herî bilind ê karê mirov – ew xizmeta mirov e di hemû warên jîyana civakî da, li ku divê garantîya mafên wekehev û jîyaneke hêja ji bo hemûyan hebe, û pirsên êkolojîyê yek ji beşên girîng ên îdêolojîya wî ne…*

*– eger di cîhana rewanî da tê gotin, ku Zerdeşt Pêxember di heş û rewanê mirovan da hizira jihevcudakirina Dilovanîyê û Zulmê bi cî kirye û bang kirye, ku divê xwe li dilovanîyê bigirin û zulmê red bikin, wisa jî, eger pêwîst be, amade bin, li dijî zulmê têbikoşin – ew çi rengî dibe, bila bibe, lêbelê, anegorî têorîya Ocalan di mafên xwe da hemû gel û mirov divê weke hev bin, û, eger ew mafana tên binpêkirin, ew bi xwe şêwazekî zulmê ye, û, lewra jî, divê li dijî wê zulmê têbikoşin; ewî bi zanistî rê û rêbazên wê têkoşînê dîyar kirine û bi xwe jî rêberîyê lê dike…, lê têorîya wî ya Konfêdêralîzma Dêmokratîk hemû prênsîpên pêwendîyên civakî destnîşan dike, û, eger civak anegorî wan tevbigere, ewê bikaribe di nava aştî, aramî û ahengîyê da bijî. Û mînaka di jîyanê da pêkanîna wê sîstêmê jî îro Rojavayê Kurdistanê dide xuyan.*

*Li vira, dibe ku pirs derê hole: "Ev mînahevîya helwest, têgihîştin û watedarkirina jîyana mirov ji ku tê?" – Wek ku tê xuyanê, dijwar e mirov bikaribe bersîveke yekawa ji bo vê pirsê bibîne…Lêbelê, mirov dikare bibêje, ew, ku Abdullah Ocalan di dema xwe da hinek tişt di derbarê zerdeştîyê da xwendibin jî, ewê dê nikaribûya bandora xwe li ser têgihîştin û dîtinên wî yên gerdûnî bihişta, lewra ku, ya yekem, Ocalan wek têorêtîk û siyasetmeder li ser bingeha sosîalîzma zanistî pêk hatye, û, ya duyem, wê demê di wî welatê misulmanîyê da (Tirkîya) zerdeştî nikaribû di nava gel da ewqasî naskirî û pêkan bûya, ku di jîyana wî da cîyê xwe hebûya.*

*Li vira mirov tenê dikaribû bi bawer bigota, ku, her çiqas, piranîya kurdan îro misulman in, lê gelek deremên (êlêmênt) asa, norm û ferzên bawerîyên kevnar ên gelê kurd (heya yên berî zerdeştîyê jî!) di civaka kurdî da zêndî mane û tên parastin, û hema di wê civakê da jî Ocalan gihîştye, mezin bûye û wek kesayetîyeke têgihîştî pêk hatye.*

*Û, wek ku tê xuyanê, evan mercana, wisa jî rewşa civakî û siyasî ya ku wê demê di Komara Tirkîyayê da serdest bûye, perwerdeya wî ya siyasetmederîyê, û bîra wî ya gênêtîkî, ji bo ku têorîzan (theorist) û têkoşerekî ji bo mafên gelan ê weke wî pêk bê, bûne bingeh…*

*Ev herdu kesayetîyên gewre (Zerdeşt û Ocalan) zarokên heman gelî yên serdemên cuda bûne. Û, anegorî wê jî, di serdemekê da (dewra VI a berî s.m.) pêxemberekî gewre pêk hatye, lê di ya dinê da (nîveka dûyem a dewra XX – destpka a XXI a s.m.) – têorîzan, stratejîst û rêberekî gewre…”* (Ezîz ê Cewo; “Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka “windabûyî”...)” , Ankara, Weşanên Aryen, 2017, rûpel 104 – 107).

Ev dîtin û raman wê hê paşê bên, lê heya ku Ezîz ê Cewo bigihîje van, ew di nava tevgera natewî da û bi rêberê wê û bi gelê kurd ra tevayî rêyekê derbaz bûye. Û her gavekê, ya ku bala mamosta kişandye, û hêjayî nirxandin û watedarkirinê bûye, ewê di gotar, nirxandin û berhemên wî yên dinê da cîyê xwe dîtye. Û ew berhemên mamosta jî di vê berevokê da bi rêzê, anegorî demnûsîyê (bi kronolojî) cîyê xwe girtine... – ji destpêkî heya rojên vê serdemê.

Û, her çiqas, mamosta Ezîz ê Cewo, wek kesekî, yê ku di nava karên cuda yên Tevgerê da beşdarbûna xwe anye (rojnamegerî-şirovegerî, tevgerî-rêxistinî û siyasî-dîplomasî), lêbelê, yek e, di nava wî da hertim, di her dem û kêlîyekê da nivîskar, lêgerîner û rojnamegerek hişyar û serdest maye. Û, lewra jî, hemû bûyer, ên ku bi beşdarbûna wî pêk hatine, an wê demê ew wek çavdêrekî amade bûye, ewî timê jî bi çavê lêgerînerekî li wan hemûyan nihêrye... Ango, hîç rêzek, hîç peyv û gotinek hema wisa nehatine nivîsîn, lewra jî, ewê ne ku tenê ji bo siyasetmederên pispor, lêgerîner û nivîskaran balkêş be, lê her weha, ji bo xwendevanê sade...

# RÊBERÊ NEBÎNAYÎ YÊ GELÊ NEBÎNAYÎ![1]

**(Notên rêwîtîyê)**

*"Hêza me di vîna me da ye, di gîyana me da ye...Û van hemûyan jî gel dide me!*
*Paşeroja vî gelî, roja wî ya îroyîn û pêşeroja wî bawerîyê didin me!*
*Ew bawerîya wî ya hember ramana azadîyê û amadebûna wî, ku ji bo pêkanîna wê îdêayê heya dawîyê bimeşe, bawerîyê didin me!"*
(Rêber Apo)

… Belê, hema piştî hevdîtina bi rêberê netewî Abdullah Ocalan ra ev nêrîn li bal min çê bû. Wisa ku, ji vê sernivîsê matma nebin! Dibe ku, dema van notan bixwînin, hûn bêhtir matma bibin.

Dema di welatê xwe da yî – di nav gelê xwe da (gelê ku ewqas dûr û nenas e, lê di heman demê da, ewqas nas, ewqas hezkirî û nêzîk e!), di nav şervanên Artêşa Rizgarîya Gelê Kurdistanê (ARGK) da, bi rêbrê netewî ra yî, hîs dikî, ku tuyê hê gelek tiştan di derbarê gelê xwe da biznibî û fêr bibî; tu destpêdikî bêhnvedana xwe ya netewî hîs bikî, paşê pêwendîyên te wê bi nirxên netewî ra çê bibin, peyra…, lê pwyra jî wê ji te ra derfet çê bibin, ku vegerî ser rewşa xwe ya xwezayî, ser rehên xwe yên dîrokî… Ew reh, ên ku dibin-digihînin Medya kevnar, dergûşa mirovahîyê – Navçemka (Mêzopotamya) dîrokî. Ewan rehan hertim jî di derbarê xwe da dane zanîn, timê jî berbi wir va kişandine – berbi welatê pêşîyan – berbi Kuristanê va.

Pêdivîyeke xwezayê hebû, ku em herin Welêt, daxwezek hebû…

Û, weha, em, pênc kurdên Sovêta berê diçin ji bo hevdîtinê bi Serokê Giştî yê Partîya Karkerên Kurdistanê (PKK) – Abdullah Ocalan ra pêk bînin. Em diçin, ku rastî siyasetmederê hemdemî yê herî bi nav û deng bên, ê ku awirên bi mîllîona kurdan li wî ye – û ne tenê awirê kurdên Welêt, lê wisa jî awairê kurdên dervayî Kurdistanê (di nav wan da wisa jî hemwelatîyên me yê Sovêta berê). Hemû jî bi rêzdarî û hezkirin jêra Serok Apo dibêjin.

Piştî hevdîtina bi Serok Apo ra me hêvî hebû, ku emê Kurdistanê bibînin – Kurdistana dagerkirî, çarparçekirî, veçirandî – lê di heman demê da – tuje bi jîyan, tuje bi vîna berxwedanê û têkoşînê – têkoşîna ji bo azadî û serxwebûnê.

Kurdistan – welatê şengesyarên (*şovalyê*) Rojhilatê! Welêtê medên lêgêndar

---

[1] *Havîna sala 1994-an komek kurdên Sovêta berê, diçin seredana rêberê gelê kurd Abdullah Ocala. Piştî çend rojan bi pêşniyara birêz Ocalan ew derbazî Başûrê Biçûk (Rojavayê Kurdistanê) dibin – diçin nava gel… Ew çend rojan li gund û bajarên Rojavayê Kurdistanê digerin, bi gel ra danûstandinan pêk tînin. Danûstandinên wan bi gelê sade, kesayetîyêm navdar û siyasetmederan ra pêk tên…û ew dîsa vedigerin Şamê. Dema ew diçin Akadêmîya Leşkerî-Siyasi – bal birêz Ocalan, pirsa wî ya yekem ji wan ev bûye, ka, gelo wan gel çawa dît, pêwendîyên wan çawa pêk hatin? – Mêvanên wî bi hûrbînî dîtinên xwe bi wî ra par vedikin...*

*Mêvanên vî Mirovê mezin, vê Kesayetîya nebînayî çend rojan jî li Şamê dinînin... Dema meha wan tuje dibe, ew vedigerin Moskovayê… Li Moskovayê mamosta Ezîz ê Cewo di derbarê wê rêwîtîyê da bîranînên xwe bi zimanê rûsî dinivîse. Ew bi şêwazê notên rêwîtîyê, bi sernivîsa «Удивительный лидер удивительного народа» di kovara «Курдистан рапорт» ("Kûrdîstan raport") da tê weşandin (№ 7, 11. 1994). Peyra, hê derng ew bi sernivîsa "Rêber jî nebînayî ye, û – gelê wî jî!"di malperên kurdî yên cuda da hatye weşandin. Bi vî şêwazê sernivîsê û hinek ssererastkirinên dinê va ew cara yekem tê weşandin.*

(efsanewî), û lêgêndên (efsane) ku îro jî hê dijîn! Welatê ku mitaledarên xwedî ramana ronî û bijîşk, serleşker û poêt (helbestvan), avakar û hunermend dîyarî mirovahîyê kirine! Emê herin Kurdistanê bibînin, a ku hatye nivîşkankirin, a ku ji ber bêbaldarî, bêwijdanî û zordarîya mirovahîyê heya kurahîya rewanê xwe hatye êşandin û dilşkestî bûye, lê ewê xwe nespartye hîç kesî, mirovatî û nîgara xwe ya netewî winda nekirye… Emê biçûna wî welatî, yê ku heya naha bi dilovanî û kedhezîya xwe va, bi rewanê dot û lawên xwe yên afrandarîyê va mirov zendegirtî dihêle. Ew dot û lawên vî welatî îro jî bi hevgirtin û bi biryarbûna xwe ya meşandina têkoşînê ji bo mafên xwe yên mirovî û netewî va mirov tima dihêlin. Û ew hevgirtin, û ew bilindbûna rewanê netewî, ne bê dijwarî, lê gav bi gav di nav gel da hatin pêşxistin – anegorî berfirehbûna Têkoşîna Rizgarîya Netewî, di bin rêberîya Partîya Karkerên Kurdistanê da. Îro hêmanên ragîhandina girseyî bi şev û roj di derbarê wê têkoşînê da radigihînin, hinek – rastîyê, hinek jî – nîvrastî û derewan (îjar pêdivîya cîhanê çiqas bi agahîyên rastîn heye!). Lê em bi dil û rrewanê xwe hîs dikin, ka rastî li ku ye, û derew û gilîgerokîyên siyasî li ku ne.

Û em bawer jî nakin, ku emê rojekê berî rojekê rastî rêberê Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî bên, ji destê yekem agahîyan bigirin, bi çavên xwe rastîyê bibînin û bawer bibin, ka ev têkoşîna bi mîllîonan kurdan bi ku va dibe, yên ku wisa bi fedekarî û xwegorîdarî beşdarî wê bûne.

## AKADÊMÎA

Rojhilata Navîn – herêma here germ a cîhana me. Li wir ji serdemên kevnartirîn va berjewendîyên gelên cuda raserî hev hatine, ewê pêkhatin û mirina gelek şaristanîyan dîtine.



***Bi serokê giştî yê PKK Abdullah Ocalan ra di hewşa Akadêmîayê da.***

… Û, va, em li ser xaka kevnar a Rojhilata Navîn in. Em bi şêwazekî sade pêşbazî kirin, bêyî merasimekê. Serokê PKK di xanîyê xwe yê sade da bi kevneşopîyên netewî xêrhatina me kir: sivre danîn, ew bi xwe bi mêvanan va mijûl bû, û paşê destpêkir di derbarê kurdên Sovêta berê da pirs û pirsyar kirin: ka em çawa dijîn, çima wisa bû, ku piştî hilweşîna Yekîtîya Sovêtê hemû gelan mafên xwe destanîn, para xwe ji mala giştî hildan, lê kurd bê tişt man? Ma ne, kurdan bi hemûyan ra tevahî beşdarî karê avakirina mala giştî-

tomerî bûne, ew ji êrîşên dagerkeran parastine û jinûva welatê wêrankirî avakirine û rakirine ser pêyan… Lê, weha, kurd dîsa ketine ser rêya penaberîyê ya bêdawî. Û gelek caran van penaberan înkar dikin, di cîyê jîyana nû da wan nanivîsin-niştecîbnûna wan fermî nakin –ji wan ra mercan ava nakin, ku ew hebûna xwe bidomînin… Û kîyê ji bo vê yekê bersîvê bide? Kî dive mercan biafirîne ji bo pêkanîna mafên wan ên welatî, mirovî û netewî?

Pirs in, pirs in, pirs! …

Û evan pirsana netavetî didan ne tenê serokê PPK-ê.

Dema her hevdîtineke me, dema gotebêjan, dema dersên di Akadêmîya Leşkerî-Siyasî ya ARGK-ê da em hewl didin vî mirovê hêja têbigihîjin, ji bo xwe wateya wan lêgêndan (esfane), ên ku li dora navê wî û partîya wî hatine hûnandin, ravebikin, û rastîya vî serokê nebînayî yê gelê nebînayî têbigihîjin.

Dema hevdîtinên di Akadêmîyayê da ew dîsa ew bû – ew mirovê sade û merivhez bû, lê di heman demê da ew dîsa ew mirovê xwedî gotin bû, bi biryar bû û dizanibû çi dibêje. Ewî qîmetê her deqeyeke xwe dizanibû; heya sowbetên wî, lîstikên pêgokê (fûtbolê) û volêybolê bi guhdarvanên Akadêmîyayê ra li deşta sporê ya Akadêmîyayê (gelek caran ewî bi xwe ew lîstik tevger dikirin!) – ji bo wî ew jî demên kar bûn, ew hertim di nav raman û mitaleyan da bû, li ser agahîyên nûhatî da diponijî. Bi fîzîkî ew li vira bû, lê bi ramanên xwe ew li Welêt û li derveyî Welêt bû – bi gelê xwe ra – ew bi pirsgirêkên gelê xwe dijîya. Ênêrjîya wî derbazî te dibe, di nav te da li hember hêzên xwe bawerîyek çê dibe, û li rex Apo tu xwe azad, kêrhatî û xwedî biryar hîs dikî… Û ew wisa zelal li tiştên dijwar û giran dinihêre! … Û ew çawa di rewşên here lihevpiçikî da varîantên here optimal dibîne. *“Ev ji ku tê, gelo,* – me digot, – *ew çi ye, ku mirov wisa berbi wî va dikşîne, gêrîlla çawa û bi çi li dijî artêşa yekmîllîonê şer dikin, a ku heya diranên xwe jî biçekkirî ye?!”*

***Ew vîn û bibiryarbûna wî – ku cîhanê biguhêre, her tiştê xwe yê kesî bihêle û xwe bide karê serkevtina dadwerîyê û mirovbûnê, derbazî mirov jî dibe, û tu dixwazî li rex wî bî, beşdarî destpêkirina karên wî bî, alîkarê wî bî, hevkar û rêhevalê wî bî, … leşkerê wî bî!…***

Xwe bi xwe gotinên wî hatin bîra min, yên ku ewî çar sal berê gotibûn zanyr û rojnamegerê tirk Yalçin Kyûçûk: *“Ez 44 salî me, lê hê jî, wek zarokê xwe di nava karê xwe da bîrdikin, ez karê xwe pêk tînim. Ez lez nakevim, bêhna min pir fireh e, wek ku divînî, her deqeyeke min pir dagirtî ye...”* – Lê ya sereke, ya ku me li bal wî dît – ev e: *ewî heya dawîyê xwe daye îdêya Azadîya Welatê xwe. Û stûna navendî ya kesayetîya wî hûmanîzm e.* Armanca sereke ji bo wî mirov e û azadîya wî, lê di mirov da jî ji bo wî ya sereke kesayetî ye: bi dîtina wî her tenê kesayetî dikarin azad bin û ji yên mayî ra azadîyê bînin. Rizgarkirina Kurdistanê ji bo Ocalan armanceke bi serê xwe nîne: di wê da ew rizgarkirina gelên herêmê dibîne, rizgarkirina mirovahîyê dibîne. *“Û ji bo wê,* – ew dubare dike, – *hêja ye, ku mirov jîyana xwe bide!”*

Dema Ocalanê ciwan ji bo di jîyanê da pêkanîna îdêyayên xwe dest bi têkoşînê dike, dê û bavê wî ramaneke wisa sewdaserî dihejmêrin. *“Tu çi dibêjî,* – wan jêra digot, – *ma di rewşa Tirkîyayê da tiştekî wisa pêkan e?”* Lê bavê wî ber wî digerya:*“Tu çawa dikarî tiştekî wisa bikî? Li dîrokê binihêre: Şêx Seyêd, Seyîd Riza, Şêx Obêydulla û yên dinê gihîştin çi..., tuyê bigihîjî çi?”* – Serok Apo di vê derbarê da dibêje, vedibeşire û didomîne: *“Erê, bi rastî jî... Bi rastî jî pir dijar bû. Mirovan bêhtir ji vejîyana mirîyê hezarsale bawer dikirin, ne ku vejîyana gelê kurd! Îdêologên kemalîzmê bi zorê kirbûn serê mirovan, ku têgehên “kurd” û “Kurdistan” li binpêya çîyayê Agrî binax kirine û li ser ra jî bêton kirine. Lê me bi karê xwe ew kurdê mirî vejîyand. Û naha êdî kurdan nikarin rawestînin! Ne ew bêton, ne têrora dewletê nikarin vîna gelê serhildêr bişkênin, nikarin meşa wî ya berbi azadîyê va rawestînin. Dema me dest bi têkoşîna xwe kir, mirov hebûn, ên ku em bi ciddî nedipejirandin, hineke dinê jî ditirsyan: mirov çawa dikare di derbarê kurdan da biaxive, ew jî di derbarê Kurdistanê da?! Ji bo wê qanûnên Tirkîya “dêmokrat” mirov ceza dikirin, û bi giranî ceza dikirin. Lê me bi şev û roj ji gel ra şirovekir. Bi şev û*

*roj me di derbarê cêribandina têkoşînên rizgarîya netewî yên di cîhanê da xwend (wisa jî ya gelê kurd). Di pêvajoya lêgerînên xwe da me armanc û rêbazên têkoşîna xwe ji watedar kir, me jinûva gelê xwe û xwe nas kirin. Û em roj bi roj dihatin guhartin. Bi wan werguhartinan ra, yên ku di nav gel da pêk dihatin, em jî dihatin veguhartin,. Me xwe û gelê xwe ji paxs û gemara hezarê salan paqij kir, a ku encana rewşa gelê me ya koletîyê bû, ya helwesta suckar a mirovahîyê li hember wî bû. Jîyan diherike, her tişt tê guhartin, bi awayekî dinê nikarî xwe di jîyanê da li ser pêyan xweybikî. Dema me di nav gel da kar dikir, me berhemên keda xwe didîtin; me êdî bi çavekî dinê li gelê xwe dinihêrî, û di eyna wî da me xwe û kêmasîyên xwe didîtin, Di nav gel da artêşeke tam a welatparêzan terbyet bûye. Û encam êdî li ber çavan e, gel rabûye ser pêyan û êdî kesek nikare wî rawestîne. Erê, bi rastî, nikarin gel rawestînin, rêberîya netewî gel derxistye ser wê rêgehê, û ew îro êdî bi wî ra bi rêya serxwebûnê va dimeşe".*

Ew hemû, çi ku me dît, di gotarekê da bi cîh nabe: tenê ji bo vegotina dersên Ocalan, dibe ku pirtûkeke stûr pêwîst bike.

## Akadêmîya... Akadêmîya kurdî!

Em, kurdên Sovêtê (û ne tenê em!), ên ku tenê akadêmîyên bîyanîyan zanibûn, naha ya xwe, ya netewî dîtin: Akadêmîya Leşkerî-Siyasî ya bi navê Mehsûm Korkmaz. Û em, ên ku çûbûn seredana serokê PKK Andullah Ocalan, – hemû jî serbazên Artêşa Sovêtê yên di zexîrê da (yedek subay), – serbilind in, ku gelê me jî Artêşa xwe ya weha heye, Akadêmîya xwe ya weha heye. Ew çi ku me dît, ne hema wisa akadêmîya ye, ew komplêkseke tam e – ji bo perwerde û terbyetkirina kurdê nû, mirovê nû. Li vira exlaqekî nû diafire, nirxên mirovî yên nû, pêwendîyên di navbera mirovan û gelan da jinûva tên watedarkrin. Û pîvana ewî kurdê nû jî Abdullah Ocalan di hevpeyvîneke xwe da şêwaz dayê: *"Em hewl didin, ku karê ku em dikin encamên bi kêr bide. Em hewl didin tîpeke mirov a dêrîn û hêja derxin holê, yê ku terefdarê wekhevîyê û dadwerîyê be, yê ku azadîhez û kedhez be, bi xwezayê ra di nav ahengîyê da be"*. – Û ev bernameyeke rêal e, ya ku îro di her gundekî Kurdistanê da pêk tê, di çîyayên wê da, di Akadêmîyayê û baregehên gîrîllayan da pêk tê. Û me ew hemû bi çavên xwe dîtin û bi bawer bûn: di nava xwe da me Akadêmîya wek qulçikê vejîyandina mirovahîyê, exlaqê nû û nirxên mirovan ên nû nav dikir, li ku bingeha şaristanîya nû ya vejîyanbûyî tê danîn. Û afrandarê wê diyardeyê jî Abdullah Ocalan e. Erê, ya sereke di vê tevgerê da vejinandina nirxên civakî ye. Û ji ber wê jî nûnerên gelek gelan bi aktîvî beşdarî wê dibin: *yên tirk, asorî, alman, ereb, yewnan, înglîz...*

Dema navbera dersan keçeke guhdarvana Akadêmîyayê berbi me hat û bi rêzdarî xwe da nasîn: "Candar" – Paşê ew destê xwe ji hevala xwe ra hejand û tiştek bi tirkî got. Hevalê wergerand: *"Hevala Candar dibêje, ku ew dilşad e, ku bi kurdên Yekîtîya Sovêtê ya berê ra nas dibe. Baş e, ku tevgera me bala we jî dikişîne, ku çarenûsa Kurdistanê netavetîyê dide we jî. Hevala me turkmen e*. – Û Jîyanê (navê wergêra me wisa bû) wergerandina axavtina Candarê ya jînber û geş ji bo me domand: – Lê hûn dizanin, berî ku bi hevalên PKK-î ra nas bibim, min xwe wek tirk dizanibû. Lê – wek tirkeke ne tam, ya sorta doyem. Dê û bavê min bi zanebûn di derbarê wê da tiştek nedigotin. Û dema ez ji hevalan hînbûn, ku di Tirkîyayê da ji bilî tirkan wisa jî gelên dinê hene, yên ku zimanên wan jî ji koma zimanan a tirkî ne, yên ku xwedî jîyana xwe ya rojane ne, xwedî çand û dîrok in, min destpêkir bînim bîra xwe: dema dê û bavê min di derbarê tirkbûna me da diaxivîn timê gotina *"em jî"* lê zêde dikirin, lê di dawîyê da jî "lê" digotin û bi pirwate li çavên me dinihêrîn – bi xwe jî – tirsek di çavên wan da dîyar dibû. Carekê min çend rojan ser hev ji dêya xwe pirsî... û ew destda bû. Dema ez bi hevalên PKK-ê va çûm-hatim, min destpêkir, jîyanê jinûva watedar bikim. Ez têgihîştim, ku em hemû, û di nav wanda wisa jî tirk, hatine nuxsankirin. Ya ku em dijîn – ew ne jîyan e... Û wisa ez gav bi gav beşdarî karê nav gel bûm. Di destpêkê da min tirê, qey ji nûnerên gelê dinê ez tenê me di nav vê tevgerê da. Paşê min dest ji xwendina kûrsa çaran a zanîngeha Ankarê berda (ewê ji bilî koletîyê çi bida min?) û ez çûme çiyê, ji wir jî derbazî Akadêmîyayê bûm*"*.

Min li wê keçê dinihêrî – ewa xilfikî, tenik – û zendegirtî mam: gelo ew ewqas hêza vînê ji ku tîne, ewqas bi prênsîpbûn û bi biryarbûn – dest ji jîyana azad û xwendinê berdaye? Ew çi ye, gelo, ya ku ew anîye vir? Ew çi bûye, ku Heqî Qerar û Kemal Pîr ên bi netewa xwe va tirk anîne vira, ên ku jîyana xwe ji bo azadîya Kurdistanê dane? Ew çi ye, ku îro bi sedan keç û xortên tirk tîne nava vê tevgerê? Nirxên hemmirovahîyê û netavetîya ji bo çarenûsa gelan (di nav wan da – ji bo gelê xwe jî) di vê cîhana han a ne aram – di mala me hemûyan da. Û ew di cîhanê da ji bo wan li ser hemû tiştî ra bûye, û îro jî wisa ye.

Akadêmîya – giraveke serbixwe, mirov dikare bibêje, cîhaneke taybet di xwezaya Rojhilata Navîn a hişk û dijwar da, di nava pêwendîyên lihevpiçikî yên di navbera mirovan û gelan da, yên ku di vê cîhana me ya sûckar da jîyana xwe îdare dikin. Li vir hem gêrîllayên sade, hem jî fermandarên komên gêrîllayan (weke alayên me), birîndar-ne birîndar, hemû jî bi ruh û rewanê xwe va tendurust, hemû weke hev in, hemû guhdarvanên Akadêmîyayekê ne, hemû cengewarên artêşeke rizgarîyê ne, hemû heval in! Û em jî di nava wan da, li rex wana, ketine nava jîyana wan a rojane (tuyê bibêjî em ji roja yekem va di nava wan da bûne!). Ya Xwedê, em çiqas ji wan cuda ne, em çawa berovajî bûne, em çiqasî ji rehên xwe dûrketine, ji gelê xwe! Tenê li vir me destpêkir mirovbûna kal û pîrên xwe yên sade û dilpak têbigihîjin, ên ku pirê caran ji ber wê çawanîya xwe ya sade û dilnimz bûne armanca qerf û tinaz û nuxsankirinên derdorên wan ên ji rêya mirovahîyê xalifî û dûrketî.

Ev cîhan, a ku bi nirxên mirovî va jinûva vejîyan bûye, di vê Cîhana me da bi serê xwe jîyana xwe cuda û xweser didomîne – di vê Cîhana tuje şer û pevçûn û kirêtî da. Û ev hemû çawa dikare di serê mirov da cî bibe? Û mirovekî tenê, komeke xwendkaran, partîyekê çawa dikaribû di nava demeke ewqas kurt da ev hemû nirxên mirovî vejinîne û zêndî bike?!

Û rêzdarîyeke çawa li hember mirov, berbihêrîyeke çawa li hember hev! Ev mirovana çawa dikarin li ser nêrîna xwe bisekinin û bi wê ra wisa jî rastîyê bibînin, ew çiqas jî giran û buha li ser wan rûnî, bi her awahî bidin bawerkirin, û bi xwe jî bawer bikin! Çawa dikarin bûyerên ku di cîhanê da pêk hatine binirxînin û ewê ji wan bûyeran hilçinin, çi ku dê ji bo rizgarkirina Welatê şêrîn pêwîst be û kêrî wê bê, dest ji wê bikişînin, ya ku êdî xilmet bûye û ji bo meşa berbi pêşva dibe asteng! Erê ew wisa pêşva diçin, bi dijwarî, lê diçin (di dîrokê da timê wisa bûye: her tiştê nû, her tiştê pêşverû hertim jî bi keleman ra rûberû maye û bi dijwrî bi pêş va çûye!).

*"Hêza me di vîna me da ye, di gîyana me da ye... û van hemûyan jî gel dide me! Ew paşeroja vî gelî ye, roja wî ya îroyîn e û pêşeroja wî ye, ku bawerîyê didin me! Ew bawerîya wî ya hember ramana azadîyê ye û amadebûna wî ye, ku ji bo pêkanîna wê îdêayê heya dawîyê bimeşe, bawerîyê dide me!"* – Serok Apo ji me ra şirovedikir.

Ewî di derbarê wî gelî da digot, ê ku di navbera gelek sedsalan da dagerkerên bîyanî ew bindest û kole kirine, lê ew gelek caran çek di dêst da li dijî wan zordaran rabûye, lê her carê jî şkestye û daye der, ji ber ku yekîtîya wî nînbûye, kesekî ku hêzên wî bigihîne hev nînbûye. Lê naha – naha êdî gel bi xwe xwedîyê têkoşîna xwe ye, ew li dora rêvebirîya netewî berev bûye û berbi azadîyê û serxwebûnê va diçe. *"Merc û bawerîya serkevtinên me di gelê me da ne, di me bi xwe da ne, naha em bi hîç kesî va girêdayî nînin û naxwazin jî girêdayî bin!"* – Rêberê kurdan bi bawer dibêje.

Hem gel, û hem jî rêberê wî têdigihîjin, xêrxwaz û parazvanê wan ê tek-tenê ew bi xwe ne, tenê divê bi hêza xwe bawer bin, û hêza wan jî yekîtî û bitevgerbûna wan da ye. Belê, dîrokê û çarenûsa tal ew fêrî gelek tiştan kirine, û têgihîştina cêribanndina dîrokî ya weha di her kar û pêwendîyên wan da dîyar dibe. Serok Apo taybetîyên rewşa naha û demajoya dîrokê pir baş têdigihîje: gelê kurd rêyeke xwe ya dîrokî ya tayebet derbaz bûye, di dîroka wî da gelek demên trajîk hebûnê, û ji bilî wê:

*– Çiqasî jî mirov cêribandinên cîhanê li ber çav bigire, dîsa jî her gelek li ser ya xwe hîn dibe,* –Serok Apo dibêje, *– heya li ser şaşîyên xwe!... Û em li vir ji van cuda nînin, ne*

*awarte ne. Ew cêribandina me ye, û em bi kesekî va girêdayî nînin – ne bi madî, û ne bi sîyasî, ne jî bi praktîkî. Cêribandina kurdan a dîrokî ya tal heye. Em gelek kesên berî xwe bi bîr bînin, lo hema yên dema xwe jî. Ew, ên ku xwe piştgirîya derva va girê didan, dema here biryardar da ew hatin firotin, xiyanet bi wan hate kirin. Ya me cuda ye: hêza me di gel da ye, û gelê tu carê xiyanetê ji me ra neke, ji ber ku gel em bi xwe ne.*

Hem dema hevdîtinên di Akadêmîyayê da, hem jî dema hevdîtinên bi gel ra heman tişt dihate gotin: hem ji hêla partîzanan va, hem jî ji hêla mirovên sade va. Weha, di Akadêmîyayê da fermandarê ciwan ê tabûrekê ji me ra çi got:

*– Hûn dizanin, hevalên me yên mezin ji me ra digotin, ku di destpêka têkoşînê da heya dê û bavên wan berê xwe ji wan guhastine, nexwastine wan nas bikin, naha tevahîya gel di wan da azadarên xwe dibîne. Û bi rastî jî, bi xwezayî ye, gel divê bigihîşta wê astê: têkoşîna me ji bo kê ye? Em jî hema gel in, û gel jî ji bo azadîya xwe têkoşînê dimeşîne...*

Dema hevdîtina dawîyê ya bi birêz Abdullah Ocalan ra, di derbarê kurdên Sovêta berê da axavtin vebû – di derbarê çarenûsa wan da, di derbarê vegera wan a Welêt da... Û gelo em ji bo wê amade ne? Û Serok Apo destxweda jî şiroveya wê da:

*– Lê hûn hê bi derûnî (psîkolojî) ne amade ne. Di wan welatan da, li ku kurd ji dêya xwe bûne û mezin bûne, dewletên wan ew bi standartên xwe terbyet kirine – ji bo pêdivîyên xwe, ji bo xwe. Û li vir dijwarîyên berbiçav hene. Lê her dijwarî têne derbazkirin. Ji min û yên temenê min ra dijwartir bû, dema me dest bi têkoşîna xwe kir. Lê me bi karê xwe yê ji bo gihîştina armanca xwe ew dijwarî derbazkirin. Jîyan bê dijarî nabe, pirsgirêkê hertim hebin, lê ya sereke ew e, ku tu gavan paşva neavêjî. Ji bo ku bi rastî vegerin ser rehên xwe, karekî demdirêj û dijwar pêwîst dike. Di sêrî da divê mirov bi derûnî amade bibe. Sibê hûnê di welatê xwe yê serbixwe da bijîn. Lê ji bo wê divê mirov amadekarîyên xwe bike. Di vê têkoşîna xwe da em hemû ji bo wê amadekarîyên xwe dibînin. Kurd amade dibin, ku azad bijîn, ev e armanca meye yekem. Ez bi xwe jî her rojê ji bo wê amadekarîyên xwe dibînim. Bila ev we netirsîne. Mînak, em kesayetîya min hildin. Kî bûm ez? Dibe ku derfetên min kêmtir hebûn, ne ku yên we. Ez ji we lewaztir bûm, Ji bo we di Yekîtîya Sovêtê da, hêç nebe, tiştek hatibû kirin: di demên cuda da, di hinek deveran da heya hinek mercên bi kêr hatibûn sêwirandin. Lê ya min, di dema xwe da tiştekî min jî nînbû, û ez bi xwe jî ji bo wê ne amade bûm. Êdî ez di derbarê mercên Tirkîyayê da nabêjim, li ku tenê ji bo peyva "kurd" anegorî qanûnên wî welatî mirov ceza dikirn. Lê min hema di destpêkê da ji bo xwe biryar da – û ji xwe destpêkir. Û encam jî, hûn bi xwe dibînin, li ber çavan e...*

Sibetirê me ji komeke guhdarên Akadêmîyayê xatirê xwe dixwast, ên ku divê derbazî Welêt bûna. Ewana dilşad bûn, ku diçine Welêt, lê hinek hevalan bi dijwarî xatirê xwe ji wan dixwastin û avijîya xwe li van tanîn, ku diçin, ji bo rizgarîya welêt şer bikin, ji bo rûmet û serxwebûna gelê xwe, lê ew li wir dimînin. Keç û xort rêz bûne – ew di rastîya têkoşîna xwe da bi bawer in û ji bo rêya xwe ya hilbijartî bi biryar in...û cilên gêrîlla jî çawa li wan dihatin, bawerîya wan hêjabûna wan çawa dîyar dikir, ku ew diçin bi dagerkerên bîyanî ra bikevin nava qal û cengê – bi koledarên gelê xwe yên sedê salan ra! Ew hemû ketin rêzê, û em jî bi wan ra rêz bûn – ji bo xatirxwastinê. Erê, em jî, em – kurdên Sovêta berê, ketin rêzê, û hestên wisa yên nêzîk, lê wisa nenas wê demê li bal me dîyar bûn. Çi bextewrî bû, ku yekem car di jîyana xwe da me xwe di rêza şervanên artêşa xwe da dîtin (bila em paşê bi laqirdî ji hev ra bibêjin: *seran-pîran*!), wê artêşê, ya ku sedê salan gelê me di derbarê wê da xiyal kiribû. Tenê hebûna artêşeke wehaye bi tevger û ji bo têkoşînê amade, hêvîyê dide mirov, ku welatê meyê azadîya xwe bi dest bîne.

Hemûyan, bi dorê, xatirê xwe ji hevalan xwastin... Em berxwedikevin, lê ji bo wan ew karekî di rêzê da yê rojane ye. Yek bi yek bi dorê nêzîkî hevalên di rêzê da bûn, xatirê xwe xwastin û ketin rê. Gêrîllayeke keç weha xatirê xwe xwast: *"Heya ku em li ser xaka azad hev dibînin!"* – Ez li çavên wê dinihêrim – çiqas şad e, çiqas xwebawer e, bi biryar e – destê wê diguvêşim û hîs dikim, ku herçar tilîyên wê di nîvî da tunene, ewê ew di nava şêr da windakiribûne (evê ez paşê pê hesyam!), ger wisan e, ewê pevçûnên germ dîtine... Lê tu tişt, ê ku wê ranewestîne, nîne, ew bi dilekî şad diçe, dibe ku diçe diyarê mirinê jî...

Belê, ew amade ye, here diyarê mirinê – ji bo welatê xwe!... Bi rastî, me nizanibû, çawa ji xwe bkira: heya keç diçin welêt biparêzin, lê em çi dikin?! Û li vir bajarên cuda hatin bîra min – yên nas û nenas: keçên temenê wê ji xwe ra şad û bextewar dijîn, dixwînin (ji min ra paşê gotin, ku ewê xwendin li Înglistanê hiştye), bengî dibin, mêrdikin, zarokan mezin dikin... Lê ev keça han neçar e çekê hilde destê xwe, ji ber ku herroj li ber çavê tevahîya mirovahîyê rêjîmên faşîst, ên ku Kurdistan dagerkirine, tevkujîya gelekî pêk tînin...

Carekê min bi laqirdî ji gêrîllayekê pirsî:

– Gelo çima di nav gêrîllayan da ewqas keç hene – çi ye, ji ber wê ye, ji ber ku xort kêm in?

– Çi ye, çima Kurdistan tenê welatê we ye?! – Ewê bersîva min da.

Çi bibêjî, ya me mêran, tiştê ku em li ser hinekî bidin heşê xwe, heye!..

Û tenê naha me destpêkir, wan kurdan têbigihîjin, yên ku di almanîyayê da çalakîya xweşewitandinê pêk anîbûn – wek nîşana şermezarîyê li dijî siyaseta wê dewletê. Erê, Apo rast dibêje, ku ev cîhana *“nivîşkan e, bêexlaq û sûckar e, ew mehkûm e!”* Ma, ev cîhanê çawa li ser ya xwe venebe, dema hovîtîyên faşîstên tirk di Kurdistanê da dibînin, bêdeng dimînin ne bes e, hela ser da jî çekan didin wan cinewirîyan, ji bo ku ew heqê kurdên medenî bên der...

Dema me xatirê xwe ji Akadêmîayê xwest, li me pir giran hat, em hemû dilkovan bûn. Îro di Welatê me da şerekî giran di navbera leşkerên tirk ên dagerker û gêrîllayên ARGK da diçe. Gêrîllayên kurd hewl didin wan zevtkarên bîyanî ji Welatê xwe raqetînin, ên ku li hember binecîyên kurd hovîtîyan pêk tînin, li dijî wan çeka kîmyewî bikartînin, gund û bajaran wêran û talan dikin. Gel jî li dijî van hemû hovîtîyan têkoşîneke bi tevger dimeşîne. Û di wê têkoşînê da hêvîya gel, mercê serkevtinên wî hêza wî ya rêvebir – PKK, hêza wî ya leşkerî – ARGK û tevgera wî ya netewî – ERNK gav bi gav azadî û serxwebûna wî nêzîk dikin, a ku gel ewqas daxwez kirye.

Û ev têgehana çiqas giranbuha ne ji bo kurdan, ji bo Serok Apo! Û çiqasî ewan ji bo rêberê kurdan giranbuha ne, ewqas jî gêrîllayên ciwan ên ARGK ji bo wî giranbuha ne, yên ku dê armancên gel bînin sêrî...

Weha, di Akadêmîayê da gêrîllayê bi navê Amed çi ji me ra got:

– Piştî bidawîkirina perwerdeyê ya di baregehê da (Akadêmya dê hê paşê sazbibe) em amade dibûn, derbazî Welêt bin. Dema xatirxwastinê Serok got:

*– Bê wate û armanc jîyana xwe nekin xeterê. Xwe bê wate gorî nekin, me ji bo wê hûn amade nekirine, lez nekevin, tenê li wir rîsk bikin, li ku pêwîstîya wê hebe. Eger yek di rûyê we da vala-vala jîyana xwe bike xeterê, emê dada we bikin, hûn li ku jî hebin, hizkî mirî bin jî. Qîmetê xwe bizanibin, vala-vala xwe dêris nekin, hûn li Welatê xwe pêwîst in.*

Û van gotinan hemû jî dizanin û bibîrtînin – hem gêrîllayên kevn, hem jî yên nûhatî! – Gêrîllayê xwedî cêribandin gotina xwe bidawî kir...

Di rê da, dema em ji Akadêmîayê diçûne mal, gotinên Serok Apo hatin bîra min: *“Kurdistan welatê hemû kurdan e, ew li ku dibin, bila bibin. Ji bo dayîkê hemû zarok jî yek in. Ew, çi ku we îro dît, ji bo kurdistanîyan û kurdên tevahîya cîhanê tê kirin. Û çi ku îro dagerker di Welêt da pêk tînin, ew dijî me hemûyan e!”*

***Di derbarê vî mirovê behredar (talanted) da gelek hatye nivîsar, û wê hê gelekî jî binivîsin. Û wê gelekên di derbarê fênomêna Abdullah Ocalan da binivîsin – mirov, ê ku hêvî û daxwazên tavahîya gelekî di nav xwe da navendkirye, yê ku bûye sembola bîrewarî, lehengî û bibiryarbûna kurdan...***

Lê di Kurdistanê da hevdîtinên me yên bi gel ra ştrîxên (xêzik-dêtayî) nû li portrêyê wî mirovê mezin zêde kirin...

## KURDISTAN!

Xewna me, ku emê rojekê Kurdistanê bibînin, pêk hat û bû rastî, lê ne tam: ji çar parçeyên Kurdistanê me dikaribû tenê herin parçeyekî – Başûrê Biçûk (beşê Sûrîyayê –

Rojava), yê ku li ser rêya me bû, û em dikaribûn hêsa herin û bi gel ra biaxivin.

Erê, em çûne parçeyekî welatê xweyî kal û bavan, ê ku me nedîtibû. Berî 200 salî zêdetir pêşîyên me, ji bo ku xwe ji tevkujîya Roma Reş rizgar bikin, ji wîr revîbûne, xwe li Rûsîyayê girtibûn.

Wek ku hemû xaka Kurdistana îro, ev beşê wê jî bi peykerên dîrokî yên şaristanîyên cuda dewlemend e – yên dema asorîyan, medan, romîyan, vîzansîyan. Û welatîyên me yên vî beşî em bi dilekî germ pêşbazî kirin. Ewan bi dil û baldarîyeke mezin ew dewlemendîyên dîrokî nîşanî me dan, şiroveyên xwe di derbarê dîroka mirovahîyê da ji me ra anîn zimên – anegorî têgihîştina xwe, ya ku pirê caran dijberî wê ye, ya ku ji hêla hemûyan va hatye pejirandin, û di helwesta xwe da pirê caran ew şiroveyên wan bêhtir obyêktîv bûn û wisa sade bûn, ku dihatin bawerkirin û diketin heşê mirov.

Li ser girê Eyn-Dara, li ku kelayên kevnar ên nîv-wêranbûyî hê jî li ser pêyan mabûn, xortên binecî bi germî ji me ra dîroka Kurdistanê vedigotin, di derbarê şerên rizgarîyê û bi taybet jî di derbarê hêztirîn tevgera azadîxwaz a li Bakûrê Kurdistanê da.

– *Û kî dizane,* – yekî ji wan ê bi navê Ciwan got, – *dibe ku di tamarên me ra xwîna wan diherike, yên ku ev kela hanê avakirine, an jî ya wan, ên ku ew parastine, an bi şer hildane û wêrankirine.... Kî dizane? Û em zureta evan hemû şaristanîyan in, îro li ser van kilafeyan sekinîne – li ser durêyana dîrokê, û bi me va pêwendîdar e, ka emê ji vir û pêva bi ku va herin!* – Dema ewî xortê ciwan digot "bi me va pêwendîdar e", gotina wî ne tenê ji bo kurdan bû, lê ji bo me hemûyan, ji bo hemû mirovan bû, ji bo mirovahîyê bû. Û ev jî dihate wê wateyê, ku hemû mirov divê hewl bidin, ku li rû erdê êdî kilafeyên (xerabe) nû yên berhemên afrandarîya mirov çê nebin. Ku hemû mirov divê di aştî û aramîyê da bijîn, bi dostanî û di wekhevîyê da... Û ev daxweza hemû kurdan bû, di nav wan da wisa jî ya Abdullah Ocalan, ê ku dema rêwîtîya me daûstandinên me bi wî ra pêk hatin...

Daxwaz li hêlekê, lê em carna rastî dîtinên weha dihatin: *"Ev hemû baş e, eger mirov bi rastî mirov bin. Lê eger li dora te hemû hovên dirinde ne?"* – An: *"Na, her gelek bi xwe ji bo çarenûsa xwe bersîvdar e!"* – Lê hinek jî hebûn, ên ku ew nêrîn red dikirin.

Em rastî nêrînek a weha jî hatin:

–*Em neteweke nebînayî ne,* – kalkê Ferat bi dilekî kul digot. – *Ay, tu dikarî ji min ra şirove bikî, ji bo çi em wisa bûne: carna yekî bîyanî yê bêkêr, yê ku di nav her tiştî da ê herî dawîyê bûye, qîmetê wî li bal me hê mezin e, û ew li bal me xwedî rêz e, ne ku rayedarê me bi xwe, yê ku aqilbend e, leheng e, xwedî cêribandineke mezin e; hertim ji me her yekî berbi alîyekî va kişandye... Û rêvebirên me, şûna ku bigihîjin hev û bibin yek, bi hemû hêzên xwe va li dijî dijminê me hemûyan bitêkoşin, demên here dijwar da xiyanet ji hev ra kirine, an jî, ya here baş, vekişyane, xwe dane hêlekê. Û kî ser ketye?! Na, kurê min,* – kalê 80 salî carekê bêhnek li cixara xwe xist, – *di gelek cîyan da em bi xwe gunehkar bûne... Erê, erê, em bi xwe gunehkar bûne, ku em ewqas dem ji azadîyê û dewleta xwe merûm mane. Em ne hêja bûne ku dewleta me hebe. Naha tiştekî dinê ye, gelê me êdî hêjayî wê ye. Lê naha jî mirovên wisa yên xwefiroş û ketî hene... yên weke Tahar Adîaman. Tfû! Heya nav-dilê mirov hev dikevin, dema wî navî didî! Di nav me da pîsên wisa jî hene. De bêjin, mirov ji pezê wisa yê bêmejû çi dikare hilde! Mala Xwedê ava be, naha gelê me êdî hatye guhartin, naha hemû bi rêberê me ra ne, bi raperîna gelê me ra ne. Lê gazinên min ji rêbrîya me jî hene. Eger ez heya wê demê bijîm (dibe ku Xwedayê sebir bike, wê heya wî çaxî banî min li dinya wîalin neke!), ezê herim bal Serok Apo û bêjim wî: "Ew çawa wisa dibe, he?! Ew faşîstên tirkan, ew merivxurana gund û bajarên me li rû erdê ra rast dikin, çeka kîmyewî li hember gel bikar tînin, gelekî tam tunedikin, lê yên me tenê bi çalakîyên li dijî sazîyên wan ên leşkerî û baregehên wan ên di Kurdistanê da bi sînor dibin?"* – Ew, çi ku di Şamê da kalkê Ferat, ê ku bi mêvanî ji Amedê hatibû, ji me ra got, penaberk a ji Şirnaxê jî hinekî bi awayekî dinê anî zimên:

– *Divê mirov bi çeka wan nemirovan bersîva wan bide,* – ew bi hemû bedena xwe va dilerizî, zimanê wê giran dibû, lê gotina xwe bê rawestan domand, – *ca we rewşa bajarê me bidîta, ez çi dibêjim, bajarekî wisa, tenê kilafe (xerabe) jê mane... Lê çiqas zarok, kal û*

*pîr û jin hatine kuştin? Mirov jê sawê dikişîne, dojeha rastîn di ser serê me da hilşya, û kîyê ji bo wê bersîvê bide, û kîyê ji bo wê bipirse? Jixwe emê bipirsin!* – Ewê hêsirên xwe paqij kirin û domand: – *Li dijî van dirindeyan tu jî divê hema bi çeka wan şer bikî... Hîvîyeke min ji we heye, birayên min, eger hûn Apo bibînin, jêra bibêjin, eger dijmin gelê medenî nahêvşîne, egr dijmin ...* – ewê êdî nikaribû axavtina xwe bidomîne, ew bînçikyayî dibû, û dota wê banzda, dermanan bigihînê...

Gelê me heya çi astê siyasî bûye! Kalkê Ferat rast digot, gelê me êdî bûye xwedîyê hemû taybetmendîyên netewî û amade ye bi destê xwe dewleta xwe ava bike. Di vê da em hem di Akadêmîayê da, hem jî di Kurdistanê da bi bawer bûn.

Ew li her cîyan dîyar dibû, li her cîyan, em kuda jî diçûn, hem li Efrînê, hem, li Dêrikê, hem li Qamuşloyê, hem li Cizîrê... Gel tenê bi pirsgirêkên xwe yên rojane nedijya, gel tevger bibû. Bi dewletî ramankirina wan li hember desthilatdarîya Sûrîyayê jî dîyar dibû. Di nav kurdan da rêzgirtineke bi çap û pîvan li hember qanûnên Sûrîyayê dihate xuyan, bi taybetî jî li hember Hafiz Esed...

Di jîyana mirovan a rojane da tenê xem û xerêqek hebû: çawa alîkarîyê bidin Welêt, çawa alîkarîyê bidin têkoşîna xwe. Û tevahîya gel, wek organîzmeke yekgirtî bi ramanekê dijî – ku ew hemû û her yekî ji wan cuda, keda xwe dikin nava tevgera netewî ya giştî. Ji van deran bi hezaran keç û xort çûne çîyê (di nav wan da hem ereb, hem jî asorî), û kesek nikare wana rawestîne.

Weha, dayka gêrîllayê pakrewanbûyî – dayka Necîfe, bi xwe jî ereb, çi ji me ra got:

– *Mirovbûn bi navnîşanên netewî nayê pîvan... Bayron kî bû?* – (Min bi zorekê matmabûna xwe veşart: ew ji ku di derbarê Bayron da dizane?) – *Înglîz bû, ne wilo? Û tu çi dibêjî, ew çira çû, ji bo Yewnanistanê bimire? Helbet mirovtî di nav wî da axivye, û bi xwe ewî xwe deyndar dîtye...*

– *Rast e,* – min gotina wê piştrast kir – *lê ji ku?...*

– *A, dixwazî bibêjî, ez ji ku di derbarê Bayron da dizanim? Ez bibêjim, birangê minî hêja,* – bi kurdîyeke paqij ewê got, – *weha, dema lawê min bi cînarê me – xwendkarê kurd ra hate mal, di derbarê kurdan, pirsgirêkên wan, têkoşîna wan da gotin... Çi gunehê xwe veşêrim, piştî wê, dema Sîpan (navê wî xortî ye!) çû, min ji lawê xwe pirsî:*

– *Çi karê te bi wan şer û pevçûnan heye, lawo? Rast e, dilê mirov dêşe, lê ew bi xwe ditêkoşin, û heya baş jî şer dikin! – Hûn dizanin, ewî çi ji min ra got?*

– *?* – Min bi pirs li wê nihêrî!

– *Ew ber xwe ket, heya çavên wî tuje hêsir bûn, û weha got:*

– *Ay, ay, ay, îja tu çi dayîk î?! Tu çawa dikarî ji xwe ra wisa hêsa bijîyî? Ay ezê naha di derbarê mirovekî da ji te ra bibêjim...*

– *Û ewî di derbarê ewî mirovê nebînayî da ji min ra got, paşê ewan herduyan ji min ra gelek tiştên balkêş gotin...*

Ne tenê ewê dayka hêja em matma kirin. Di Helebê da em mêvanê dostekî bûn, tevahîya malbata wî bi xewn û xiyalekê dijya: kêrî têkoşîna netewî bên, di nava rêzên têkoşerên rizgarîya Kurdistanê da bin. Û, va ye, em rûniştine, sowbet dikin, û, ji nişkêva Mazlûmê biçûk (bi hezkirin navê Mazlûm Doxan ew nav lê kiribûn) direve hindur û dike qîrîn: *"Kalko û pîrkê hatin!"* – Jin û mêrekî navsere, derdorê 65 salî hatin hindur. Ew ji herêma Cizîrê hatibûn, hatibûn mêvanîya birazîyên xwe.

Em rûniştin, axivîn, û, jinişkêva xatya Tawê destpê dike, ji me ra propagandayê dike. Li vir xwedîyê malê, Seîd dikaeve nava axavtinê: *"Propaganda xwe bihêle, te tirê mêvanên me ji Yekîtîya Sovêtê ne, û tiştekî nizanin? Ew haj ji her tiştî jî hene!.."* Paşê me bi wê dapîra delal ra li ser têgihîştina cîhanê, têkilîyên di navbera mirovan da, di derbarê heqî û neheqîyê da sowbet kir. Lê ya here balkêş ew bû, ku ewê bi xwe li ser mêtafîzîkê û dîalêktîkayê dest bi sowbetê kir... Ewê bi baldarîyeke mezin di derbarê dîroka kurdî da sowbet dikir, di derbarê tevgerên rizgarîxwaz da dizanibû... Ewê bi mêrê xwe va di derbarê hunera kurdî ya gelêrî da bi dil sowbet meşandin... Hevdîtinên wehaye balkêş di tevahîya rêwîtîya me da pêk hatin.

Malbetên ku ji wan kesek di nav tevgera rizgarîxwaz da pakrewan nebûbûya, an kesekî wan di nav wê têkoşînê da nînbûya, zêde rûyê wan nedigirt, derên nava civakê. Jixwe dê û bav û pismamên pakrewanan di nav gel da xwedî rûmeteke mezin û rêzgirtinê ne. Bawer bikî, malbeteke wisa nîne, ku têkoşerek jê derneketibe. Hene malbat, ên ku 3-4 pakrewanên wan hene. Dema agahîya pakrewanbûna yekî an yekê distînin, şînê nakin, berovajî wê, bi wê serbilind dibin. Dema destpêkê bêdeng ji bîranîna ya/yê pakrewan ra rêz digirn, paşê di derbarê wê/wî da diaxivin, û hemû bi hev ra dibêjin: *“Pakrewanên têkoşîna ji bo rizgarîya Welêt nemir in!..”*

Dema em çûne seredana dayîkekê, a ku vê dawîyê lawê wê pakrewan bibû, ewê em pir sade pêşbazî kirin û bi serbilindî got: *“Tenê bi vê rê,* – ewê dayîkê got, – *emê bikaribin bigihîjin armanca xwe – azadî û serxwebûna Welatê xwe. Heya têkoşîna me zêndî ye, heya gelê me zêndî ye, pakrewanên me zêndî ne. Tenê wê demê mirinê wan biqeside, dema kesek nemîne, ku karê wan bidomîne, dema kesek nemîne, yê ku çeka wan bilind bike...”* – Û ewê ji bo ruhê hemû lehengên meşa azadîyê drozgeyek xwend.

... Û serhatîke weha jî li Welêt ji me ra gotin: “Dayîkek çar lawên wê hebûne, di têkoşîna ji bo rizgarîya Welêt da sê lawên wê pakrewan dibin, ew bi serbilindî yê çaran jî dişîne... Lê dema ew jî pakrewan dibe, vê carê ew reşê girê dide û şînê dike. Û dema cînara wan dipirse, gelo çima ew ji bo pakrewanbûna hersêkên pêşin negirya, lê ji bo yê çaran digirî, şînê dike, gelo ew zêde şîrin bûye di ber dilê wê da? – Ew dibêje: *“Na, ew hemû lawên min ên delalî û ber dilê min da şîrin bûne, min ji hemûyan jî weke hev hez dikir... Lê ez ji bo wê digirîm, ku êdî kes nema, ez bişînim dijî dagerkerê Welatê xwe”.*

...Carekê dema di Akadêmîayê da bi gotinên *“Serokê min!”* berbirî Abdullah Ocalan dibin, ew dibêje:

*–Serokê min jî, serokê we jî ew pakrewan in, ên ku ji bo azadîya Welêt jîyana xwe dane, û divê em hewl bidin, ku hêjayê navê wan bibin!*

Bi rastî, tuyê bibêjî em ketine cîhaneke cuda, nava pîvanne dinê...

Îro şer li jîyana Kurdistanê hatye ferzkirin. Û tevahîya gel, ji biçûk heya mezin, beşdarî wî şerî dibe – şerê nîştîmanî, yê rizgarîyê!...

Xortekî 17-18 salî, yê ku dixwest here çîyê, bibe gêrîlla, digot:

– Binihêrin, bêdadîyeke çawa di vê cîhanê da desthilatdar e. Cîhan wan dewletan nas dike, yên ku Kurdistan di nava xwe da çarparçekirine. Lê ew ne anegorî vîna me ye, ne jî anegorî berjewendîyên gelê me ya. Welatê me hatye dagerkirin, û ji bo me yek e, dijimin duh ketye axa me, yan jî, em bibêjin, dused sal berê. Em hesab dikin, ku dijmin Welatê me duh dagerkirye, û em divê wî ji wir raqetînin! – Û min jinûva heman vîn hîs kir û bêyî hemdî xwe pirsî:

– *Çi ye, tu êdî çûyî Akadîmîayê?...*

– Heya naha we hîs nekiribû, ku Akadêmîa tenê bi dîwarên Akadêmîayê sînor nabe? – Naha tevahîya Welêt bûye Akadêmîa, tevahîya gel îro hem bi xwe hîn dibe, hem jî hîn dike...

Bi zarê wî ciwanî rastî diaxivî: em kuda jî neçûna, hemû agahdar bûn, hemû jî – ji biçûk heya mezin, ji kurikên biçûk heya kalên zemande bi siaysî qal bibûn:

*–Ê-ê-ê,* – kalkê Welî axînek rahişt, – *naha dora me hatye. Demeke dirêj me – kurdan xizmeta xelkê kirye, dewllet avakirine – dîsa jî ji bo bîyanîyan, ji bo bîyanîyan nivîsye, avakirye, straye...heya ji bona bîyanîyan giryane... Naha dem pêra gihîştye, ku em xizmetê ji gelê xwe ra bikin. Ezê ji te ra serhatîyeke balkê vebêjim, kurê min,* – ewî kur û dûr li kûrahîya çavên min nihêrî. – *Min ev serhatîya ji hineke dinê bihîstye. Nizanim, gelo ew bi rastî pêk hatye, yanê ji hêla kurdekî bi aqil va hatye afrandin, lê dîsa jî, naveroka wê gelekî pirwate ye. Dibêjin, ku gelek salan berê kurdek ji Cizîrê tê Şamê, karê xwe dibe sêrî, lê ji otobûsê derengî dimîne, nikare vegere gundê xwe, lewra jî dixwaze di hotêlê da bi cîh bibe – ji bo şevekê. Lê li wira wî hilnadin, ji ber ku li şûna paseportê belgeyê bêwetenêîyê li bal wî hebûye (ew ji wan kurdan bûye, yên ku, her çiqas bi dehsaln di*

*Sûrîyayê da niştecî bûne, dewletê daxweza wan a mafê hemwelatîyê red kirye û li şûna wê kaxazek daye wan) ... Ew hîvî-lava dike, lê tiştek jê dernayê. Wê demê ew dipirse:*

*–Baş e, ger wisan e, hûn dikarin gora Saleheddîn nîşanî min bidin*? – Karmendên hotêlê wa bi guman li wî dinihêrin: *"Evê çi ji gora Saleheddîn bike?"* – Lê ew ji ya xwe nayê xarê, û yek ji wan wî dibe ber mezergeha Saleheddîn... Û, bi vî awahî, ev kurda diçe ber gora sazûmankarê xelîfeta ereban û diqîre: *"Ka rabe, hela rabe û binihêre, lo! Binihêre, ka te çi kirye! De rabe, lo-o-o! Binihêre, te ji wana ra împêratorîyek avakir, ew ji tunebûnê rizgarkirin, nîvê cîhanê ji bo wan hilda, lê ew îro naxwazin min –hemqewmîyê te, şevekê jî di hotêlê da bihewînin!"...*

... Kurdistan – welatê lêgêndan (esfaneyan)! ... Lê îro kordistanî bi saya vîna xwe, bi saya exlaqê xw, lehengîya xwe bi xwe bûne lêgênd. Kê dikaribû bawer bikira, ku mirovên Rojhilatê, yên ku nedihîştin, keçên wan heya bi kurmam û kurxalên xwe ra ji mal dekevin, îro bê astengî dihêlin, ku ew herin çîyê – bibin gêrîlla! Û îro ew jin, ên ku mil bi mil bi mêran ra weke hev li dijî dagerkerên bîyanî şer dikin, ji şeş hezaran zêdetir in!

Di vê da em di Akadêmîayê da bi bawer bûn: nîvê guhadarvanên Akadêmîayê keç bûn.

*–Hûn van keçan dibînin, – fermadarekî bi navê hevalê Rênas got. – Ew hemû bi destûra dê û bavên xwe hatine, ji ber ku rêjîma tirk har bûye: gund û bajarên me bombebaran dike, çaralî wêranî û penaberî ye. Lê gel êdî qîmetê serxwebûn û azadîyê dizane! Ne bi têrora dewletê, ne bi çekên kîmyewî, ne bi tiştekî dinê ew êdî nikarin gel rawestînin. A, hema evê daxweza bicîanîna armanca gel a giştî, evê têkoşînê gelek nirxên netewî vejîyandin û zêndî kirin, di nav wan da wisa jî, exlaqê netewî û azadîya jinê... Hemû jî dizanin, ku di Rojhilatê da jina kurd bi azadîya xwe ji yên gelê dinê cuda dibe. Û ev azadî jî têkojîna me vejîyand,* – hevalê Rênas bi serbilindî gotina xwe domand. – *Yên ku diçin, dizanin, ku wek mirovne weke hev diçin, wek heval diçin, berbi armancekê va diçin – berbi azadîya Welatê xwe va... Çaralî dibêjin: "Kurdistan welatê hemû kurdistanîyan e!"*

*– Kî di Kordistanê da dijîn? Krdistanî, ne wilo!? – Pîrka Gulnaz di Efrînê da ji me ra dibêje. – Va, Serokê me dibêje, ku nîvê kurdistanîyan jin in, û ewana ji xwedîyên vî welatî ne – weke hemûyan. Ê, ger wisane, divê ew xwedî li mala xwe derkevin, wê biparêzin! Lê êdî kî?*

Û, wek ku tê xuyan, ev dîtin hema wisa ji cîyekî vala nehatye, ma ne, jimêjva kurd gelê Rojhilatê yê herî leheng û şervan hatine naskirin. Lê pêşîyên kurdan jî gotine: *"Şêr şêr e, çi jin, çi mêre!"*

A, li vira axavtina min a di akadêmîayê da ya bi keçên partîzan Jîyan û Çîçekê ra hate bîra min. Ew herdu jî pir ciwan bûne û mîna hemû keçên cîhanê bûne. Ne zêde demek dûr bû, ku herduyan jî dixwend – yekê di zanîngehê da ji bo bijişkîyê, ya dinê di xwendegehê (kolêc) da ji bo darayzanîyê (êkonomîstîyê).

– *Çi hûn anîn nava têkoşînê?* – Min ji wan pirsî.

– *Çi em anîn?* – Jîyan pirsa min dubare dike. – *Çi dikarbû em banyana?... Weha binihêrin, gelê 35 mîllîonê dewleta xwe nîne, welatê me çarparçekirî ye, mafên me yên mirovî û netewî hatine binpêkirin, û ev jî ne bese, hebûna netewa kurd bi xwe jî di welatê wî bi xwe da înkar dikin. Mînak, li bal me di malê da (bajarê Wanê) ji bilî kurdî em tucar bi zimanekî dinê neaxivîne, min dizanibû, ku ez kurd im, min stranên kurdî distran, min govenda kurdî gerandye, dawîya dawîyê, ez bi kurdî giryame..., lê di Tirkîyayê da hewl didan, bidin peytandin, ku kurd nînin!*

– *Û em bi çi ji tirkan, ereban, farisan û ji gelên dinê kêmtir in?* – Çîçek beşdarî axavtinê bû, – *naha êdî di nav tirkan da mirovne wisa hene, ku çarenûsa kurdan û Kurdistanê netavetîyê dide wan. Û naha di nav rêzên me da keç û xortên tirk jî hene... Çi ku em dixwazin, hem bi qanûnî, hem bi dadwerî digihîje me. Û em tiştekî xelkê jî naxwazin.*

*–Ma ne, hemû gelên cîhanê jizûva mafên xwe yên netewî dest anîne?* – Jîyan serda zêde dike. – *Û gelê me êdî naxwaze û nikare di rewşeke weha ya bê maf û bindest da bijî, ev jî ne bes e, di bin êrîşên têrora dewletê û tevkujîyê da!..*

Erê, wisan e, Kurdistan ji her alîyan va li ser Tirkîyayê pir buha rûdinî, her çiqas dewlet hê jî naxwaze wê bibîne.

Kurdistan ne tenê welatê lêgêndan (efsane) e, lê wisa jî welatê vejîyandina mirovahîyê û têkilîyên mirovî ye, li ku her endamekî civakê bêhnvedana jîyana siyasî hîs dike, û beşdarî şêwazdayîna dîplomasîya gelêrî dibe... Ev welatek e, yê ku çêtirîn mirovên cîhanê yên xwedî zên neçar dike, ku ew bi pirsgirêka wê va mijûl bibin, jêra çareserîyê bigerin... ji ber ku Kurdistan êşa mirovahîyê ye: di rizgarîya Kurdistanê da mirovahîyê bigihîje rizgarîya xwe.

Di Kurdistanê da gel bi awayê xwe lêdana dilê demê hîs dike, bi rêalî li rewşa tiştan dinihêre û, her çiqas di pişt her nêrînekê da her yek cêribandina xwe, felsefa xwe ya jîyanê heye, lê dîsa jî bi giştî ew weke hev dertên.

Hinek dibêjin, ji bo wê zulm û zordarîyê, ya ku faşîst di Kurdistanê da pêk tînin, gelê tirk gunehkar e. Hinek ên dinê rêjîmê gunehkar dibînin. *"Di temamîya dîroka xwe da, – hinek li dijî vê nêrînê derdikevin –, tirkan nikaribûye hîç rêjîmekê saz bike, ya ku bi dêmê xw va mirovî be. Helbet, rast e, ji roja damezirandina PKK va gelek nûnerên gelê tirk di nav têkoşînê da ne, û îro jî kesayetîyên navdar piştgirîya tevgera me dikin, yên wek Yalçin Kûçûk û Îsmaîl Bêşîkçî. Lê heya vê demê tirkan di nav xwe da wêrekî nedîtine, ku gunehê xwe bipejirînin û xwe xwemukur bên... Û heya ew wisa ye, heya gelê tirk gunehê xwe, yê ku wî dijî mirovahîyê pêk anye, xwemikur nehatye, di welêt da bi xwepaqijkirinê negihîştye dêmokrasîya rastîn, ewê li ser ya xwe vebe"...*

Bi kê ra jî em axivîn – bi karkeran ra, rewşenbîran ra, gundîyan ra, bi karsazan ra, wan hemûyan jî bi bawer û biryar digotin, ku di vê têkoşînê da divê hemû li dora rêbirîya netewî bibin yek. Rêberî, ya ku ji her demê bêhtir bi gel ra bûye yek, û gel jî di wê da rizgarîya xwe dibîne û li dû wî dimeşe...

Kurdistan çiqas dewlemend e! Ew bi neftê û zeytûnê dewlemend e, bi tsîtrûsan û nanê xwe, ew wisa jî bi kanên xwe yên mirovî va dewlemend e... Ew wisa jî bi dilovanîya mirovî va dewlemend e, bi bedewîya xwezayê û ya mirovan, bi çanda rewanî va. Gelê wî bi rengawazên "gulistana" xwe va dewlemend e: sunnî û elewî, êzdî û xrîstîan! Û di nav van kurdên "cuda" da – asorî, ereb, tirk, turkman, ermenî, kildanî, adirbêcanî... Kê gotye, ku Kurdistan tenê welatê kurdan e?! Ew welatê wan e, yên ku ji dewr û zemanan va li wiraa li rex hev jîyane û îro jî dijîn, û ji bo azadîya welatê xwe ditêkoşe. Ewana hemû Kurdistanê bi rastî welatê xwe dibînin, û, wek xwedîyên wê dewlemendîyê, bi hev ra dijîn û bi hev ra jî wê diparêzin.

Û Kurdistanê bi hevgirtina hemû dot û lawên xwe her û her serbikeve. Hemû kurdistanîyan jî em bi dil pêşbazî kirin. Û, her çiqas şerekî gemar hebû, yê ku di Kurdistanê da rêjîmên faşîst tevdaxistine, ji bo kurdên Sovêta berê dilovanî û xemxurîya xw diyar dikirin.

Û şerm ji rêvebirîyên wan dewletan ra, yên ku sîyaseta têrora derûnî (psîkolojî) û bişavtina binecîyên kurd dimeşînin, yên ku bê veşartin fortê xwe didin, ku komara xwe ji hêmanên bîyanî "paqijkirine" (û ewê "keda" partîya xwe dibînin) – şerm ji wan ra, yên ku bi sazîya "monoêtnîk" ya komara xwe serbilind dibin! Lê di Kurdistanê da, her çiqas ewê hê serxwebûn dest neanye jî, bi saya siyaseta PKK-ê, nûnerên hemû gelan bi hev ra wek dost û bira dijîn û bi hev ra bi dostanî jî têkoşîna xwe dimeşînin.

***Kurdistan! ... Wê hela hê rojnameger û nivîskarê bêne wir, ewê hê hewl bidin, ji bo xwe surên vî welatê dercîhanî (êkzotîk) vekin, ewê hê di derbarê bilindbûna ruhê netewî yê gelê wêyî nebînayî da binivîsin, û, helbet, di derbarê rêberê wî yê nebînayî da! ... Ewê hewl bidin bersîvên wan pirsan bibînin, ên ku dertên pêşîya wan, û dawîya dawîyê, wek ku tê xuyan, ewê têbigihîjin, ka ew çi bûye, ku kurd neçar kirine, ku ew çekê hildin destê xwe, ew çi bûye, ku keç û xortên kurd neçar kirine, ku ew wek nîşana şermazarîyê li dijî bêdadîyê, çalakîya xweşewitandinê pêk anîne. Wek ku tê xuyan, ewê tê bigihîjin, ka mabesta komîsarê polîsa Almanyayê çi bûye, dema piştî axavtinaên nûnerên parlamêntoyên welatên cuda ên di mîrîcana çanda kurdî ya Frankfûrtê da, gotibû: "Ez***

***tênagihîjim, PKK naha rêxistina kurdî ye, yan a navnetewî ye?" Û dibe ku ewana tê bigihîjin, ka gelê kurd çima hem di Welêt da, hem jî li derveyî welêt bi xwepêşandanên sedhezarî piştgirîya xwe ji bo PKK dîyar dikin û bi yekdengî bang dikin: "Bi can, bi xwîn em bi te ra ne, ey Serok!"...***


Lê vê demê em hê di hewşa Sîabend da (di bajarê Qamuşloyê da) rûniştine, li dora fîncana qawê di derbarê tiştên cuda da sowbet dikin... Ji me dûr – di esmîn da "sênîya" hîvê ya zîvîn pir lewaz ronî dike, werzebayekî sivik, nizanî ji ku, bîna gulistana "rojhilatî" digihîne me...

...Tuyê bibêjî, divê berê meyî li çûyînê bûya. Lê hîç dile me nedigirt, ku em herin, ma ne, em lap nêzîk bûn, lap li rex Welêt bûn... Bi van rêyan ra pêşîyên me çûne û hatine, bi van rêyan ra kerwan berbi hêztirîn împêratorîya Medyayê va kişyane, bi van rêyan ra dagerkerên bîyanî êrîş anîne ser Kurdistanê... Bi van rêyan ra kurdistanî neçr bûne li cîhanê belav bibin, bi van rêyan ra şoreşgerên kurd neçar bûne welatê xwe biterikînin. Lê hema bi van rêyan ra jî ew careke dinê vegeryane Welêt. Û em, bêyî hemdî xwe, li şopên wan digerin, yên ku berbi azadî û serxwebûna Kurdistanê va dibin...

Sibetirê dema xatirxwastinê me ji dostên xwe ra got:

– Emê hesab bikin, ku em bi demeke kurt ji bo kar ji welatê xwe diçin û emê zûtirekê vegerin... Dema xatirê we, heya hevdîtinê!

Û rojeke havîna Şamê ya pir germ otobûs li rex daristan û rezên tiryan ra berbi ayrportê va dipeke. Li wir xortê ciwan, dema paseportên me yên sovêtî dibîne, bi rûsîyeke şkestî me slav dike û, piştî ku bilêtên me yên tranzît dinihêre, rêya berbi balafirê va nîşanî me dide...



**Korda Mad**
**Moskova-Rojhilata Navîn-Moskova, hezîran – tîrmeh, s. 1994**

# PIRSGIRÊKA KURDÎ
# …Cîhanê ji bo çareserkirina wê çi rêyan pêşnîyar bike?[2]

## 1. Di navbera şêr û aştîyê da

*Cîhanê ew yek li ber çavên xwe dît, ya ku salekê berê wê nikaribûya heya di xewna xwe da jî banya ber çavên xwe. Di nav axavtinên rêvebirên Komara Tirkîyayê (KT) da li şûna gotinên berê, yên weke: "...Emê tunebikin!... Emê... bahara tê..., havînê...paîzê dawîya wan bînin!", êdî gotinên dinê cîyê xwe girtibûn – yên weke: "...divê destekê bidin pêvajoya dêmokrasîyê di welêt da!". Û ev her dikaribû pey axavtina rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan ra pêkan bûya, ya ku ewî di dadgeha taybet a girava Îmralîyê da pêşkêş kiribû (têksta wê paşê wek pirtûkekê di Tirkîyayê da bi navê "Zivireke nû li ser rêgeha rêformên dêmokratîk" hate weşandin). Ev pirtûka paşê wê ji hêla siyasetmederan va wek "Manîfêstoya Komara Dêmokratîk" bê navkirin. Û pey vê ra rojnamegeran ji serokê Biryargeha Giştî ya Artêşa Tirkîyayê Kivrikoxlû pirsîbûn, ka, gelo helwesta wî li hember biryara cezayê kuştinê çi ye, ya ku Dadgeha Ewlekarîya Dewletê ya Tirkîyayê ji bo Abdullah Ocalan derxistye? Ewî gotibû, ku ewana 15 salan li hemberî hev şer kirine, û nêrîna wî dê sûbyêktîv bûya, ku naha dema siyasetmederan pêra gihîştye, ji bo ku pirsê çareser bikin. Lê paşê, hê derng Serokê Dadgeha Bilind a KT Samî Sêlçûk di axavtina xwe da (ya ku ewî "Manîfêstoya Komara Dêmokratîk" navkiribû) cara yekem di dîroka xwînrêj a Tirkîyayê da vekirî di derbarê nemirovîbûna Destûra Bingehîn a welatê xwe da daxwîyand, û diyar kir, ku bi tu awahî ew ne anegorî pîvan û daxwazên maf û normên navnetewî ye, ew mafên hemwelatîyan binpê dike, dijdêmokratîk e û h.w.d. Di rewşeke weha da Serokê Dadgehê pêşniyar kir, ku divê ne ku guhartinan bikin nav vê Destûrê, lê Destûreke nû ya dêmokratîk bipejirînin.*

*Pey van gotinên Serokê Dadgeha Bilind ra nûnerên dinê yên rêzên jorîn ên desthilata KT jî axivîn û lê zêdekirin: "Êdî jizûva dem e!..."*

*Lê serekwezîrê KT Êcêvît di axavtina xwe da heya gihîşt wê astê, ku got, xwedêgiravî, "...partîya wî ji roja damezirandina xwe va dijî wê Destûrê bûye...".*

*...Serekkomarê KT Silêman Dêmîrêl jî piştgirîya pêşnîyara Samî Sêlçûk dike. Û heya dibêje, ku ewî bi xwe dixwest ewqas karên qenc bike, ji bo ku bi navekî qenc ji ser kar here hêsabûnê ...*

*Lêbelê, her çi jî hebe, bi girtina rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan ra, pirsgirêka kurdî bilind bû û gihîşt asta navnetewî, cîhan hişyar bû, hejya û bi dengekî bilind qêrya: "Azadî ji Ocalan ra, aştî ji Kurdistanê ra!..." Û di wan derdorên dewletan da, yên ku piştgirîya rêjîma Tirkîyayê dikirin û dest li pişta wê dixistin, dan heşê xwe, û bingeh çêbû, ku Îtalîya mafê panaha siyasî bide rêberê gelê kurd.*

*Dijminên gelê kurd xwestin, bi zulmê û bêdadîya li dijî gelê kurd û rêberê wî dawîyê bi pirsgirêka kurd bînin, lê berovajî wê – rastî derkete holê...*

*Axavtinên Serok Partîya Karkrên Kurdistanê, Serokê rûmetê yê Kongrêya Netewî ya Kurdistanê (KNK) Abdulah Ocalan çavên civaka cîhanê vekirin, rûyê rastîn ê dewleta tirk*

---

[2] *Ev gotar-nirxandin neh mehan pey bi korsanî girtina rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan ra hatye nivîsîn, ew di Rûssîyayê da bi zimanê rûsî hatye weşandin, şêwazê wê yê cuda di konfêrans û sîmpozîûmên navnetewî da hatine pêşkêşkirin (dîsa bi rûsî)... Peyra, hê dereng, ew hatye wergerandin û bi zimanê kurdî jî di malperên kurdî yên cuda da hatye weşandin...*

*derxiste holê, rê li ber veguhartinên (rêform) civakê vekirin – bila vê demê ew tenê li ser asta goftûgo û pevguhartina raman û nêrînan be jî...*

*Li ser rûpelên rojname û kovaran gotar û matêrîalên dinê derketin, û di wan da ev pirsana derdiketin pêşîya xwendevanan: "Gelo pêdivîya me bi vî şerî heye? Gelo pirsgirêk tenê di pêşketinên sotsîal-aborîya civakê da ne? Lê pirsgirêka kurd? Çima hemû çavên xwe li ber wê digirin û naxwazin wê bibînin?"*

*Bi rastî jî, ma ne, di KT da bingeha bingehîn a hemû pirsgirêkan bi pirsa kurdî va têkilîdar e. Eger KT pirsgirêka kurdî çareser neke, ew divê êdî hêvîya xwe nede ser tiştekî jî.*

*Hê derng ji dîaspora tirkan a Ewropayê wê dengê jineke tirk a bi navê Încî Can bigihîje me, ya ku bi têlêvîzîonê daniştina dadgehê ya li girava Îmralîyê dîtibûye û di nameya xwe da ji Abdullah Ocalan ra di derbarê rewşa xwe ya rewanî (ruhî) ya rastîn da dinivîse. Ew dibêje, ku bi xwe kemalîst e,... ku, her çi jî bibe, ew bi rêzgirtin li dewleta xwe dinihêre, ku, dema di meha sibatê da ji çapemanîyê agahdar bû, ku Abdullah Ocalan girtine, ew dilxweş bûye.*

*Lê... hê derng, dema ewê axavtina Abdullah Ocalan bihîsytye, ew têgihîştye, ku Ocalan hîç jî ne ew mirov e, wek ku desthilatdarîya fermî û hêmanên ragîhandina girseyî yên Tirkîyayê hewl didin, wî bidin xuyan...*

*Û ev netewperesta tirk digihîje wê astê, ku êdî gotinên dinê ji Abdullah Ocalan ra dinivîse: "...ew hezkirin û rêzgirtin, a ku di nav min da li hember We heye, weke wê hezkirin û rêzgirtinê ye, ya ku di nav min da li hember Kemal Atatûrk hebûye, – Xwe Hûn naxeydin, ne? – Ji bo min Hûn Ataturkê duyem in!"*

*Peyra Încî Can di nameya xwe da dinivîse, ku ewê di kesê Abdullah Ocalan da mirovekî nû dît, ê ku ewê timê xiyala wî kirye û hîvîya wî bûye – mirov, ê ku terefdarê mirovîyê, terefdarê mafên mirov, terefdarê dadwerîîyê be...*

*Û pêvajo didome. Mirovên cuda diaxivin: yên terefdar û yên dijber. Lê giranî li terefê wan hêzan bû, yên ku piştgirîya pêvajoyên dêmikratîk dikirin – yên ku di wê rêyê da dimeşyan, a ku Abdullah Ocalan pêşniyar kiribû.*

*Ji 50 mirovan zêdetir, kesên navdar ên Tirkîyayê û welatên dereke daxuyanîya di derbarê piştgirîya înîtsîatîva rêberê gelê kurd da dabûn, û hema pey vê ra rojnameya "Huriyet"-ê fotowêneyên hinekên ji wan li ser rûpelê xwe yê yekem diweşîne û bi tîpên mezin dinivîse: "Îjar çi ferqî di navbera van û Ocalan da!"...*

*Roj bi roj hejmara wan mirovan zêdetir dibe, yên ku piştgirîya îdêayên Ocalan dikin. Û wê demê bê, rojnameya "Huriyet"dê fotoyê girseya bi mîlîonan welatîyên KT biweşnî û di bin da jî bi tîpên mezin binivîse: "Îjar çi ferqî di navbera van û Ocalan da!"...*

*Peyra dê axavtina dozgerê sereke yê KT Vûral Savaş jî bê, û di wê axavtina xwe da ew bang dike, ku li ser rêya veguhartinên dêmokratîk bibin asteng, ên ku "ji bo yekparebûna welêt xeter ne", ku divê destûr bê dayîn, bi dizî têlêfonên siyasetmederan hildin bin kontrolê û guhdarîya axavtinên wan bikin, sansûra leşkerî bikine kar. ... Li dijî vê helwestê û ji bo piştgirîya Samî Sêlçûk (Serokê Dadgeha bilind a KT) rêvebirên KT û siyasetmederên dinê dengê xwe bilind dikin... Samî Sêlçûk dê careke dinê jî biaxive û wê careke dinê bibêje, ku ewê ji wê rêya dêmokratîk, ya ku wî hilbijartye danegere.*

*Lê hê dereng Sammîta Rêxistina Ewlekarî û Hevkarîyê di Ewropayê da (REHE/AGIT)di Stenbolê da pêk hat (18–19. 11. 1999)û li wir di derbarê pirsgirêka Çêçênistanê da, di derbarê Qerebaxê, Kosovoyê da hate axavtin... Û, her çiqas di derbarê berjewendîyên gelê wan da tiştek nehate gotin jî, lê, dîsa jî, hate axavtin... Lê di derbarê pirsgirêka kurdî da tenê bi gotinên gulover û tomerî-giştî, yên weke: "Mafên mirov" anîn zimên. Hema wisa – hemû li hevva hesikî, ne dîyar: "Mafên mirov!", – qey bibêjî, di Tirkîyayê da pirsgirêka kurdî nîne, an jî binpêkirina mafên bîst mîllîon welatîyên kurd ên komarê ne binpêkirina mafên mirov e. Lê di rastîya xwe da têgeha "binpêkirina mafên mirov" di KT da rastedêr wek binpêkirina mafên gelê kurd tê têgihîştin. Û her ji vê hêlê va ev şêwazdayîneke (formûlekirin) weha di cî da ye. Û li vir ya here balkêş ew e, ku hemû*

*beşdarên Sammîta REHE/AGIT-ê, heya ew, ên ku dijî hev diaxivin, di pirsa kurdî da bi "yekdengî" gihîştin pejirandina şêwazê "Mafên mirov". Ev ne ji ber wê, ku gelek dewletên serkêş, ên ku beşdarî wê forûmê bûne, beşdarên kompoloya navnetewî ya li dijî rêberê netewî Abdullah Ocalan in?! Ma ne ewana baş têdigihîjin, ku pirsa Abdullah Ocalan û pisgirêka kurdî bi hev va girêdayê ne: bêyî çareserkirina yekê, mirovê nikaribe ya dinê çareser bike.*

*Û, dibe ku, hema bi vê ra jî ew yek pêwendîdar e, ku hema berî pîrozkirina 21-salîya damezirandina PKK (27.11) di başûrê Kurdistanê da li dijî hêzên PKK-ê dest bi tevgera leşkerî ya hevbeş a artêşa Tirkîyayê û PDK ( bixwêne – mala barzanîyan!) bû. Û ew jî wî çaxî, dema bi pêşniyara Abdullah Ocalan, ji bo ku hewa siyasî û leşkerî bê nermkirin û ji bo piştgirîya pêvajoya veguhartinên dêmokratîk, piranîya hêzên leşkerî yên ARGK ji sînorên KT hatibûn vekişandin. Du komên aktîvîstên PKK-ê (her yek ji heyşt kesan) hatinTirkîyayê, ji bo ku beşdarî pêvajoya aştîyê bibin. Û endamên herdu komên parlamênterên aştîyê jî destxweda hatin girtin. Lê 25-ê mijdarê biryara cezayê kuştinê yê li dijî Abdullah Ocalan di Dadgeha Bilind a KT da hate erêkirin. Cîhan hîvîyê bû, ka helwesta terefê kurd, civaka cîhanê û dewletên gewre dê çi be... Gelê kurd bi tevger ew biryara kirêt û rezîl û şermezar kir. Li dijî vê biryarê gelek rêvebirên dewletan û rêxistinên navnetewî helwesta xwe diyarkirin... Lê Tirkîya weke xwe dimîne. Kengê û bi çi awahî ewê bibe xwedî dêmekî şaristanî û mirovî? – Ev jî dê hem bi helwesta hevpeymanîyên KT ên NATO-yê, hem bi ya gelê Tirkîyayê bi xwe, bi tevgera kurd û tevahîya gelê kurd va girêdayî be.*

*Lê naha di KT da çiqas terefdarên aştîyê û werguhartinên dêmokratîk hene, dibe ku, ewqas jî yên dijî wê hene, plûs ew beşê civakê, yê ku yan ditirse nêrîna xwe bîne zimên, an jî di rewşa bendêmayînê da ye...*

*Di rewşeke weha da gelo mirov dikare ji Êcêvît bawer bike, ku partîya wî hema di roja yekem da li dijî Destûra Bingehîn a îroyîn bûye? Gelo kî dikare bipeytîne (îzbat bike), yê ku wisa hatye cîhanê û wek ku heye, dikare bibe yekî dinê? Lê dagerkirina Qibrisê û destpêka "şanê" Êcêvît ê siyasî? Lê hemû dîroka Tirkîyayê: tevkujîya kurdan, ermenîyan, yewnanîyan, asûrîyan? Gelo ew gel, ê ku ji sêrî heya nigan hatye xêvkirin (aptal), wê wisa hêsan mercên aştî û dêmokrasîyê yê bigihîje û bipejirîne?*

*Em li vir ne bi katêgorîkî bibîjin – erê, û ne jî bibêjin – na!*

*Û wisa jî emê xwe nexapînin û ji carekê va bi pêşkevtinên weha bawer nekin...*

*Li vira tenê tiştek ji hêlekê va hêvîyê dide, lê ji hêla dinê va mirov hişyar dike, ku ew hinekî bi fesal be. Ez dibêjim, anegorî pîvanên kevneşopîyên deweêta tirk, divê Serokê Dadgeha Bilind a KT Samî Sêlçûk ceza bikirana... Eger ew ceza nekirine, ji wê jî zêdetir – heya bi wî ra "qayîl jî bûne", ev li mirov ferz dike, ku ew li ser wê baş bide heşê xwe. Eger KT û ji vir û pêva jî di wê rêyê da neçe, ewê bê wê wateyê, ku lîstik didome...*

*Bi nêrîna min, di rewşeke weha da hem gelê kurd, hem jî civaka dêmokratîk a cîhanê divê heya asta here bilind hişyar bin...*

*Ay, lê ya PKK-ê, ya wê, çi ji destê wê tê, dê bike, û wê, ji bo ku pirsgirêka kurdî bi aştî û dêmokrasî bê çareserkirin, dê karê xwe bidomîne,...*

## 2 ...Lê dîsa jî!

… Îro mirov dikare bi bawer bibêje, ku pirsa kurdî bûye yek ji pirsgirêkên cîhanî yên here giran. Neçareserbûna vê pirsgirêkê hertim di derbarê xwe da dide zanîn, wek birînek a li ser ruh û wijdanê cîhana şaristanî. Îro di cîhanê da ji bilî gelê kurd neteweke duyem nîne, ya ku bi hejmara xwe va 40 mîllîon be û bê dewlet be. Û, ji bilî vê, wisa jî gelê kurd bi serê xwe di cîhanê da neteweke tenê ye, ya ku welatê wê çarparçekirî ye, hatye veçirandin û bêrûmetkirin. Û *"hezkirina"* xwe li hember vî gelî di dewletên cuda da, ên ku welatê wî –

Kurdistan di nav xwe da parçe kirine, bi şêwazên cuda diyar dikin. Lê di nava wan dewletan da bi barbarî, zulmkarî û nemirovîya xwe KT cuda dibe û di wî warî da ewê rêkoreke sosret şkandye. Û ev hemû bi erêkirina bêdeng a cîhana şaristanî pêk hatye û îro jî pêk tê, lê gelek caran, wisa jî, bi piştgirî û hevkarîya hinek dewletan.

Lewra jî, çareserkirina pirsgirêka kurdî deynê mirovî yê dewletên gewre ye, pirsa rûmet û wijdanê civaka cîhanê ye...

Neçareserîbûna pirsgirêka kurdî îro netavetîyê dide bi dehhezaran, sedhezaran, minê bigota, heya bi mîllîonan mirovan. Û bûyerên salên 1998–1999-an evê ji me ra dibêjin.

Ger mirov bala xwe bidê, wê bibînin, ka çawa bi erêkirina bêdeng a cîhana şaristanî li ber çavê civaka cîhanê li hember mirovahîyê zulm û bêdadî serdest dibin.

Di cîhana me da, li ku nirxên hemmirovî wisa bêqîmet bûne, li ku roj bi roj bêqanûnî zêde dibe, li ku nemirovîya desthilatdaran gihîştye asteke wisa, û ew şengesiwarên hesabên tazî, evên bêrû û bîexlaq di çavqulîya xwe da ewqasî kor bûne, ku trajêdîya bi mîllîonan hemwelatîyên xwe “nabînin”.

Herroj ev mirovana hewl didin, ku cîhanê û xwe jî di wê da bi rengê reş û sipî bidin xuyan: *va, xwedêgiravî, ên baş hene – ew jî em in, û yên xerab hene – ew jî ew in!*

Û ji bo wê, ji bo ku vê nêrîna xwe ya mejûyê nexweş bigihînin xala dawîyê ya heşmendî, ewana ji eyarê xwe dertên, bi her rê û rêbazan hewl didin, ku hevdu reş bikin, çi tiştên nepak heye, di derbarê hev da bibêjin, û di heman demê da nabînin, ka di mala wan da çi pêk tê...

Pir baş tê bîra me hemûyan, dema di cîhanê da du sîstêm hebûn – ya kapîtanîst û ya sotsîalîst (DYA û dewletên ku xwe li wan digirtin û Yekîtîya Sovêtê û welatê sotsyalîst). Wisa jî tê bîra me, ka nûnerên herdu hêwirgehan demên hevdîtin û danûstandinan çawa bi fesal li rû hev vedbeşirîn û di heman demê da çawa li dijî hev propaganda (û ne tenê prpoaganda!) dimeşandin...

Baş tê zanîn, wisa jî, ku di destpêkê da cîhanê nedixwast Yekîtîya Sovêtê nas bike û bi wê ra danûstandin û hevkarîyê pêk bîne, lê, dem hat, ew neçar min, bi Sovêtê ra hevpeymanîya antîfaşîst sazkirin. Lê paşê demên “şerê sar”, ên pêşbirka çekzêdekirinê û “şerên stêrkan” pêra gihîştin...

Wisa jî tê bîra cîhanê, ka DYA çawa di dema xwe da hem Yaser Erafet, hem Nêlson Mandêla têrorîstên №1 dihejmartin. Paşê Erafet û Mandêla hêjayî Xelata Aştîyê ya Nobêlê bûn, û rêvebirên vê dewleta gewretirîn rastî wan dihatin û destê wan diguvaştin...

Dîroka têkilîyên DYA û Viêtnamê hemû jî baş dizanin: hem di DYA da, hem jî di Viêtnamê da hê demeke dirêj wê saw û xofa şerê Viêtnamê jibîrnekin. Lê îro êdî di navbera wan dewletan da pêwendîyên dîplomasî û aborî hatine rasterêkirin... Divê wisa jî bibûya. Û mala Xwedê ava!

Cîhan wisa hatye sêwirandin: dostên duh ji hev vediqetin, dijmin bi hev ra ziman dibînin, dijminatî û pevçûnên berê tên jibîrkirin (an jî, hewl didin, çiqas ji wan tê, jibîr bikin!) û hevkarîya xwe pêktînin.

Dîrok ranaweste. Êdî 10 salan zêdetir e, mirovahî rewşa Şerê Cîhanê yê Sêyemîn dijî – şer, ê ku nehatye daxuyandin! Li xerîta cîhanê binihêrin... Ji sala 1988-an û vir va ha li vî welatî, ha li wî welatê cîhanê şer destpêdibin (ên Kavkasîyayê, Asîya Navîn, Rojhilata Navîn, Balakn û h.w.d) û dewletên gewre beşdarî van şeran dibin – rastedêr an bi navgînî (an jî helanan didin wan û agirê wan gurtir dikin!).

Dabeşkirina cîhanê ya nû pêk tê û, wek ku tê gotin, “qanûnên cîhanê yên nû” tên danîn: Şerê Cîhanî gur dibe. Lê dewletên gewre êdî ne yên berê ne: ewana şer bi nîv-“dûreke”, an bi çekên nûtirîn, an jî bi destê hineke dinê dimeşînin. Ev jî taybetmendîya şerên nû ye.

Li rex çalakîyên leşkerî ra, an jî di demên bêhnvedanê da nûnerên dewletan li hev dicivin, forûman û civînên dinê lidardixin, ji bo ku bi hev ra pêvajoyan û mêla pêşveçûnên wan binirxînin, bi hev ra çalakîyên xwe sererast bikin û careke dinê – de, gidîo, berbi qada şêr va bilezîne! (Demên krîza Kosovoyê tê bîra we?!).

Taybetmendîyên mirovahîyê weha ne. Bûyer li her cîyan dubare dibin – hema-hema bê guhartin...

… Dema di Kurdistanê da xwîna mirovên bê sûc û guneh dirije (ya zarokan, kal û pîr û dayîkan), dema roj bi roj ew meskenê bedewtirîn ê cîhana me tê wêrankirin û valakirin, dema bi mîllîonan mirov dibin penaber, dema lawê mezin ê gelê kurd, têkoşerê ji bo mafên mirov, hûmanîst û welatparêzê mezin birêz Abdullah Ocalan bi alîkarîya cîhana “şaristanî” hatye girtin û îro di nav dîwarên girtîgeha sîstêma faşît a Tirkîyaê da ye, siyasetmeder, zanyar, dîplomat û erkdarên fermî li şûna wê, ku bi rêbazên biryardar trajêdîya gelekî rawestînin, di forûman da li hev dicivin û wan bûyeran analîz dikin, yên ku pêk hatine, an pêk tên!? Û hercar jî “nikarin” bersîveke tam bibînin.

Lê bi rastî bersîv heye…

… Dibe ku dem pêra gihîştye, ku helwesta li hember pirsgirêka kurdî divê ne ku tenê ji hêla siyasî, ewlekarîyê û dadwerîyê va binirxînin, lê wisa jî – ji hêla mirovî û exlaqî va.

Mirov dixwaze li pirsgirêka kurdî wek rastyeke wisa binihêre, ya ku ji hêla hemûyan va li ser asta têgihîştina cîhanê ya here sade, lê ya here rast bê têgihîştin, wek dîtin û têgihîştina zarokan a paqij! Û ev nêrîn jî min bi zanebûn hilbijart! – Ma ne, têgihîştina here rastîn a cîhana hawîrdorê – ew têgihîştina zarokan e – ya paqij, bêteref, bêguneh û rastîn…

**Ka, werin, em li cîhanê bi çavên zarokên bê guneh binihêrin, lê ne bi çavên xwe – yên mirovên bi temen, ên ku qanûn û rêzikên cihêreng ji ber xwe derxistine (ên asta navnetewî, yên hundurîn!...) ên di derbarê hevkarîya di navbera dewletan da, di derbarê bi hev ra bi aştîyane jîyanê da, di derbarê mafên mirov û netewan da, lê destxweda jî, hema piştî pejirandinê herroj heman qanûn û rêzikan, ên ku wan bi xwe jî pejirandine, diteribînin, binpê dikin,. Dertê, ku ewana ew qanûn bi zanebûn ji bo wê pejirandine, ji bo ku paşê jî wan li dû hev binpê bikin, û heya di wî warî da bi hev ra dikevine pêşbirkê jî?!**

**Lê, di vê navberê da, zarok dixwazin di aştîyê da bijîn, derfetên wan ne ku tenê ji bo wê hebin, ku zikê wan têr be, baş wergirtî bin, bilîzin û hevaltîyê bikin, lê wisa jî derfetên wan hebin, ku zanîn û perwerdeyê bi dest bînin. Ku wisa bin, wek ku ew ji dêya xwe bûne – bi taybetmendîyên xwe yên netewî va: *bi ziman, bi çand, bi derûnî, bi jiyana rojane!***

Naê ber heşê wan zarokan jî, ka çima ên mezin qanûna derdixin, eger wê paşê wan biteribînin, û peyra jî rêxistin, komîsîon, dadgeh û trîbûnalên cihêreng ên navnetewî saz dikin, ên ku hîç tiştekî jî nikarin bikin, ku trajêdîya mirovî pêk neyê, û tenê wê demê li hev berev dibin û dixwazin tiştekî bikin, dema êdî zulm û zordarî hatye şkandin, ...lêbelê ewê êdî karê xwe yê reş pêk anye. Ewê çawa tê bigihîjin, ku ên mezin li hev dicivin, ji bo ku qîmetekî bidine wan bûyerên pêkhatî – dîsa jî ji bo berevkirina hinek komîsîonan, ji bo ku ji nûva karên wan analîz bikin..., lê hîç çareserîyekê jî nebûnin. Û wisa – bê dawî!...

Lê, gelo wê çêtir nînbûya, – zarokan dê bigota, – eger me ew hemû rêxistin, komîsîon, dadgeh, tribunal belavbikirana û wek mirov bijyana? Ma ne, yek e, dîsa jî di cîhanê da bêdadî serdikeve?!..

Helbet, helwesta min ne ewqasî jî reşbînî ye, û ez naxwazim bibêjim, ku hemû qanûn, ên ku hatine pejirandin, kêrî tiştekî naên. Na! Pirs hîç jî di qanûnan da nine. Pirs di wê da ye, eger em bi xwe dê wan qanûna binpê bikin an pêk neynin, wê demê ji bo çi wan dipejirînin? Eger ew qanûn dê li hember mirov û gelên cuda bi rengên cuda bên bikaranîn, wê demê em ji bo çi xwe dixapînim?

Dibe ku Krîlov, helbestvanê rûs ê mezin, hezar carî rast bûye, dema nivîsye:

“...Li hember ê bi hêz hertim yê bê hêz gunehkar e!”

Hinekê bibêjin – na?!..

Mirov dikaribû ji wan terefan bipirsya, yên ku heya radeyekê dixwazin, ku pirsgirêka kurdî çareser bibe… Û terefên wisa di cîhanê da têra xwe hene. Helbet, her terefek

dixwaze, ku pirsgirêk bi şêwazekî bê çareserkirin. Ev jî tê têgihîştin – her yek hesabên xwe yên siyasî-aborî hene! Di heşê her yekî da berjewendîyên xwe serdestin…

**Di encama siyaseta tevkujîyê da herroj beşekî gênofonda gelê kurd tê tunekirin (ma xwe, ew bêdawî nine!), axa Kurdistanê tê wêrankirin, sotin û valakirin û bi mîllîonan kurdistanî dibin penaber, lê ew dewlet, ên ku berjewendîyên wan hene, jixwe ra hêsan li vê pêvajoyê dinihêrin, şûna wê, ku destê wan zalimên sewdaser ên asta dewletê bigirin, û wan rawestînin.**

Mirov nikare ne vê siyasetê, ya ku ji hêla hevkar û hevpeymanîyên Tirkîyayê (DYA, hinek dewletên ewropî û Îzraîl) va tê meşandin, ne jî, ya ku ji hêla dijberên wan va (Rûsya, hinek welatên ereban, Îran û ên dinê) tê meşandin, wek siyaseta şopandina berjewendîyên jiyanî yên xwe yên netewî navbike.

Nakeve heşê mirov: dema di derbarê axa Qibirêsê, ya ku ji hêla Tirkîyayê va hatiye dagerkirin, tê axavtin, mafên kêmanîya tirkan a li giravê tînin hole. Û, her çiqas, li giravê tirk ne binecî ne jî, lê dîsa jî ewana hewl didin axa xelkê bikin ya xwe. Û evê xwesteka xwe ya bê bingeh ewana venaşêrin jî. Bala xwe bidinê, van demên dawîyê "serokkomarê", xwedêgiravî, Komara tirkî ya Qibrisê bê şerm û fedî daxuyandibû, ku, eger hîç tirkek jî li giravê nînbe, yek e, Qibrisê ya tirkan be (li her deverê, li ku ew îro dijîn, ewana wê demê li wir peyda bûne, dema gelên binecî êdî bi hezarsalan li ser xaka xwe ya dîrokî jîyabûne!); dema di derbarê albanên (armawit) Kosovayê da diaxivin, ên ku mafên wan ên xweser hebûn (bila ne tam serxwebûn bûya jî!), dema di derbarê Çêçênistanê da dibêjin, a ku ji mîllîonekî kêmtir binecîhên xwe heye û di nav sînorên Fêdêratsîona Rûsîyayê da dewleta xwe heye, li Ewropa Rojava di derbarê binpêkirina mafên mirov da dibêjin. Lê ew, ku bîst million kurd (20 mîllîon!) di welatê xwe yê dîrokî (Bakûrê Kurdistanê) da dadijîn, heya ji wî mafî bêpar mine, ku bi navê xwe jî bên naskirin, ji ber ku welatê wan mêtîngeha Tirkîyayê ye. Û DYA û Ewropa Rojava ne ku tenê vê rewşê tiştekî normal dihejmêrin, lê her weha wan kurdan, ên ku doza dadwerîyê – mafên xwe yên netewî dikin, terorist navdikin. Û hîç kesek jî naxwaze wê têbigihîje, ku heya di piranîya welatên mêtîngeh (kolonî) da jî hebûna gelên binecîh nehatye redkirin, her çiqas, gelek mafên wan hatine bi sînorkirin û binpêkirin. Lêbelê di Tirkîyayê da, wek ku di Destûra wê ya Bingehîn da hatye nivîsîn, kurd nînin! Zimanê ku 20 mîllîon mirov pê diaxivin, di vî welatî da qedexe ye, lê wan, ên ku wêrekîyê di nava xwe da bibînin, xwe kurd nav bikin, an bi kurdî biaxivin, wek mirovne suckar tên dîtin, li dû wan dikevin, wan digirin, ceza dikin. Van demên dawîyê di Meclîsa Tirkîyayê da biryar girtin, ku "zimanê kurdî zimanekî xweser nîne". Û ev jî îro di dawîya sedsala XX da, di dewletekê da, ya ku di gelek waran da welatên cîhanê yên şaristanî bi wê ra pêwendîyên xwe hene û di nava hevkarîyê da ne!

Mirov evê çawa têbigihîje?!

Eger mirov wisa nêzîkî pirsê bibe, dikare çend sed mirovên nîvhovber berev bike, û ewê di heman demê da qanînan bipejirînin, ku zimanên Bayron (înglîzî), Balzak (fransî), Pûşkîn (rûsî) ne zimanên xweser in?! Eger mirov bi şêweyê parazvan û hevkarên wan nêzîkî pirsê bibe, wê demê dê bikaribe Corc Waşîngton, pey wî ra jî Dmîtrîy Donskoy, Îvan Sûsanîn, Garîbaldî û gelek têkoşerên dinê yên azadîya gelên xwe têrorîstên №1 bi nav bike!

Ji bilî wê, bi nêzîkbûneke weha ne tenê mafên gelê kurd tên binpêkirin, lê, ji ber piştgirîya rêjîma dijmirovî ya tirk, ew derbê digihînin berjewendîyên gelê tirk bi xwe jî. Ma, êdî li vir hizir, têgihîştin û wateya durust li ku man? Ka, êdî heşmendî li ku ma? Gelo eger li Kurdistanê aştî bûya, gelo di wê da hem jî dê berjewendîyên Tirkîyayê û tevahîya Ewropayê nînbûna – hem ya Rojava, hem jî ya Rojhilatê?

Wek ku tê xuyan – na!

Dibe ku li vir ew prênsîp kar dike, ku bazirganîya here baş şer e? Lê eger sibe-dusba evê rastîyê gelê tirk jî têbigihîje? Ma ne, radeya bêheşkirina wî jî sînorên xwe heye! Wê rojekê jî bê, û tirkê hişyar bibin û wê ziyana xwe ya aborî ya di vî şerî da bihejmêrin, hem

jî wê ziyana xwe ya exlaqî, hejimara kuştîyên xwe bihejmêrin (û ewana êdî destpêkirine ewê pêk bînin).

Êdî dem e, ji asîmanê jorîn dakevin ser erdê, ji ewrên siyaset û dîplomasîya “bilind” peya bibin û çavên xwe li ser rastîya cîhanê vekin û lê binihêrin: wek ku DYA di dema xwe da dijwarîyên şerê viyêtnamê derbazkirin, tema “sîndroma Viyêtnamê” dîtin, îro di Tirkîyayê da berhemên şerê qirêj, ê ku wan bi xwe di Kurdistanê da meşandine, berevdikin. Sîndromeke wî cûreyî, “sîndroma Kurdistanê” êdî di Tirkîyayê da jî peyda bûye...

Lêbelê, di cîhanê da kesek tune, ku di vê derbarê da bike qêrîn û hewr!.

Eger ne ji bo xatirê mafên xwezayî yên gelê kurd û rawestandina şerê xwînrêj be jî di Kurdistanê da, hîç nebe, divê alîkarîyê bidin gelê tirk, ji bo ku ew vê kirîzê derbaz bike, ya ku bi siyaseta bêheş û nedûrdîtî ya rêvebirên KT ew îro ketyê.

Her şerek jî demekê destpê dibe û piştî demekê jî radiweste!

Ev şera kêrî kê tê? Ez bi bawer im – ew ne kêrî gelê kurd tê, nejî kêrî gelê tirk!

Ew siyaseta rasterê û dûrdîtî, ya ku rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, her çiqas ne di rewşeke azad da ye jî, meşandye û îroji dimeşîne, ji bo ku pirsgirêka kurdî bi aştîyane bê çareserkirtin, rê û rêbazên pêkan destnîşan dike.

...Gelo kesekî carekê ji xwe pirsye, ka PKK çima ji welêt derket? Eger mirov bi çavê rastîyê li dîrokê binihêre, dê bersîvê bibîne: derbeya 12 rezbera 1980-î tê bîra we, ya ku xûnta leşkerîyê di KT da anî ser desthilatdarîyê?

Lê çima derbeya leşkerî pêk hat?

Ew çi derbe bû? – Gelo kesekî li ser vê pirsê serê xwe êşandye? – Helbet – erê!

Lê agahîyên di vê derbarê da vedişêrin, ji ber ku wisa ji wan ra dest dide. Lê rastî di wê da ye, ku di KT hîç demekê jî desthilata medenî (sivîl) nînbûye. Û îro jî bêhna medenîbûnê ji wê nayê, ewqasî pirs di wê da ye, dema ku li wan pêwîst be, ewana xwe desthilata leşkerî nav dikin, ji bo ku çavê cîhanê bitirsînin û bi hêsane zulm û zora xwe pêkbînin: zordarî, kuştin, çalakîyên leşkerî li dijî gelê medenî. Û paşê jî, ji bo ku di destê wan da tiştek hebe, ku bikaribin kirên xwe efû bikin û bê tirs û xof hovîtîyên xwe bidomînin.

Piranîya siyasetmederan, baş dizanin, di dadgehên navnetewî da li hember KT çiqas doz hatine vekirin – ji bo sûcên wê, ji bo binpêkirina mafên mirov! Lê çiqas jî hê di pêvajoya amedekarîyê da ne, lê çiqas jî li dijî wê hatine qazenckirin?! Lê Tirkîyayê tfûyî ser wan biryaran kirye, xwedîyên wê yên bi hêz li pişta wê sekinîne!...

Li vir pirseke heşmendî dertê holê: *gelo hêja ye, ku kurd hêvîya xwe bidin ser wan rêxistinan, ên ku ewqas di vê cîhana me da hene?*

**Demekê berê ez û hevalekî xwe va çûbûn mêvanîya malbeteke kurd, a penaberên ji Bakûrê Kurdistanê. Xwedîyê malê arşîveke wisa dewlemend berevkiribû – ya berhemên aûdîo, vîdêo, rojname û kovaran ên di derbarê bûyerên di Kurdistanê da û yên bi wê ra pêwendîdar, ku arşîva here mezin a cîhanê dê xwezîya xwe bi wî banya.**

**Hevalê min weha matmayî pirsî:**

**– Hûnê çi ji van hemûyan bikin?**

**– Bibêjim! – Malxwê male bêhneke kur rahişt û domand, – Lê hûn dikarin bibêjin, hîç demekê dadgeh, trîbûnalan û rêxistinên din ên navnetewî yên destûrmend (kompêtênt) em – kurd ji tunekirinê parastine? Helbet, na! Lê hûn dizanin dewletên gewre ji bo berjewendîyên xwe yên demi ji destpêka sedsalê heya van rojên me çend caran em firotine û îro jî difiroşin û piştgirîya celatên me dikin? Ma, gelo, em dikarin hêvîya xwe bidin ser kesekî ji wan? …**

**Û, hûn dizanin, arşîvên vî rengî di piranîya malbatên kurd da hene!** – Malxwê male axavtina xwe bidawî kir.

Erê, ez têdigiîjim, ku rêvebirîya KT jî ne azad e, hevsarê wê di destê xwedîyên wê da ye, û ewana wê wek jendermeya herêmî xwedî dikin. Lê dem hatine guhartin, û xwedîyên

wê êdî dê jendermeyeke wisa ji bo çi xweybikin?! Ew pir buha dertê, bi taybetî jî, dema pêdivîyeke wisa mezin bi wan nîne. Hem jî kurd êdî ne yên berê ne…. Ewana xwe xwedîyên rastîn ên welatê xwe hîs dikin.

Îro Kurdistan mêtîngehek a navnetewî ye. Lê dîrokê daye xuyan, ku, mêtîngeh çawa jî bibin, ne bi aborî, ne jî bi siyasî êdî jizûva xwe efû nakin. Li xerîta siyasî ya cîhanê binihêrin: *hemû dewletên gewre, yên ku ji xwe ra rêz girtine, bi xwe dest ji mêtîngehên xwe kişandine û azadî dane wan!* Her tenê rêvebirîya Tirkîyayê bi soza xwe, ya ku daye Ewropa Rojava bi pencirûkan xwe hişkem bi Bakûrê Kurdistanê va girtye, bi wê armancê, ku piştgirî û xwedîderketina xwedîyên xwe bi destbixe, welatê me wêran dike, û ew ji bo xwe tenê kirye çavkanîya dewlemendîyên sererd û binerd ên xwezayî.

Pêvajoya pêşvaçûna cîhanê daye xuyan, ku: *dagerker çi jî bikin, çiqasî jî hewl bidin, yek e, gelên bindest dê rojekê bigihîjin azadîya xwe!*

**Pêşvaçûna dîrokî berbi wê va dibe, ku pirsgirêka kurdî dê çareserya xwe bibîne. Koledarên gelê kurd, alîkar û hevkarên wan nikarin bi dehan mîllîonan kurdan tunebikin. Ji destpêkê va heya nîvaeka sedsala me ji sê mîllîonan zêdetir kurd hatine tunekirin, lê îro ew ji 40 mîllîonî zêdetir in û ji wan tenê 20 mîllîonî zêdetir di Bakûrê Kurdistanê da dijî. Her tenê pirs di wê da ye, ka gelo çi pêwendî wê di navbera torinên celadên berê û yên îro û torinên gorîyên wan – ên kurdan da hebin!**

Û evê di gelek waran da wê pêwendîdarî me û we be. Rêvebirîya netewî ya kurdî bi serokatîya birêz Abdullah Ocalan çi ku ji destê wê hatye, pêk anye û îro jî pêk tîne, ji bo ku ev şera werguhêzî şerê navbera herdu gelan nebe, her çiqas, rêvebirîya KT a îroyîn her tiştî dike, ku ew hema wisa jî pêk bê.

**Pir xeter e, dema mirov tenê ji bo berjewendîyên xwe yên rojane dijî, dema ku li pêşya wî hê roja sibê jî heye. Lê roja sibê a torinên me ye, û şanê tu kesî neketye û mafê tu kesî nine, bextewarîya xwe li ser hesabê zarokên pêşerojê ava bike. Divê wisa cîhanê avabikin, ku torinên me nebin gerewên (rehîne) siyaseta îro, ya ku rêvebirîya KT dimeşîne. Ew ne kêrî gelê kurd tê û ne jî kêrî gelê tirk!**

Gotineke pêşîyan heye, dibêje, ku zulm zulmê tîne. Lê bûyerên vê dawîyê derxistin holê, çi ku di derbarê PKK da heya naha hatye belavkirin, hemû jî derew e, ku PKK, her çiqas sedem û derfetên wê jî pir hebûne, ne ku tenê naxwaze û nikare têrorê pêk bîne, lê her weha, ew nizane jî, ka wê çawa pêktînin...

**Lê têrora dewletê, minê bigota, ya navdewletî, ya ku gîhandine radeya here bilind a cerda zordarî û stemkarîyê, dawîya dawîyê wê kurdan neçarî berxwedanê bike, ji ber ku gelê kurd ji destê têrora dewletan a navnetewî pir zêryaye. Û ne teqez e, ku ewê hema cengewarên PKK-ê bin... Di nav kurdan da dê mirovne wisa derên holê, yên ku dê bersîva wê stemkarîya xeter, bêwijdan û nemirovîyê bidin,...**

**Ew her tenê pirsa demê ye!**

Û ji bo ku ev pêk neyê, ji bo ku paşê kurdan bê sedem tewanbar nekin, dem pêra gihîştye, ne ku li ser şkandina wê zulmê serê xwe bêşînin, a ku wan bi sunî ji ber xwe derxistye, lê li ser şkandina zulm û zordarîya rastîn, a ku rêjîma faşîst tîne serê gel û êş û azar û trajêdîyayê bi xwe ra tîne. Û wê demê wê hêsan be, ku bedbextîya bi mîlîonan mirovan di vê cîhanê da ji holê bê rawestandin.

Ew dikare pêk bê, eger dewletên gewre bixwazin, ji ber ku ew bi xwe baş dizanin, ka ew çi zulm û zordarî ye, bingehên wê li ku ne û mirov çawa dikare wê ji holê rake. Tenê divê ew bi xwe vê bixwazin!

Ez heya dikarim navnîşanên wê jî destnîşan bikim, fermo: Tirkîya, Ankara, Çankaya, Destûra Bingehîn a Komarê û yên ku wê pêk tînin: Serokkomar, Hukumat, Meclîs û ew, ya ku Fermandarîya Giştî pêk tîne – Biryargeha Giştî... Û, ji bilî van, komên mafîoz û yên cerdên bi tevger – hemû bi hevra ne, hemû li hev civyane!

Hûnê bipirsin – çawa?

Ev jî karê wan e! Ewana baş dizanin, çawa bi wan ra ziman bibînin.

Ev – ji bo wê, ku di derbarê pirsgirêkê da têgihîştineke giştî hebe!

## 3. Berbi biryarên Dadgeha Nyûrnbêrgê va…

Pirs dertê holê: dewletên gewre yên cîhanê di çareserkirina pirsgirêka kurdî da çawa dikarin rola xwe bilîzin û ji bo destpêka pêvajoya aştîyê çi divê bê kirin?

Îro li ser asta navnetewî forûmên cihêreng tên lidarxistin: hevdîtin, komcivîn, maseyên gulover... Ew forûm bi şêwaz û naveroka xwe va çawa dibin, bila bibin, kurd mafdar in, ewana wek xelekên destpêkî yên trîbûnalên (dadgeh) leşkerî yên navnetewî bihejmêrin (kurdan ew wisa hejmartine û ji vir û pêva jî dê wisa bihejmêrin), û ji ber wê jî, ew mirovana, yên ku hê dêmê xwe yê mirovî winda nekirine, wê herdem tewanbarîyê raberî rêvebirîya KT bikin.

Wek ku tê xuyanê divê hesab bikin, ku Dadgeha Nyûrnbêrgê her tenê ji bo demekê navber daye pêvajoya xwe. Dibe ku pêwîst dike, ku ew bi komeke nû ya dadgeran va pêvajoyê jinûva destpêbike û doza hember rêvebirên wan welatan bibihê, li ku sûcên giran li dijî mirovahîyê pêkanîne, çekan didin destên sewdaser û cinewirîyên barbar û, wisa jî, pirsa wan hêz, dewlet, rêxistin û kesayetîyan, ên ku wê demê (û hem jî îro) alîkarî dane û didin geşvedana faşîzmê û hemû reng û şêwazên rûdana wê. Wan hemûyan divê wek beşdarên çalakîyên zulm û zordarîyan bihejmêrin, ên ku li dijî mirovahêyê hatine pêkanîn.



***Dadgeha navnetewî ya Nyûrnbêrgê (1945 – 1949). Ji bo pêkanîna sûcên giran li hember mirovahîyê syasetmeder, serleşker û serekfermandarên Almanya faşîst hatin darizandin. Lê kengê, gelo, ev dadgehê careke dinê berev bibe û ji bo sûcên giran, ên ku wan li dijî mirovahîyê pêk anîne, rêvebirên Tirkîyaê jî bên darizandin?***

Û wek dozger divê nûnerên gelên herêma Rojilata navîn derkevin pêş, ên ku di encama siyaseta Tirkîya duh û îro da gorî û windayîyên wan çêbûne... Wisa, ku ez ji bo hemû rêxistinên mafparêz û hûmanîtar pêşnîyar dikim (helbet, eger yên wisa heya îro hê hene û xwedî erk in), bila amede bin, hîç nebe, ji bo destpêkê, pêngava xwe ya tewanbarkirinê diyar bikin. Ew deynê me û wan ê mirovî ye!

Lê ji bo çareserkirina pirsgirêka kurdî ji navê terefê kurdî yê dozxwaz ez îro van pêşniyaran dikim:

**Ya yekem:** dewletên gewre, eger ew bi rastî dixwazin, ku pirsgirêka kurdî bi aştî bê çareserkirin, divê dest ji siyaseta dustandartîyê berdin û li hember KT wan hemû sepandin (sanction) û çalakîyan bi kar bînin, ên ku li hember Yûgoslavyayê – dema krîza Kosovoyê û li hember Îraqê – dema êrîşkarîya wê ya li ser Kuvêytê ("Bahoz di xîzgehê da") hatine bikaranîn.... Bi hemû hêz û derfetan divê rêvebirîya Tirkîyayê neçar bikin, ku guhartinan di wî beşê Destûra Bingehîn a wêlêt da pêk bîne, li ku tê gotin, ku hemû niştecîhên KT tirk in, û li şûna wê binivîsin, ku "gelên bingehîn ên KT tirk û kurd in, û anegorî wê jî maf û erkên wan diyar dibin. Ku ew komar ji du welatên ji hêla maf va weke hev – Tirkîyayê û Kurdistanê pêk tê". Mafên nûnerên gelên dinê jî divê bi Destûra Bingehîn a KT bêne misogerkirin.

**Ya duyem:** civaka navnetewî divê girtina Abdullah Ocalan wek çalakîya cerdevanîya (eşkîyalik) dewletan a navnetewî qîmet bike, wê tewanbar bike û daxwez bike, ku rêberê netewî yê gelê kurd di bin garantîya Rêxistina Natewên Yekbûyî (RNY), Yekîtîya Ewropayê (YE) û rêxistinên dinê yên navnetewî û dewletên gewre da bê azadkirin. Dewleta tirk divê wisa jî hemû girtîyên siyasî azad bike û ziyanên wan ên wateyî û darayî li wan vegerîne.

**Ya sêyem:** ji bo ku qîmetekî tam bidin wan barbarî û tevkujîyan, ên ku rêjîma tirk a berê û naha li hember gelên kurd, ermenî, yewnanî, asorî û yên dinê pêk anîne, trîbûnala navnetyewî saz bikin û pirsa wan rêvebirên zulmkar ên Tirkîya duh û îro, wek pirsa sûckarên leşkerî bibihên, ên ku li dijî mirovahîyê sûcê giran pêk anîne.

**Ya çarem:** leşkerên dagerker ên KT ji xaka Bakûr û Başûrê Kurdistanê bên derxistin.

**Ya pencem:** ji hesabê byûcêya Tirkîyayê û byûcêyên wan dewletan, yên ku piştgirî dane zûlmkarîyên wê, yanê jî çek danê û îro jî didin wê, û bi wan çekan tevkujî û wêranî ji Kurdistanê ra anîne, zyanên wateyî û darayî yên kurdistanîyan li wan vegerînin: gund, bajar û rêyên rûxandî ji nûva ava bikin, merc û derfetan amade bikin, ji bo ku kurdên ku bi neçarî bûne penaber, vegerin cîh û warên xwe (bêyî wê, ka ew penaberî çiqas dem berê pêk hatye, û di bin garantî û ewlehîya rêxistinên navnetewî da).

Bi vê ra dê ji bo dewletên gewre derfet çêbibin, ku ew beşdarî avakirina gund û bajarên Kurdistanê yên wêrankirî bibin û aborîya wê ya talankirî rakin ser pêyan.

**Ya şeşem:** bingeheke piralî amade bikin, ku bi qanûneke taybet derfetan ji bo wan kurdan biafrînin, ên ku di encama siyaseta dewleta Tirkîyayê ya nepejirandin û bêtehmûlîyê, binpêkirina mafan û tevkujîyê da neçar mane, welatê xwe biterikînin û, ev êdî çend nivşên wana di welatên bîyanî da dijîn, vegerin welatê kal û bavan, ji bo ku Tirkîya hemû zyanên wan ên wateyî û darayî li wan vegerîne û, wisa jî, xercê vegera wan a welêt û bi cîh û warkirina wan ji byûcêya dewletê bide.

Û, ji bilî wê, di dawîyê da gotinek jî ji bo Mala Nûneran (Meclîs) û gelê DYA heye: "Hukumeta DYA hersal navnîşa (lîste) rêxistinên têrorîst amade dike, û di rêza wan rêxistinan da wisa jî navê PKK datîne. Mirov dixwaze ji amadekarên vê navnîşê bipirse: *"Ey dadgerên birêz ên qencî û xirabîya vê cîhanê, gelo we li ser çi bingehê ew navnîş amadekirye? Hema helwesteke weha ya li hember têrorîzmê bi xwe rê li ber têrorîzma rastîn – têrorîzma dewletê – venike, gelo?"* Ew, ên ku xwe mirovên dadmendî dihejmêrin, ên ku navê wan ê Mirov bi tîpa mezin nivîsî ye, bila destê xwe bidin ser dil û wijdanê xwe an li ser Pirtûka pîroz û bibêjin, ka ewana, wek mirov, ne wek erkdarekî, yê ku di bin desthilata qanûnên dijmirovî da ye, dê bi çi awahî li dijî hovên devbixwîn ên heya diranan biçekkirî bitêkoşyana, yên ku ajotine welatê wan, malwêranîyê û miriinê ji kes û kinêzên wan ra tînin?

Gelo rêyeke dinê dimîne, dema mirov hîç bi awayekî dinê nikare wî hovê dirinde yê di dilqê mirov da rawestîne? Ma ne di dîroka hemû gelên cîhanê da demajoyên weha hebûne, û ew gelana li dijî dagerkerên bîyanî têkoşîna xwe ya mafdar meşandine. Û ev

mafê gelan di tûzika Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY) da misogerkirî ye!

Lê, dema di navnîşa rêxistinên têrorîst da PKK-ê didin xuyan, di Meclîsa Nûneran da wê bi hêsane wan xalên byûcêya DYA (di nav da wisa jî yên veşartî) bidin erêkirin, ên ku wê alîkarîya leşkerî ya ji bo rêjîma faşîst a Tirkîyayê misogerbikin. Ev ya yekem! Ya duyem, ji bo ku domandina wê hovîtîyê bê efûkirin, a ku artêşa Tirkîyayê di Kurdistanê da dimeşîne, û ew çek, ên ku dane wan, bêne dêrskirin, ji bo ku peyra dîsa bikaribin rêvebirya Tirkîyayê bikişînin ber derê Mala Sipî, ji bo ku ew mîna parsekan destê xwe dirêjî xwedîyên xwe bike... Û bi vî awahî... heya bêdawîyê. Lê naha êdî Tirkîya heya gewrîya xwe di nava vî şerê neheq û qirêj da maye...

Ma, RNY an NATO çekan li dijî hinekan bikar naynin (ew dadwerî be an – na, pirs ne di wê da ye!), eger ew ji bo çareserkirina nakokî û pevçûnan rêyeke dinê nabînin?! Ka, bibêjin, fermo: erê, yan – na? Û eger erê, ji bo çi!? Pîvana mafdarbûnê li ku ye, kê bi wan mafan kî erkdar kirine, ji bo ku ew li ser serê hemûyan bibn dadger? Erê, mirov têdigihîje, wisa jî dibe, ku RNY jî neçar dibe, ku berê xwe bide çareserkirina pirsê ya bi vî şêweyî... Lê ew camêrana çima wisa nakin, dema pirs tê-digihîje Tirkîyayê?

Û paşê jî, ma, gelo ev ne bêhurmetî ye li hember pîrozîyên mirovî, dema *wê dewletê, ya ku di tevahîya dîroka xwe da ji derdorên xwe (û tevahîya cîhanê) ra tenê kirêtî, wêranî û tevkujî anîne, wek endama rêxistinên navnetewî hildibijêrin. Ji artêşa vê dewletê komên leşkerî dikin nav hêzên aştîparêz.*

Hûn tê digihîjin – **dewleta tirk – û aştîparêzî?!**

Bi erêkirina bêdeng a cîhana, xwedêgiravî, şaristanî, tirk, ên ku şaristanîya Vîzansê tunekirine, tevkujîya gelek gelên herêmê pêkanîne, naha jî xwe gîhandine beşê gelê kurd ê mayî û çûne-derketine Qibrisê...

Gelo ne bes e?! Gelo ne dem e, wê pirsê wisa çareser bikin, ji bo ku aştî bê vê herêmê jî?! Lê heya pirsgirêka kurdî nehatye çareserkirin, zû ye, ku mirov di derbarê aştîya herêma Rojhilata Navîn da biaxive.

**Sala 1997-an di Romayê da konfêranseke navnetewî pêk hat. Mijara wê wê jî ev bû: “Ji pirsgirêka kurdî ra çareserîya aştyane”. Abdullah Ocalan ji beşdarên wê konfêransê ra peyamek şandibû, û di wê peyamê da ev dihat gotin: “...Eger têkoşîna gelê me ya ji bo mafê xwe yê netewî ya bi rêberîya PKK-ê nînbûya, wê demê, piştî xûnta 12-ê rezbera sala 1980-î dê heman tişt bihata serê wî jî, ya ku hatibî serê gelên ermenî û asorî... Rêvebirên DYA û hinek dewletên Ewropa Rojava,** – *di peyama Ocalan da dihate gotin,* –**bi zanebûn hewl didin, ku PKK wek rêxistineke têrorîst bidin xuyan, lê civaka navnetewî, derfetên wê hene, ku bi xwe di nêrîna berovajî vê da bi bawer be. Û, eger beşdarên konfêransê naxwazin, ku biryarên wan li ser kaxezê bimêînin, dixwazin bi çavên xwe rastîya Kurdistanê bibînin, konfêransa we dikarbû komek beşdarên xwe erkdar bikira û bişanda wir, û PKK jî wê ji bo alîkarîya şandeke wisa çi ji destê wê tê, dê bike. Lê ji bo wê, ku encamên lêgerînan di çavê civakê da bêhtir cîyê bawerîyê bin, we dikaribû rêxistineke xwedî ray a navnetewî jî beşdarî wê bikira, em jî amadene ji qanûnên navnetewî ra rêz bigirin”.** – Gotinên Rêberê birêz pêdivîya xwe bi şiroveyan nînin.

Di dawîyê da min dixwast hêvîya xwe ji bo mirovbûna mirovahîyê banya zimên... Ku, wê demê bê, û wê tirîbaûnaleke mîna ya Nyûrinbêrgê berev bibe û dema daxuyandina biryara dawîyê ya gunehbirînê, dadger dê teqez ji van pêşniyarên jorê sûd wergirin.

**Û, eger jinûva dadwerî pêk bihata, û ew yekîtî li dijî berjewendîyên wan ên netewî nînibûya, kurdan dê bikaribûya xwe azad hîs bikirana û dê bi xwesteka dilê xwe, bi kê ra dibe, bila bibe, yekîtîya xwe avabikirana...**

**28. 11. 1999.**

# JANGLYORÊ[3] NÛPEYDABÛYÎ DI QADA SIYASETÊ DA
## (an fehlvekirina Vladîmîr Zavêlskî di xewnê da û bi hişyar…)[4]

### Pêşgotina kovara «Дружба» ("Dostanî")

***Di hejmara 26-an a kovara «Коммерсанть-Власть» ("Kommêrsant-Vlast") a 6-ê hezîrana sala 1999-an da gotara Vladîmîr Zavêlskî ya bi sernivîsa "Emê bi rêya xwe bimirin"(«Мы умрём своим путём») hatibû weşandin!***

***Di gotarê da serdema îroyîn a têkoşîna rizgarîya netewê ya gelê kurd, rola rêberê netewî birêz Abdullah Ocalan bi şêwazekî lêpovajîkirî, heya carna jî bi bêrêzî li ber xwendevan tê vekirin, û yek bi yek hema mina propaganda fermî ya dewleta tirk e. Bi xwezayî, dilê gelek xwendevanên me mabû, têlêfon dikirin, name dinivîsîn, bi xwe dihatin û daxwez dikirinm li ser rûpelên kovara me, wek weşanek a di warê pirsgirêka kurdî da xwedî cêribanidin û pisporî, şirove bikin, dawîya dawîyê, ka çima li ser rûpelên çapemenîya Rûsîyayê gotarên weha peyda dibin…***

***Helbet, ji bo wê pirsê, ka çima ew gotara navborî li ser rûpelên kovara «Коммерсанть-Власть» ("Kommêrsant-Vlast") hatye weşandin, em nikarin bersîvê bidin, ew pirs a exlaqê rojnamegerîyê, wijdanê nivîskarê gotarê, û rêdaktsîona kovarê ye...***

***Di destpêkê da me dixwast, bersîva pirsên xwendevanan bidin, lê paşê, nûnerê me nivîskar Korda Mad (Ezîz ê Cewo) piştî sowbet-govtûgoya xwe ya di Mala Kurdan da bi rûspîyekî kurd ê ji Krasnodarê – apê Tajdîn ra, gotarek bi sernivîsa "Janglîorê nûpeydabûyî di qada siyasetê da" nivîsî, û ewê sererastkirinên xwe kirin nava planên me: me biryar da, wê gotarê pêşkêşî bala xwendevanên xwe bikin.***

---

Rûspîyekî derdorê 75 salî li hember min rûniştye. Di kûrahîya çavên wî da netavetî û bêbawerîyek veşartî ne…, lê li derekê jî – hêwarze. Apê Tajdîn ji Krasnodarê bi mêvanî hatibû mala lawê xwe, û ji wir jî hatye seredana "Mala kurdan". Li vir hinek parçeyên ji çapemenîya Rûsîyê pêşnîyarî wî kiribûn. Ewî ew xwendibûn û biryar kiribû qal û cengekê dayne –yeke ne weke wê, ya ku ew dema şerê dijî dagerkerên faşîst beşdarî wê bibû, lê yeke dinê, li dijî ketîbûn-kirêtî û bêprênsîpîya mirovî. Ew bi guman li min dinihêre, serê xwe dihejîne û van gotinan li dû hev tîne-dinitirîne:

– Ax hûn, rojnamegerno, ma çawa wijdanê we naêşe, – ew ji berîka xwe fotokopîya gotara Vladîmîr Zavêlskî ya *"Emê bi rêya xwe bimirin"* derdixe, a ku di hejmara 26-an a kovara «Коммерсанть-Власть» ("Kommêrsant-Desthilat") a 6-ê hezîrana sala 1999-an da hatibû weşandin. Lê min ji çavîya masa nivîsarê orîjînala wê hejmara kovarê derxist:

– Va – ev? – Min xwest bibêjim, ku min jî ew xwendye...

– Erê, ew! Min wisa jî dizanibû, ku ya we hemûyan, rûyekî we heye. We ji îdêalê mirovî ra xiyanet kirye... Ev çiqasî bêexlaqî û kirêtî ye! – Ewî destê xwe di hewê da

---

[3] ***1.*** *Janglyor – Artîstê tsîrkê, yê ku dikare bi hostatî û çapik tiştan davêje hewa û çend tiştan di heman demê da bigire.* ***2.*** *Di Fransa sedsalên navîn da û li Pîrênan ew navê artîst, dengbêj, sazbend û akrobatên gerok bûye.* ***3.*** *Bi wateyeke dinê ji wan mirovan ra dibêjin janglyor, ên ku bi hêsane, bi hostatî, lê bi xwesteka xwe dane û gotinan diguhêrin û bi kar tine.*

[4] kovara «Дружба» ("Dostanî"). № 7, tîrmeha sala 1999-an, r.: 9 – 12.

hejand.

– Tu çima wisa dikevî nava heyecanê, ber xwe dikevî, em hê nû dêmokrasîyê hîn dibin: ma ne di Ewropayê da heya kêmanîyên sêksûal azad û xwedî maf in. Bila ya me jî, kêmanîyên me yên wisa di warê exlaqî û siyasî da hebin. Yek e, di nava civakê da mirovên bi exlaq pirtir in, mirov ne bêheş in, dê bikaribin serederîyê lê bikin û rastîyê tê bigihîjin...

– Erê, ez tê digihîjim, lê, dîsa jî, wek ku di nav gel da tê gotin: *"Kûçik dewte, kerwan dimeşe!..."*

... Ev her tenê beşekî govtûgoya me ye, beşekî rûdana hestên apê Tajdîn e, her beşekî gotinên wî yên *"bi per û bask"* in...

Axavtina me bi beşdarê Şerê Mezin ê Nîştîmanî (1941 – 1945) pir balkêş derket. Û min biryar kir, gotinên ewî mirovê hêja, yê ku di nava parazvanên Stalîngradê da li dijî êrîşên faşîstan li ber xwe dabûye, du caran birîndar bûye, ... û dilê wî... "ji bo welêt pir dêşe", her hinekî sererast bikim, şêwazekî analîza "rojnamegerîyê" bidim wan û pêşkêşî bala xwendevanan bikim!

Û, bi rastî, dema vê gotaroka Zavêlskî dixwînî, dibînî ku di nava wê ra xeta propaganda dewletê ya Tirkîyayê derbaz dibe. Tuyê bibêjî, qey dîsa vekirî heman derewên nas dibihêyî, yên ku li ser pêlên radîo û têlêvîzîona Tirkîyayê tên belavkirin, an li ser rûpelên rojnameyên wan tên weşandin. Bi rastî karê me bi kê ra heye – *"bi rojnamegerê tirk ra"* (ev gotinên apê Tajdîn in!), an yên mirovekî, yê ku rûmet û wijdanê xwe firotye (ma, gelo, mirov dikare wê birfoşe, ya ku li bal wî ninie?).

Balkêş e, ku xudanê gotarê ne prêntsîpên dîrokê têdigihîje, ne jî haş ji rastîya sade heye: ku *"her tişt diherike, her tişt tê guhartin!"*

Ew îdêolojî bê berhem dimîne û dimire, ya ku werguhêrî dogmayê dibe. Eger Vladîmîr Zavêliskî dîroka PKK û berhemên Ocalan xwendibûna (ez êdî di derbarê lêgerînan da nabêjim!), dibe ku ew, hîç nebe, ya here kêm, dê ew rastî têbigihîşta, ya ku êdî ji zûva ji hêla hemûyan va tê zanîn: *PKK ji roja yekem a hebûna xwe va bi hemû karên xwe û yên endamên xwe – ji jêr heya jorê, dispêre analîzê, dinirxîne û, bêyî ku yekê/î bihêvşîne, rexne dike, û gav bi gav taktîk û stratêjîya xwe pêş dixe. Û ya sereke, ya ku PKK ji rêxistinên dinê cuda dike jî, hema ev e!*

Ya vê partîyê, sîstêma dîtinînên wê heye, bername û armancên wê hene, yên ku hîç kes nikare wan biteribîne. Lê, divê mirov vekirî bibêje, ne hemû kes in, ên ku vê rêxistinê fêm dikin – ew ne rêxistineke klasîk e.

Tê bîra min, dema hevdîtinekê Ocalan ji xortekî ciwan, ê ku nû perwerdeya akadêmîayê derbaz bibû, pirsî: "Ê, çawa ye? Tu PKK çawa têgihîştî?" – "Ez pir baş têgihîştim, Serokê min!" – Xort bersîv da. Ocalan vebeşirî û got: "Min PKK saz kirye, lê ez jî heya dawîyê wê tênegihîştime. Ew çawa bû, ku tu di demeke ewqas kurt da wê têgihîştî?"...

Erê, buhayê wê rêxistinê quruşek jî nîne, ya ku di mercên dîrokî yên konkrêt da nikaribe taktîka xwe biguhêre, lê di heman demê da xeta xwe ya stratêjîk biparêze û bê guhartin bidomîne. Wisa jî xeta stratêjîk a PKK wek ku hebûye, wisa jî bê guhartin maye. Di dadgehaa li girava Îmralîyê da Ocalan di gotina xwe ya dawîyê da bi taybetî gotibû: ***"Helwest û tevgera PKK hem di hundur da, hem jî li derva divê rast bê qîmetkirin"***. – Di têkstên fermî yên axavtinên Abdullah Ocalan da weha hatye nivîsîn, lê di rastya xwe da ew di axavtina xwe da weha ravedike: ***"Her çi jî hebe, PKK ne di welêt da ne jî li derveyî welêt dê ji helwesta xwe gavan paşva neavêje. Têra xwe hêz, çek û fînansên wê hene, ji bo ku têkoşîna xwe berfirehtir bike"***. – Û ewî ev hişyarî jî daye: ***"Ew, a ku di van 15 salên dawîyê da pêk hatye, dikare heya sedsaleke tam bidome"***.

Hîç xema Zavêlskî û xwedîyên wî jî nîne, ku şer dikare wisa dirêj bidome, ma ne, çiqas ji bo tevahîya cîhanê xirab be, ewqasî ji bo wan baş e, ewana derfetên xwe berfireh dikin, dê ji trajêdya xelkê sûd wergirin û bi wî awahî dewlemend bibin ... lê ewana jibîr dikin, ku piştî vê dê demajoyeke dine bê – pêvajoya berovajî ya berê, ewana divê bersîvê bidin – mirov kor nînin: zulm bi xwe ra zulmê diafrîne...

Çapemanîya Tirkîyayê civaka tirk sewdaser û xêv kirye, lê ez bawer nakim, ku heman tişt anîbin serê Zavêlskî. Ma ne, eger ewî bixwasta gotarek di derbarê rastîyê da binivîsya, dê dikaribûya berbirî terefê kurdî bibe, yê ku dê hemû agahîyên pêbawar bidana wî, û bi wê ra wisa jî, *"xwemukurhatina"* ("itiraf") Ocalan...

Di derbarê "xwemukurhatinê" da: Weha, di axavtina serok Ocalan da çi tê gotin:

***"Rasttênegihîştina PKK ya vê serdemê dikare bigihîne wê yekê, ku welat bibe nêçîra dirindeyan, ên ku lîstikeke xeter dilîzin ...*** (Û hema vê jî *Zavelsky & company* dixwazin! – K. M.) –Serok Ocalan dibêje û gotina xwe didomîne: ***– ... Îro PKK di nava civakê da roleke pir mezin dilîze, ewê xeta îdêolojîyê û stratêjîyê ya formal danye hêlekê û destbi têkoşîna ji bo serxwebûnê û azadîyê kirye. Ew gav bi gav ji wê partîyê gihîştye, ya ku di qada bandora wan pêvajoyên cîhanî da bûye, yên ku meşa dîrokê rêvedibin..."***

Û ji vê jî zêdetir: ***"Nabe ku mirov pêwîstîya guhartinan red bike. Lewra jî bi rêya lêgerînên tecrûbeya cîhanê û anegorî vê rewşê, ya ku îro li holê ye, min hewl daye, guhartinan bikim bernameya PKK".*** – Û ev jî, wek ku tê zanîn, hê gelek berî bi korsanî girtina Ocalan a ji hêla sazîyên taybet ên DYA û Îzraêlê va destpê bûye.

Mirovên gewre timê vekirî ne. Tiştê ku ew veşêrin, nine. Û, weha, Ocalan jî tiştek venedişart, her çiqas hesab nedida hîç kesî, qey bibêjî, ew ne ku di dadgehê da ye, û bi şêweyekî hêsan analîz û têbînîyên xwe tanîn zimên:

***"... Bêhtir ne rast e, bibêjin, ku ew rê, ya ku min ji bo welêt xwastye – ew ya şêr û zordarîyê ye. Rola xwe di îdêolojîya rêxistinê û xurtkirina aktîvbûna civakê da ez, wek ku ew hebûye, wisa jî nas dikim û dipejirînim.***

***Bi neheqî min tewanbar dikin ..., hemû tewanbarî derew in û hêjayî şermezarîyê ne. Bi rastî, ya ku pêk hatye, ew têkoşîna ji bo jiyana mirovan bûye, û ew gorî jî ji bo dêmokratîkkirina civakê û komara azad hatine dayîn.***

***... Eger tevahîya sûc bavêjin stuyê min, ewê hem bi siyasî, hem bi exlaqî bêdadî be... divê terefê dinê jî ji wî sûcî para xwe hilîne, yê ku di heşkorîya xwe ya siyasî û zalimîya xwe da bêhtir gunehkar e".***

Ma ne, PKK di bin seroketîya Abdullah Ocalan da hê berî bi korsanî girtina wî ji hêla sazîyên taybet ên DYA û Îzraêlê va sê caran (1993, 1995, 1998) bi yekalî şer rawestandibû û ji bo terefê Tirkîyayê pêşnîyar kiribû, ku bi hev ra ji bo çareserîya pirsgirêka kurdî li dor maseyê rêyên aştyene bigerin. Lê ka, gelo, rêvebirîya Tirkîyayê bi çi bersîva wan pêşnîyaran dabû, gelo Zavêlskî dizane? – Girtinên girseyî û êrîş û cerd (zorkutî), revandin û kuştina nûnerên rewşenbîrîya kurdî, bomberdûmankirina gundên kurdan, tevger û çalakîyên leşkerî li dijî gelê medenî! – Va, ev e rûyê şerê kirêt, yê ku rêjîma Tirkîyayê di Kurdistanê da dimeşîne.

An, Zavêlskî hîç serederîyê li vê mijarê nake, a ku ew di derbarê wê da dinivîse, û tenê agahîyên çavkanîyên Tirkîyayê bikar tîne, an jî pir baş dizane, ka divê çi û çawa binivîse. Wê demê, ya yekem, an ew rojnamegerekî (an lêgerînerekî) bêkêr e, ya duyem, pirs di wê da ye, ka *"ewî ji kê û çiqas pere wek bertîl girtine"*!

Ji bo pirsa danûstandinên bi DYA ra. Ya Partua Karkerên Kuristanê, xeta xwe heye: *divê mafên gelê kurd bên dayîn*, bêyî ku li çavê dewlet û rêxistinên dinê binihêrin. Û li ser vê rêyê, hem bi Ocalan ra, hem bêyî wî, PKK ji bo danûstandinan timê jî vekirî bûye. Çiqas ez pê dizanim, nûnerên DYA di dema xwe da li cîyên cuda di bin sîwana rêxistinên cuda da, an li pişt perdeya wan va bi nûnerên PKK ra hinek "govtûgo" pêk anîne. Lê, yek e, rikberên PKK kî dibin, bila bibin, ew divê ji mafên xweserîyê yê gelê kurd ra di Tirîyayê da (û ne tenê li wir) rêz bigirin… Lê ji bo PKK, ewê bi kê ra bikaribe vê pirsgirêkê çareser bike, ewqasî jî ne girîng e, her tenê rikberên wê mirovne bi exlaq bin û ji prênsîpên terefê kurd ra rêz bigirin.

*"... Hê çend sal berê,* – Zavêlskî dinivîse, – *dema di tevahîya cîhanê da partîyên kommûnîst navên xwe bi yên sotsîalîst û dêmokrat vediguhartin, dest ji dogmayên berê dikişandin, Ocalan dinivîse: "Tevgera PKK ... di encama vekirina rûyê rastîn ê siyaseta rêjîma kolonîlîst a Tirkîyayê di Kurdistanê da û têkoşîna li dijî netewperestîya bûrjûayên*

*biçûk ên rêformîst da gihîştye û pêk hatye. Wê demê bûrjûayên biçûk ên rêformîst jî ji hêlekê va di bin dêmikê (maska) marksîzmê da xwe didan xuyan, lê ji hêla dinê va têkilîyên wan pir nêzîk va bi rêjîma kolonîlîst a Tirkîyayê û di hinek cîyan da jî bi hêzên paşverû ra hebûn. Tevgera PKK di encama teşhîrkirina siyaseta lihevkirinê bi dagerkeran ra gihîştye û pêk hatye".* – Zavêlskî van gotinên Ocalan tîne û gotina xwe dibe sêrî:– Yên ku di dema xwe da dîroka partîya kommûnîst xwendine, ev gotinên weha ji wan ra nas in". – Hema wisa, ne kêm, ne zêde! ... Wek ku tê xuyan, çiqasî jî Zavêlskî di dema xwe da dîroka Partîya Kommûnist a Yekîtîya Sovêtê (PKYS) xwendibe jî, yek e, ew tiştekî jî tê negihîştye, lewra jî cudahîyê hîs nake.

Wê demê, ka em bi Zavêlskî ra bi zimanê mirovekî ne zêde nexwendî biaxivin û çend pirsan bidin wî:

– Lê ew, ku xwedîyên te êdî peyva "mêtîngeh" ("kolonî") bi kar naynin, gelo ew tê wê wateyê, ku têgîn û sîstêmeke wisaa êdî nîne?

– Ma, gelo Kurdistan welatekî mêtîngeh nîne?

– Ma, gelo ew, çi ku Tirkîya di Kurdistaanê da pêk tîne, ji mêtîngehê xerabtir nîne? Di welatên mêtîngehî da desthilata fermî, hîç nebe, hebûna gelê binecî bi xwe înkar nake, ziman û çanda wan qedexe nake.

– Ma, gelo piranîya partîyên Tirkîyayê, yên ku di bin navên cuda da dertên pêş (di nav wan da wisa jî yên marksîst!) partîyê metewperest an şovînîst nînbûne?

– Ma, gelo di Kurdistanê da kes an rêxistinên wisa tunebûne, yên ku xwe firotine mêtîngeran? (Helbet, kes û rêxistinên wisa di hemû welatên mêtîngeh da hebûne!).


*A, ya ku wisa Zavêlskî har kirye jî, ev e...!*

Li vir çi tiştê ne zelal heye?Têrmîn ne bi dilê Zavêlskî ne... Hinek kes çawa bi hêsane çerm û rengê xwe diguhêrin!...

Di derbarê sernivîsa wê gotara kirêt û hjayî şermezarîyê da – "Emê bi rêya xwe biminrin"! Eger xudanê gotarê yekî xwedî zanînên kur bûya, dê ev gotina hanê ya sade bizanibûya: *"Hîç kes nikare wî gelî bikuje, yê ku naxwaze bimire!"*

Û ew ji demê zûtir şad dibe. PKK êdî jizûva rawestyaye tenê partî be, îdêyayên wê îro di mejûyê bi mîllîonan kurdan da û ne tenê yên kurdan da dijî. Û tenê bi rêberîya vê partîyê kurdê bigihîjin mafên xwe yên netewî. Heya nedost û neyarên wê jî evê dipejirînin.

Di derbarê mîtîngê û peykerê Lênîn da! Ya yekem – yên ku cîyê mîtîngê hildibijêrin, ne kurd in. Ya duem – heya eger di Moskovayê da peykerên wan, ên ku Zavêlskî bi sernimzî xizmeta îdêalên wan dike, hebûna jî (Xwedê neke!), yek e, kurdan dê guh nedana şêwrên wî.

… Kesekî maf nedaye wî, ku ew li şûna welatîyên Rûsîyayê biryar bike, ka ew divê ji bo kê peykeran daynin, an ên kê bînin xarê, û kurd jî li kîderê mîtîngên xwe pêk bînin... Ya sêyem – yên wek Zavêlskî (Xwedê dizane, ka Zavêlskî bi xwe xizmeta kê dike!) bixwazin ji bo mîtîngê berev bibin (û mirovên weha jî dijwar bixwazin li cîyekî berv bibin – lewra ku naxwazin, ji hêla gel va bên naskirin!), bila, eger wisa li wan xweş tê, di bin wêneyê Adolf Hîtlêr da berev bibin! Ev jî kûryozên dîrokê ne (qerf û qîle!): ew, ên ku di dema xwe da marksîzm–lênînîzm "diperestin", yên ku di bin sloganên întêrnatsîonalîzmê da xwe veşartibûn û ji wan mafên taybet û berheman sûd werdigirtin, ên ku ji bo êlîta partîyê dihatin parvekirin, îro ji xwe ra xwedîyên nû dîtine.



***A ev jî ew e, ya ku pir Zavêlskî xweş tê (proje ya xudanê gotarê ye).yên wek Zavêlskî dê pir bixwestana xwe di bin Hîtlêr da paqij bikirana! Wêne ji orîjînala gotarê ji kovara Dostanî hatye Hildan...***

Ma jîyan wisan e? Hemû diherike, hemû tê guhartin? Û çima jî na! Ma, kê Hîtlêr anî ser desthilatê? Îdêlogên faşîzmê kî bûn? Û peyra çi pêk hatye, tevahîya cîhanê dizane: kontslagêr (êwirgehên navendkirî), kamêrayên gazê, tunekirina bi dehmîllîonan mirovan (di nav wan da wisa jî yên alman!), holokosta cihûdan... . Dibe ku ew ji bo Zavêliskî hindik e! Çi ye, ew mazoxîst e? Ew dîsa dixwaze...? Tirk jî di kuştinê da hosta ne! Dibe ku pêvajoya vezayîn-beravîtina Hîtlêrên nû destpê bûye?

Nizanim, çi bibêjim: “Ya star!”

Hestên apê Tajdîn rê nedidan hev, pir xemgîn bû:

– *Dertê, ku ji tevkujîya ermenîyan, kurdan, yewnanîyan, asorîyan a destpêka sedsala XX, di nava kontslagêrên faşîstan ra, di nava kamêrên gazê û holokosta cihûdan ra, di nava şerê ji bo Stalîngradê û Bêrlîna sala 1945-an ra, di nava Helebçê û Şirnaxê û termên kurdistanîyên medenî ra Vladîmîr Zavêlskî destê xwe dirêjî tiştê kurdan ê herî pîroz dike – dirêjî têkoşîna me ya netewî û rêberê netwî Abullah Ocalan...*

Ez ber dilê apê Tajdîn da têm:

– *Ber xwe mekeve, cîhan bi şêweyêm cuda xwe ji her cure qirêjê paqij dike, û, eger qirêj neyê xuyan, dê çawa bê paqijkirin?! Û evê gemarê emê nîşanî tevahîya cîhanê bidin.*

Apê Tajdîn ji cî rabû, xatirê xwe ji min xwest, weha bi guman li çavên min nihêrî, xwest bi bawer be:

– *Soz didî?*

Min bi erênî serê xwe hejand û, dema destê xwe da destê wî, hês kir, çawa destên wî yên qusyayî ên bi torên tamarên şîne gevez dilerizin…

Kalemêrê kurd kûzekûz, lê bi gavên bi bawer berbi dêrî va çû, şûnda berbi min zivirî, destê xwe hejand û derket…

Piştî çûyîna apê Tajdîn mitaleyên cuda ên tal tavetî nedidian min. Çawa dikare bibe, mirovê ku di cîhana şaristanî da bijî, yê ku xwe parçeyekî civaka mirovahîyê bihejmêre, bi wî şêweyî li tirajêdîya gelê kurd binihêre – ne siyaseta tevkujîyê bibîne, ne bêexlaqîya dewletên gewre û biçûk ên wek qaşilan li ber pêyan ketî ne, û her tenê ji bo bejewendîyên xwe raman bike?

Wê demê, bi dîtina Zavêlskî, Hîtlêr rast bûye? Wê demê divê çi bê kirin, em divê li şûna peykerên bîranîna gorîyê faşîzmê, yên Hîtlêr daynin? Û bila herroj Zavêlskî destegulên teze dayne binpêya peykerê “Fyûrêrê gewre”? Em bibêjin, îjar çi ferqî: rêvebirên Tirkîyayê yên îroyîn şopdarên Kemal Atatûrkê faşîstê sereke yê Cîhanê ne, yê ku mamosta û merebîyê Adolf Hîtlêr bûye. Ewana jî, mîna Kemal-paşa tevkujîya gelê kurd pêk tînin! ... Û wek ku evana karê Kemal-paşa didomînin, wisa jî yên wek Zavêlskî karên wan didomînin, ên ku alîkarî dan Hîtlêr, ku ew bibe “natsîstê sereke”. Lê pisporên îzraîlî – payhatîyên gorîyê holokostê, alîkarîyê didin wan, ji bo ku “holokosta” kurdan pêk bînin. Belê, dibe ku helbestvanê ermenî yê navdar Parûyr Sêvak badîhewa di helbesteke xwe da nenivîsye: “Ey, dadwerî, ka ez tfûyî enya te bikim!”

Û, eger sibê refên hewayî yê balafirên Tirkîyayê Bêrlînê, Têl-Avîvê, Waşîngtonê, Londonê bombebaran bikin, ji bîr nekin, Zavêlskî bi bîr bînin...

Bila Dîrok ji wî û xwedîyên wî yên nû ra dadger be!

**P.S.**

Vê dawîyê ez rastî rojnamegerekî bîyanî hatim. Derket, ku ew tirk e. Lê ew bêhtir kêm kemalîst-faşîst bû, ne ku Zavêlskîyê xudanê gotara navborî.

Dema gotûbeja me min gotê:

– Dizanî, îro du terefên vî şerî hene – hukumeta Tirkîyayê û gelê kurd. Lê rojnamegerên tirk xwe davên pêş, hewl didin, bibin teresê sêyem ê vî şerî.

Û, hûn bawer dikin, ew bi minra qayîl bû û lê zêde kir:

– Û ew pir xeter e!...

Ew, ku rêjîm û desthilatdarên paşverû tevkujîya kurdan pêk tînin, her tenê beşekî trajêdîya mirovahîyê ye. Gewretirîn trajêdîya mirovahîyê di wê da ye, ku ew wê jênosîdê dibîne û bêdeng dimîne, û bi her awahî piştgirî û alîkarîyê dide pêkhatina wê.

Li vira gotinê lawê gelê kurd ê gewre û rêberê Netewî Abdullah Ocalan li vê rewşê tên:

***"…Û heya ku kurd di rewşeke weha da ne, ev cîhana nivîşkan e, bêexlaq û sûckar e, ew mehkûm e.***

***Kurd heya radeyekê encama helwesta neyînî ya mirovahîyê ne, û ji vê hêlê va – trjêdîya wê ne".***

**16.07.1999**

# CÎHANPENAHÊ MEZIN XEWNA XANÎYÊ MEZIN DISÊWIRÎNE

## (Name ji rêberê netewî Abdullah Ocalan ra)[5]

Serokê birêz!

Heya ku ez bikaribim, di xwe da hêzekê bibînim û nameyekê ji Serokê netewî ra binivîsim, demek pêwîst bû, ku bûyerên bihurî bêne têgihîştin, û ew dem jî dirêj bû û gihîşte roja iro. Dibe ku min heya naha bi dehan name û nivîs di bîra xwe da sêwirandine, lê her carê jî min cesaret nekirye wan bispêrime kaxezê, ji ber ku min her care jî ew tam nedîtine. Ew raman û mitaleyên min wê paşê wek helbest û nivîsên dinê derên ronahyîyê (Hinek ji wan êdî amade ne, û ez yekê ji wan ji Serokê xwe ra dişînim).

**Hezarsala sêyemîn wê bi ramana Serokê Mezin xemla xwe wergire**

Di destpêkê da ez sersala Serokê Netewî ya 2000-î pîroz dikim û dibêjim, ku bi kar û xebatên Serokê Mezin gelê kurd ji windabûnê rizgar bûye û hezarsala sisêyan wê, bêfitya, bibe hezarsala Serok Apo û gelê kurd.

Ji ber ku…

Hezarsala duduyan bi reng û awazên ramana Serokê me xemla xwe wergirt û dibe dîrok. Hezarsala sêyemîn jî wê dîsa ji ramana Serokê me hêzê bigire, bi reng û awazê ramana Serokê mezin xemla xwe wergire û berbi dihatûya dîrokê va bimeşe.

Cîhanpenahê ku xewna Xanîyê Mezin di jîyanê da disêwirîne, îro li “girava di pişt hevt deryîan da” ye, lê ramana wî ji wir jî ronayîyê dide cîhanê û gel û welatê me û hêvîya Azadî, aştî û mirovayîyê dide hemûyan. Û hebûna vê ronayîyê jî garantîya meşa gelê kurd a berbi Azadîyê va ye. Û, ji ber gel jî baş dizane, ku ew çavkanîya hebûn û azadîya wî ye, bi xwe jî bûye garantî û mercê hebûna wê ronayîyê.

Kî çi dixwaze, bila bibêje, kî çi dixwaze, bila bike, yek e, ewên destên xwe yên gemarî dirêjî navê Serokê Mezin dikin, wê di dîrokê da winda bibin û mirovayî wê navê wan bi nifirên giran bîne zimên, lê navê Serokê me, wek navekî hêjayî mezinahyîya dîrokê, wê li ser zarê her dayîk, zarok û kal û pîrên kurdistanî be… Û îro jî zarokên ku zimanê wan nû vedibe, peyva wan a yekem navê Serok Apo ye.

Li ser bingeha ku serokê me danye, hezarsala sêyemîn wê bibe ya gelê Kurdistanê, mirovahîyîyê, yekîtî û aştîyê.

Û em bi bawer in, ku cîhanê bibihê û şerm bike. Di dîrokê da timê jî wisa bûye: mirovayîyê destê xwe hildaye ser pêşîkêşê xwe û paşê jî ew wek pêxember hebandye û serê xwe li ber wî çemandye. Û demê bê, cîhanê ji van kirinan şerm bike û spasî û rêz û hurmetên xwe ji bo gelê kurd û Dayîka serokan pêşkêş bike.

Gotineke Omer Xeyam li helwesta serokan a li henber mirovên gunehkar tê. Helbestvanê mezin berbirî Xwesê dibe û dibêje:

*“Ey Xweda, eger ez şaşîyan bikim,*
*Û tu jî ji bona wê min ceza bikî,*
*Êdî çi ferqî di navbera min û te da?!”*

Zindan û girtîgehên bi destan çêkirî wê nikaribin xwe li ber mezinayîya Serokê me ragirin, û wê rojê bê, dîwarên wan dê birûxin, ji ber ku ra (îrade), ruh û ramana bi millionan kurdan di kesayetîya Serokê me da ye, ew hêvîya gelekî çil millionî ye, hêvîyeke

[5] *Ev nameya dawîya sala 1999-an bi rêya “Byûroya hiqûqê ya sedsalê” ji rêberê netewî ra hatye şandin. Paşê, ew di bin sernivîsa giştî ya “Nameyên bi zimanê qedexekirî” da di rojnameya “Azadya Welat” da hatye weşandin (sal 2000, hejmar 209).*

wisa nikre bê hebskirin.

Îcar. ka emê li derva çawa xwe di zindanê da bibînin, bikaribin bi her kar û barên xwe va hêjayî wê hêvî û armancê bibin? Ew jî bi serê xwe peywirek e, ya ku divê her yek ji me têbigihîje: em hemû – çil million bi Serokê xwe ra dê demeke dirêj di rewşeke weha da nemînin, eger em bi xwe wê rewşê nepejirînin û ji wê ra destê xwe daneynin. Rast hatye gotin: "Gelê ku nexwaze bemire, hîç kes nikare wî bikuje!" – Û gelê me jî bi rêya Serokatîya xwe gihîştye zanebûneke wisa, ku nema rewşeke weha dipejirîne. Ma bindestîya hezarsalan ne besî wî ye? Hebsa dewletekê têra me nake, heya welatek jî têra me nake, Serokê me êdî ji zûva ji sînorên welatekî, heya ji sînorê herêmeke cîhanê derketye û pirsgirêka gelê Kurdistanê dexistye ser bilindayîya cîhanê.

Hemû kurd îro di wê bawerîyê da ne, ku hezarsala nû dê bibe destpêkeke nû di berdewama rêya ronî ya Serokê me yê Netewî da, ya ku dê gelê me berbi azadîyê va bibe…

Bi vê bawerîyê, bi navê hemû heval û hogirên xwe, ez sersala 2000-î li Serokê me yê Netewî pîroz dikim û dibêjim, ku emê heya dawîyê karkerên ramana Serokatîya xwe bimînin. Emê ji bûyerên bihurî jî dersên dîrokî derînin.

– Bila her bijî Serokê me yê Netewî –Serok Abdullah Ocalan!
– Bila her bijîn gelê Kurdistanê û gêrîllayên me yên leheng!
– Bila her bimrin xiyanet û xwefiroşî!

Bi rêz û silavên germ û hêvîya bi Serokê Netewî ra tevayî li ser xaka nîştîman a azad pîrozkirina sersaleke berî sersalekê.

## Dem û dîrok

(Dîyarî ji bo Serokê Netewî…)

Bila dîrok neponije,
Îcar demeke nû wê tê:
Jîyaneke weke dojeh
Îro nema l'rewşa me tê!
Sal û sersal l'hev zivirîn,
Ev gel êdî ne ew gel e,
Roja çûyî naê kirîn:
Osmanîyê venegere…
Keç û xortên me yên tûre
Agrê rizgarîyê gurkirin,
Partî, artêş û gelê me,
Ocalan ew tevgerkirin.
Bila cîhan amade be,
Îcar dora aştîyê hat,
Ji bo wê jî gel l'ser pêyan e,
Îro azadî ye xelat.
Kar û barê meyê ev be,
Û emê her li ser pêyan bin,
Roja meyê ronî bibe,
Dîroka me bê nûkirin…
Va ye, îro Aştî tê,
Serokê me bûye serkêş,
Ta Ewropa ji Îmralîyê
Aştî wek merc wî daye pêş.
Nabe, dibê, – weha nabe,
Bes e, êdî rabin ji xew,
Îcar dema Aştîyê ye,

Jiyaneke bê tirs û saw…
Îmralî jî ji wê rewşê
Neçar maye, bêpergal e,
Hê pal daye wek pîreşêr
Û diqîre, zarezar e:
– Nema êdî qebûl dikim!...

**Korda Mad**
**(Ezîz ê Cewo)**
**20.12.1999/Moskova**

# KURD, CÎHAN
# Û RÊYÊN ÇARESERÎYA PIRSGIRÊKA KURDÎ[6]

Îro agirê serhildan û raperînan li Rojhilata Navîn û Bakûrê Afrîkayê girtye. Pêşîyên me dê bigotana: *"Text û tacên dewletên wê herêmê dihejin!"*

Û, eger di cîhanê da hinek bi matmayî, hinek bi xweşbînî û yên din jî bi dilêşê li wan bûyeran dinihêrin, kurd li ser dîmenên wan serhildanan bûyerên raperînên Kurdistanê tînin ber çavê xwe û wan jinûva watedar dikin.

Bi rastî, dema mirov li rêya têkoşîna gelê kurd a ji bo mafên xwe yên mirovî û netewî dinihêre, dibîne, ka ew rêyek a çawa dûr û dirêj û tuje dijwarî derbazbûye, heya karibûye ji qedexe, înkarê û tevkujîyan ra bibêje – na! Ewî li hember wan hemûyan serî neçemandye – li ber xwe daye, serhildan û raperîn pêk anîne. Ji asta xweînkarkirinê gihîştye ya xwenaskirin û xwetêgihîştinê ya here bilind, ji xewa mirinê hişyar bûye, rabûye ser pêyan, nigê xwe li erdê dixe û doza mafên xwe dike.

Belê, ev gel êdî ne yê duh an pêr e!

Ji bo ku ew bigihîje asteke weha têkoşînek hatye meşandin: têkoşîna li hember xwenedîtin û xweînkarkirinê, têkoşîn – li hember xewa mirinê û nezanîyê; têkoşîn – li hember hovîtî û barbarîya dagirkeran, li hember têrora dewletê (û ya dewletan!)... Û di vê têkoşînê da Tevgera rizgarîxwaz bi hezaran pakrewan dane. Bi dehhezaran dot û lawên gelê kurd ên here hêja di hebs û zîndanên wan rêjîman da mane û hê jî dimînin, hê jî rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan hebsîyê rêjîma zulmê ye. Vê rêjîmê bi hezaran zarokên kurd ên deh – danzdehsalî jî avîtine zindanan, ji ber ku wan kevir avîtine tank û panzêrên artêşa dagirker, ên ku êrîş birine ser gelê medenî yê bê sûc û guneh...

De îjar şerm bike, Cîhan, eger te hê têgeha şermê windanekirye!

... Helbet, dibe ku hîç hewce jî nedikir, ku mirov vê rêya dîrokî careke dinê dubare bîne zimên: gelê kurd van hemûyan baş dizane û bi vê zanebûnê jî ew îro têkoşîna xwe didomîne. Heya zarokên ku di nava alava vê têkoşînê da gihîştine û mezinbûne, ew jî baş dizanin... Lê, dema ji nav gelê me hinek hêrmofrodît (yên nêremûkî) ên siyasî û yên xweevîndar, an van tiştan nabînin, an jî naxwazin bibînin, û bi devê neyaran li hemberî Tevgera netewî û Rêberê wê diaxivin, an jî destê xwe didin dijminê barbar ê hezarê salan, pêwîst e, ku mirov van rastîyên dîrokî dem bi dem dubare bike!.. Ji bo ku hinek wana jibîrnekin!

Rastîya dîrokê evê ji me dixwaze!

Lê ya dinê, ya ku me dixwast bala xwendevanên xwe bikişanda ser, ev çend xalên bingehîn in – ji bo vê serdemê:

– êdî bes e, ku em daxwaz bikin, ku şert û mercên rêberê gelê kurd di zindanê da bên başkirin! Doza me divê ji bo Azadîya wî be!

– Êdî bes e, ku em doza mafên perwerdeya zimanê dê bikin! Ev daxwaz heya demekê di cî da bûye, lê ji bo demek a dirêj ew dikare zerarê bide – ew dikare hêza berxwedanê û daxweza dozê berbi lewazbûnê va bibe. Zimanê kurdî divê bibe zimanê fermî! Ji bo wê jî pirsgirêka kurdî divê bi bingehê va bê çareserkirin – bi hemû misogerîyên destûrî û garantîyên navnetewî va.

– Êdî bes e, ku em doza wekhevîya di nav sînorên dewleteké da bikin! Evê bangê ji bo demekê têrê dikir. Lê cîhanê jî dît û bi bawer bû, ku Komara Tirkîyayê (KT) ji vê ra ne amade ye, ew dixwaze pirsgirêka kurdî bi tunekirina gelê kurd çareser bike... Ji bilî vê, îro di Welêt da balansa hêzên siyasî di navber rêjîma dagerker û gelê kurd û tevgera netewî da hatye guhartin: ji hêla siyasî va gelê kurd bûye xwedî gotina biryardar, êdî rêvebirîyên piranîya şaredarîyên Kurdistanê di dest gel da ne, gelê kurd li ser pêyan e û di gelek pirsan

[6] *Çavkanî: http://www.pen-kurd.org*

da dikare daxweza xwe li rêjîmê ferz bike û rêjîm jî neçar bimîne, gavan paşva bavêje (mînak, biryara Komîsîona hilbijartinê ya bilind a vê dawîyê!) ...

– Pirsgirêka kurdî ne tenê (û ne ewqas) ya dewletên herêmê ya hundurîn e, çiqasî pirsgirêkek a navnetewî ye, û dewletên cîhanê yên gewre divê her tiştî bikin, ku demekê berî demekê ew pirsgirêk bi rêyên aştyane bê çareserkirin;

Û li ser bingeha van sedeman mirov dikare ji bo çareserîya pirsgirêka kurdî van xalên jêrîn pêşnîyar bike:[7]

**Ya yekem:** dewletên gewre, eger ew bi rastî dixwazin, ku pirsgirêka kurdî bi aştî bê çareserkirin, divê dest ji siyaseta dustandartê berdin û li hember KT hemû wan hêz û derfet û çalakîyan pêk bînin, ên ku dema krîzîsa Kosovoyê li hemberî Yûgoslavîyayê û dema şerê (agrêsîya) li dijî Kuvêytê li hember Îraqê pêkanîn... Divê bi her awayî li ser Tirkîyayê ferzbikin, ku ew wî beşê Destura bingehîn a xwe ji binî va biguhêrîne, li ku tê gotin, ku KT dewletek a yeknetew e. Û divê li şûna wê bê nivîsandin, ku "gelên KT ên bingehîn tirk û kurd in, û anegorî vê jî berpirsyarî û mafên wan hene". Ku "ew komara ji du welatên ji hêla mafan va weke hev pêk tê, ew jî Tirkîya û Kurdistan in". Divê mafên nûnerên gelên din û kêmnetewan jî bi Destûra Bingehîn a Komarê bên misogerkirin.

**Ya duyem:** civaka navnetewî divê girtina birêz Abdullah Ocalan wek pêkanênek a cerdevanîya dewletan a navnetewî qimet bike, wê bûyerê şermezar û tewanbar bike û ji KT daxwez bike, ku demekê berî demekê rêberê gelê kurd serbest bê berdan – di bin garantîya Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY), Yekîtîya Ewropayê (YE), rêxistinên din ên navnetewî û dewletên gewre da. Rêjîma Tirkîyayê wisa jî divê hemû girtîyên siyasî û zarokên kurd azad bike û zîyna ku gîhandîye wan, li wan vegerîne.

**Ya sêyem:** ji bo ku qîmetekî rastîn bidin wan sûcan, ên ku rêjîma Tirkîyayê li hember gelên kurd, ermenî, yewnan, asorî û yên dinê pêkanîne, dadgeheke bilind (trîbûnal) a navnetewî bê sazkirin û kirên hovane ên rêvebirên Tirkîyayê yên îro û duh binihêrin û binirxînin, wek şuxulên merivkujên leşkerî û sûcê li dijî mirovyîyê.

**Ya çarem:** leşkerên dagerker ên KT divê ji xaka bakur û başûrê Kurdistanê bên derxistin – di bin çavdêrîya YN, YE û rêxistinên din ên navnetewî da.

**Ya pêncem:** ji hesavê byûcêya Tirkîyayê û byûcêyên wan dewletan, ên ku piştgirî dane hovîtîyên wê, yan jî çek dane wê û bi wan çekan di Kurdistanê da tevkujî û wêranî pêkanîne, hemû zîyanên kurdistanîyan li wan bên vegerandin: gund û bajarên wêrankirî û şewitî bên avakirin, rêyên wan bên çêkirin, her merc û derfetan biafirînin, ku kurdistanîyên ji ber têrora dewletê koçber bûne, vegerin cî û warên xwe.

Bi vê ra hem jî dewletên gewre wê bikaribûna beşdarî avakirina gund û bajarên Kurdistanê yên wêrankirî bibûna û alîkarîyê bidanaê wê, ji bo ku ew aborîya xwe pêşbixe.

**Ya şeşem:** KT divê alîkarî û destekê bide wan kurdan, ên ku ji ber siyaseta wê ya dijmirovîyê welatê xwe terkkirine û ev êdî çend nivşên wan li xerîbîyê mezinbûne, ji bo ku ew vegerin welatê kal û bavan. Tirkîya divê hemû zîyanên wan li wan vegerîne, xercê rêya vegera wan hilde ser xwe û ji bo bi cîbûna wan a di welêt da amadekarîyan bike.

Eger ev hemû pêk bên, wê demê wê êdî pêwîstî nemîne, ku em li pey çareserkirina pirsgirêkên cuda bikevin, ji ber ku hemû pirsgirêk di nav pirsgirêkekê da dibin yek, ew jî pirsgvirêka kurdî ye! Ew ku bi destûrî çareser bû, hemû pirsgirêkên din dê bi otomatîkî çareeser bibin...

## Li şûna peynivîsarê:

Berfanbara sala 1991-ê min helbestek nivîsî, ya ku paşê, sala 1998-an di pirtûka min a helbestan a "Kerwnên bêxewîyê" da hate weşandin. Ew dîyarîyek bû ji bo serhildana gel

[7] *Van xalên rê û rêbazên çareserkirina pirsgirêka kurdî (wek mercên çareserîyê), dema ku pêwîst tê dîtin, divê mirov bîne bîra cîhanê, lewra ku mirov dikare bi bawer bibêje, ku pirsgirêka kurdî dikare her bi pêkanînina wan mercan bi rastî bê çareserkirin.*

a wê demê, lê, ger mirov dixwîne, dibîne,  ku ew li vê serdemê jî tê:

**SERHILDAN**
(Banga Şoreşê)

Serî hildaye gelê minî kurd –
Hatye – hingavtye çîya û gelî–geboz,
Îro ew rabûye xweşmêre û xurt –
Bo Kurdistanê danye dew û doz.

Rabin, birano, xweşmêre rabin,
Pêra gihîştye roja doza me,
Ala xwe rengîn em hilbirînin –
Dijmin derînin ji Welatê xwe!

Kurdê ha rabe – heya ew hebe:
Erş–erda tevde ewê bo welêt,
Jîyana xwe jî wê nehêvşîne –
Û raqetîne wan hove kirêt.

Rabin, birano, mêrane rabin,
Pêra gihîştye êdî roja me,
Emê zorayîya xwe bicivînin –
Dijmin derînin ji Welatê xwe!

Bêhna Azadîyê em kirine yek –
Em tev rabûne û naên raê:
Bo Kurdistanê me hildaye çek,
Emê li dijmin rakin fermanê!

Rabin, em rabinm tev bi yek rabin,
Êdî va, hatye roja doza me,
Heş, sewda û raê xwe bicivînin –
Zevtkar derênin, ji welatê xwe!

Êdî rabûne, em xweş rabûne –
Ala xwe rengîn me hildaye jor,
Dê û xwîşkên me – ew jî rabûne –
Hildane ala me kesk, zer û sore…

Rabin, birano, xweşmêre rabin,
De hûn jî r’abin, dê û xwîşkên me:
Hêz û zoraya me bicivînin –
Dijmin derîninji welatê me!

# …LI SER PÊLÊN KOMPLOYA NAVNETEWÎ

**(Li şûna pêşgotinê ji bo weşana kurdî ya gotara “Di nava ta û bendên kompolya navnetewî da”)**

*Hersal 15-ê sibatê gelê kurd, dost û xêrxwazên wî û mirovahîya pêşverû ya cîhanê komploya navnetewî, ya ku li dijî rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan pêk hatye, şermezar dikin...*

*Êdî ji 20 salî zêdetir e, ku ev mirovê mezin li girava Îmralîyê girtî ye, lê dîsa jî rêberîyê li meşa gelê kurd a berbi azadîyê va dike, beşdarî hemû destpêk û destanînên wî dibe…*

*Rast e, dibêjin, ku komplo pêk hatye, lê gelo bingehên wê çi bûne, çi sedemên pêkhatina wê hebûne, kî û çawa beşdarî wê bûne, di wê da rola wan çi bûye? Gelo encamên wê çawa tên nirxandin?*

*Û, ya dine: gelo mirov îro dikare bibêje, ku ew komplo pêk hatye û bidawî bûye, yan, ew îro jî didome? Evana her tenê hinek ji wan pirsan in, ên ku îro netavetîyê didin mirov. Û îro gelê kurd û tevahîya cîhanê dixwazin têbigihîjin, ka ew komplo çawa pêk hat. Ka kê û li kîderê şaşî tê berdan, an bi xiyaneta xwe bûn hevkar û hevparên wê komploya kirêt û bûn sedemê wê bêdadî û nemirovahîyê, ya ku li dijî gelê kurd û rêberê netewî pêk hatye...*

*Di welatên cuda yên cîhanê da bi sedan gotar hatine weşandin, gelek weşan û bernameyên cuda yên radîo û têlêvîzîonan hatine belavkirin, bi dehan pirtûkan ronahî dîtine û di van hemûyan da bi hûrbînî dem û bûyerên cuda yên vê komployê hatine nirxandin û hewlwatedarkiirin... Dibe ku dehsal, an, heya, sedsal jî derbaz bibin, lê gelek terefên vê komployê yên tarî heya dawîyê derneyên ronahîyê. Mirovê her û her bi baldarî van bûyeran binirxînin û bixwazin tê bigihîjin, ka kî bûne ew hêzên sereke, yên ku ev lîstik pêk anîn?*

*Ji mêj va hatye gotin – her tiştekî veşartî rojekê dertê ronahîyê!...*

*Wê demê, heya tora komployê dihate hûnandin, rêya rêberê gelê kurd ê netewî Abdullah Ocalan du caran li Rûsîyayê ra derbaz bû. Herdu caran jî ez bi wî mirovê mezin ra bûme, em bi hev ra rojên pir teng û dijwar jîyane. Min tevahîya mezinahîya raman û rewana wî mirovê hêja û nebînayî dîtye, bi wî ra ketime nava govtûguyê, min xwastye tê bigihîjim, ka ew çi ye, ku di rojên ewqas giran da dihêle, ku ew di tu şert û mercan da nirxên mirovahîyê jibîr neke û bixwaze bi mirovbûna xwe vê cîhanê biguhêrîne...*

*Wan xwendevanan, ên ku gotara min a “Serok jî nebîhayî ye, û – gelê wî jî!”a di bin ser nivîsa giştî ya “Notên rêwîtîyê – pişt 20 salî” xwendibin (ew di malperên www.xendan.org , www.amidakurd.net* û *www.mezopotamya. gen.tr da hatye weşandi), dê ev gotinên di derbarê rêberê gelê kurd da bên bîra wan:* ***“Ew vîn û bibiryarbûna wî – ku cîhanê biguhêre, her tiştê xwe yê kesî bihêle û xwe bide karê serkevtina dadwerîyê û mirovbûnê, derbazî mirov jî dibe, û tu dixwazî li rex wî bî, beşdarî destpêkirina karên wî bî, alîkarê wî bî, hevkar, rêheval û leşkerê wî bî…”***

*Piştî wê hevdîtina xwe ya yekem a bi wî mirovê mezin ra, çend caran jî hevdîtin û danûstandinên me pêk hatine. Min bi rêberê gelê kurd ra goftûgo kirye, û her carê jî min dilopek ji okînosa rewan û ramanên wî hilçinye û wek gotar, şirove û nirxandin pêşkêşî xwendevanên xwe kirye...*

*Ev gotara sala 2002-an di Moskovayê da bi zimanê rûsî hatine weşandin*[8]*. Ji ber wê jî goveka xwendevanên wê bi Rûsîyayê û komarên Sovêta berê bi sînor maye... Lewra jî, ji*

---

[8] *«В петле международного заговора». См. журнал «Дружба» (kovara “Dostanî”), №14/15, март, 2002 г., стр. 69–75.*

*ber ku ev mijara bi xwe ya gelê kurd bi xwe ye, û ew bêhtir nêzîkî dil û ramanên wî ye û, pêdivî hebû, ku ew bi kurdî jî bê weşandin, piştî demekê ew di bin sernivîsa giştî ya "Li ser pêlên komploya navnetewî" da di malperên kurdî yên cuda da bi zimanê kurdî jî hatye weşaandin...*

**Weha, ew gotar:**

# DI NAVA TA Û BENDÊN KOMPLOYA NAVNET'EWÎ DA

## I. Çima?

Em – kurd, wek netew, bi dehezarsalan li ser sehneya dîrokê ne. Û di her serdemeke dîrokê da tiştek para me kurdan derketye (qenc an xerab!). Gelê me ji demên kevnar va di dîroka mirovahîyê da şopeke berbiçav hiştiye. Em (dîsa jî, wek netew!) di serdemên dîrokê yên cuda da xwedî hinek maf û derfet bûne, û me ew bi cînaran ra jî parvekirine (Împêratorîya Medyayê û yên dinê).

Paradoksa dîrokê! – Sazûmankarên dewleta here kevnar di cîhanê da, yên ku bi merdane destanînên xwe bi cînaran ra parvekirine, heya îro bê dewlet in!

Sedem çi bûye?

…Di vê cîhanê da ji ber dutîretî û bêtevgerîya xwe û ji ber lîstikên siyasî û êrîşên dijminên har û hov em destevala mane.

Her çi jî hebe, rastî dimîne rastî: peyhatîyên medên kevnar heya naha jî di tevahîya cîhanê da li serê rêyên penaberîyê ne û hê jî li cîyekî nehêvirîne.

Çima?

Çima mîna gelên dinê yên cîhanê û weke wana em jî xwedî heman mafan nînin? Çima ew tişt ji bo me qedexe ne, yên ku ji bo nûnerên gelên dinê xwezayî tên dîtin? Çi ye ev? Bilindtirîn ruhek e ev, ê ku çarenûsa me, wek netew, bi rêva dibe, yan – bêdadîya dîrokî?

Gelê me rabûye serhildan û raperînan, hewl daye çarenûsa xwe ya dîrokî biguhêrîne, lê ji ber dutîretêya navxweyî, ne yekgirtîbûnê, bêtevgerîyê, xiyanetê, ji ber tunebûna rêberekî netewî–giştî, her weha, ji ber êrîşên ji derva û lîstikên siyasî, her carê em şkestine. Û bi demê ra em hînî çarenûsa xwe bûne (lehengê destaneya "Hebsîyê Şîlîonê" ya Bayron tê bîra we?!), me biryara çarenûsê ya vî rengî wek tiştekî divyayî pejirandye, û chanê jî ji hêla xwe va em hêjayî vê dîtine. Hemûyan mil dane mile hev û bi hev ra dijî her rêberekî me rabûne, yê ku xwestye guhartinekê bike nava çarenûsa gelê xwe. Xayîn û xwefiroşên di nav me da, yên ku wek kole xwe spartibûne dijmin, bi dagerkeran ra bûne yek û serhildanên me di nava xwînê da xeniqandine û rêbarên tevgera rizgarîya netewî dardakirine… Gelê kurd jî, her çiqas, qey bibêjî, di xewa hingorê da bûye, lê di qulçên cuda yên heşê wî yê şêlûkirî da time dengê pirsekê rûdaye: Çima? Çima? Çima?

Mirov bi sedsalan lê digeryan, lê bersêvek nedidîtin. Ew wisa bû, heya ku… dest bi tevgera netewî ya kurd a hemdemî nebû.

**"Lêgerînên pirsgirêka kurdî divê tenê li ser bingeha zanistî pêk bên, di nav çarçoveya dîroka herêmê û cîhanê da û bersîva hemû pirsên heyî bên dîtin!"** – Di dîroka gelê kurd da cara yekem rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan, dema hê xwendkar bû, wisa, bi giştî, li ser bingeha zanistî rêyên lêgerînên pirsgirêka kurdî destnîşan kir…

Lêgerîn û berhemên zanistî yên vî mirovê mezin rastîyên dîrokî yên nedîtî û nebînayî, sedemên têkçûna tevgerên kurdî yên rizgarîxwaz derxistine hole û ew rê, yên ku dikarin gelê kurd bigihînin azadîyê, destnîşan kirin; **"Ya sereke, gelê kurd di têkoşîna ji**

**bo mafên xwe yên netewî da divê hêvîya xwe nede ser hêzên derva. Tenê bi saya yekîtîya xwe, bi zanistî tevgerkirina têkoşîna xwe, li ser bingeha beşdarbûna girseyên gel di tevgerê da, kurdê bikaribin bigihîjin wan armancên xwe yên xewnî".**

Û evê rewşê tavetî nedida dagerker û mêtîngeran, ên ku xwe wek xudanên vê cîhanê yên berz didîtin: gelo di vê cîhanê da tevgereke netewî dikaribû bêyî kontrola wan hebûya? Û li dijî tevgera azadîxwaz a gelê kurd û rêberê wê dest bi şerekî veşartî kirin..., ê ku gihande wan bûyeran, ên ku di paytexta Kênîyayê – Nayrobîyê da pêk hatin – di vî qolçê ji hêla Xwedê va jibîrkirî yê "cîhana reş" da.

Tê bîra min, çawa ez cara yekem çûme Kurdistanê, welatê pêşîyên xwe. Pêşîyên min zêdetirî 200 salî berê ji ber siyaseta barbar a Tirkîya Osmanî (her çiqas dibêjin, ku ya barbaran siyaseta wan nîne, ya wan dozîn e – *instinct*!) neçar bûne welatê xwe biterikînin. Armanca çûyîna Welêt yek bû: ezê herim û li wir jî rastî rêberê nebînayî yê têkoşîna rizgarîya netewî Abdullah Ocalan bêm, pêra sowbet bikim...

Piştî vegera xwe min notên xwe yên rêwîtîyê nivîsîn, û ewê di bin sernivîsa "Rêber jî nebînayî ye û – gelê wî jî" li Moskovayê di kovara «Курдистан рапорт» ("Kûrdîstan raport") da bi zimanê rûsî ronahî dît (№ 7, mijdar,1994).

Wê demê cîhaneke nedîyar li ber min vebû, û min di derbarê wê cîhanê da mitale dikir: **"Kurdistan... Wê hela hê rojnameger û nivîskarê bêne wir, ewê hê hewl bidin, ji bo xwe surên vî welatê dercîhanî (êkzotîk) vekin, ewê hê di derbarê bilindbûna ruhê netewî yê gelê wêyî nebînayî da binivîsin, û, helbet, di derbarê rêberê wî yê hêja da..."**

Dem pêra gihîşt û ez rastî vî mirovê nebînayî hatim. Hevnaskirina me ya yekem, a ku li ser kaxezê sipî hatibû nivîsîn, di cîhana îroyîn da wek nivîsên mixî yên cîhanpenahên cîhana kevnar, wek kêrtik û xêzikên li ser dêmikên (maske) zêrîn ên faraonên Êgîpta kevnar li ber mirov vedibin: **"Ew vîn û bibiryarbûna wî – ku cîhanê biguhêre, her tiştê xwe yê kesî bihêle û xwe bide karê serkevtina dadwerîyê û mirovbûnê, derbazî mirov jî dibe, û tu dixwazî li** r'ex **wî bî, beşdarî destpêkirina karên wî bî, alîkarê wî bî, hevkar, rêheval û leşkerê wî bî…"**

Ez careke dinê notên bîranînên xwe yên rêwîtîya wê demê per dikim, ez dixwazim tê bigihîjim: gelo reha vê bêdadîyê, ya ku li hemberî gelê min û rêberê netewî pêk hatye, li ku ye?

Dema xatirxwastinê, li ser bingeha **"vîn û bibiryarbûna xwe – ku cîhanê biguhêre"**, ewî weha gote me: **"Ev, çi ku we îro dît, ji bo kurdistanîyan û kurdên tevahîya cîhanê tê kirin".**

Û çawa çêbûye, ku heman dagerker û hevkar û hevpeymanîyên wan kurdên ji hev parçekirî û di tevahîya cîhanê da belavkirî hema di Kurdistanê da ji bo berjewendîyên xwe bikar tînin? Hem di Waşîngtonê da, hem di Londonê da, hem jî di Ankarayê da ev hemû jimêjva dihate zanîn, ji ber wê jî komploya navnetewî ya vê pîvanê pêk hat. Ev komplo ne ewqas li dijî kesê rêberê gelê kurd bûye, çiqas di kesê wî da li dijî gelê kurd, li dijî her kurdekî, li dijî wî kurdî bi xwe, yê ku xwedî nirx û rûmeta mirovî ye. Ji ber ku ew îro sembola hemtomerî ya gelê kurd û azadîya wî ye.

Ji bo ku mirov van hemûyan têbigihîje, divê paşva vegere û bibîne, ka wî gelî çawa bi rayê rêberê netewî û bi saya îdêayên wî rabûye ser pêyan û ji bo mafên xwe têkoşînek meşandye. Ew gel, ê ku hêvîyên wê bi per û bask bûne, îro diqîre: "Kudistan – Ocalan!", "Bi can, bi xwîn em bi te ra ne, ey Serok!", "Bê Serok jîyan nabe!", "Emê nehêlin, ku Roja me tarî bikin!"

Evê nota bilind gelê Kurdistanê pêşva dibir, ji bo parastina rêberê wî. Û xwînê çemkî biherikya, eger her tenê gotineke rêberê netewî ew herikîna bi mêllîonan mirovên xwepêşandêr ranewestanda. Hema bi pêngava wî dest bi pêvajoyeke nû – pêvajoya aştîyê bû, lê...

Û dîsa jî – çima?

## II. Komplo!

Îro gelê kurd û dostên wî, her weha tevahîya cîhanê dixwazin têbigihîjin, ka ew komplo çawa pêk hat. Ka kê û li kîderê şaşî tê berda, an bi xiyaneta xwe bû hevkarê wê kombloya kirêt û bû sedemê wê bêdadî û nemirovahîyê, ya ku li dijî gelê kurd û rêberê netewê pêk hat.



**Ezîz ê Cewo bi Abdullah Ocalan ra – Moskova, 20. 01. 1999.**

*Naha* di Dadgeha Mafên Mirov a Ewropayê da amedekarîyên lêpirsîna doza Abdullah Ocalan a li dijî rêvebirîya Tirkîyayê û beşdarên dinê yên vê kompoyê (yên rastedêr an ne yekser) tê kirin. Di piranîya welatên cîhanê da bi sedan gotar hatine weşandin, gelek weşan û bernameyên cuda yên radîo û têlêvîzîonan hatine belavkirin, bi dehan pirtûkan ronahî dîtine û di van hemûyan da bi hûrbînî dem û bûyerên cuda yên vê kompoyê hatine nirxandin...

Lê wê demê, heya tora kompoyê dihate hûnandin, rêya rêberê netewî Abdullah Ocalan du caran li Rûsîyayê ra derbaz bû. Û herdu caran jî ew bû “mêvanê” Moskovayê. Her çiqas, mirov her heya radeyekê dikare seredana wî bi mercî “mêvantî” nav bike.

Hatina yekem a rêberê netewî a Moskovayê ji bo me bû wek birq û birûskeke di asîmanê sayî da! Çawa? Çima? Sedem...? Bêhêvîtî,...yan? Ev pirsana rê nedidan hev, dema ez ji Saratovê vegeryame Moskovayê, û pê hesyam ku Serok li vir e. Ya ku netavetî dida min, ew bû, ku dema pêşbazîkirina wî bi kesên fermî ra li balefirgehê wisa jî mirovne wisaye ne dîyar amade bûn, ên ku tu kesî di derbarê wan da tiştek jî nizanibû. Ew jî wê demê, dema gelek hevalên me haya wan jî pê nînbûn, ka çi dibe!

Paşê dîyar dibe, ku du mehan berî hatina Abdulah Ocalan a Moskovayê planeke weha hatibûye amadekirin: wê mirovekê ji Moskovayê di bin navê bazirganekî da biçûya Şamê û ji wir ew û Ocalan va (ew jî di bin navê bazirganekî da) wê bihatana Moskovayê. Paşê...kesek wisa jî tê negihîşt, çima ew varînata pêk neanîn. Kesekî ji hevalên me di derbarê wê da tiştek jî nizanibû.

Gelek tiştên ji vê zêdetir jî hebûn. Hema di wê serdemê da di bin navê lêgerîna rewşa karên çandî-perwerdeyî di herêma Saratovê da hema berî hatina birêz Ocalan min verêyî wir dikin. Û hema di navbera wê dema kurt da ew jinişkêva tê Moskovayê.

Çima “veşartîbûneke” weha? Û ji kê? Ew jî, dema di karên amadekirin hatin û pêşbazîkirina rêberê netewî da mirovne wisa beşdar bibûn, ên ku tu pêwendîya wan ne bi derdorên fermî ra, ne jî bi komeleya me ra nînbûn. Kî bûn ew?

Piştî vegera Moskovayê, ya yekem, a ku netavetî dida min, ew xwestina min bû, ku di zûtirîn demê da hevdîtina bi rêberê netewî ra pêk bê. Min dixwest zû têbigihîjim, ka ev hemû tê çi wateyê, hatineke wehaye jinişkêva û bi lez ji bo çi bûye, çi hatye guhartin, çima, ji bo çi?

Pirs bûn, pirs bûn, pirs...

Hê dereng, dengekî hindurîn dirmilî dida min: eger rêberê netewî li vira ye, ew tê wateya ku ew dizane, çima. Û hew!

Û, weha, dem pêra gihîşt. Serok di havîngeha Jîrînovskî da bû...û amadekarîyên xwe dikir, ku ji wir cîguhastî bibe.

Em di salona qatê yekê yê avahî da rûniştibûn û hîvya Serok bûn. Mahîr hilkişya jorê, bal wî. Piştî demeke kurt ew vegerya jêr û ragîhand, ku Serokê zûtirekê bê. Piştî çend deqeyan bi nerdîwanan ra Abdullah Ocalan hate jêrê –li ser dêmê wî ew beşera xweş bû, ya ku me hemûyan ra wisa nas bû. Em silavkirin, di palkursîyê da rûnişt û pêşnîyar kir, ku em jî rûnîn. Hevalên me çay anîn. Demekê hemû bêdeng bûn. Serok berbi min zivirî, bi pirs li çavên min nihêrî:

– Dibînî, jiyan çawan e? Û tu çawa li van hemûyan dinihêrî?

Min dizanibû, ku ev pirsa bersîveke konkrêt dixwaze, lê ez ji bo wê ne amade bûm. Min hê pêra negîhandibû hemû giranîya bûyerê têbigihîjim û watedar bikim. Çavkêlkekê min bêhna xwe girt. Çi bibêjim? Piştî demeke kurt, ez bi xwe jî têñegihîştim, çawa ji zarê min pekya:

– Tu li vir î, û ev ya here sereke ye ji bo me, – Ez destxweda jî têgihîştim, ku ew ne bersîv e û, piştî ku ramanên xwe berevî ser hev kirin, min domand. – Bi rastî, pêşkevtina bûyeran a weha ji bo min syûrprîzek bû... Û min hê pêra negîhandye her tişrî watedar bikim...

– Baş e, ez têgihîştim, – Serok hate alîkarîya min, – ango, tu hê haş ji hemû bûyeran nînî. Her tişt wisa zû pêk hat, ku... Naha divê mirov bendê be, ka li hember van hemûyan li vira wê helwestê çawa hebe. Belgeyek amade dibe – nameya min, hûn hewl bidin, ku ew di demê da bigihîje cîhê pêwîst. Em binihêrin, ka bûyerê çawa pêşbikevin. Hêvî heye?! – Ewî nîvpirs, nîverênî got, berbi Mahîr va zivirî û bi pirs li wî nihêrî. Lê ew wek şagirtekî li ber mamostayê xwe, bêdeng sekinîbû, paşê serê xwe bi erênê hejand: “Belê, Serokê min!”

– Lê paşê... – Serok careke dinê berbirî min bû, – tu jî bi baldarî bûyeran bişopîne, paşê em binihêr’in...

Peyra ewî pirsa amadekarîyên cîguhastina xwe ya cîhê nû kir.

Bûyer wisa bi zû li hev hatin guhartin, ku heya me hîs jî nekir, çawa dema cîguhastina Serok a havîngeha Alêksêy Mîtrofanov pêra gihîşt. Di dema wan bûyeran da ez 2-3 caran li bal Serok bûm.

Carekê, em li havîngeha Mîtrofanov bûn, Mahîr di cîyan da çûbû. Bi serok ra komên parastinê û destekê û ez mabûm. Hevalên me amadekarîyên xwe dikirin, ku herin xweşokê (di hewşê da saûna li cîhekî cuda bû). Ez jî bi wan ra çûm. Bi serok ra tenê hevalên keç û Sînan man.

...Di saûnayê da pir germ û xefikî bû... Ez berî hemûyan derketim. Derdorê katê 22 bû. Min hê nû pêra gîhandibû kincên xwe wergirim, dema Sînan hate hindur.

– Serok derketye hewakê bînvede, – ewî lezobezo got, – ez tenê mame. Ezê herim wî alîyê vekirî, bi wî ra kesek namîne!

Ez bi lez derketin derva.

– Çima tu heya dawîyê nemayî? – Serok ji min pirsî.

– Pir germ û hewayeke xefikî bû!– Min bersivand.

– Baş e, ka, em bigerin, – Serok got û meşya. – Çi hewayeke sar, lê paqij e. Di Rûsîyayê da li hemû herêman da hewa ne yek e, ne wisa, dibe ku li hemû deverên wê ne weha sar e?!

– Belê, herêm hene, li ku $30^0$ serma ye, lê herêm jî hene, li ku naha heya dilopek baran jî naê.

– Welatekî wisayî gewre û dewlemend, û gelê wî wisa di xizanîyê da dijî. Mirov zendegirtî dimîne!

– Belê, ji talebext ra, wisan e! – Min di bîra xwe da erê kir.

– Ê, we ji bo xwe encamek jê derxist: evî gelî bi fedekarî serkevtinên nebînayî bi

destxistin, bi lehengî li dijî faşîzmê berxwedaye û serketye, welatê wêrankirî ji kilafeyan rakirye ser pêyan, û dawîyê!?...

– Sîstêm wisa bûye... – Min got.

– Erê, sîstêm ne rast bûye. Ango, ne ku sîstêma sotsîalîzmê, lê ew, a ku di bin navê sotsîalîzmê da hatibûye avakirin. Mirov dikare bibêje, "sotsîalîzma rêal" – ev ew e, ya ku hatye avakirin. An jî, mirov dikare bibêje – "sotsîalîzma sovêtî".

– Ji talebext ra, hema wisa bûye!

– Ne bes e, ku mirov bizanibe, ka ew rast e, an – na... – Ewî berê xwe guhast û li kûrahîya esîmanê tarî nihêrî, wek ku bixwaze tiştekî li wir bibîne, paşê domand. – Divê mirov hemû sedeman binirxîne û dersên kêrhatî jê derîne. Dilê mirov, wek mirov, ji bo we û vî welatî dêşe. Eger rêvebirîyeke rastîn hebûya, wê wisa nehata serê vî welatî. – Serok meşa xwe bêdeng di tarîyê da domand, dem bi dem li der dorên xwe dinihêrî, serê xwe berbi esmîn bilind dikir û bala xwe dida kûraya wî – asîmanê çîkî-sayî û tuje stêrk, paşê berbi min vegerya û jinişkêva got: – Tu bê kum î, tu serma nakî?

– Na, spas, ne sar e! – Min bersîv da û ji bîra jî kir, ka şevên paîza derengî dikarin çiqasî sar bin. Wê demê ez destxweda tênegihîştim, tiştê ku nahêle ez sermayê hîs bikim, ew coşa ji ber amadebûna rêberê netewî ye!...

– Ev welata têra hemûyan dike, têra cîhanekê dike, lê gelê wê di rewşeke giran da ye. Ya ku divê mirov serê xwe li ser wê bêşîne jî, hema ev e. Em jî wisan in: Kurdistan welatekî pir dewlemend e, gelê wê kedkar û fedekar e, lê ew çarparçe kirine, û ew ji hêla koledarên bîyanî va hatye dabeşkirin! Sedem çi ye?! Çi têra wan nake? – Erd, daristan, nevt, zêr, komir, av – ev têra tevahîya cîhanê dikin! Têgihîştina netewî nîne! Lê mirov çawa dikare wê sererast bike? Dijwar e, lê mirov dikare! Tenê divê mirov têkoşîneke rast û durust û bi biryar bimeşîne, têkoşîna ji bo jîyanê û sazûmankarîyê!.. Xwendina te çi ye?– Ewî bi carekê va mijara axavtinê guhart.

– Rojhilatzanî, – min bersîv da.

– Helbet te naha berhemên helbestvanên Rojhilatê xwendine!

– Belê, – min bi erênî bersîv da,– Xeyam, Rûdakî, Baba Tahêr, Nîzamî, Fîrdûsî, Rûstavêlî... Wisa jî yên kurd...

– Îjar?

– Bi çi wateyê?! – Min bi pirs bersîv da.

– Ji hêla jîyanê va, felsefaya jîyanê va, bi wê wateyê, ka mirov çi ji xwezayê dixwaze, ka ewê kengê bibe mirov? Carna ez bi xwe li ser wê nêrînê r'adiwestim, ku mirov ji bo xezayê bûye xeterekê...

– ...

– Helbet, wisa jî kurd di nav wan da! Lê kurd êdî tên guhartin. Kurd êdî ne yên berê ne, ew ne yên salên 70-î ne, cudahîke mezin heye! Dîsa karekî mezin me divêt, lê evî gelî êdî heq kirye û êdî amade ye bibe xwedîyê çarenûsa xwe. Û evê dive ne em tenê tê bigihîjin, lê divê wisa bikin, ku hem jî cîhan evê bizanibe. Pêwîst e, ku kurd jî di vê cîhanê da, di bin vî asîmanî da cîhê xwe yê hêja bigirin! – Ocalan destên xwe kûr-heya dawîyê kirin berîyên kurtikê xwe, bi nigê rastê hejek tûj a sportîv kir, wek ku, tuyê bibêjî, li pêgokê dixe, û domand: – Ka, em bi zû gerekê jî bidinê, hewayeke paqij jî bikişînin, û tu dikarî herî. Lê eger karên te yên lez nînin, tu dikarî îşev li vir bimînî.

Ya me sê, heya çar ger jî derketin. Wê demê, dibe ku, di cîhanê da kesek ji min bextewartir nînbû, ji ber ku rêberê netewî li rex min bû – têorêtîkê mezin û rêberê têkoşîna ji bo mafên mirov. Lê wisa jî di cîhanê da mirovek nînbû, yê ku weke min ewqas hêwarze di ruhê wî da hebû, ji ber ku ji bo pirsên min bersîv nînbûn: Lê paşê?... Çima wisa?... Çima ez di wê rewşê da ewqas bêhêz derketim?... Lê eger ez bi ramanên xwe her tiştî xerab bikim?... Lê eger hema wisa jî pêwîst e?... Lê eger?... Li ser wan ramanên min da Serok pirsên xwe jî zêdekirin:

– Te ji van hemûyan çi derxist, çi têgihîştî? – Tuyê bibêjî, qey ewî mitalên min xwendine, an jî ew rasterê dikirin.

– Her tişt bêhtir giran e, ne ku em hizir dikin. Dibe ku, sozek dabin?!

– Çi soz?! – Ewî kurt birî. – Rewş ji bin kontrolê derketye... Lê, eger li ser me bazarîyê dikin?! Lê eger ez, – Serok mitalên xwe bideng domandin, – rojekê rabim û herim Ankarayê û bibêjim: “Va, ez li vir im!” – Ewî got û li min nihêrî. Cara yekem di bin ronahîya sipîçirkî ya lempên şevê da min dêmê wî mirovê mezin wisa diyar û ronî dît – bi biryar û vîn.  – Carna dibêjim... – Û derbazî axavtina bi dengê hindurîn bû, bi xwe ji bo xwe.

– Çawa dibe, lê dewleta tirk?... – Min ber xwe neda.

– Çawa dibe? Dibe! Dibe, ku wisa jî bibe. Bi psîkolojî ez ji bo wê amade me!

Min nikaribû dijî vê tiştekî bibêjim. Min di derbarê bûyerên berî hatina wî da pir hindik dizanibû. Ez mîna wî mirovî bûm, ê ku ketibe cîhaneke bîyanî ya nenas. Serok di debarê vê rewşa min da tiştek nizanibû. Bi dîtina wî haya min ji hemû bûyeran heye, an jî, hîç nebe, ez hinek tişt dizanim.

– Dibêjin, ku di vê navberê da Jîrînovskî çûye Tirkîyayê?.. – Serok ji nişkêva pirsî: – Ewana dikarin li ser pirsa me hev rûnîn?

– Naha her tişt dikare bibe! Eger ew bi rastî wisa be, wê demê?... – Vê carê min pirsî.

Ocalan careke dinê herdu destê xwe heya dawîyê kirin berîyên kurtikê xwe, di nav stêrkan ra li asîmanê tarî nihêrî – wek miovekî, yê ku ji bo pirsên berevbûyî bersîvên pêwîst digere, serê xwe hejand û berbi min vegerya:

– Di cîhanê da hîç pirsek jî bê bersîv nemaye! ... Ka, em zû bilivin!

Em bêdeng nêzîkî malê bûn. Hemû hevalên me êdî li derva bûn, û her yek di cîhê xwe da sekinîbû. Yekî derî li ber Serok vekir, xwe da alîyekî... Hewayek a  germ avîte rûyê me...

– Dibe ku emê tenê li welêt bi hewa paqij bînvedin. Ew çawa tê gotin: Sibe tê – xêr jî pêr’a? Hem qencî, hem jî xirabî bi vîna me va girêdayî ne!... – Serok got û çû hindur...

Sibe hat. Xêr derengî ma, lê… Lê her tenê di r’ojên teng da ez hemû wateya gotinên wî mirovê mezin têgihîştim: bi rastî jî di rojên here giran da gelê me li dora rêberê xwe civya û bû kom…

Çend roj jî bihurîn, û em careke dinê li bal Serok berev bibûn. Dema derbazî sivderê dibûn, em rastî mirovne nenas hatin, ên ku amedekarîya çûyînê dikirin … Ew nûnerên dewletê bûn. Rewş aloz bû. Nûnerên dewletê gotibûn, ku divê Serok ji Rûsîyayê derê. Li welêt û li dervayî welêt hevalên me rêyên çareserîya wê pirsgirêkê digeryan. Rewşeke ne sade li hole bû. Pêwendîyên têlêfonî yên bi nûnerên me yên welatên cîhanêye cuda ra encamek nedan. Hemû bendê bûn. Piştî demekê ji Ewropayê agahî dan, ku Îtalîya amade ye Serok qebûl bike…

Dema xatirxwastinê pêra gihîşt. Sibetirê divê Serok verêkirana. Wê şevê hemû li bal wî man. Heya dereng hemû hişyar bûn, bi wê hêvîyê, ku, hîç nebe, carekê jî Serok bibînin. Êdî derengê şevê bû, û her çiqas ji hemûyan ra hatibû gotin, ku herin-razên, ji ber ku divê berbangê zû rabûna, lê dîsa jî xew nediket çavên kesekî…Her destberbangê her tişt steqirî. Li her cîhan lemp dişixulîn, û berbangê dîsa hemû li ser pêyan bûn…

Dem pêra gihîşt, divê biçûna. Berpirsyarê parastinê û koma destekê û hevalê Teyhan ma. Piştî ku aghî bihata, ku Serok ji Rûsîyayê derketye, ewana divê hemû alavên radio û têlêvîzîonî, pirtûk û tiştên navmalê berevkirana û ew mal biterikandana.

Li balefirgehê hemû çûn, ez û Rostem Biroyêv di makîneyê da man. Ocalan xatirê xwe ji me xwast:

– Giranîya xwe bidin ser karê xwe, – ewî got, – Hewl bidin, bûyeran baş bişopînin, binirxînin û wan rast têbigihîjin. Neyên lîstikên hinekan. Haş ji xwe hebin. Heya hevdîtina li ser xaka Welêt!...

Piştî ku Serok verêkirin, Mahîr û Mecît Mamoyan vegeryan. Ewana gotin, ku ji Îtalîyayê yek ji wezîrên hikumeta Masîmo D'Alêma hatibûye, ku Serekwezîrê Îtalîyayê bi xwe bi têlêfonê bi Serok ra axivye û jê pirsye, gelo ew çawa dixwaze: ku mafê penaha

sîyasî bidin wî, an mafê penaberîyê? Serok bersîva wê pirsê weha dabûye: “...Ya ku wê ne li dijî berjewendîyên Îtalîyayê be!”

Comerdîyeke çawa!

Bi hêvîya ku em li ser xaka welatê xwe rêberê netewî bibînin, em ketin nav karê xwe…

Peyra ez dîsa vegeryame Saratovê.

Dest bi serdema bûyerên Romayê bû. Rojeke wisa nînbû, ku çapemanîya cîhanê di derbarê çalakîyên kurdan ên di wlatên cuda yên cîhanê da ranegîhanda: “zevtkirina” aştyane ya baylozxaneyên Yewnanistanê di payt’extên welatên cuda da, guhartina navê “Meydana Çêloyê” bi “Meydana Kurdisatanê” di Romayê da, çalakîyên xweşewitandinê yên kurdan wek nîşana şermezarkirina siyaseta Tirkîyayê û hevpeymanîyên wê ya li hember gelê kurd û rêberê netewî...

Bi tevahîya gelê kurd ra, bi hemû rêxistinên me ra tevayî me ew rojên giran derbazkirin. Çalakîyên cihêreng li komarên Yekîtîya Sovêta berê jî pêk hatin, heya gihîşt tiştê nebînayî yê tundûraw – xweşewitandina hevalên me Teyhan û Jêjat.

Di nîveka yekem a rêbendana 1999-an da ez ji Saratovê vegeryame Moskovayê. Li vir ji min ra hat gotin, ku Mahîr çûye. Ji bilî vê – hîç tiştek! Min nepirsî – kuda? Ez bi bawer bûm, ku ew çûye welêt, bal hevalan, ji bo ku her tiştî binirxînin û binihêrin, ka di vê rewşê da divê çi bê kirin... Sibetirê min amedekarîyên xwe dikir, ku dîsa vegerim Saratovê, çûm, ku xatirê xwe ji hevalan bixwazim û pê hesyam, ku ew çûne balafirgehê, pêşbazîya mêvanekî bikin. Min xwast bi têlêfonê xatirê xwe bixwazim. Min zengil berda, ji min ra gotin , ku ew diçine malê, û wê baş bibûya eger ez jî biçûma wir...

Li malê min Mahîr dît. Derket, ku ew “mêvan”, ê ku hevalên me pêşbazîya wî kirine, ew bûye. Rastedêr ji Romayê hatbû! Ewî di derbarê rewşa Serok û ya li Romayê da vegot. Got, ku hevalên me li wir xirab kar dikin, û li wir rewşeke xeter gihîştye, ku ewî dîtinên xwe di derbarê wê da ji Serok ra gotye, hinek ji wan ji kar hatine dûrxistin, û, dikare bibe, demeke nêzîk da Serok dîsa bê Moskovayê... Li ser pirsên me: “Gelo li vira garantî hene, ma ne, cara yekem rêvebirîya Rûssîyayê Ocalan neçar kir, ku ew ji Rûsîyayê here?”; “Ma, gelo, rêvebirîya Rûsîyayê ji bo wê amade ye?” – Ewî got, ku vê demê li ser pirsa hatina rêberê me a Rûsîyayê di nava sazîyên ewlekarîyê, parastina welêt û sazîyên dewletê yên dinê da dubendîtî heye. Lê ew ewqasî jî ne girîng e, lewra ku ew, ên ku piştgirîya me dikin, ji bo serkevtinê şansên wan mezin in. Û paşê jî, pêwîst nake, ji bo wê zêde gengeşîyan bikin.

Bir’yar hate girtin, ku ez divê bi alîkarîya dostan di herêmeke Rûsîyayê da cîhekî xewle ji bo Serok amade bikim. Lê hê dereng biryar hat dayîn, ku cîh divê li derdorên Moskovayê bê dîtin.

Di navbera du rojan da me vîllayek dît.

15-ê rêbendanê ji min ra t’êlêfon kirin û gotin, ku em divê di cîyekî da herin, lê kuda, negotin. Di destpêkê da em du kes bûn – ez û Mahîr, paşê Rostem Biroyêv jî gihîşte me. Her di rê da em pê hesyan, ku diçin bajarê Nîjnî Nûvgorodê (Gorkîya demekê). Li wir Cemal Şamoyan jî ji Tambovê gihîşte me–Mahîr jêra têlêfon kiribû – di vê derbarê da û ji bo armanca hatina xwe em paşê hatin agahdarkirin…

16-ê rêbendanê Serok bi balafireke biçûk bi hevrêtîya karmendê ÎNTERPOL-ê Mecît Mamoyan (…her paşnavên me mîna hev in!) hat û li balefirgeha Nîjnî Novgorodê peya bû…

Ji Nîjnî Nivgorodê em hatin vîlla rex Moskovayê, ya ku me ji bo Serok amade kiribû.

Sibetirê Mahîr û Mecît çûn û êdî venegeryan. Bi Serok ra komek hevalên me man. Berî êvarê nûnerê ewlekarîyê hat û got, di rewşeke weha da mayîna li vira xeter e, lewra jî divê ew parastina Serok pêk bînin. Êdî sibetira dinê komeke ji pênc mirovan hat û ew villa ji hewşê û ji derva va, hildane bin çavdêrîyê. Xortên ji wê komê em hişyar kirin, ku, dikare, hêzên taybet ên Tirkîyayê li dû şopa Serk bin, û, çiqas derfet hebe, divê ew derneyê hewşê, lê eger ew bixwaze derê, divê em wan agahdar bike…

Li ber çavan bû, ku ev qeyde-qanûn, ên ku wan danîn, ne bi dilê Serok bûn…

– Îjar ev çi ye? – Ewî bi hêrs pirsî. – Eger wê wisa bibûya, çima ez anîm vira? Lê Mahîr li ku ye? Evî çi kir?

– Dibêjin, ku Mahîr nexweş e. – Min agahîya ku ji nûnerên ewlekarîyê wergirtibû, gote Serok.

– Nexweş e?! – Ewî bersîva pirsa rûdayî bi pirs da.

– …

Hewşa wê vîllayê ne mezin bû, li çardorê tuje berf bû. Serok kêm derdiket wir, bi bingehîn dixwast bi mitale û ramanên xwe ra bimîne.

Dema hate qatê jêrîn, ewî em di salonê da berev kirin û di derbarê girîngîya wê demê da axivî, di derbarê girîngîya serdemê ji me ra ravekir.

Ez têgihîştim, ku Serok dixwze dil bide me, ku vîna me bi hêz bibe. Lê ya sereke, ewî aramîya xwe û me diparast.

Piştî demekê em di xwaringehê da berev bibûn û me sowbet dikir. Serok di oda xwe ya li qatê duyem da bi karê xwe va mijûl bû, û carekê ra, me hew dît, hate xwaringehê. Heya me nedît jî, ka çawa hat. Hemû bi carekê ra rabûn, raçivyan û, wek ku bi fermana “Hişyar bin!”, sekinîn. Ew nêzîk hat, bi dest da zanîn, ku em rûnîn. Hemû rûniştin, lêbelê me palkursîyek vala hişt – ji bo wî. Serok hate ber palkursîyê, lê rûnenişt. Hemû bêyî rayê xwe careke dinê rabûn ser pêyan.

– Rûnîn, rûnîn, – ewî got, – Hûn rûnîn, lê ezê hinekî bisekinim. Van demên dawîyê ez westyame, ...hertim r’ûniştî me û hîç werzêş nakim!

Em careke dinê rûniştin.

– Belê-ê! Ê, hûn çi dibêjin? We heya naha negotye, eger li vir mercên pêwîst nînbûn, çima ez anîme vir?

– ...Her tenê pêşîya hatina te bang li me kirin! – hemûyan bi yekdengî gotin.

– Erê-ê... – Serok kete nava mitaleyan, navberek dayê û paşê pirsî: – Ê, paşê...?

– Em agahdar nekirine, ka amadekarîyên hatina te çiqasî pêk hatine. Her ji me ra hatye gotin, ku li ser wê bi te ra axivîne, – me bersîv da.

– Lê ne wisan e!... – Serok kurt birî.

Nûnerê ewlekarîîyê têlêfon kir. Ewî pirsî, eger Serok ne dij be, ewana dixwazin bên, bi wî ra biaxivin.

Serok qayîl bû.

Hatin. Piştî hevsilavkirineke kurt gotin, ku divê amadekarîyên derketina Ocalan a ji Rûsîyayê bibînin.

Serok pirsî:

– Lê Mahîr?

Gotin, ku ewê zûtirekê bê.

Piştî demekê hemû berev bibûn. Axavtinek pêk hat, a ku mîna daniştina pilankirinê bû. Axavtin kurt bû. Hate gotin, ku divê li ser çûyîna Serok rawestin, divê ewê bi hûrbînî binirxînin û amade bikin. Fermana hukumatê heye: divê Ocalan zûtirekê Rûsîyayê biterikîne, û divê her tiştî bikin, ku ew di navbera du rojan[9] da derê, û divê binihêrin, ka çi derfetên me hene, û Serok dikare kuda here. Piştî govtûgoyekê li ser dû rêyan rawestyan: yan ew dvê vegere welatekî Ewropayê, ya ku di demeke wisa kurt da mirov nikaribû pêk banya, û ya duyem – li ser Ermenîstanê ra here welêt. Nûnerên terefê Rûsîyayê soz dan, ku wê bi terefê Ermenîstanê ra biaxivin, ji bo ku ew alîkarîyê bidin, ku Serok li ser Qerebaxê

[9] *Çima “di navbera du rojan da”, ev tê çi waateyê? – Wê demê pirseke weha zêde ne girîng bû. Paşê, hê derng emê pê bihesyan, ku wan rojan divê seroka Dêpartamênta dewletê (Sazîya karên derva) ya DYA Madlên Olbrayt bihata Rûsîyayê… Û serekwezîrê Rûsîyayê yê wê demê Yêvgênî Prîmakov ji serekkomar Yêltsîn ra gotibû, ku dema danûstandinan Olbraytê ji wî bipirsr – Ocalan di Rûsyayê da ye? – Û, eger Ocalan li vir be, û ez bibêjim na jî, ewe pir qurnaz e, wê li cavê min binihêre û dê ji axavtina min tê bigihîje, ku ez rast nabêjim!… – Lewra jî, biryareke wisa ya bi lez hatibû girtin!*

ra derbazî welêt bibe…

## III. Firîna berbi ne tu cîyî va…

Piştî wê, dema bi daxweza Hukumeta Rûsîyaê ji bo çûyîna Serok hemû amadekarîyên formal bi dawî bibûn, biryara li ser Ermenîstanê ra çûyîna Kurdistanê hate girtin. Lê Serok ferz dikir, ku Mahîr jî bi wî ra here.

– Ew nabe! – Nûnerekî terefê Rûsîyayê got.

– Çima? – Serok pirsî.

– Lê kîyê li vir bimîne? – Bi devekî bi ken ewî pirsî.

20-ê rêbendana1999-an em çûne balafirgeha Şêrêmêtêvoyê (ya Moskovayê). Li vir çûyîna me ya Ermenîstanê betal kirin, em di balafirekê da dane rûniştandin, ya ku berbi cîhekî ji me ra ne diyar va difirî… Her tenê di hewê da ez jinişkêva pê hesyam, ku em difirine Dûşanbê (paytexta Tacîkistanê), lê êdî dereng bû.

Min ji nûnerê ewlekarîyê pirsî:

– Ma wisa dibe, çima di destpêkê da ji me ra nehate gotin, ma ne, di wê herêmê da şere?...

Di nav me da axavtineke ne xweş çê bû.

Dema Ocalan di derbarê axavtina me ya hişk da pirsî, min jêra got, ku firîna berbi wê herêmê va bi xeter e, ku li wir şer û pevçûn hene… Ew kete nava mitaleyan û piştî demekê pirsî:

– Ma tiştekî dinê heye, em çi dikarin bikin? – Ewî nêrîna xwe got û bi mitaleyên xwe ra ma.

Ez têgihîştim, ku vê demê ew naxwaze bi hîç kesî ra bikeve nava pêwendîyan. Di balafirê da hinekî sar bû. Serok potê xwe avîte namila xwe û di nava mitaleyan da di pencerê ra li derva dinihêrî… Piştî demekê ew rabû û berbi dawîya balafirê va çû – balafir a leşkerî-barbir bû. Ewe mezin bû, di navenda wê da teknîkeke giran hebû, ya ku bi çadireke leşkerî pêçayî bû. Li der-doran vekirî bû, li rexên wê kursîyên hişk (ên leşkerî) hebûn. Li dawîya balafirê em li ber pencereyê sekinîbûn. Serok bêdeng bû û di nava mitaleyan da li dûr dinihêrî... Paşê berbi min va vegerya:

– Ev çi lîstik e? Kî di nav da heye?

– Helbet, eger dawîya dawîyê tiştekî wisa divê bibûya, wê demê divê tu dawetî vir nekiriana, – min bi otomotîkî bersîv da û destxweda jî hîs kir, ku ev ne bersîv e, û ez ewê tenê ji bo wê dibêjim, ku rêyekê ji bo derketina ji vê rewşa bi derûnî ya aloz bibînim... Mirov ji vê rewşê bi derûnî tengav dibû...

– Te nedît nûnerê wan çi got? – Serok mitaleyên xwe domand.

– Dibe ku ew her tenê terefekî lîstikê ye? – Min, bi carekê va bersîv da.

– Lê Mahîr? Ewî zanibû û deng nedikir?

Min nizanibû çi bibêjim.

Û Serok, mîna mirovekî, yê ku an ne hîvîya bersîvekê ye, an jî dizane, ewê çawa be, vegerya û berbi cîhê xwe va çû. Dema gihîşte cîh, got:

– Gelo mirov nikaribû hinekî palda? Ez hinekî westyame. Û ji bilî wê, ev balafira, fesala wê!... – Li ser dêmê wî nîşanên bîntengîyê dîyar bûn.

Min ji xortên koma parastinê hîvî kir, ku betaneîyekê yan tiştekî mîna wê peyda bikin... Min ji Serok ra cîyek amade kir. Ewî pal da, şarfa xwe avîte ser çavên xwe – ji bo ku li xwe bike tarî. Piştî demekê min dît, ku Serok xew nekirye: dem bi dem ewî şarfa ser çavên xwe rast dikir – nedixwast wî şêwazê balafirê bibîne, di nava mitaleyên xwe da bû û, dibe ku, bûyerên vê dawîyê dinirxandin – di nav çarçoveya dema naha û ya bihurî da... Dîsa demek derbaz bû...Serok şarf li ser çavên xwe da alîyekî, rabû, di cîh da rûnişt û pirsî:

– Hê gelek maye?

– Na, hinek maye! – Min bersîva wî da û xwest bipirsim, gelo ew qet-na hinekî hêsa bû, lê destxweda jî hîs kir, ku ew pirseke ne di cî da ye.

...Di balafirgeha Dûşanbê da tu astengî nînbûn, li derdoran hemû azad kiribûn, tenê yên “xwe” mabûn... Em bi nerdewanê ra peya bûn, li makînaeyan siyarbûn û ... ketin rê...

Di Dûşanbê da em heya dawîya meha rêbendanê (1999) man. Dema em li wir bûn, qedexe bû, ku em bi têlêfonan biaxivin, ji bo ku tu kes nikaribe cîyê me pê bihese. Her piştî rojekê derfet dan, ku em bi têlêfonê bi kurtî hevalên me agahdar bikin: “Em gihîştine cî!” Ji bo ku ew dengê min bibihên û bi bawer bin, ku em gihîştine cî. Lê piştî du rojan Serok peyameke sergirtî (bi şîfre) stand û anegorî wê spartin dan. Hema roja yekem Serok bang kir, û me şêwrek danî. Bi şêwazî ew mîna daniştina civînekê bû - “civîna du kesan” a di “ne tu cîhî da”. Serok li ser karên me yên di Dûşanbê da rawestya, ewî dixwast bizanibûya, ka em di wê rewşê da dikarin çi bikin. Rewş awarte bû. Ewî got, ku di hinek çarçoveyan da ez xwedî înîtsîtîv im û lê zêde kir: “Bi serê xwe tu tiştî nekî, em şêwra xwe li hev bixin... paşê!”

Di wî avayî da du ode û sivderek, a ku di heman demê da xwaringeh bû, ji bo me veqetandibûn. Di hewşê da xanîyekî cuda yê bi berban jî hebû – ew “biryargeh” bû. Ji bo hemûyan xwarin ûzbêkekî binecîh li ser kuçik amade dikir. Dema ew li wan deran bû, Serok dernediket û ji ber wê jî ew bi derûnî bînteng dibû. Ewî dixwast gelek caran derê derva, bi hewa paqij bînvede. Dîyar bû, rojê du caran têra wî nedikir. Dema Serok derdiket derva, ku bîna xwe bikişîne, ji bo yê xwarinpêj time mijûlîyek didîtin: an di serşoyê da, an di ardûxaneyê da, an jî di bajêr da…

Dema Serok di nava mitaleyan da di hewşê da digerya, mirov nikaribû ew ji ramanên wî biqetanda, tenê, eger ewî bi xwe bixwasta li ser pirsekê guftûgo bikira, an jî tiştek bipirsya.

Di rewşeke weha da, dema em ji hemû cîhana mayîn qutbûyî bûn, dema tu agahêyek nênbû, rewş aloz dibû. Em bi ramanî rêyên derketina ji wê reşê digeryan.

Carekê min ji Serok pirsî:

– Lê eger ez ji bo kirîna hinek pêdivîyan derêm?

– Ewê nehêlin, ku tu tenê herî, – ewî got.

– Ezê bi wan ra derêm, lê paşê ji wan qut bibim û ji cîhekî têlêfonkim.

Serok kete nava mitaleyan, paşê pirsî:

– Lê tuyê paşê çawa bêyî?

– Ew ewqasî jî ne dijwar e, mirov dikare wê jî hel bike... – min got.

Ewî nepirsî – Çawa? – Her lê zêdekir: – Binihêre, tenê tiştekî xerab nekî!

Ez çûme bal serokê koma parastinê û di derbarê xwesteka xwe a çûyîna ji bo kirîna pêdivîyan gotê. Ewî ji hêla xwe va ji serokê koma pêwendîyan ra got, ku ew bi min ra derê nav bajêr. Lê serokê komê bi nîvdengî got:

– Binihêrin, ew dikare ji me ra pirsgirêkên zêde derxe. – Û piştî navbereke kurt, berbirî min bû: – Ka, em leznekevin. Paşê!

Ez têgihîştim, ku bersîv neyînî ye.

Her çiqas destûra min hatibû dyîn, ku ji bo Serok xwarinê cuda çê bikim, em bi hev ra qayîl bûn, kû xwarin ji bo hemûyan bi hevra bê çêkirin. Xwarina ji bo Serok an di navberê da, an di dawîyê da dihat hildan.

... Her çiqas bi şev û roj xortên hêzên taybet Serok diparastin, dîsa min cîhê xwe nêzîkî derê oda wî hilbijart, qey bibêjî, ger tiştek biqewimya, minê bikaribûya tiştekî bikim... Carekê derengê şevê derdorê katê 4-an, ez ji dengê derîyê odeya Serok hişyar bûm... Min destxweda banzda ser pêyan. Di nav dêrî da Serok xuya bû. Ewî li min nihêrî û pirsî:

– Çi ye, çima ranazêyî? Sibê gelek kar li pêşîya te hene.

– Ez razabûm! – Min bersîv da.

– Metirse, – ewî got û perdeya pencereyê da alîyekî. – Binihêre, ew li ser nobetê ne.

– Dîsa jî!...

– Çi dîsa jî, – ewî got, – heya, eger tiştek bibe jî, ez û tu va çi dikarin bikin? Razê, karê min heye, eger pêwîstî çê bibe, ez te hişyar bikim!...

Herşev ewî heya dereng kar dikir: dixwand, dinivîsî, peyam li ser bantan ji bo hevalan, gel û têkoşerên pêşenîyê dinivîsî. Tiştê ku bala mirov dikişand, pirtûkên bi bingehîn felsefî bûn.

Ji ber ku ewî pirê caran hema-hema heya berbangê kar dikir, ji ber wê jî taştê û firavîna wî dibûn yek.

Dema ew di hewşê da digerya, mirov hîs dikir, ku hewa têra wî nake (wek masîyîyê ji avê derxistibin), cîhan ji bo wî teng e, dem têra wî nake: ew diket nava ramanan, mitale dikir, mitale dikir... carana pirsên qut-qutî dida, û tenê bi wan pirsan mirov dikaribû tê derxista, ka ew di derbarê çi da mitale dike, çi raman di serê wî mirovê mezin da digerin.

Dema gerekê ewî pirsî:

– Dibe ku gelê me di nav bêtavetîyeke bêsînor da ye. Êdî demeke dirêj e, ji me tu agahîyek nîne! – Û piştî navbereke kurt lê zêde kir: – Balkêş e, gelo hevalên me di vê rewşê da çawa tevdigerin? Naha dibe ew di nav gel da û bi gel ra ne!

Carekê jî got:

– Te perwerdeya sovêtî dîtye, dîroka wî welatî, çanda wî xwendye, te qanûnên wî zanibûn, bibêje, dema êrîşên faşîstan rêvebirîya welêt di rewşên nestandart da çareserî çawa didît? – Qey bibêjî ewî bideng şêwaz dida ramanên xwe û bi xwe jî bersîva wê da. – Helbet, ez bi giştî dizanim...Wê demê rewş bi bingehîn cuda bû – hêza desthilatdarîyê ya mêrane hebû, gel bi tevger bû, Artêşa sor hebû, dawîya dawîyê, civaka cîhanê hebû, ya ku li ber çavên xwe tevahîya nemirovahîya faşîzmê dîtibû û hîs kiribû. Ya me lapter cuda ye!

... Şev bû. Di asîman da di nav ewrên betreng ra, ji dûr va stêrk diçirûsîn. Gera me hema-hema bê axavtin derbaz bû. Her di dawîyê da ew kêlîyekê rawestya, bînveda, paşê bîneke kûr rahişt û berbirî min bû:

– Tu dizanî, Tirkîya naha demên xwe yên here giran dijî, lê ew kêmheşana vê yekê tênagihîjin û dikarin tevahîya welêt têkbibin...

Li vir ez ketim nava axavtinê:

– Tu dizanî, di nav gel da gelek çalakîyên me tên rexnekirin, dibêjin, ku em siyaseteke pir nerm dimeşînin. Hêzên Tirkîyayê yên leşkerî gundên me wêran dikin, lê em dibêjin – aştî! Me dikujin, me neçar dikin, ku em warên kal û bavên xwe biterikînin, Kurdistan bûye welatekî bê kurd, lê em dibêjin – aştî!

Serok rawestya, li min nihêrî û got:

– Ê, îjar?

– ...Dibêjin, – min axavtina xwe domand, – ku em divê wana neçr bikin, ku ew jî bizêrin, wek ku ew tînin serê gelê me. Heya em jî weke wan nekin, Tirkîyayê li dora maseya hevdîtinan rûnenî...

Li vir Serok hêrsa xwe zevt nekir:

– Çi ye, we heşê xwe firandye? Yên ku wisa dibêjin, ew jî sewdaserne mîna wana ne. Eger wisa bibûya, wê demê çi ferqî – di navbera me û wan da? ...

Dema gereke dinê:

– Kurdan ji bo gelên herêmê ewqas kirine, lê bê tişt mane. Tu dizanî çima? –Serok berbirî min bû.

– Di gelek pirsan da em bi xwe gunehkar bûne. Te bi xwe nivîsye: “Gelê ku li hemberî xwe xiyanetên here mezin kirye – ew em, kurd in!” – Min bersîv da.

– Belê, wisa bûye. Lê gelê kurd êdî gihîştye xwetêgihîştina netewî! Ne wisan e? Û rizgarîya wî jî di vê da ye, – ewî gotina xwe bidawî kir.

Carekê em li ser şêwazê jîyana me axivîn. Ewî nêrîna xwe anî zimên:

– Ez hercar ji we ra dibêjim, lê, hûn dîsa jî bi jiyana sivik û hêsan dijîn. Mînak, min hûn hemû gîhandine heya asta îro, û hûn, bi xwezayî, heya radeyekê, berhemên karê min in. Em hemû bi hev va girêdayî ne. Bi xwe hebûna we, wek ku heye, pêwîndîya wê bi rêberê we ra heye... Lê cîhan we hemûyan dipejirîne, nasnameyên (paseport) xwe dide we, lê dema di derbarê rêberê we da tê gotin, dibêjin – na! Hûn jî divê evê têbigihîjin! An hûn heya radeyekê xwe bi destê wan va berdidin, an jî ewana evê ji we hêvî dikin. Hûn divê

heya dawîyê yên xwe bin. Nabe, ku mirov di heman demê da di nivî da yê xwe, an ê xelkê be. Tiştên nîvhero nîvmirî ne. Û yê nîvmirî jî ji mirîyan xirabtir e! – Li vir Serok navbereke kurt dayê, li min nihêrî, vegerya di stêrkên li asîman nihêrî û axavtina xwe domand. – Di vî asîmanî da her tişt bi hev va girêdayî ne, hemû bi qanûnekê dijîn – bi qanûna gerdûnê, her yek li wir cîhê xwe heye. Me di vê cîhanê da cîhê xwe winda kirye, em derveyî zagonê hiştine, em bîyanî bûne, ji ber wê jî cîhan wisa dijwar me dipejirîne. Lê ewê me bipejirîne. Eger nepejirîne, ewê hem nemirovî be, hem jî bi xeter be, ji ber ku gelê kurd êdî nikare vê rewşê tehmûl bike. Wê wisa nebe!

Carekê, dema em di derbarê rewşa îroyîn ya gelê kurd da diaxivîn, ewî, qey bibêjî ne ji bo yê hemberî xwe, got:

– Çima wisa bû, şaşî di çi da ye? – Û destê xwe di hewê da wisa dawşand, qey bibêjî, dibêje: “Nebêje, bersîv pêwîst nake!”

Dibe ku bersîva wî bi xwe hebû, an, ewî nedixwast bersîva yekî dinê bibihîsta? Ew pêşda diçû, destên xwe dabû pişt xwe, bi serbilindî dimeşya. Ew mîna wî mirovî diçû, yê ku bersîvên hemû pirsan dîtibûn, lê dîsa tiştekî ji bo roja tê digere…

Dema gera me ya dawîyê ya berî vegera Moskovayê Serok ev gotina hanê avît:

– ...Ev çi ye, xiyanet e, an?... – Û serê xwe wisa hejand, mîna miovekî bibêje – erê!

Dema êdî destûra vegera Moskovayê hatibû dayîn, û em êdî di rê da bûn, Serok pirsî:

– Em vedigerine Moskovayê, lê ji wir...?! Em kuda jî herin, em berbi çareserîya pirsê va diçin. Çi li hev tê alandin, ew jî tê veresandin. Her çi jî bibe, em neçarin, hê zêde li hev bialînin? Evê li me ferz dikin, cîhan me berbi wê va def dide. Me ewqas car got – aştî! Lê kesekî nexwast demgê me bibihê.

Dema êdî em vegeryabûn Moskovayê, di maleke li rex Moskovayê da bi cîh bibûn, benda amadekarîya çûyîna Serok a ji Rûsîyayê bûn – ya ku hê nedihate zanîn, ka berbi ku va, ewî pirsî:

– Çima Mahîr naynin? Qena meyê bizanibûya, ka çi çi ye? Pêwendîyên wî bi hevalên me ra hene.

Berpirsyarê koma parastinê bersîva vê pirsê da:

– Hûnê di balafirgehê da hev bibînin, ew bi pirsa çûyîna mêvan va mijûl e.

Hinekî dereng Serok got, ku dixwaze bi karê xwe va mijûl be, divê peyamê li ser bantê binivîse, û wê pir baş bibûye, eger kesekî ew aciz nekira û di ser da zêdekir:

– Here û bi wan ra be, bi tiştekî va mijûl bibin, heya ez bidawî dikim.

…Li qatê yekê min û berpirsyarê komê nerdî (tavla) dilîst û sowbet dikir, dema Serok bi beşereke xweş berjêr bû û hate bal me.

– Ezê jî bigiîjim we! – ewî got.

Min cîhê xwe da wî. Serok rûnişt. Zar hildan destê xwe û got:

– Em matçeke dîrokî destpê bikin – matça dostanîyê di navbera Kurdistanê û Rûsîyayê da!...

Sibetira dinê em çûne balafirgehê. Em li wir benda balafira ji Yewnanistanê bûn. Lê bi fermî tu agahî di derbarê firîna wê da li wir tunebû… Wê demê nûnerên dewletê gotin, ku wê Serok bişînin Şamê. Me nêrîna Serok a di wê derbarê da ji wan ra got, ku nabe, herin wir, ji ber ku ewê bibe sedema şêr di navbera Tirkîyayê û Sûrîyayê da û me pêşniyara Serok ji wan ra got – ku hinekî jî bendê bimînin. Piştî demekê agahî hat, ku balafir ji Yewnanistanê derketye û piştî du katan wê bigihîje Sankt-Pêtêrbûrgê. Nûnerên dewletê pirsîn:

– Lê li wir garantî heye?

Li ser vê pirsê Mahîr got, ku hem partîyên kolîtsîonê, hem muxalefet, hem gel, hem jî ruhanî piştgirîya me dikin.

Piştî 15-20 deqeyan pey hatina me ya Sankt-Pêtêrbûrgê ra balafira yewnanî jî li wir danî. Dema em bendê bûn, mirovekî payebilind ê dewletê li bal Mahîr ji Serok ra got, ku wan Mahîr agahdar kirine, ku li vir tu garantî nînin, ku îro Rûsîya ji bo wê ne amade ye. Û paşê lê zêde kir:

– Bêje Serok, – ewî gote min, – eger ew carekê jî bi vî awahî bê Rûsîyayê, wê min ji vî karî bavêjin, ezê kûçe û kolanan gêzî bikim û dê nikaribim alîkarîyê bidim we...

Ji bo ku nûnerê dewleta Rûsîyayê kûçeyan gêzî bike, ne neçarî û ne jî pêdivîyeke wisa çê nebû. Ev ji bo kê baş bû, ji bo kê – xerab? Mirov dikare ji bo vê gengeşîyê bike. …Her tiştek li ber çavan e: li dijî gelê kurd û rêberê netewî komploya navnetewî, xiyaneta mirovî, bêdadîya dîrokî pêk hatye. Cîhan weha ye – bêdad e û bêexlaq… Guneh û şaşî û têberdanên pêşîyên me di vê cîhanê da ji bo me mîras mane, û îro ji bo wan hemûyan em bersîvê didin – bi tevahîya gel û rêberê xwe va.

Lê gelê me êdî îro bi hestî nêzîkî wê pirsê nabe, pêşîyên me û paşeroja me ya dîrokî yên me ne, û em wan wisa têdigihîjin, wek ku ew hebûne, lê ji paşerojê û şaşîyên ku hatine kirin, em dersan derdixin. Lêbelê, bi wê ra tevahî em jibîr nakin, ku divê ji bo roja xwe ya tê, ji bo pêşeroja xwe xemxurîyê bikin, ji ber ku em bi dîrokî li hember wan bersîvdar in. Û hêvîya me ya netewî, pêşeroja me di kesê rêberê netewî Abdullah Ocalan da li ser girava Îmralîyê ye. Ew ronahîyê dide rêgeha me, û gelê me bi hêvîya roja tê ji bo azadî û mirovahîyê radibe têkoşînê.

Roja me ji girva Îmralîyê hiltê, û gelê me ji wê Rojê tîna jîyanê digire, û bi hêvîya hatina dihatûya azad têkoşîna xwe ya ji bo aştî û dêmokrasîyê didomîne.

**Rezbera sala 2001-ê – Moskova**

# DÎROKÊ BEŞDARÊN KOMPLOYA NAVNETEWÎ DARIZÎNE Û BIRYAR XWE BIDE![10]

## (Hevpeyvîna rojnameya «Свободный Курдистан»/“Kurdistana azad”)

*Êdî çar sal li ser bi korsanî girtina rêberê netewî ra debaz bûne, lê heya îro jî gelek tişt di wê bûyerê da tarî dimîne...*

*Îro gotûbêja me bi êdîtorê giştî yê rojnameya “Kurdistana azad”, û nûnerê Yekîtîya dêmokratîk a gelê kurd a berê, lê naha Serokê Şêwra Otonomîya Netewî-Çandî ya Kurdên Rûsîyayê, endamê Kongrêya Netewî ya Kurdistanê Ezîz ê Cewo ra ye.*

**– Birêz Ezîz ê Cewo! Hûn yek ji wan kurdên Yekîtîya Sovêtê bûn, yê ku ew bûyerên tevlihev ne ku tenê li ber çavên xwe dîtine, lê hûn bi xwe jî beşdarî wan bûne. Fermo, bibêjin, çima Abdullah Ocalan du caran hate Rûsîyayê, her çiqas bi praktîkî ji hemûyan ra dyar bû, ku rêjîma Yêltsîn dê penaha siyasî nede wî?**

– Ez bêhtir çavdêrê wan hemû bûyeran bûme, ne ku beşdarê wan, ji ber ku hîç kesek ji me, ji bilî Mahîr Welatê nûnerê PKK-ê yê wê demê di Rûsîyayê û Yekîtîya Dewletên Serbixwe (SNG) da nizanibû, ka bûyer çima hema bi wî awayî pêk tên, û derfetên kesekî jî nînibûn, ku bikaribe bi awayekî bandorî ser wê dramayê bike, ya ku li ber çavên me pêk dihat. Me hemûyan, ji bilî Mahîr Welat, tenê karên teknîkî pêk tanîn, ên ku pêwendîya xwe bi amadekirina hevdîtinan û wergera ji zimanekî bi zimanekî dinê hebû. Her weha, divê bê zanîn, ku em beşdarî hemû hevdîtinan nedibûne: hinek mirov bi wergêrê xwe va dihatin bal Mahîr, û danûstandinên wan bêyî me pêk dihatin. Ji bilî vê ew gelek caran tenê diçû hevdîtinan. Wê demê em bi bawer bûn, ku divê hema wisa jî bibûya. Tê bîra min, çawa dema rêberê me cara yekem li Moskovayê bû, ez û Mahîr va çûne hevdîtinekê bi hinek kesan ra, yên ku ne nas bûn. Piştî beşê yekem ê hevdîtinê ra Mahîr xwest, ku ez derbazî makîna me bibim, lê bi xwe axavtina xwe bi “mêvanan” ra di makîna wan da domand. Hem jî, rewşeke wisa saz bibû, ya ku bi bingehîn ji ber helwesta Mahîr derketibû holê, me nikaribû, ku hertim li rex wî bûna û haş ji hemû bûyeran hebûna...

Ji bo beşê duyem ê pirsa we: ka çima Serok cara duyem hate Rûsîyayê? Ew ji ber wê bû, ji ber ku Mahîr ew ferz dikir! Min di wê derbarê da di gotar xwe ya “Di nav ta û bendên komploya navnetewî da”[11] bi hûrbînî nivîsye. Wê demê ewî em jî dane bawerkirin, ku rêvebirîya Rûsîyayê dê destekê bide hatina rêberê netewî ya Moskovayê. Wê demê me digot, eger wisa dibêje, ew tê wê wateyê, ku wisa jî heye, di nava me da qanûneke nenivîsî hatibû pejirandin, ku kesek bikaribe bipirse, ka, gelo kê û çi soz dane wî?...

Her paşê, piştî çend salan pey girtina Rêberê netewî ra, em wateya bûyera pêkhatî têgihîştin. Ma ne wê demê Mahîr bi rêya Mecît Mamoyan hewl dida, rastî Borîs Bêrêzovskîyê wê demê endemê ***“malbetê”***[12] bê, yê ku dikaribû bi hêsane wezîrên dewletê peywirdar bikirana û ji ser kar bavîtana. Dibe ku, lewra jî, dema Mahîr bi bawer digot, ku, li jorê her tişt dê bê çareserkirin û Serok dê bikaribe bi hêsane herî kêm nîv salekê di

---

[10] Rojnameya «Свободный Курдистан» (“Kurdistana azad”), №2. 2003. Wergera ji rûsî ya Ezîz ê Cewo ye.

[11] *Gotar cara yekem bi zimanê rûsî li Moskovayê di kovatra «Дружба»/“Dostanî” da (2002, №14/15) bi sernivîsa: «В петле международного заговора» ronahî dîtye. Peyra Ezîz ê Cewo bi xwe ew wergerandye kurdî û ew di bin sernivîsa giştî ya “Li ser pêlên komploya navnetewî” da di malperên kurdî yên cuda da hatye weşandin.*

[12] *Dema serekkomarîya Borîs Yêltsîn koma wan mirovan, ên ku ewî li dora xwe bervkiribûn, di nav gel da wek “malbet” hatibû navkirin.*

Rûsîyayê da bimîne, mabesta wî ev çavkanî bû.



*Mecît Mamoyan û Abdullah Ocalan di balafirê da, dema hatina ji Romayê berbi Nîjnî Novgorodê va (Rûsîya), 16. 01.1999.*

Ji wê jî bêhtir: Mahîr û Mecît bi tevayî çûne Romayê, wê demê Serok li Îtalîyayê bû. Piştî demekê Mahîr tenê vegerya, zûtirekê Mecît bi Serok ra ji Romayê bi balafira serekwezîrê Îtalîyayê Masîmo D'Alêma hate Nîjnî Novgorodê (Gorkîya berê/Rûsîya)...

**– Dema gulana sala 1998-an Mahîr careke dinê ji Sûrîyayê vegerya Moskovayê, ewî armanca hatian xwe çawa şirovekir?**

– Wê demê ew bi Mecît Mamoyan ra hema ji balafirgehê çû û derdorê sê mehan tu agahîyên me jê nînbûn, ka ew li ku da çûye û ne cîyê mayîna wî, ne jî têlêfona wî me nizanibû. Her carna, dem bi dem, ew dihate bal me.

**– Ji bo sekina ne asayî ya Mahîr tu şik û gumanên hevalan çê nebûn?**

– Helbet, guman hebûn. Hema wê demê yek ji nûnerên PKKê, yê ku divê biçya Sûrîyayê bal Abdullah Ocalan, ji Ewropayê hate Moskovayê. Ewî di derbarê sekna Mahîr da Serok agahdar kiribû.

**– Ji hevalan ra li hev hat, gelo, biznibin, ka Mahîr li ku dimîne?**

– Peyra ewî hîç vendişart jî, ku Mecît Mamoyan ji bo wî xanîyek kirê kirye.

**– Ji kerema xwe ra bibêjin, ev ne ew Mamoyan e, yê ku wek karmendê Întêrpolê di gotareke xwe da we behsa wî kiribû?**

– Belê, ew bi xwe ye...

**– Di berfanbara sala par da rojnameya "Ramana kurdî" hevpeyvînek bi endamê berê yê Komîtêya Navendî ya PKKê Mahîr Welat ra weşandibû. Ew dibêje, ku bi xwe dijî hatina Abdullah Ocalan a Moskovayê bûye, lewra ku pêwendîyên wî bi nûnerên sazîyên dewletê yên Rûsîyayê ra nînbûne.**

– Hîç jî ne wisan e. Hemû gotinên di drbarê wê da, ku pirsa derketina Serok a ji Sûrîyayê ji nişkêva derketye holê, û ji bo Mahîr ji nedîtîva bûye, bê bingeh in. Hê di sala 1993an da, berî hatina yekem a Mahîr Welat a Rûsîyayê, nûnerekî PKK ê bi navê Mihyedîn gote min: "Zû, an dereng, Serok Apoyê ji Rojhilata Navîn derê, û em divê ji bo derketina wî amadekarîyan bibînin, û Mahîr Welat hema ji bo wê hatye Moskovayê".

Mahîr ji bo wê hatibû şandin, ku ji bo hatina Serok merc û derfetan amade bike – hema ew jî yek ji erkên wî yên sereke bû. Komîtêya Navendî ya Partîyê dizanibû, ku heya pirsgirêka kurdî di Tirkîyayê da çareser nebe, Serok dê nikaribe demeke dirêj di Sûrîyayê da bimîne. Lê, mixabin, wek ku dihate xwestin amadekarî ji bo wê nehatin kirin. Û ya dinê jî, berî wê, ku Mahîrê biçûya Lênîngradê, lê ezê – Saratovê, biryar hatibû girtin, hevalekî me ji bo wê bişînin Sûrîyayê, ji bo ku ew bi Serok ra di bin navê bazirganan da vegerin... Di derbarê wê da min her piştî girtina Serok bihîst. Ji bo çi pilanên wan hatine guhartin, ez nizanim.

Dema em paşva dinihêrin, diyar dibe, ku ji Mahîr ra li hev hatye Serok bide bawerkirin, ku her tenê ew, Mahîr Welat dikare danûstandinan bi rayedarên dewleta Rûsîyayê ra bi serfirazî bibe sêrî, û destûra hatina xwe ya duyem ya Rûsîyayê wergirtibû.

**– Ewî çima wisa bi biryar dixwast vegere Rûsîyayê?**

– Ew pirseke pir dijwar e. Mirovê nikaribe yekawa bersîva wê bide. Tê bîra min, çawa nîveka sala 1995an di Akadêmîya Leşkerî-Siyasî ya PKKê da rapora di derbarê karên Mahîr da dinirxandin. Di wê danişînê da hemû fermandarên leşkerî amade bûn. Ewana wê demê li wira perwerde didîtin. Wek ku ez tê gihîştim, Navendê di derbarê karên wî da bêhtir dizanibûn, ne ku me li vira, û wê demê qîmetekî neyînî dane karên Mahîr. Ji bilî vê notên Serokatîyê hene, û di wan da kesayetî û karên Mahîr hatibine rexnekirin.

Çi ku dimîne pirsa di derbarê pêwendîyên wî bi sazî û rayedarên dewletê yên Rûsîyayê ra, bê guman ew hebûne. Bi rêya kê, bi kê ra, ew ne ewqasî jî girîng e. Dema Mahîr di Navendê da bû, ewî gelek caran bi têlêfonê bi wan mirovan ra diaxivî, yên pêwendîyên wan bi êşêlonên jorin ên desthilatê ra hebûn.

**– Ka em dîsa vegerin ser pirsa dîl girtina rêberê netewî. Ew çi lîstik bû, û, bi nêrîna we, kî beşdarî wê bibûn?**

– Qîmetê bûyera dîlgirtina rêberê netewî êdî hatye dayîn. Tevahîya cîhanê dizane, ka ji hêla kê va û bi çi awaîyî ew komploya kirêt pêk hatye. Yên ku ew çalakîya ne qanûnî tevger kirin û pêk anîn, ew sazîyên taybet ên DYA, Brîtanîya Mezin û Îzraêlê bûn. Ewana Rêberê netewî girtine û spartine dewlaeta tirk...

**– Wê demê çi karê Rûsîyayê û Mahîr li vir heye?**

– Di pirsa Rûsîyayê da, em divê welêt, gelê wî û rêjîma desthilatdar ji hev vebijêrin. Ne her demê ye, ku desthilat nûnertîya berjewendîyên gel û welêt dike. Em bi bîr bînin, Rûsîya çar salan berê çawa bû! Berjewendîyên netewî dihatin firotan, dewlemendîyên netewî dihatin dêrskirin, xezîna welêt şêlandibûn û derbazî bankên welatên dereke kiribûn! Yên ji Rûsîyayê ra xiyanet kirin, wana wisa jî ji rêberê me Ocalan ra xiyanet kirin. Wisa jî mirov dikare bibêje, yên ku ji Abdullah Ocalan ra xiyanet kirin, wana berjewendîyên Rûsîyayê firotin. Û heya îro gelek pirs mane, yên ku benda bersîva xwe ne.

Mînak, dema berî girtina rêberê me Mahîr li Yêrêvanê bû, tenê bi serê xwe çûbû baylozxaneya Almanîyayê û bi wan ra hevdîtin pêk anîbû. Hevdîtina wî li wira bi kê ra bû, ew li ser çi pevketibûn?.. Pirs gelek in!

– Û kê ew hevdîtin tevger kiribûn?

– Bersîva vê pirsê tenê Mahîr bi xwe dikare bide.

Piştî ku Rêberê netewî ji Moskovayê çû Romayê, rêvebirîya partîyê bang li Mahîr kir, ku here Navendê. Ew bi balafirê firî Têhranê, lê hevalan, ên ku çûbûn balafirgehê, ji bo ku wî pêşbazî bikin, ew di nava rêwîyên wê da nedîtibûn. Ewana di derbarê wê da hevalên Moskovayê agahdar kirin, û heval ketin nava tefekûrîyan. Piştî çar rojan ew jinişkêva ji hevalên me ra têlêfon dike û dibêje, ku ew bi balafirê tê Moskovayû û dixwaze, ku herine pêşîya wî. Dema hevalan jê pirsîn, kîjan rêys e û ji ku difire, ewî gotibû, ku ji Almanîyayê difre û dem û hejmara balafirê gotibû...

**– Çi pêwendîya van hemûyan bi Almanîyayê ra heye, ma ne ew divê çûbûyaa Tehranê?**

– Li vira tiştek dîyar e: hevalên me ew verêyî Tehranê kiribûn. Di balafirgeha Şêrêmêtêvoyê (Moskova) da ew kontrola nasnameyê derbaz bibû, ketibû balafirê. Ew bi çi awayî ji Tehranê li Almanîyayê peyda bibû, her tenê Mahîr bi xwe dizane.

Tenê ew dikare şirove bike, ka çawa dikaribû hevalên xwe li çîyayên Kurdistanê bihêle, dema piştî girtina rêberê netewî ew ji bo hesabdanê (rapor) li Navendê bû. Bi çi awayî ji wî ra li hev hatibû, li ser tevahîya Rojhilata Navîn ra xwe bigihîne Ewropayê?

Û pirseke dinê ya balkêş jî: du mehan berî hatina Serok a Rûsîyayê, ji Ewropayê yekî bi navê Elî hate Moskovayê, ew bi xwe bi nasnameyê Mustafe Gunaydin dihat zanîn. Wek ku Mahîr em didan bawerkirin, armanca hatina wî bazirganî bû, lê her kesê ku bi wî ra pêwendîyên xwe çê bûn, digotin, ku ew mirovekî ji bin va dûrî bazirganîyê ye, ku ew “kesayetîyeke tarî” ye. Û hema ev mirova di nava wan kesan da bû, yên ku dema hatina yekem a Abdullah Ocalan a Moskovayê, çûbûn wî pêşbazî bikin. Ew hertim li rex Mahîr bû û haya wî bêhtir ji bûyeran hebû, ne ku gelek hevalên me. Piştî girtina Serok Elî bê ser û berate winda bû û jimareke mezin pere jî bi xwe ra bir...

Eger mirov li ser van hemûyan da wê rastîyê zêde bike, ku serekwezîrê Rûsîyayê yê wê demê Yêvgênî Prîmakov pêwendîyên xwe bi Madlên Olbrayta wezîra karên derva ya DYA ra hebûn û di nava wî û hempîşeyên wî yên demekê di nava mûxabaratên welatên bîyanî da hevpiştgirîyek (*solidarity*) mabû, gelek tişt ronî dibe.

Helbet dîrokê hê van bûyerên bi sûc qîmet bike.

Eger mirov bûyerên bihurî analîz bike, dikare bi bawer bibêje, ku ew komplo taybetîyên xwe yên navnetewî hebûn, û di Rûsîyayê da jî mirov hebûne, yên ku wê demê li ser pişta trajêdîya gelekî dewlemend bûne...

Di derbarê vî sûcê navnetewî da êdî çend pirtûk hatine weşandin. Lê rastî her wê demê dê derê holê, dema ew dewlet, ên ku beşdarî vê delkbazîyê bûne, grîfa (mor) sûrîbûnê ji ser agahîyên di derbarê bûyerên wê demê da rakin.

**– Xwendevanên me dipirsin: “Çima Serok Apo neçû Kurdistanê? Li wir dê gêrîllayên me ew biparastana”.**

– Ev her helwesteke hestyarî ye, û mirov dikare wê têbigihîje û ji wê ra rêz bigire. Lêbelê, wek ku tê zanîn, jîyana rêal bêhtir dijwar e, û xeterîyên xwe hene. Eger Serok biçûya nava gêrîllayan, ewî dê bi çûyîna xwe ew bidana bin derbê. Artêşên Tirkîyayê û NATO-yê, yên ku bi teknîka here hemdemî va hatine biçekkirin, dê bavîtana ser parazvanên leheng ên gelê me, û ewê jî dê bibûya sdema wan bûyeran, ên ku kesekî hêvî nedikir.

Her tenê helwest û tevgeryana bi pîvan û heşmendî ya rêberê netewî li pêşîyaa xwînrêjîyê girtin. Ewê gava Abdullah Ocalan wê demê sedemên desttêwerdana leşkerî ya Rojhilata Navîn a ji hêla DYA-yê ya ji holê rakir. Dema Serok Apo Sûrîya terikand, ewî got: “Çûyîna min a ji vira rê li pşîya şêr di herêma Rojhilata Navîn da girt...”

Lê, wek ku em dibînin, piştî çar salan DYA-yê dîsa jî ji bo desttêwerdana wê herêmê sedem dîtin...

**– Bi dîtina we, ev goşangîrîya (tecrîd) ser Abdullah Ocalan pêwendîya xwe bi bûyerên Îraqê ra heye?**

– Helbet, hemû bi heva girêdayî ne! Bi xwe tecrîda ser Rêberê netewî dûmahîya komploya navnetewî ye. Ew xelekek a tora kompoloyê ya giştî ye. Ewana baş tê tigihîjin, ku gavên Serok Apo yên ji bo aştîyê dikarin planên wan ên şerxwazîyê têkbibin. Hemû jî baş tê digihîjin, ku Abdullah Ocalan têkoşerê bêwestan ê ji bo aştîyê ye, ew ewledarê (*guarantor*) aramîyê ye di Rojhilata Navîn da...

# HEMÛ RÊ DIBIN AMEDÊ...[13]
# -I-

Amed!...

Sembola serhildan û berxwedanan, colanga şaristanîya kevnar, bingeha avabûna berhemên raman, rewan û destê mirov, û wargeha vejîna mirovayîya nû!

Û hemû nirx û hêjayîyên xwe Amedê ne tenê bi hêz û berxwedanan û bi bedena xwe ya kevirî parastye. Ew li ser bingeheke dîrokî ava bûye û pêş ketye, û reyîşkên wê bingehê jî di nav axa kevnar a Kurdistanê û tevayîya Navçemkê (Mêzopotamîya) da bi hezarsalan kûr çûne.

Wêrekîya mirovî, hêzeke gîyanî û zanistî pêwîst in, ku mirov ji bo têgihîştina van hemûyan rabe ser rê... rêya naskirina bingehên xwe yên mirovî, netewî û şaristanî – di nav gevgijkên dîrokî da, li ser xaçerêyên dewranên bihurî.

Rêya me hemûyan me dibe Amedê, em li kîjan parçeyê cîhanê jî bijîn...

Belê, rêyek heye, ya ku berbi Amedê va dibe, lê pirs di wê da ye, ka emê çawa û bi çi barî rabin ser wê rê û berê xwe bidin payt'exta Kurdistana piroz.

Û li vir pisporî û hêzeke gîyanî ya hindurîn tê xwestin ku mirov piştî wan bahozên dîrokê ra di nav gêjgering, kilafe û wêranîyan da, yên ku bi destê peranîya eşîrên barbar pêkhatine, bingehên xwe bibîne, xwe nas bike û vegere ser reng û rûçikê xwe yê mirovî... û mirov bimîne, wek mirovekî xwedî sewda...

Amed! Navekî giran û granbiha!

Û ev jî, ne ji bo wê, ku ew paytexta kurd û kurdistanîyan e! Na! Ji ber ku ew Amed e, peykera şaristanîya dîrokî û berhema bilindayîya sewda û hunera mirov, bi xemla destên avakar û ramana pêşîyên me ya ronî.

Çend hezarsal bihurîn, çendik çend êrîş hatin, li bedena Amedê ketin û têk çûn, çendîn hêzên bi tevger hatin û çûn – winda bûn! Lê Amed maye, îro jî heye, û wek "kalê zemanan û xortê geryayî" amade ye, ku bersîva pirsên me bide! Lê di hindurê vê bedena kevnar da çiqas û çito hêz û raman li dijî hev sekinîne!? Û ew hemû jî hatine û buhurîne, lê Amed îro jî li ser pêyên xwe sekinî ye, bedena xwe ji toz û xubara dîrokê dawdişîne, li dijî qalib û qalikên demên bihurî ber xwe dide, kêlî bi kêlî wan dişkêne, vediroje û bi dijwarî xwe ji wan rizgar dike...

Û werzebayê azadîyê li kûçe û kolanên wê da fûr dide – digere, dikeve bêvila her yekî û di guhê wan da dibêje: "Amade be, Azadî êdî ne dûr e! Amade be... ji bo nêzîkkirina

---

[13] *...Bakûrê Kurdistanê û KT di dawîya sedsala XX û destpêka ya XXI da di pêvajoyeke siaysî ya pir dijwar û, di heman demê da, pir girîng û balkêş ra derbaz bûn. Wan salan gavên ji bo çareserîya pirsgirêka kurdî hatin avîtin, li ser rêya berbi Îmralîyê va şandên nûnerên dewletê û yên HDP-ê diçûn û dihatin, rêberê netewî birêz Abdullah Ocalan rêyên çareserîya pirsgirêka kurdî pêşniyar dikir, di Welêt da amadekarîyên hilbijartinan dihatin kirin, gel û rêxistina wî ya sereke – HDP berendamên xwe destnîşan dikirin… Heya ku bigihîjin asta wê demê, Amed û gelê kurd rêyeke dirêj û bêhempa ya têkoşîna dêmokratîk derbaz bûne…*
*Hema wan demên vê pêvajoyê, dawîya sala 2004-an ez çûme Amide, ji bo beşdarî Konfêransa zimanê kurdî bibim… Li wir ji bilî beşdarbûna konfêransê min wisa jî rewşa Amedê şopand, û ev gotar encama çavdêrî û nirxandinên min e. Herdu beşên gotarê jî wê demê bi zimanê rûsî û kurdî di çapemanîyê me ya Rûsîyayê da û bi kurdî li ser rûpelên malpera PEN-a kurd (www.pen-kurd.org ) hatye weşandin… Peyra, hê derng malperên* www.amidakurd.net û www.xendan.org *jî bi boneyên cuda ew weşandine.*

Azadîyê tu jî karekî bike û amade be! ...”

A, di demeke weha ya dîrokî da em çûne Amedê. Ji Rûssîyayê: Îraîda Smîrova û Zerê Ysûbova (herdu jî zimanzan, ji Sankt-Pêtêrbûrgê), Ordîxanê Celîl (wêjezan, ji Sankt-Pêtêrbûrgê) û ez (bi helbest û gotarên xwe zimanzanîyê va, ji Moskovayê).

Ji herçar hêlên cîhanê zimanzan û wêjezan, nivîskar û mirovên weşana wêje û zimên ra têkilîdar hatibûn – kurd, alman, holandî, tirk, ermenî, svêd û yên dinê.

Her kes bi xiyal û dîtinên xwe, her yek bi armancekê hatibû wê xaka pîroz...

Û amedîyan malovanîya van hemûyan dikirin – bi rewşenbîr û karkerên xwe va, bi gundî, parêzer û xwendkarên xwe va, bi rêvebirîyên navçeyan, ên herêmî û ya bajêrê Amedê va, û hemûyan jî di bin awazên kurdîya şêrîn da rengek dan “Rojên wêje û zimanê kurdî”... Û ji xêncî wê, heya salekê berê ji bo axavtina bi kurdî rayedarên kurd di dadgehan da kaş-berkaş dikirin…

Bi rastî jî cîyê serbilindîyê ye: serokê rêvebirîya Amedê Osman Baydemîr bi kurdîyek a paqij û şêrîn konfêransê vedike û civîna çapemanîyê dimeşîne, û li ber çavan e, ku ew bi koma xwe va bi çareserkirina pirsgirêkên bajêr va dijîn. Barekî giran e, pirsgirêkên bi sedsalan ketine ser hev, di rojek da çareser nabin...

Tiştê ku me çend sal berê hîç xiyal jî nedikir wan rojan wek rastîyekê li pêş me derket: di Amedê da hevtêyekê di avayîyên rêvebirî, şano, navendên çandê û yên din da bi beşdarîya dusedî zêdetir pisporan (êdî em di derbarê bi sedan dilxwazên wêje û zimanê kurdî da nabêjin!) rojên wêje û çanda kurdî derbas dibin, û tu astengî çê nabin, ji xeynî hişyarîyeke nîvgirtî û nîvhero ya hindurîn a bêdeng, ew jî ji bo *“hinek taybetmendîyên tenik ên vê demê”*. Me hemûyan heya radeyekê bi têgihîştinî wan tiştan dinihêrî: ka çima dema balafir dadikeve balafiregeha Amedê, daxuyanîyê tenê bi tirkî û înglizî didin, ka çima li ser dîwarên Amedê nivîsên bi tirkî hene, lê yên bi kurdî – na. Em têdigihîştin, ku ew di rojekê da pêknehatye û dê di rojekê da jî ranabe, lê dengekî hindurîn di nava me da nedipejirand û diqîrya:

-Çima?!

Û em tê nedigihîştin, ka ew pirs ji bo kê ye: ji bo dagirkeran, ji bo me – kurdan, an ji bo çarenûsê, a ku navê xwe Cîhan e?!

Û evê rewşê jî bi taybetî em, mêvanên ji Rûssîyayê zendegirtî hiştin: *çawa dibe, di Rûssiyayê da komar û herêmên netewî hene – ên otonom, an fêdêratîv: Tataristan, Çûvaşîya, Marî-Êl, Çûkotka, Adîgêy, Osêtîya, Daxistan, Îngûşêtîya, Çêçênistan, Başkortostan û yên din. Hemû jî bi navê xwe yê netewî, hemû jî serokkomar û serokê hukumeta xwe hene, dibistan, xwendegeh û zanîngehên netewî yên bi zimanên netewî, pirtûk, rojname bi zimanên wan tên weşandin, radîo- têlêvîzîonên bi zimanên wan, li ser dîwarên wan dîsa heman tişt, rêyên wan ên hewayê li ser navê wan û di balafiran da jî bi zimanê wan daxuyanî tên dayn: “Hûn bi xêr hatine..!” Heya di hinek ji wan komar, an herêman da netewa ku bi navê wê ew tên binavkirin, di kêmanîyê da ne, ango kêmnetew in. Lê kurd zêdetirî bîst mîllîonî ne, û em şa dibin ku ji me ra fersend çê bûye, li ser ziman û çanda xwe di nav xwe da biaxivin... Lê hê jî navê gelê kurd, zimanê wî bi destûrî qedexe ne, hê jî anegorî Destûra Tirkîyayê ya Bingehîn di vî welatî da tenê tirk hene û tenê zimanek xwedî mafê hebûn û jiyanê ye! Şerma cîhanê!!! Û ev cîhan çawa ji şerma (helbet, eger şerma wê heye!) di erdê da naçe?! Û ev tiştê han jî kesekî bawer nedikir, ku pêk bihata. Pêwîst bû, ku şerê panzdeh salan pêk bihata, têkoşîna gelê kurd a ji bo aşîtî û dêmokrasîyê ya bi rêberîya rêberê netewî Serok Ocalan bihata meşandin, divê ew bi nemerdî dîl bihata girtin û tenê – bê heval li “girava nava hevt deryan” têkoşîna xwe ya ramanî û bîrdozî ji bo mafê gelê me bidomanda, ji bo ku...*

Lê ev tenê destpêkek e, destpêkek a nû. Û her carê, her dema ku gavekê bavêjin, divê em – kurd bibêjin: “Ev yek! ...” Divê em bi yekê, duduyan, ... sedan, ... hezaran hêsan nebin, heya mafê gelê me di rêza gelên din da û wek wan neyê destanîn... Divê berdewamîya wê têkoşînê ya vê demê, di rewşa siyasî ya cîhana îro da, bi sazîbûna sîstêma

dewleteke weha da bigihîje xala xwe ya hişmendî. Tenê bi van mercan mirovê bikaribe van gavan erênî dinirxînin...

Dema min li ser van tiştan hinek nêrînên xwe ji kurdeki ji Ewropayê hatî ra gotin, ewî, zûr bû, li min nihêrî, demekê kete nava mitaleyan, wek ku mirovekî li tiştekî bigere, paşê got: "...Ev pirsên me belkî zêde ne ji bo kurdan bin. Heya cîhan jî êdî tê digihîje. Tiştê balkêş ew e, ku êdî hinek rewşenbîrên tirk jî têdigihîjin, lê ew hê kêm in, û wêrekîya wan têrê nake. – Ewî hizingek rahişt û gotina xwe domand. – Berî du rojan ez rastî rewşenbîrekî tirk hatim û, tu dizanî, ewî ji min ra çi got? – "Tu bi xêr hatî mêvanîya me! ..." – Ewî got. Ew jî di Amedê da! Ez pir êşyam. Min hema pirsne wek ên te dan wî. Û, tiştekî balkêş! Ewî wê demê hema – hema bersîva wan pirsan da. An, mirov dikare bibêje, hewl da, ku bide. Weha, dema ez li ser van pirsan bi wî ra axivîm, ewî li çavên min nihêrî, soromoro bû û bi dengeki nimz got:

– Bi rastî ez ji bo vê rewşê şerm dikim, lê çi dikarî bikî, ev rewş me ava nekirye, ev sîstêm li serê gelê me jî bûye bela. Gel bi xwe jî wisa tirsandine, wisa heşê wî xwarine, ku ew ditirse vê dewleta xwe winda bike. Lê yên mîna min, her çiqas hindik bin jî, hene, û em bi bawer in, ku, eger kurd mafê xwe bi rengê otonomî, an fêdêralî bistînin, wê ji gelê me ra çêtir be. Heya, ez natirsim, bibêjim, eger kurd serbixwe jî bin, wê ji bo gelê me bêhtir baş be, ne ku naha. Hûnê bibêjin – çawa? – Binihêrin, wê demê xortên me wê wek bazirgan, pispor, dîplmat, avakar, mamaosta, lê ne wek leşker bêne welatê we. Û wê demê ewê hem neyên kuştin, hem jî wê bi aborî çêtir be. Hem ev welatê gulvebide, dewlemend bibe, hem jî emê dewlemend bibin. Ez bi bawer im, ev rewşa tenê kêrî hinek cerdevanên (çete) di nav dewletê da tê.

– Belê, tu rast dibêjî! Ji mêj va hatye gotin, ku bîznêsa here mezin şer e!- Min gotina wî navbirand.

– Belê, belê, wisa ye. Lê naha, ez dibêjim, pêvejoyeke nû destpê bûye. – Ewî lez da bersîva gotina min.

– Ewê jî divê rayedar û rêvebirên Komara Tikîyayê bibêjin. Terefê kurd ewqas gav avêtin...- Min got.

– Belê, em jî, hûn jî, em hewlên ji bo aşîtîyê bidomînin! – Ewî axavtina bi alîyekî din va şo kir. Û min dît, ku beraxêvê min dixwaze xwe ji nav wê gotebêjê vekişîne û here. Min jî mîna mirovekî bitirse, ku ew dikare ji tiştekî dereng bimîne, bêyî hemdî xwe ev gotinana dan rûyê wî:

– Eger îro hûn min mêvan nav dikin, ew tiştekî ne normal e!.. Vê rewşê heya kevirên Amedê jî tamûl nakin, hûn divê baş bifikirin û wê bigihînin gel û rayedarên xwe jî. Rewşeke weha ne normal e, dibihên, ne normal e!? Û ev nenoralî ne tenê ji bo kurdan e, vê baş bizanibin!..

Ewî tiştek negot, zarê wî negerya, ku tîştekî bibêje, ji şerma serê xwe kire ber xwe, destê xwe li milê min xist, meşya û bi gavên hûrik ji min dûrket. Ez jî di cîh da sekinîbûm û mitale dikir: "Eger hinek mirov mane, ên ku hê dikarin şerm bikin, tê wê wateyê, ku hê her tişt winda nebûye. Eger yên weha di Tirkîyayê da pir hebûna, û yên heyî jî wêrekiya wan a hemwelatîyê hebûya, rewşa vî welatî wê weha nînbûya.

A din jî, karê me yê bi rewşenbîrên tirk ra, mirovê bixwasta, ku çêtir bûya!..- Min bi xwe bi dengekî bilind ji xwe ra got û ez berbi mêvangehê va meşyam".

...Wan rojan jiyan di Amedê da dikelya. Li her cîyan civîn bûn, konfêrans, gotebêjên zanistî, şevên helbestvanîyê. Nêrîn û ramanên zanistî û yên din ji her hêlên cîhanê herikî bûn û di Amedê da ketibûn govtûgoyê:

– Zimanê kurdî yek ji zimanên hindewropî yê kevnar e, yê ku gelek şopên bingehên destpêkî yên mak-zimanê hindewropî parastine û bi vî zimanî çandeke dewlemend hatye sêwrandin;

– bi zimanê kurdî zargotineke gel a dewlemend û wêjeyeke pêşkevtî gihîştine rojên me;

– zaravên kurdî: kurmancî, soranî, zazakî û yên din şêwazên hebûn û dewlemendîya vî zimanî ne;

– wêjeya kurdî rengekî xweser û taybetmendîyeke bi rengawaz ya gulistana wêjeya mirovayê ye;

– ji bo parastin, fêrkirin û pêşxistina zimanê kurdî û wêjeya bi wî sêwirandî divê bi destûrî statûseke wek ya zimanê fermî ji wî ra bê naskirin û ew di seranserê Kurdistanê û welatên serdest da serbest, wek zimanekî fermî bê bikaranin;

– ji bo pêkanîna van mercan, hêz û rêxistinên navnetewî divê zimanê kurdî hildin bin parastina xew...

Aha, bi bingehîn ev bûn, ew nêrîn û daxwazên beşdarên Konfêransa zimanê kurdî, ya ku 2 – 3-ê berfanbara 2004-an di Amedê da pêk hat. Û biryarên konfêransê jî li ser bingeha wan ava bûn.

Di şeva helbestvanîyê da cara yekem min tema helbestxwendinê hîs kir. Dema tu, wek helbestvanekî li ber dada xwendevanan disekinî û di nav peyvên helbestên te ra pirîskên agirê çavên wan bi pencera çavên te ra rewana te germ û jîyandar dikin... Wê şevê di bin ronahîya mûman a romantîk da piştî dused salan li şûna wan pêşîyên xwe, yên ku hesreta Welêt di dilan da ji vê cîhanê çûbûn, ez vegeryame Amedê...

Li Amedê ne tenê bîyanî û kurdên di xerîbîyê da berev bibûn. Wan rojan ji herçar parçeyên Kurdistanê kurd hatibûn, li wir berevbibûn: ji Rojhilatê Kurdistanê, ji Başûrê mezin û Başûrê biçûk (Rojava), hemû rengên kurdan li wir berev bibûn û reng – awazên xalîçeya me ya netewî tam nitirandibûn; hemûyan hev vedixwandin bal xwe... Û her yek jî bi hêvîyekê ji hev veqetyan, ku careke din bên bal hev. Bên bal hev, ku êdî tu hêz nikaribe wan ji hev dûr bixe, ku li ser rêya çûyîn–hatina wan a bal hev tu sînor ji wan ra nebin asteng.

Ev terefên wan rojan ên hestî û wateyî bûn. Lê ji xêncî wan û biryarên praktîk bingehek jî hate avêtin, ji bo ku di konfêransa tê da li ser alfabê, rastnivîsandin û rastaxavtin, pêşxistina zaravan û standartkirin û dewlemendkirina zimanekî wêjeyî yê giştî rawestin, ku biryarên têne pejirandin, bigiwîjin destê hemû zane û pisporên bi wan pirsgirêkan ra pêwendîdar...

Daxwaz, nêr'în, raman û xiyalên kurdan û dostên wan pir bûn. Lê ya sereke, hêvîya gelê kurd a Aşîtî û Azadîyê roj bi roj geş bibe, ku ew bi bawerîyeke ronî ji bo pêşerojek a hêjayî navê mirovîyê têkoşîna xwe ya dêmokratîk bidomîne.

...Du rojan berî vegera xwe em, hinek beşdar û mêvanên “Rojên wêje û zimanê kurdî”, di kolanên Ameda kevn da digeryan, dema komek a zarokan derket pêşya me. Lîqînya wan bû, dikenyan, dilîstin, bi kurdî laqirdî dikirin. Dema ku em dîtin, revîn-hatin dora me girtin. Bi pirs-pirsyaran di nav me da govtugoyek vebû. Peyra me xwest bi hev ra fotoyan bikişînin. Dema yê foto dikişand got: “Amade bin, dikişînim!” – Hemû zarokan herdu tilîyên xwe wek V vekirin û bi hevra qêryan: “Bijî Serok Apo!” Mêvanek-dudu ji nedîtîya jinişkêva veciniqîn. Xortekî 13-14 salî kenya û got:

– Metirsin, di wêneyê da ew gotinaê derneyên, heger derên jî metirsin, ên me di Stanbol û Ankarayê da jî wan gotinan diqîrin!..

Dema mêvanê me yê bîyanî tê gihîşt, ka çi pêk hat, kenya û got:

– A, pêşeroja kurdan di destê van zarokan da ye, yên mezin divê vê yekê baş bizanibin û ji wan dersan bigirin!..

## **Peynivîsar:**

Dema ev gotar êdî amade bû, Yekîtîya Ewropayê dema destpêka pêvejoya berendamtîyê ji bo Komara Tirkîyayê (KT) dîyar kir. Di KT da ew wek cejnekê pêşbazî kirin. Ew mafê wan e! Lê terefên vê pirsê yên mirovî, felsefî, rûmetî û wateyî jî hene. Pirs di wê da ye, ku mirov ji bo ebûra rojane nirxê mirovî têk nede...

Kurd jî bi erênî vê pirsê dinihêrin: bi ketina nava YE dibe ku Tirkîya bi neçarî qanûnên şaristanîya dêmokratîk wergire. Ji ber ku bi sazîya xwe ya îro va ev dewlet tu hêvîyê nade...

Her tişt wê baş be, eger kurd piştî vê jî têkoşîna xwe ya dêmokrasîyê û azadîyê bidomînin, û bi nêrîna me, Yekîtîya Ewropayê jî divê wek "hesasîyetên" Tirkîyayê balê bide ser yên kurdan jî û evê jî neke mînaka Lozanê. Her çiqas kurd jî êdî ne yên destpêka sedsala bîstî ne, dîsa divê bawerîya xwe bi yekîtî û bitevgerbûna xwe bînin... Em bi bawer in, ku rayedarên ewropî jî, berî ku biryarê bigirin, ji bîr nekin, ku, eger pirsgirêka kurd bi dêmokrasî neyê çareserkirin, wê bi hemû dijwarîyên xwe va bibe pirsgirêka Yekîtîya Ewropayê...

**Moskova – Amed – Moskova**
**sermawêz–berfanbar–2004**

# HEMÛ RÊ DIBIN AMEDÊ[14]
# -II-

## 1. Her çi jî hebe...

Dîsa berê me li Welêt e, û dîsa henû rêyên me em berbi Amedê va dibirin ...

Vê carê PEN-a navnetewî, Navenda PENa kurd û PENa tirk 20-25-ê adara 2005-an li bajarê Amedê li ser pirrengîya çandî sêmînarek li darxistin û malovanîya wê jî, weke herdem, şaredarîya bajêr dikir. Çapemenîya kurd di derbarê vê da bi hûrbînî ragîhand û ew wek tiştekî bûyerî nirxand, û em hemû jî di wê nêrînê da bûn, ku bi rastî bûyereke dîrokî bû.

Çima?

Li Amedê, di nav sînorên dewletekê da, ya ku bi destûrî hê jî hebûna gelê kurd napejirîne, li ser ziman, çand û navê kurdî axavtin jî bi serê xwe gaveke erênî ye. Lê, wek ku me di gotara xwe ya berî vê da anîbû zimên, dîsa, dema balafir dadiket Amedê, daxuyanî tenê bi zimanên tirkî û înglîsî pêk hatin, dîsa li ser dîwarên Amedê navên kûçeyan û tiştên din bi tirkî bûn, dîsa di dibistanan da perwerde bi zimanê t'rkî bû, dîsa yên ku diçûn kûrsên zimanê kurdî li ser tilîyên du destan dihatin hejmartin (binihêre: "Hemû rê dibin Amedê"- li ser malpera Navenda PENa kurd: *www.pen-kurd.org* û, her weha, bi rûsî: «Все дороги ведут в Амад» – rojnameya «Свободный Курдистан»/"Kurdistana azad", Москва, № 1/32, rebendan, 2005)...

Dîsa kurd û ewropîyan, vê carê wisa jî çend endamên PENa tirk bi wan ra, di nav hev da li ser pirçandîya vî welatî, mafê zimanê kurdî axivîn...

Eger em hesab hildin, ku di Komara Tirkîyayê (KT) da, li ku bi Destûra Bingehîn bilî gelê tirk û ziman û çanda wî, gelên din (ên ne tirk), çand û zimanên wan naên pejirandin û tu mafekî hebûn, jîyan û pêşketinê ji bo wan nîne, hinek mirov berev bûne û li ser çanda neteweke di vî welatî da qedexekirî diaxivin (dibihên, her tenê diaxivin?!), em vê gaveke erênî dihesibînin... ji ber ku me îro wêrekî wergirtîye, em çûne bakûrê Kurdistanê, yê ku bi fermî başûr-rojhilatê Tirkîyê tê navkirin, li paytexta wê Amedê, ya ku (dîsa bi fermî!)

---

[14] Li nasîya 13 binihêrin!

*... Dema du gotarên nivîskar bi sernivîsa giştî ya "Hemû rê dibin Amedê" da hatibûn nivîsîn, wî hêvî hebûye, ku ewê wek rêzegotar heya astekê bidome, lê, wek dertê holê, ev dîtin û nêrînên wî ne bi dilê rêjîma KT bûne... Û rojekê jî (10. 12. 2010), dema dîsa berê wî li Amedê bûye, ew divê dîsa beşdarî konfêransekê bibûya, nûnerên sazîyên dewletê yên KT wî di Stenbolê da radiwestînin, rojekê di balafirgehê da di bin çav da dihêlin, peyra paşva vedigerînin Moskovayê... Û bi wî awahî rêya berbi Amedê va li ber wî tê girtin... û dawî bi domandina rêzegotara wî tê. Helbet ev yeka mînaka binpêkirina mafên mirov ên ramanî û gotinê ye... Lê nivîskar pir hêsan nêzîkî vê bûyerê dibe, lewra ku, wek ku ew bi xwe dibêje: "Dema mirov wê hemberî wan bûyeran dike, yên ku di Welêt da li hemberî gelê min pêk tên, ev hîç ne tiştek e".*

*Lê dîsa jî...*

*Gelo her tişt bi vê bidawî bû? Helbet, na! Di cîhana îro da, dema ji ber hebûna ewqas hêmanên çapemanîyê û rgîhandinê yên nû ev cîhan pir "biçûk" bûye, û herçê ku heya wê damê hatibûye nivîsîn, bingehek ji bo dîtin û nirxandinên nû ava kirye, ew bûyerên kirêt ên rêjîma Tirkîyayê nikarin mirov bêdeng bikin û rê li pîşîya rastîyê bigirin, lewra ku, ya ku berî van bûyeran hatye nivîsîn li holê ye, û mirovên ku bixwazin rastyê bibînin, ew jî heya radeyekê têra wan dike...*

Dyarbekir tê navkirin, û bi nivîskarên xwe û yên ewropî û yên tirk va li ser çand û zimanê kurdî diaxivin û dewleta tirk tenê rojekê berî bidawîbûna sêmînarê, berbangê seata 5-an nûnera rojnameya "Radîkalê" ji hotêlê dibe û piştî 5 seatan, piştî destêwerdana rêvebirîya şaredarîya Amedê wê serbest berdin!... Her çiqas jî em hemû tê digihîjin, ku dewlet bi vê yekê peyamê dide me: "Binihêrin, ha-a-a, sînorên xwe bizanibin!" – dîsa jî em amade ne bibêjin – mala Xwedê ava be!?

Helbet, helbet, hinek "tenikîyên Tirkîyayê yên taybet" ên vê demê hene, û ji ber ku ev sêmînar di bin sîwana PENa navnetewî (ango, Ewropayê) da pêk tê, em jî divê "bi têgihîştinî nêzîkî pirsê bibin", ji bo ku (Xwedê neke!) rêvebirîya KT nexeyîde, yan helwesta kurdan di nava planên Awropa gewre da bi cîh nebe, an...!?

Her çi jî hebe, em li paytexta Kurdistanê – Amedê ne, û dema ku em çûne, ev e, û merc û rewşa heyî jî, bixwazî-nexwazî, weha ne...

## 2. Dewxwastin û kodik veşartin?!

"...Dema bahoz diteqe,
helbestvan timê li rex gelê xwe ye".
*(Valêrî Bryûsov, helbestvanê rûs*
*ê destpêka sedsala XX)*

Her çi jî hebe, wek ku min li jorê jî got, dewleteke redkar da û di rewşeke weha da, goftugoya li ser rê û şêwazên perwerdeya zimanê kurdî jî tiştek e!

Lê!... Û dîsa lê!...

Di bin sîwana PENa navnetewî da em, nivîskarên kurd berev bûne, û di pirsa mafê zimanê kurdî da nûnerên PENa navnetewî ji bo me mînakan disêwirînin: ew ji bo rewşa zimanê kurdî û mafên wî da bêhtir bi wêrekî helwesta xwe didin xuyan, bêhtir bi obyêktîvî û rêalîstî nêzîkî pirsê dibin, ne ku em – kurd.

Dema di welatekî da zimanekî ku bîst–bîstpênc mîllîon mirov pê diaxivin, heya qedexe jî kêm e, ku mirov bibêje, wî wek ziman jî nas nakin, û em li ser rê û rêbazên perwerdeya wî diaxivin, çiqas rêal e, gelo? Ma, çawa dibe, zimanê ku di welatekî da bi fermî nehatibe pejirandin, mirov çawa dikare li ser şêwaz, rê û rêbazên perwerdeya wî biaxive? Di sêrî da divê zimanê kurdî bi fermî. wek yek ji zimanên dewletê bê pejirandin, statûsa wî bi Destûra Bingehîn bê misogerkirin, paşê, anegorî wê, sazîyên dewletê saz bibin: *wezareta perwerdeyê, înstîtûtên akadêmî yên lêgerînî, zanîngeh û xwendegeh, dibistan û bindarûkên zarokan...* A, paşê mirov dikare ji wan sazîyan ra wek alîkarî cêribandin û zanînan pevbiguhêre... Li vir pirs a neteweкê, nasname, çand û zimanê wê ye! An- na!..

Ma ewropî, amêrîkî û cîhana din nizanin, ku netewek, a ku yek ji afrînêrên şaristanîya mirovayîyê ye, îro di KT da heya navê wî qedexe ye, ku henû mafên wî yên gerdûnî, mirovî û netewî, roj di nava rojê da, binpê dibin, ku welatê wî hatye dagerkirin, ne bes e, dagirkerê hatî di welatê wî da malxwêtîyê dike, zimanê wî dibire, çanda wî tune dike, gund û bajarên wî wêran dike... Lê hê jî ji bo berjewendîyên xwe ev zor û hêzdarên cîhanê bi serdarîya vî welatî ra bazarîyê û siyasetê dikin.

Û em, kurd jî ker û lal jêdayîyan (vêrgî) didin vê dewletê.

Ka, em li ewropîyan û amêrikyan binihêrin, çika li hemberî pirsên weha helwesta wan çi ye! Ew dibêjin: "Ji bo rêvebirin, parastin û misogerkirina mafên xwe em jêdayîyan didin, dewletê xwedî dikin, û divê ew jî bikeve xizmeta gel!" A me – kurdan çawan e? Beşekî byûcêya welêt ji van jêdayîyan (vêrgî) berev dibe, û hemû xercên dewletê ji vê diçin: *ên serekkomar, serekê serdarîyê (serekwezîr), wezaretan, artêşê, polîsan, hêzên ewlekarîyê, tendurustî, perwerde, çand, zanistê...* Û gelê me jî xercê xwe dide û ji her tiştî bêpar dimîne, ne bes e, ev sîstêm wî û henû nirxên wî tune dike, welatê wî wêran û talan

dike, zimanê wî qedexe dike. Ango, çi dertê holê, gelê me bi xwe kujar, wêrankar, zordar û mijovdarên xwe kirê dike, zikê wan têr dike, bi cil û pêlav dike, çekê dide destê wan, … ji bo ku…?!

Gelo dem nîne, ku gelê me vê yekê bibîne, ji bilî têkoşîna xwe ya siyasî – dêmokrasî, bi rêya dadmend û parêzerên xwe serî li dadgehên navnetewî bide, hem doza mafên xwe, hem jî doza wê bike, ku zyana ku heya naha gihîştyê, lê bê vegerandin...

Eger em û cîhan rastîyê dixwazin, divê ev pêk bê. Tenê bi vê helwestê û nêzîkbûnê cîhan dikare ji hêvîyên gelê kurd ra bibe bersîv... An, na, hemû gotin û axavtin vala ne!

Gelo wê hêvîyên cîhanê û gelê me bi vî awahî bêne bersivandin?

Dibe ku, eger Ewropayê û dewletên gewre û bi hêz ên cîhanî va bi "şermoketî" nêzîkî pirsê nebûna, derdorên nijadperest ên di nav dewleta KT da dê ewqas cesaret negirtana?!

## 3. Ji "tyûrbanomanîyayê", hevparîya serdarîya faşîstan, heya "bayrakomanîyayê"

...Bi rastî jî Tirkîya hem welatekî kontrastan e, hem jî yê ferzkirina kevneperestîyê ye. Tiştê ku di tu welatekî cîhanê da pêk nayê, di Tirkîyayê da bi hêsane pêk tê. Heya gelek tirk bi xwe, piştî ku cîhanê dibînin, zendegirtî dibin, ku ew bi xwe wisan in, lê, yek e, dîsa jî wek xwe dimînin.

Ma ji bîra kê çûye "pirsgirêka", ku parlamêntoya vî welatî da ji bo laçikekê çê bû – pirsa tyûrbanê... Du salan pirsa ku di vî welatî da li dora wê siyaset dihat kirin, çapemenî û têlêvîzîonê li ser diaxivîn, laçika parlamêntereke jin bû.

Dibe ku tenê di vî welatî da faşîstan (ên ku bi fermî xwe netewperest nav dikin, êdî em di derbarê yên din da nabêjin!), wek ku agirê berî gûrnîyan bidî, xwe gîhandin piranîya endamên Parlamêntoyê û wisa jî zû temirîn. û van hilbijartinên dawîyê da hîç cîyek jî qazenc nekirin. Dîsa jî, ji ber ku ev tevgera dewletê bi xwe saz kirye, dema ku pêwîst be, derdixe pêş. Ango, bi taybetmendîyên xwe va ew kêrî her serdarîyekê jî tê, ji ber serdarî di vî welatî da hertim di kûrahîya xwe da ji vê hiltê. Bala xwe bidinê, tiştê ku polîsên vê rêjîmê anîn serê jinên ku derketibûn ji bo pîrozkirina 8-ê adarê, mirovayê kêm dîtye, rêjîmên here paşverû serê xwe li keviran xistine, êdî em di derbarê gullekirina zaroka 12 salî û gullebarankirina meşvanan da nabêjin... Û li ser vê tonê rêjîmê bawer dikir, ku ewê çavê gel tirsandye, wê êdî wêrekîya wî têrê neke, derkeve serhildanan.

Lê Newroza îsal ew hemû hêvî û bawerîyên wan vala derxistin, tenê di Amedê da ji mîllînekî zêdetir gel beşdarî Newrozê bû. Û di nav wan da jî gelek çavdêrên bîyanî û beşdarên sêmînara me hebûn.

Û rêjîm har bû... Vê carê ewê çeka xweye here cêribandî bikaranî – provakatsîon!

Li Mêrsînê, dema gel bi alên netewî û wêneyên Serokê netewî va dimeşîya, yekî bi cilên sivîl ala KT dide destê zarokekê, û zarok jî wê vîalî-wîalî bawerdide, li erdê dixe... Û kamêrayên ji berê va amadekirî vê hiltînin. Pîşt ra hemû rêsûrsên dewleta fermî dikevin xizmeta kevnemayîyên faşîstan û dest bi hîstêrîya dijî kurdan dibe.

Dest pê kirin kurdan û Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî di gunehên nebûyî da tewanbar bikin...

Em matmayî bûn, tu dengekî durist û tendurust ji rewşenbîrên tirk derneket, kesekî şermezar nekir, kesekî negot, ku, eger bêhurmetî ji alê ra hatîye kirin, ew ji hêla wan va pêk hatye, yên ku ev provokatsîon çêkirin, ên ku ji bo xatirê armancên xwe yên qirêj û kirêt ala welatê xwe avîtine nav dest-pêyên zarokan. Ên ku di bin wê alê da tevkujî û wêranî di welatê wan zarokan da pêk anîne û bi wê ew al kirine sembola kevneperestîyê, tevkujîyê û wêranîyê. Û li vir kevnefaşîstên tirk (ên ji MHP – Partîya tevgera netewperest) ev kozîr revandin û derketine kûçeyan, heya dawîya adarê jî li hemû deverên Tirkîyayê ji hêla dewletê û faşîstan va ev agir dihate gurkirin. Polîsan belevok belav dikirin, bi zorê davîtin erebeyan, banga meşa şermezarkirinê dikirin.

Û kesek tê nedigihîşt jî, ka ev hemû ji bo çi pêk tê?

Û yên ku derxistin kûçe û kolanan jî karmend û peywirdarên dewletê û der-dorên wan bûn.

Di Stambûlê da xortekî tirk bi hêrs qala wê bûyarê dikir û "bayrak, bayrak!"a wî bû. Min ji dostê xwe pirsî, ka ew çi dibêje, got: *"Dibêje, ku ev dîn bûne û gelê me jî bi xwe ra dîn kirine, van mejûyê gel xwarine,* – dibêje, – *di Amêrîkayê da ji parçeyê ala dewleta wan nîvderpêyan (kîlot) didirûn û tu kesek tiştekî nabêje!... Zarok li ku, siyaset li k'u?!"*

Lê hema 27-ê adarê MHP-ê di Stambûlê da meşek li dijî kurdan lidarxist. Derketin ser "İstikrar cadesi"-yê (kûçeya Aramîyê-???) û diqîryan: "An ji Tirkîyayê hez bikin, an jê derên!", "Lêxin, lêxin, bila binalin, û dengê wan bigihîje Ewropayê!", "Yên ku alan bişewitînin, emê jî wan bişewitînin!" "Serokê van darda bikin û wan jî bişewitînin!" û tiştê wek wan, ên ku tenê ji mejûyê nexweş dikaribûn derên.

Em sekinîbûn û me metmayî li wan dinihêrî. Hinek fîlmên dokûmêntal ên salên 30-î yên sedsala bihurî dihatin ber çavên mirov, dema faşîstên hîtlêrî di kûçe û kolanên Bêrlînê ra bi marş dibuhurîn...

Li vir hinek çavsor bibûn û bi çepikan agir bêhtir gur dikirin, lê hinekan jî xwe dabûn hêlekê û bi çavên tije tirs li van kevnefaşîstan û qîje-vîja wan dinihêrîn.

Stambûl bibû derya alên sor ên bi hêker û stêrk: li ser xanîyan, ofîsan, erebayan, otobûsan, li pencereyên dikan, ofîs û malan va, di hemû bazaran da ji eşya û xurek zêdetir alên KT bûn. Heya alek li pencereya wê dikanê va daliqandibûn, a ku cilên jinan ên binî rêklam dike û difiroşe, û ew al jorda li ser wêneyê jineke tazî va mêl bibû û dimilmilî, lê jina ku rêklama cilên binî dikir, tuyê bibêjî, ji tabloya rêklamê, li van tiştan dikenya.

Ma êdî mirov bi xwe çawa xwe rezîl bike!?

Şerma cîhanê!

Em vegerîyane Moskovayê, têlêvîzîonên Tirkîyayê hîn jî meş û mîtîngên dijî kurdan germ dikirin... Û van hemûyan jî rêjîm destek dike û helanan dide wan. Ji bo çi, dibe ku ew êdî texmîn dike, ku rojên xwe yên dawîyê jiyan dike?! Lê dinihêrî û nema têdigihîjî – ev çi ye, çi dixwazin û vî welatî bi ku va dibin? Gelo bi van provakatsîonan û germkirina hîstêrîya dijî kurdan KT çi qazenc dike, gelo evên van tiştan tevdidin kî ne, dostên gelê tirk in, an neyarên wî ne? Bi tiştên weha vala û arzan wê heya kengê vî gelî bixapînin? Ka, dengê rewşenbîrên welatparêz ên welatê xwe li ku ye? Ka dengê Yaşar Kemal, ê ku di nameya xwe da li hember xeterên ku ji globalîzmê tên, em hişyar dikirin?! Ma ev tiştên ku îro dibin û yên ku di vî welatî da bi sedsalan pêk hatine, berhemên globalîzmê ne? Ev hemû gelo ew kenc û tengîyên hindurîn nînin, ku ji bo hatina globalîzmê amadekarîyê dikin û rê li ber wê vedikin?

Her çi jî hebe, Tirkîya ketye ber tengîyê, çokvedaye erdê, ka wê çi bîne cîhanê, hîn kesek nkare bibêje!

Pirs in, pirs in, pirs in û pirs!

## 4. HESKÎF: di navbera mirin û jiyanê da... (SOS!)

Bîstûsêyê adarê piştî firavînê beşdarên sêmînarê çûne Heskîfê – bajarê dîrokî. Ev peykerê dîrokî, yê ku îro dikare sertaca berhemên huner û sewdayê mirov bê navkirin, û mirovahî dikare pê serbilind bibe, rêvebirîya KT plan dike, bi avakirina bendavekê, wî di bin  avê da winda bike. Gelo ew herêm bêyî wê bendavê nikare bijî? Armanc çi ye? Ev peykerê dîrokî, divê ne ku bikeve bin avê, berovajî wê, divê ji hêla dewletê va bê parastin. Lê eger hêza wê têrê neke, divê bang li rêxistin û sazîyên navnetewî, yên wek UNESKO-yê, bê kirin, û ev kevnemayê dîroka kevnar ji bo dihatûya mirovayê bê parastin.

An – na, êdî çi ferqî di navbera rêvebirîya KT û talîbanên Afxanistanê da, yên ku peykerên bûddîzmê dane ber topan...



**HESKÎF – piştî sazkirina bendava Îlîsûyê tiştek dê ji vî peykerê kevnar ê dîrokî nemîne….**

Ji bo piştgirîya Heskîfê gelek sazî û rêxistinên navnetewî – û kesayetîyên navdar dengê xwe bilindkirine.

PEN-a navnetewî jî, wek rêxistina nivîskaran a navnetewî wê ji sazî û rêxistinên navnetewî ra nameyan bişîne, di konfêrans û hemcivînên (kongrê) xwe da pirsgirêkên Heskîfê bîne zimên, bala civaka navnetewî bikşîne ser pêwîstîya parastina vî peykerê dîrokî, û rê û rêbazên pêkanîna wî karê pêwîst pêşnîyar bike.

Heskîf benda piştgirîyê ye, lê dema yek dibêje, divê yê ku dibihê jî hebe. Eger serdarîya KT a îro ji van dengan ra guhê xwe bigire, divê sazî û rêxistinên navnetewî li hemberî wê sanktsîyonan pêk bînin...

Heskîf benda mirovîya mirovahîyê ye!

**19 – 30. 03. 2005.** **Moskova – Stambûl – Amed – Moskova**

# YEKÎTÎYA NETEWÎ YE ERÊNÎYA DEMÊ![15]

…Û ta îro jî, wek wan pêşîyên xwe,
Ew dijminê me dîsa maye ew,
Ger lê pêwîst be, me dighîne xwe,
Lê-k hema dem hat, me zol dike ew!...
(Ji poêma "Dojeh")

Eva demek a dirêj e, ji wan bûyeran, ên ku li Kurdistanê pêk tên, sewdayê mirov bêzar bûye, ew dike û nake, nikare serederîyê ji wan bike û bersîveke heşmendî bibîne. Bi rastî, mirov êdî ji şroveyên berê jî westyaye, dibîne, ku di vê cîhanê da *"li cîyekî tiştek wisa nîne"*. Jixwe şermezarkirina dijminên hov û har jî em negîhandine tu encamê... Mirov çawa mirovên bêexlaq û bêşerm şermezar bike? (Me ew şermezar kirin, û wan jî şerm kirin!?)

Mirov ji çi hêlê va li pisgirêkan dinihêre, sedemên peydabûna wan û rêyên çareserîyê ji bo wan digere, dîsa encam ew e: *"li cîyekî tiştek wisa nîne!"* Mejûyê mirov bi hêbet dikeve tevgerê, sewdayê wî hewl dide çirûskeke ronahîyê bibîne, lê encam dîsa ew e – bêencamî!

Heşê mirov ê normal êdî van tiştan ranagire!

Çima?

Û dîsa mejû agahîyan leber dike, sewda jî dîsa bûyerên îro û yên dîrokî tîne rex hev, hemberî hev dike... Lê dîsa *"tiştek ne wisa ye!"* Mejû vê carê derfetên xwe yên veşartî dike tevgerê, sewda heya dawîyê di nav zexîra ramanên xwe ya hezarê salan da digere, dixwaze mînakekê bibîne, lê dîsa...

Dîsa hewar û hêwarze ye! Dîsa guregura fr'oke û tankan e! Dîsa gund û bajar wêran dibin! Dîsa mirovên sivîl tên qetilkirin... Vê carê jî di nav girtîyên siyasî da du hezar zarok zêde bûne, ji ber ku wan kevir avîtine tank û panzêrên artêşa dagerker.

Ev Bakûr e!

Li parçeyê Welêt ê rojhilatê, ji ber ku doza zimanê dê û mafên gelê xwe yên mirovî û netewî kirine, mirov hatine dardadikin – mamosta û rewşenbîr! Lê li parçeyê Welêt ê başûr –rojava mirov weke sîyê digerin. Tuyê qey bibêjî, ew bi fîzîkî hene, lê hebûna wan naê pejirandin, ew heya ji mafê hemwelatîya bindest jî bêpar mane. Eger wan dipejirînin jî, para wan zindan e, zindana bê dawî. Wisa ye, me hêjayî navê hemwelatîya mêtîngehî ya bindest jî nakin! Li başûrê Welêt jî hê nû pêra gîhandine birînên Helebçê kew bigirin…

Û ev hemû Kurdistan e!

Şerm bike Cîhan, eger taybetmendîya şermkirinê li bal te hye!

Ber xwe bide Kurdistan – berxwedan jîyan e!

*
* *

...Îro dîsa pirsgirêka kurd (rasttir dibû, ku mirov bigota: hovîtîyên rêjîmên serdest li hemberî gelê kurd!) di navenda bala raya giştî ya cîhanê da ye.

Û tiştê ku mirov zendegirtî dihêle jî, ew e, ku rastîya vê pirsgirêkê li ber çavan e, û, eger xwsteka cîhanê ya mirovî hebûya, ev pirsgirêk wê bê astengîyên giran bihata çareserkirin.

Hemû jî dizanin, ka mercên çareserîya vê pirsgirêkê çi ne! Ew mafên mireovî û

[15] Gotar di malpera www.pen-kurd.org da hatye weşandin.

netewî yên gelê kurd in! Weke yên gelên xwedî dewletên serdest – ne kêm û ne jî zêde! Û ya balkêş jî ew e, ku gelê kurd û Rêberê Tevgera Netewî ya Azadîxwaz birêz Abdullah Ocalan ne carekê û ne jî duduyan, gotine, ku ew ne dijî hebûna dewletên heyî yên herêmê ne, ku her dixwazin, di nava sînorên wan da mafên gelê kurd jî wek wan gelan hebin, yên ku bi navê wan dewlet hatine naskirin. Û ji bo wê çend caran bi yekalî agirbest jî pêk anîne.

Û tiştên ku kurd dixwazin jî, xwezayî ye. Mînakên wisa di cîhanê da, çqasî bibêjî, hebûne û îro jî hene: Yekîtîya Sovêtê, Fêdêratsîona Rûssîyayê, Çêxoslovakîya û Yûgoslavîya Fêdêral (ya ku bi destê zordarên vê cîhanê hate rûxandin), Bêlgîya û hinek dewletên cîhanê yên dinê.

Lêbelê dewletên herêmê yên dagerker, her yek weke xwe mafê gelê kurd binpê dike, li hember wî tevkujîyê pêk tîne, ziman û çanda wî inkar û qedexe û tune dike...

Dibe ku di cîhanê da ewqas pirsgirêkên gelan hebûne, heya hinek ji wan ji ya gelê kurd bi pirsgirêktir bûne, lê çareserîya xwe dîtine. Lê ya gelê kurd? Ev dused salî zêdetir e, ew ji bo mafên xwe ditêkoşe, lê çareserî hê jî nehatye. Û çareserîyê li hêlekê bihêlin, heya hebûna gelê kurd tê înkarkirin. Û KT ji bo vê înkarê li cîhanê bide pejirandin, li hember gelê kurd siyaseta têrora dewletê û tevkujîyê dimeşîne, ziman û çanda wî tûnedike... Bi prênsîpa: ger kurd nemînin, pirsgirêka wan jî wê êdî nemîne!

Û ev cîhan jî, ya ku xwe şaristanî dihejmêre, van tiştan dibîne, lê xwe şûna ker û koran datîne…

*

*   *

… Ew, ku berjewendîyên dewletên gewre di herêmê da hene, terefekî pirsê ye. Û, ji bo wê jî, dema Tirkîya hovîtîyaên fermîkirî li Kurdistanê pêk têne, dewletên Ewropayê û DYA vê bi bêdengî pişt guhê xwe va davêjin. Lê, dema di çalakya li dijî wesaîta eskerî ya dagerker da dota fermandarekî tirk dimire, ji Ewropayê dengê şermezarêyê tê bihîstin.

Ma ev çi ye? Eger pirsa şermezarkirinê heye, divê fakta dagerkirina axa kurdan û rewşa leşkerî û opêratsîonên artêşa tirk bên şermezarkirin. Ya din jî, eger dilê ewropîyan ewqas li eskerê dagerker ên tirk û zarokên wan dişewite, çima wî şerî nadin ranewestandin, hema ji bo xatirê wan!? Çima destûrê didin, ku ew esker bi tank û top û balafiran êrîşê bibe ser welatekî din, wêran û talan bike, jin, zarok, kal û pîrên wan bikujin, û bi xwe jî bên kujtin? An bi qanûn û exlaqê ewropîyan ev hemû ji wan ra tê ye, lê, ku kurd bersîvê didin êrîşên wan, netê ye?

Belê, wisa ye, îro kîjan dewleta herêmê li dijî gelê kurd çi jî dike, di wir da destê derva heye! Ew dewlet, ên ku Kurdistan dagerkirine, û xweyîyên wan ên derva di sûcê dijî kurdan da hevkar û hevparên hev in.

Dewletên gewre, yên ku di dest wanda hêza çreserîyê heye, di pirsa kurdî da terefê bêçareserîyê digirin...

Lê dîsa jî, eger rêvebirên dewletên herêmê hema hinekî bi berjewendîyên gelê xwe bifikiryana, ev rewşa aloz wê ne li holê bûya.

Dixwazî tê bigihîjî, lê ev tişt, ên ku pêk tên, bi heşmendîya normal naên şrovekirin...

Eger em di derbarê berjewendîyan da dibêjin, li ber çavan e, ku çiqas berjewendîyên gelê kurd di çareserîya pirsgirêka kurdî û aştî û aramîya herêmê da hene, ewqas jî – yên gelê tirk... Wê demê ev çi ferzkirin e di şêr da? Wê demê mirov çawa dikare van mirovan, ên ku vê siyaseta şêr dimeşînin, normal bibîne?

De wer e û têbigihîje: ev 30 salî zêdetir e, ku PKK ji bo mafê gelê kurd ê rewa têkoşînê dimeşîne (26 sal jê – têkoşîna çekdarî). Û ev sîh sal in, her carê rêjîma KT dibêje: “Emê biqedînin!” – Ku: “Heya yek apoçi jî mabe, emê şêr bidomînin!” Û li pey hev hukumat tên guhartin, lê têkoşîna PKK-ê bi hêztir dibe... Û her carê ji hêla rêvebirîya Têkoşîna Rizgarîya Netewî va tê gotin, ku ew amade ne, pirsgirêkê bi rêyên dêmokratîk çareserbikin, û, eger ji mafên gelê kurd ra bê rêzgirtin, ewê şêr rawestînin. Lêbelê

hukumetên KT her carê di şêr da ferz dikin û têk dicing... Û her carê, desteya ku nû tê, jinûva vî şerî gur dike...

Û bi vî awahî serdarîyên vî welatî gelê xwe dixapînin, ji armanca wî dûr dixin û berê wê didine armanceke bêwte û vala....

Naha jî dora AKP-ê ye!

Û li vir pirs dertên holê:

– Ev şera şerê kê ye?

– Çima ji nava desthilatdarîya vî welatî hêzeke çareserîyê ranabe û nabêje: "Êdî bes e, em xwîna gelê xwe birijînin!"?

– Gelê Tirkîyayê li hember bêdadîya rêjîma xwe çima wisa bêdeng e? …

*

*   *

Helbet, eger Kurdistan di navbera welatên şaristanî da hatibûya dabeşkirin, eger ev bûyerana di welat an herêmeke normal da pêk bihatana, dibe ku bersîvên van pirsan jî normal bûna. Lê li vir pirsgirêk a Kurdistanê ye, û ev welata jî mêtîngeha (kolonî) navnetewî ye. Rast e, welatê kurdan di navbera çar dewletên herêmê da dabeşkirî ye, lê her yek ji wan jî ji hêla xwe va xweyîkî xwe li derva heye. Û, dema pirsgirêka kurdî tê holê, hem dewletên herêmê, hem jî xweyên wan ên derva hemû nakokî û dijminatîya di navbera xwe da ji bîr dikin û li dijî kurdan dibin yek. Mînak, baş tê zanîn, ka DYA û Îran dijminên hev ên çi astê ne. Lê, dema li Ewropayê kampanîya li dijî KNK-ê, ROJ-tv û sazîyên kurdan ên din destpêbû, bi rêvebirên Kongrêya Gel Remzî Kartal û Zûbêîr Aydar ra wisa jî serokê PJAK-ê (partîya kurdî, ya ku di Îranê da ji bo mafên gelê kurd ditêkoşe) Hecî Ahmedî jî bi fermana DYA hate girtin...

Di nava vê konsêptê da wisa jî hewlên tevgerkirina pakta (hevpeymanî) dijî PKKê (bixwîne-dijî kurd) ya sêalî ya **DYA-Tirkîya-Îraq**-ê dem bi dem aktîv dibin.

Eger em vê yekîtîya antî-kurd hemberî yeke din (dîsa ya antî-kurd!) a **Tirkîya-Îran-Sûrîyaê** bikin, wê bê xuyanê, ka em-kurd, ji bo ku bikaribin berjewendîyên xwe yên netewî biparêzin, divê giranîya xwe bidin ser kîjan milê têkoşîna netewî û berê wê bidine ku...

Lê di rewşeke weha da, wek prênsîp, dema di cîhanê da li dijî me-kurdan yekîtîyên cuda tên avakirin, di nav stratêgêya netewî da ji bo me ji bilî **YEKÎTÎYA NET'EWÎ** tiştekî dinê nikare hebe û pecan be! Hebûna gelê kurd bi giştî, hebûna her parçeyekî Kurdistanê, heya hebûna kurdekî tenê jî, her dikare bi yekîtîya netewî misoger bibe!

Emê tenê bi yekgirtî bikaribin li hember van êrîşên navnetewî berxwebidin, xwe li ser pêyan ragirin û di vê cîhanê da bigihîjin mafên xwe yên mirovî û netewî.

**<u>Li şûna peynivîsarê:</u>**

Destpêka meha hezîrana 2010-an ez ji Moskovayê difiryame Stambolê, ku ji wir jî derbazî Amedê bibim. Li vir divê konfêransa navnetewî ya zimanê kurdî pêk bihata.

Di balefirgehê da mirovek nêzîkî min bû û bi rûsîyeke şkestî dergehê berbi firegehê ji min pirsî... Em bi hevra berbi dergeh va meşyan. Li cîyê sîyarbûna balafirê min ji mirovê nenas pirsî:

– Hûn jî difirine Stambûlê?

– Belê, Stambûlê! Êdî 10-11 sal in, ez li van deran im, kirîn-firotina kincên binî va mijûl im... Tû çi dikir'î-difroşî? – Ewî ji min pirsî.

– Ez? Ez dikirim–nafiroşim… – Piştî navbereke kurt min domand, – Bi ziman û wêjeyê va mijûl im. – Min bi nîvlaqirdî bersîva wî da.

– Têgihîştim, - got û destê xwe dirêjî min kir, – K'emal, – ewî kurt birî.

Min jî destê xwe da destê wî û navê xwe got.

– Balkêş e, tu jî misulman î?

– Çima, ev nav li ser kê be, divê ew misulman be? – Min bi pirs bersîva pirsa wî da. – Ez kurd im, – min rê li pêşîya pirsên din birî. – Ez li xerîbîyê hatime cîhanê, diçime Welatê kal-bavên xwe...

– Balkêş e, hûnê li wir bi çi zimanî bi hev ra biaxivin?

– Helbet, bi kurdî!

– Kurdîya we bi hev digire?

– Helbet, heger destê neyaran nînbe, kurdê bêhtir hev fêm bikin…

Û axavtina me çû, derket pêwendîyên gel û netewan, siyasetên dewletan… pirsgirêka gelê kurd…

Derk’et, ku K’emal, mêla wî berbi çepgiran e (bi gotina wî!). Min li ser wê mijarê nêrîna xwe anî zimên:

– Di Tirkîyayê da bi xwezayî çepgir nikarin hebin, li wir her tenê baskê tirkçîtîyê yê çep an jî yê rast dikarin hebin. – Min got û li ser da zêde kir, – û di pirsgirêka kurdî da jî hemû çep û rastên Tirkîyayê yeknêrîn in…

Evê te hinekî xwe xeyîdand, got, ku ez di vê pirsê da ne ewqasî rast im. Min got, ku Xwedê bike, ez di vê pirsê ds ne rast bim, lê ka reng û rûçikê mirovî yê rewşenbîrîya tirk, ew çep dibin ewana, an – rast, zêde ne pirsgirêk e? – Dema li qulçekî cîhanê tilîya yekî misulmsn xwîn dibe, – min gotina xwe domand, – hûn dikin qûrîn û hewar, xwe vedikutin, ma çima ji bo siyaseta têrora dewletê û tevkujîya li hemberî kurdan dengek ji we dernayê?… 2000-î zêdetir zarokên kurd girtîne û di îşkenceyan ra derbas dibin, siysetmederên kurd, yên ku doza aştîyê dikin, bi zimanê xwe diaxivin, têne darizandin û girtin.

Kemal serê xwe kiribû ber xwe û guh dida axavtina min. Bihîst, bihîst û wek ku mirovekî ji êşa dil vecniqe, serê xwe bilind kir:

– Naha hûn dibêjin ji bo van hemûyan gelê tirk gunehkar e. Helbet, di vî gunehî da para gelê me jî heye, lê van merivxurana tirk û tirkîtî ji xwe ra kirine sîwan û kirên xwe yên kirêt di pişt wê da vediþêrin… Di pirsên bingehîn da ez jî wisa difikirim, lê hinek tişt hene, ku divê mirov bide ber çavan. Eva ku ezê ji we ra bibêjim, dîsa hevalên min hene, ku li ser wê nêrînê ne…

Hûn nabêjin, ka ev deh salan zêdetir e, ez li derveyî welatê xwe çi dikim? Tiştin hene, ne bi dilê me ne jî, lê tiştek ji destê me nayê.

Dibe ku di cîhanê da kêm mirov hebin, ên ku di derbarê nexweşîyên ji bo mirovayîyê û rewiran tehlûke da nebihîstibin. – Ewî gotina xwe domand. – Cîhana îro bi pergalên ragîhandinê dewlemend e, û di derbarê van nexweşîyan da civaka cîhanê agahdar dike. Lêbelê, ez dibêjim, hê nexweşî mane, yên ku ji hêla mirov va nehatne nasîn.

Tê bîra we, dema kampanîyayên li dijî nexweşîyên AIDS, çilmasîyên (grîp) cuda-cuda (ya mirîşkan, ya xinzîran û yên dinê) çapemanîyê, radîo û têlêvîzîonê karekî çawa aktîv dimeşandin?! Sazîyên tendurustîparêz wisa jî bi aktîvî li dijî rengên cuda yên nexweşîya harbûna seyan û rewirên dinê têkoşîn dimeşandin û îro jî dimeşînin...

Dibêjin, ku gelek nexweşîyên rewiran derbasî mirov jî dibin, lê di derbarê nexweşîya harbûnê ya seyan û guran da mirovayî bêdeng dimîne. Em dizanin, dema seyê har mirov digire, ew mirov dikare bimire, û ji bo wê jî ew demeke dirêj divê bê derzîkirin...

Ez dibêjim, mirov wekî din jî nexweşîya seyê har dikeve. Û, bi nêrîna min, ew nexweşî di nava serokdewlet û rayedarên hinek dewletên Rojhilata navîn da bi veşartî belav bûye, wek kanîballîzm (merivxurî) di nav afrîkîyan da. Lê, eger wisa nînbûya, ew tişt, ên ku di van dewletan da dibin, mirovên normal dikaribûn pêk banîyana?.. Helbet, na! Hûn dikarin bawer bikin, an- na, lê heqê we nîne, ku hûn li ser vê nefikirin, …– Wî dixwast dîsa tiştek bigota, lê em dawetî balefirê kirkin, û her yek ji me derbazî cîyê xwe bû.

Di balefire da gotinên Kemalê tirk tevatî nedidan min. Û mitale li pey mitaleyan dihatin serê min:

– Balkêş e, wek ku tê xuyanê, ne mirovekî sade ye jî...

– Tiştê wisa gelo dikare bibe?

– Lê eger bi rastî wisan be?

– Ger ne wisa ye, lê çi ye? Tiştên ku van kirine, çi ya seyên har û merivxuran kêmtir e, û Ferqa di nav wan da çi ye?

– Ferqa di navbera wan da her tenê ew e, ku di derbarê serokdewletê kanîbalîst (merivxur) û seyên har da hatye nivîsandin, lê di derbarê harbûna hinek serokdewletan da – na. – Dengekî di nav min da hêdî ev gotinan serhevda anîn.

Û, eger ew bi rastî wisa be, wê demê mirovayî divê çawa xwe ji van seên har biparêze? Di sêrî da rayedarên dewletên gewre divê bi xwe bifikirin, an – na, eger, Xwedê neke...

Lê ya gelê kurd?

Gelê kurd? Em dibêjin, wî di dîrokê da gelek lîstik û delk û dolab û tiştên bi tehlûke dîtine û baş dizane, ka wê çawa bikaribe ji vir û pêva xwe û welatê xwe ji êrîşên seyên har biparêze!..

**08. 10. 2010.**

# TAYBETMENDÎYÊN VÊ PÊVAJOYÊ Û PEYWIRA ME–KURDAN[16]

*Ger dê hebûya me îtîfaqek,*
*Vekra bikira me înqîyadek,*
…………………………..
*Tekmîl-i dikir me dîn û dewlet,*
*Tehsîl-i dikir me ilm û hikmet…*
**Ahmed ê Xanî**

Salek jî bihurî ...

Û, dema li pêvajoyên Cîhanê û Kurdistanê dinihêrî, carek a din zendegirtî dimînî: her çiqas, di cîhanê da pirsgirêkên gelek netewên dinê jî li zor û cefayan ra derbaz bûne, lê dawîya dawîyê anegorî heş û sewdayê mirov, bi awayekî çareser bûne. Lê, dema mirov li pirsgirêka kurd dinihêre, li ser rêya çareserîya wê astengîyên wisa dertên hole, ku Dîroka mirovayê li ber wana bêzar dimîne û vedigere, weha matmayî awirekî paşva davêje, dixwaze mînakek a wisa bibîne, lê – bê feyde…

Dibêjin, dîroka mirovahîyê ya têkoşîn, şer û pevçûnan e – di navbera gel û welatan da. Tê zanîn, ku gelên cîhanê yên bi hêz û tevger welatên gelên dinê dager kirine, sererd û binerd û rêsûrsên wan ên mirovî ji bo berjewendîyên xwe bikaranîne, lê tu carê armanca tunekirina wan gelan, an qedexekirina ziman û çanda wan nedane pêşîya xwe. Berovajî vê, wan komên zanistî-lêgerînêrî (êkspêdîtsîon) sazkirine, ji bo ku di warê ziman û çanda gelên dagerkirî û bindest da lêgerînan pêk bînin. Ev jî wan ne ji bo wê kirine, ji ber ku ji dagerkerên welatê me bêhtir mirehez bûne. Na! Ji ber ku ew ji van bi heş û biheştir bûne. Ji ber ku bi wî şêwazî ewana karên xwe yên mêtîngerîyê û mijovdarîya xwe hêsantir û baştir pêkanîne û zêdetir ji welatê dagerkirî sûd wergirtine… Ango, armanca wan berjewendî û sûdwergirtin bûye. Lê ya dagerkerên welatê me ne ev e. Armanca wan tunekirina gelê me ye – wek netew. Di dîroka xwe da van eşîrên nîvkûvî-nîvhov, heya xwe bi vê herêma Cîhanê ra gîhandine, li ser rêya xwe çendik-çend çand û şaristanî tunekirine!? Naha jî dor gihîştye gelê me, lê ew jî wek hestuyekî di gewrîya wan da hasê bûye.

Û ev koçerên derî şaristanîyê hatine, di welatê me da bi cî û war bûne û înkara hebûna me, zimanê me, çanda me ya hezarê salan dikin. Wek ku gelê me gotye: *“Hate cîyê min, rabû rûyê min!”*

Belê, matma bibin, eşîrên koçer li ser pişta deve û hêstiran hatine li welatê me xwedî derketine û hem me bi fîzîkî tune dikin, hem jî ziman û çanda me înkar û qedexe dikin! Gelê me jî, eva êdî çend sedsal in, rêyên xwerizgarkirina ji vê rewşê geryaye, heya hatye-gihîştye vê serdemê: û îro jî bi rêya têkoşîna siyasî, civakî-dêmokrasî, çandî û leşkerî doza mafên xwe yên netewî dike.

Di dema xwe da pêşîyên me, wek netew, her tiştê xwe wisa bi destê dagerkeran va berdane, ku ew bare dîrokê yê giran nivşên vê sedemê ra hiştine. Û ev nivşana jî îro wan şêwazên têkoşênê yên cuda bikartînin, ji bo ku wan mafan, ên ên ku pêşîyên wan bi destê dagerkeran cva berdane, careke dine li gelê xwe vegerînin. Û li ser vê rê gelê kurd bi dehezaran pakrewan dane, ...heya ku îro merc û derfet çê bûne, ku pirsa duzimanîyê tê govtûgokirin. Helbet, di vê rewşê da dibe ku ev jî pêngavek be li ser rêya çareserkirina giştî ya pirsgirêka netewî… Lêpbelê, pirs di wê da ye, kaa divê em – kurd dive doza duzimanîyê çawa têbigihîjin?

Eger duzimanî ji bo hemû Komarê be, tiştekî normal e, lê, ger tenê ji bo me kurdan

---

[16] *Ev gotar di dema xwe da di malperên www.pen-kurd.org û www.mezopotamya.gen.tr da hatibûye weşandin.*

be!?... Wê demê wê kal û pîrên Kurdistanê, jin û mêrên ku rûyê dibistanê nedîtine (ji xwe ew bi mîllîonan in!), ên ku peyvekê bi tirkî nizanin, dê pirsa wn çawa be? Eger em di derbarê mafên mirov da diaxivin, wê demê bila kal û pîrên tirk jî hewl bidin, ku zimanê kurdî fêr bibin (û ev jî bi destûrî be!), bila di dibistanên beşê tirkî yê Komarê da zimanê kurdî wek zimanê duyem perwerde bibin… Eger wisa bibe, ji bo demek a navberê ev dibe bêhnek be, û wê bibe pêngavekê li ser rêya destanîna hemû mafên xwe yên netewî…

Ev radeyek e li ser rêya têkoşîna rizgarîxwaz a netewî. Lê ji bo çareserîya hemû pirsgirêkan Destûrek a bingehîn pêwîst e. Û di wê destûrê da divê mafên gelê kurd mîna û weke yên gelê tirk bên misogerkirin. Eger di Destûrê da bê nivîsandin, ku Komar ji du netewên sereke – ji kurd û tirkan pêk tê, ku herdu netew (her weha kêmnetew jî di nav da) ji hêla mafan va weke hev in, ku di Kurdistanê da zimanê fermî kurdî ye, lê yê duyem jî tirkî ye. Her wisa jî di beşê Komarê yê Tirkîyayê da zimanê tirkî yê dewletê yê yekem e, lê yê duyem kurdî ye… Lê ya sereke, divê hemû ziman, wêje û çand û hunerên gelan ji bo pêşkevtinê ji hêla dewleta navendî va weke hev bên parastin, pêşxistin û fînansekirin.

Wê demê hem wê pirsgirêkên heyî bên çareserkirin, hem jî wê rê li pêşîya spêkûlîtsîonan bê girtin, hinek, ên ku di navberê da mane, wê li ser nakokî û têgihîştinên ji hev cuda nanê xwe qazenc nekin. Û ya here girîng, wê aştî û aramîyê bên vê herêmê.

Eger wisa nînbe, mafê gelê kurd heye, têkoşîna xwe bi hemû şêwe û şêwazan, ên ku di Rêzika Netewên Yekbûyî da hatine pejirandin, bidomîne.

Gelê kurd derseke baş ji dîrokê deranye: *“Tu kes mafan nade mirov, mafan ji wî distînin!”*

Û li vir jî jêdera sereke ya *“Her netewek tenê bi xwe dikare mafên xwe bi dest bîne!”* dertê hole.

Tevgera azadîxwaz a di bin serkêşîya Rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan da gelê me gav bi gav nêzîkî destanîna mafên netewî kirye, lêbelê îro ew pêvajo demeke pir bi girêk, zorî û tehlûke ra derbaz dibe. Ji hêlekê va dewleta tirk di girtîgehê da bi rêberê netewî ra danûstandinan pêk tine, ji hêla din va êrîş û opêratsîonê leşkerî ên li ser herêmên Kurdistanê ranawestîne, dewlet artêşek a taybet amade dike, merivkujên hizbullahî serbest berdide. Ji bo çi? Helbet ne ji bo aştî û aramîya welêt: çiqas tevlihevî hebe, ewqas ji bo desthilatdarîyê baş e…

Û, eger dewlet dibêje, ku ew ji bo çareserîyê amade ye, lê AKP asteng e, ku ew û AKP ji hev cuda ne, wê demê bila bibêjin, ka hukumet ya kê ye. Eger di navbera dewletê û hukumetê da nakokî hene, bila wê demê bibêjin, ka dewlet di destê kê da ye. Dîrok baş dizane, ka, dema hukumet dijî dewletê yan ne wek wê tevgeryane, dewletê çawa ew vala derxistine û tunekirine. Ji bo dewletê hîç pirsgirêk nînbûye: ewê di nava kêlîyekê da ya xwe anye sêrî...

Û, eger di vê rewşê da rêvebirîya AKP-î hê li ser desthilatdarîyê ye, wê demê hemû gotinên “dewletê” “qurişekî kor” nakin, bila herin, wan çîrokan ji parkên xwe ra bibêjin.

Ev – wek awireke giştî li ser pêvajoyê!

*

*   *

Naha em bên ser a me – kurdan, ka di vê rewşê da helwestek a çawa ji me tê xwastin, bi taybet jî, ji rewşenbîran.

Rêberîya netewî ya stratêjîk ji bo çareserkirina pirsgirêka netewî rê û rêbazên siyasî, dîplomasî û tevgerî digere û di praktîkê da pêk tine, gelê kurd li ser pêyan e, garantîya hemû maf û nirx û hêjayîyên netewî – Hêzên Parastina Gel peywira xwe pêk tinin… Û bi hemû milên xwe va têkoşîna rizgarîxwaz a gelê kurd di nava tevgerê da ye û encamên wê jî li ber çavan in.

Ev hemû baş e û dikaribû baştir bibûya, eger hemû rêxistin, sazî, kom û komele û kesayetîyên cuda helwestek a hevbeş a prênsîpîal li hember vê têkoşînê dîyar bikirana. Di vê pirsê da mirovên bêteref nikarin hebin, ji ber ku bêterefî jî terefek e… Eger ne wek kurd

be jî, hema wek mirov, ê ku deynê xwe yê mirovî dibîne, dengê xwe ji bo têkoşîna gelekî bindest bilind bike (heya, eger ew gel ne yê wî be jî!). Dengê piştgirîyê! Welatparêzî tenê bi helbest û çîroknivîsandinê nabe. Helbestvanê rûs yê destpêka sedsala XX Valêrî Bryûsov di dema  xwe da nivîsîye: *"Dem bahoz diteqe, helbestvan t'imê di nav gel da ye!"* – Wisa jî ji dîrokê tê zanîn, helbestvanê mezin ê înglîz Lord Bayron destpêka sedsala XIX welatê xwe Înglistanê diterikîne û diçe Yewnanistanê, ji bo ku beşdarî têkoşîna rizgarîxwaz a gelê yewnan bibe. Li wir ew nexweş dikeve û berî mirina xwe dinivîse: *"Xweyînga minê!... Zaroka minê!... Yûnanistana hejar! — Min dema xwe da wê, hebûna xwe, tendurustîya xwe daê!... Naha jî ezê jîyana xwe bidimê!"*

Em dîsa vegerin bal me.

Çima, em bibêjin, îro di têlêvîzîonên tirkan da pirsgirêka kurd zêdetir tê govtûgokirin, û zêdetir rewşenbîrên tirk beşdarî wan govtûgoyan dibin (bila ew bi giranî dij bin û her hinek – teref!), ne ku dengê rewşenbîrên kurd dertê. Ma, gelo wê çi bibûya, eger deng ji sazî û rêxistinên kurd derketa! Ma ne ev têkoşîn, a ku tê meşandin, ji bo hemû kurdan e. Ka, li ku ne ew sazîyên me, yên ku statûsa wan a navnetewî heye? Çima dengên wan ji bo piştgirîya kesên cuda dertê, lê ji bo neteweke, welatekî – kêm? Dibe ku ew ji wê tê, ku sazîyên navnetewî di nava karên xwe da mafên yekkesan bingeh digirin? Û ev jî rûyê dêmokrasîya dewletên gewre û serdest e di cîhanê da!... Ev dêmokrasîya ji bo wan e, dêmokrasîya ku dikeve xizmeta berjewendîyên welatên gewre yên vê cîhanê. Hemû sazî û rêxistinên mafên mirov ên wan welatan bi vê pirênsîpê karê xwe dimeşînin: ew mafên yekkesan diparêzin, lê yên gel û netewan – heya naxwazin jî bibînin. Lêbelê ya me cuda ye, ya me rewşa gelê me li hole ye, û ew rewş ne ya bîyanîyan e, ew ya me ye! Û ji  bo wê jî  ji sazî û rêxistinên me tê xwastin, ku ew bi helwesta xwe ji wan cuda bibin. Li ber me gelê me yê bindest û zêrîyayî heye, li ber me welatekî çarparçekirî û zîtol-zîtolîkirî heye…

Tu kurdek, tu beşekî Kurdistanê bi serê xwe nikare bigihîje Armanca netewî ya Pîroz, eger hemû kurd mil bi mil, bi yek enîyê dernekevin pêş. Herlbet, mirov têdigihîje, pir dijwar e, dagirkeran psîkolojîya xwetenêdîtinê û komplêksa xwebiçûkdîtinê di nav me da çandne, lê dijmin ewqasî jî ne bi hêz e, çiqas di çavên me da tê xuyan.

Li ber Yekîtîya netewî tu hêz nikare xwe ragire!

Dutîretîya di nava pêşîyên me da welatê me bi destê dagerkeran va da berdan û em wek netew kirin rewşa koletîyê, û wlatêm bû mêtîngeha navnetewî. Îro jî jihevdûrbûna me azdîya me dê derengtir bê. Ji bo ku di dîroka me da bûyerên Çîyayê Agirî, Gelîyê Zîlan, Koçgirî, Mehabadê, Helebçê, Qamûşloyê, Şengalê û yên din dubare nebin, Yekîtîya Netewî me divêt!…

Em hemû xeyd û nakokî, hemû pirsgirêkên biçûk ên navxweyî daynine hêlekê û ji vê salê û pêva bi enîyekê wek Yek Netew û Yek Welat tevbigerin.

Mercê azadîya me, mercê pêşketina me, heya mercê hebûna me bi xwe jî, wek netew, Yekîtîya Netewî ye!

**15. 01. 2011**

# NAME YA VEKIRÎ

## JI BO KU EV BÊDADÎ BI DAWÎ BIBE! …
### (Pêşgotina weşana kurdî)

Ev nameya vekiriî– wek helwesteke hember syaseta dewleta tirk a dagerker a li hember gelê kurd hatye nivîsîn, bi rêya întêrnêtê ji rewşenbîrên tirk, sazî û rêxistinên wan û çapemenîya Tirkîyayê ra, bi giştî ji 50-î zêdetir navnîşanan ra hatye şandin (helbet, bi zimanê tirkî!) û, her di medya civakî da hatye weşandin.

Ev siyaseta dijmirovî ya wêranîyê, talanê û tevkujîyê li hemberî kurd û Kurdistanê îro jî didome!

Ev rêjîma dewleta tirk a xwînrêj û xwînxur îro jî bi tund û tûjî wê siyaseta xwe ya hovîtîyê û barbarîyê li hember gelê kurd didomîne – gund û bajarên Bakûrê Kurdistanê wêran dike, li hember gelê medenî tevkujîyê pêk tine, ne bes e, …ev rêjîma heya wê astê çevsor bûye, ku hîç pêşkevtinekê di hîç beşekî Kurdistanê da jî ji bo kurdan nepejirîne: ewê Başûrê Kurdistanê jî kirye mêtîngeha xwe û wê wek baregeha leşkerî-sîxurî li dijî rêxistin û tevgerên kurdî bikar tine, jib o ku ji pêşketinên Rojava ra bibe asteng, bi her awahî êrîşan dibe ser herêmên wî beşê Kurdistanê, Efrîn dagerkeirye û li wir barbarîyên xwe li dijî gel didomîne…

Helbet, ez baş dizanim, ku li hember van kirên hov û barbar gotin û bangên mirovî bêhêz in, ku dema hovekî dirinde li ser te da tê, divê tu jî bi tevgereke hêztirîn li hemberî wê êrîşê rawestî, ji vê jî bêhtir, eger dixwazî xwe û gelê xwe ji tunekirinê rizgar bikî, divê tu bikaribî wan êrîşan ne ku tenê rawestînî, lê, her weha, bişkênî…

Ji bo vê jî hêz û tevgereke çekdarî ya bi hêz divêt! Van Barbara rêyeke dine nehîştine!

Dibêjin, eger aştîyê dixwazî, amadekarên xwe  ji bo şêr bike! Dibêjin, ku şer û aştî bi hev ra dimeşin! Dibêjin, şitlê aştîyê di deşta şêr da tên çandin! ...

Lê, dîsa jî!...

Her çi jî hebe!

…Her çiqas. îro rewşa cîhanê û herêmê, pêwendîyên di navbera dewletan û rêxistinên navnetewî da tevlihev û ne dîyar in, dîsa jî di nava wan rewş, têkilî û pêwendîyan da guhertinên bingehîn pêk tên… Îro êdî di nava civaka Tirkîyayê û, bi taybetî, di nava rewşenbîrên tirk da jî guhertinek (her çiqas kêm be jî!) xwe dide xuyan…

Helbet, em jî li derveyî van guhartinan namînin!

Belê, gelê me îro mînaka berxwedanê ya nebînayî û bêhempa nîşanî cîhanê dide!

Belê, dot û lawê gelê me yên here hêja bi têkoşîna xwe ya fedekar rengê xwe didin vê berxwedanê!

Lê îro rewş bi alozî û tundûtûjîya xwe va gihîşteye asta xwe ya here bi xeter!

Û, di vê rewşa aloz da, divê em – rewşenbîrên kurd jî, bi gotin û pênûsa xwe va bibin beşekî vê têkoşîna ji bo aştî û aramîyê! Divê em bibin şandekê ji bo rawestandina vî şerê neheq!

Ji bo ku ev bêdadî, ev şerê dijmirovî û hov, yê ku rêjîma faşîst li hemberî gelê me tevdaxistye di zûtirîn demê da bê rwaestin, em jî ji bo vê pêvajoyê dengê xwe bilind bikin û bigihînin cîhanê! Em bi xwe ra rewşenbîrên trik jî bikin nava tevgerê!

Her çiqas hewleke namenivîsînê ji hêla hinek rewşenbîrên tirk va hat dayîn, lê ev têrê nake, divê ev bibe wek tevgereke bêtehmûlîyê ya bênavber li hember faşîzmê û di bin

duruşma “Ji faşîzmê ra na!” bibe tevgereke ji bo aştî û aramîyê! Û divê rewşenbîrên kurd, bi taybetî jî, yên tirkîaxêv di vî karî da bi erka xwe rabin!

Her şerek demekê destpê dibe û demekê jî radiweste!

Ka, em jî, ji bo ku ev şerê neheq raweste dengê xwe bilind bikin!

…Ev nameya vekirî jî, ya ku di dema xwe da hatye nivîsîn û ji rewşenbîrên tirk ra hatye şandin, her hewlek bû ji bo vê!

Fermo, gotin a xwendevanan e!

# NAME YA VEKIRÎ

## Ji rewşenbîrên tirk ra[17]

*Gelî rewşenbîrên rêzdar!*

*Ev rewş, a ku li Bakûrê Kurdistanê û hemû Komara Tirkîyayê îro desthilatdar e, nikare tu mirovekî xwedî wijdan û rûmeta mirovî bêteref û bêdeng bihêle. Ew tiştê ku di dewleta we da pêk tê, bi rastî, şerma mirovahîyê ye – ev bêdadî, ya ku li hember gelê kurd pêk tê pêkanîn, ev têrora dewletê, yak u di Kurdistanê da tê meşandin, sertaca nemirovaya mirovahîyê ne û ji bo wê jî, ne tenê hûn, rewşenbîrên tirk dê paşê şerm bikin, lê her mirovek, ê ku xwe mirov dhesbîne. Ev êrîş – opêratsîon, ên ku di Kurdistanê da tên meşandin, ev tevkujîya sipî, ya ku mil bi mil bi tevkujîya sor ra li  hember gelê kurd û rewşenbîr û siyasetmederên wî tê meşandin, ev tecrîda nemirovî ya li hember rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan tê pêkanîn, ev zarokên girtî, yên ku sûcê wan ê herî mezin ew e, ku kevir avîtine tank û panzêrên artêşa dagirker, ev grievên birçîbûnê, yên ku berbi mirinê va dibin – ev hemû sûcê dijî mirovayê ye, yê ku rêjîma desthilatdar a Komara Tirkîyayê pêk tine…*

*……………………………………………………………………………………*

*Bi rastî min dxwast li ser vê notê ev nameya xwe bidomanda, lê hate bîra min, ku min hê çar sal berê nameyek a vekirî ji bo we nivîsîbû û şandibû... Lê ji ber ku wê demê derfetên întêrnêtî ewqas nînbûn, ev nameya negihîşt heya ber destê hinekên ji we jî... Û ji blî wê, ji ber ku tiştê ku di Tirkîyayê da pêk tên, bi naveroka xwe va dîsa ew in, ez çi jî binivîsim, wê zêde ji wê cuda nînbe, û ji bo wê jî ez wê nameyê, wek bangek a wijdanî ji we hemûyan ra rê dikim.*

*Bixwînin û bêdeng nemînin!*

*12. 11. 2012*

Gelî zanîyar, nivîskar, mamosta, hunermend, rojnameger û karmendên warê çand, şano û sînemayê yên rêzdar! Dibe ku pêwîstîya nivîsandina nameyeke weha jizûva pêra gihîştibû, lê ya ku bû sedem, ku ez pênûsê hildim destê xwe, ew rewşa dawîyê bû, ya ku îro di welatê me k’urdan – Kurdistanê û Tirkîyayê da desthilatdar e.

Dibe ku ezê li vir jinûva Amêrîkayê venekim, eger sedemên vî şerê gemar û neheq ji we ra ravebikim, ê ku ji hêla rêjîma (û rêjîmên!) Komara Tikîyayê va li hember daxwez û vîna gelê kurd hatye û tê meşandin.

Di sêrî da bibêjim, piranîya gelê kurd, û di nav wan da, wisa jî ez, baş têdigihîjin, ku rêjîmên Tirkîyayê û gelê tirk ne yek in... Lê dîsa jî, ji bo xatirê rastî û rûmeta mirovayê, divê mirov di nav xwe da hinekî wêrekîyê bibîne, û para xwe di gunehê desthilatdarîya welatê xwe da bibîne. Mînak, di nav gelê alman da gelek mirovên xwedî wijdan û rûmeta mirovî  rabûne û dibêjin, ku di wan sûcan da, yên ku rêjîma faşîst a di bin rêvebirîya Hîtlêr

*[17] Têksta vê nameyê bi zimanên tirkî û kurdî di dema xwe da di malpera www.mezopotamya.gen.tr  da hatye weşandin. Têksta tirkî di pêvekê da ye – rûpel: 96.*

da li dijî mirovayê pêk anîne, gelê alman jî para xwe di wan da heye. Û Almanîya serdema piştî faşîzmê ji bo wê xwemikur hatye û anegorî derfetên xwe şûna windayî û zîyanên wan dagirtye, yên ku di wî şerî da ji destê rêjîma faşîst zulm û zorî dîtine.

Mirovên weha, bi vê helwesta xwe heya radeyekê ew rûreşî, ya ku Hîtlêr ji gelê wan ra anî bû, lewaz kirin!

Lê, ka binihêrin, rêjîmên dijmirovayê li Tirkîyayê xwe li ber hev diguhêzin, yek tê – ji ya berî xwe faşîsttir e, lê ji nav gelê tirk dengekî şermezarkirinê jî dernaê. Êdî em di derbarê tevgereke dijîfaşîstî da nabêjin!

Û di vî welatî da bi awayekî din jî nikaribû bibûya.

Hûnê bibêjin – çima, ma em ji kê xirabtir in?

Na, pirs ne di wê da ye, ka kîjan gel çiqasî qec e û kîjan – çiqasî xirab! Gelê tirk û hemû gelên dine yên Komara Tirkîyayê (kurd, ereb, fariz, yewnan, ermenî, asorî, laz, çerkez, adrbêcanî, tirkmen û yên din) bûne rehîneyên Destûra bingehîn ya vê komarê (Ana Yasa), ya ku dibêje – Tirkîya tenê ya tirkan e, hemû mirovên lê dijîn tirk in, ji bilî zimanê tirkî zimanên din qedexe ne!..

Divê mirov çiqasî ji êgoîzma netewî kor bûbe, ku li ser vê bêdadî û neheqîyê xwe mezin bibîne û nûnerên gelên din ên hemwelatîyên xwe wek tiştekî ji nedîtî va hatî bibîne. Û evê êgoîzmê gel gîhandîye rewşeke derûnî (psîkolojî) ya wisa, ku dema yek ji nûnerên gelê qedexekirî doza axavtina bi zimanê xwe yê dê dike, û ji bo wê hêzên dewletê wî digirin, davêjin zindanan, îşkenceyê lê dikin, dikujin, serwinda dikin…û gelê tirk jî ji wan ra çepikan dixe. Ka, ji kerema xwe ra, ji vê cîhanê ra bibêjin, mirov çawa dikare xwe ji vê bêdadîyê û ji van êrîşan biparêze?...

Û, dibe ku Hûn bi xwe jî ji min çêtir dizanin, gelê kurd neçar maye, ku hewl bide, li hember vê hêza neheq û bêwijdan hêzekê ava bike, rabe serhildanan, ji bo ku, wek netew, xwe biparêze û li ser pêyan ragire… Lê her carê, ji ber bêtevgerîya xwe, ji ber bêrêberîya xwe, ji ber dutîretîya navxweyî, kurd perçiqîne…Û di encamê da gund û bajarên kurdan wêran kirine, û tevkujîya kurdan pêk anîne, û kurd malwêran, penaber û sergedan kirine, li mêtropolên xwe û welatên din belavkirine (ji bo ku ew bi hêsane bên bişavtin!) û her carê gotine – me xilazkir!

Lêbelê, rastîyeke dîrokî heye, dibêjin:

– Gelê ku nexwaze bimire, hîç hêzek nikare wî bikuje!

Û gelê kurd jî îro êdî ne yê destpêka sedsala XX e, ew êdî xwedî rêberî û tevgera netewî ye û hêza wî ya xweparastinê jî têra xwe heye, û, çi ji dêstê wî tê, pêk tîne, ji bo ku nebe berxa qurbanê.

Û, ger hinek careke din bixwazin vî gelî tune bikin, tê wateya ku ewan an fêmkor in û dînamîka dîrokê nabînin, an jî xwe li şûna ker û koran danînine û xwe û gelê xwe dixapînin, an jî… mejûyê xwe xwarine.

Lê, sed heyf û mixabin, wek ku tê xuyanê, di vî welatî da hîn jî mirovên wisa desthilatdar in. Û, eger wisa ye, yên ku xwe mirovên xwedî îrade, wijdan û rûmeta mirovyê hesab dikin (û yên wisa jî, ez bi bawer im, di nav gelê tirk da hene!), divê li hember vê siyaseta înkar û tunekirinê, siyaseta têrora dewletê rabin, an na, ewê jî sibê bibin heval û hevkarên merivxurên sedsala XXI. Hema, eger ne ji bo xatirê gelê kurd, hîç nebe, ji bo xatirê gelê xwe, pêşeroja wî, di nav xwe da wêrekîya mirovî bibînin û li hember van sewdaseran rabin, yên ku gelê tirk jî kirine rehîneyê siyaseta xwe. Divê li hember wan dengê xwe bilind bikin, destê wan bigirin, karê wan ê reş rawestînin, ji bo ku zarokên tirkan ên îro sibê şerm nekin, bibêjin – ez t'irk im! – Ji bo ku mûyê sipî, yê ku di navbera herdu gelan da maye, neqete, ji bo rêya dîalogê nexitime, û pirsgirêkên heyî di nav xwe da bi aştî bên çareserkirin.

Ev şer, ê ku li dijî gelê kurd tê meşandin, ne di berjewendîyên gelê tirk da ye jî, ji vî şerî çend mirovên desthilatdarîya Komarê li ser xwîna gelan dewlemend dibin (rast hatye gotin, ku şer bazirganîya here mezin e!). Ji bo wê jî siyaseta tunekirina gelê kurd bûye ya fermî. Û bi vê siayseta fermî bi sedhezaran kurd hatine tunekirin, bi hezaran gundên wan

hatine wêrankirin, ji dehhezarî jortir mirovên siyasî hatine girtin û îro di hebs û zîndanan da dirizin, bi mîllîonan ji warê kal û bavan hatine rakirin û penaberkirin, bi sedan rewşenbîr bê ser û berate hatine serwindakirin –û ev hemû ji ber wê, ku kurd dibêjin em dixwazin kurd bimînin, bi kurdî biaxêvin, bi kurdî bistirên û bi kurdî binivêjin…

Ma xwe zarokên desthilatdaran naçin şêr û naên kuştin, xwe mala wan naê wêrankirin?! Ji wan, ên ku şerê qirêj û kirêt gur kirin, yek jî Tansû Çîllêr bû. Naha ew li ku ye, yên din li kune?! Her yekî ji wan mal û hebûna xwe, dewlemendîya ku li ser vî şerê qirêj berevkirine, derbazî Dewletên Yekgirtî yên Amêrîkayê (DYA) kirine, Tirkîya û gelê tirk hîç li wan pêwîst nînin. Ev şera ne yê gelên tirk û kurd e: li hêlekê rêjîma înkarê û tunekirina gelan li holê ye û li hêla dinê jî – hêza gel a berxwedanê.

Rêjîm her tiştî dike, ku gelê kurd tune bike, gelê kurd jî (û ew 25 mîllîon e!) naxwaze bimire û ber xwe dide. Lê li derva hêz hene (bi serkêşîya DYA), yên ku dixwazin van gelan bînin hember hev û vê têkoşînê biguhêrin şerê navbera du gelan. Ew nakokîyên di navbera gelan da kûrtir dikin, wan malwêran dikin, bi xwe va girêdidin û dikin bin destê xwe. Di dîroka hebûna xwe da DYA li ser şerên li derva û talankirina welatan xwe li ser pêyan girtye û mezin bûye.

Fermo, ji kerema xwe ra binihêrin, heya ku rêjîm li hember gelê kurd siyaseta têrora dewletê dimeşîne, Kurdistanê wêran dike, tevkujîya netewekê pêk tîne, wê demê ji welatê Rojava û Dewletên Yekgirtî yên Amêrîkayê hîç dengek jî dernyê. Lê, dema ku kurd li hember van disekinin û bersîvê didin wan, rêjîma Komarê û xwedîyên wê yên li wîalî okînosê dikin hewar û hêwarze.

Çima?

Ka, ji kerema xwe ra, bala xwe bidinê, li rû cîyhanê li ku rêjîmeke faşîst, cûntayeke leşkerî û paşverû hebe, DYA dost û piştovanê wê ne!

Kê Ûsama Bên-Ladên amadekir û derxist holê, kê Seddam Huseyn bi hêz kir…kê îro dest li pişta rêjîmên wek yên Sahakaşvîlî dixe? Bê guman, DYA! Û ewê çi da wan? Dawîya Seddam li ku ma, Bên-Ladên naha li ku ye û kî ye, Sahakaşvîlî bi saya DYA çi anî serê Gurcistanê?

Eger Bûş û rêvebirîya DYA bi rastî dostê gelê tirk bûna, piştî têkçûna artêşa Tirkîyayê ya li Zapê, piştî çalakîyên gêrîllayên HPG ya li hember qereqolên Oremarê, Bêzelê û yên din, çalakîya li dijî polîsan di Amedê (Dîyarbekir) da, wê bigota: *"Êdî bese, divê ev şera bê rawestandin, û vê pirsgirêkê bi aşîtî çareser bikin!"* – Lê – na! serekkomarê amêrîkî daxuyand, ku PKK dijmina DYA, Tirkîyayê û Îraqê ye! Bi vê daxîyanîya xwe Bûş xwest ji tirkan ra bibêje: *"Binihêrian, ha-a-a, nebî-nebî hûn vî şerî radiwestînin!"*

Çima, ma, gelo gêrîllayên HPG-ê êrîş birin ser nexweşxaneyan, dibistanan, sînema û têatroyan? An çalakîya 11-ê rezberê wan pêk anîne? (Wek ku tê zanîn, destê sazîyên taybet ên DYA di nav van hemûyan da hebûne!)

Eger ew xortên tirk wek nûnerên çand û hunerê, wek dîplomat, karmend, bazirgan, an jî tûrîst çûbûna Kurdistanê, û kurdek li xatirê wan ketibûya, wê demê me hemûyayn dê ew şermezar bikirana… Hema ew ji bo wêranîyê û tevkujîyê çûne wir! Ew çûne şêr! Û di şêr da jî, wek ku di nav gel da tê gotin, pelawê belav nakin. Eger hinek dixwazin xortên wan neên kuştin, bila ew nehêlin, ku dewlet lawên wan bi çek û agir bşîne wlatê xelkê, ji bo ku ew jin, zarok, kal û pîrên wan bikujin. Dewlet ji bo vê wan dişîne, û kurd jî li hember vê zulmê xwe diprêzin.

Statûsek a Kurdistanê ya dîrokî li holê ye – ew welatekî dagerkirî û mêtîngehî ye, û leşkerê Tirkîyayê jî hêza dagirker e, ya ku tenê tevkujîyê, wêranîyê û têrorê ji wan ra tîne.

Û eger di vî şerî da leşkerên tirk tên kuştin, ji bo wê dewleta Tirkîyayê bersîvdar e. Kurd tenê mafên xwe yên rewa pêk tînin, ên ku di Destûra Rêxistina Nnetewên Yekbûyî û peymanên din ên navnetewî da hatine misogerkirin.

Yên ku îro dikarin Komara Tirkîyayê ji malwêranîyê û parçebûnê biparêzin, gelî rêzdaran, hûn bi xw ne! Pêşîyên me gotine – rastîyeke tal ji hezar derewên şêrîn şêrîntir e.

Divê rastîya vî şerî, rûyê  wî yê reş li ber gelê tirk bê vekirin. Û hêvî û bawerîya me bi we heye,  ku hûnê her tiştî bikin, ku ew şera dê rojekê berî rojekê bê rawestandin… Di vî karê hêja û bi r'=ûmet da rola we pir girîng e.

Û ji bo mirovayê pir girîng e, ku hûn bixwazin û bikaribin bi vê rola xwe ya bi rûmet rabin.

Hêvî û daxweza gelan bi aşîtîyê heye.

Û hêvî jî, dibêjin, dawîyê dimire!..

– Aşîtî ji her maleke we û welatê we ra!
– Azadî û aşîtî ji gelê kurd û Kurdistanê ra!
– Aşîtî û aramî ji cîhanê ra!

Korda Mad
(Azîz  ê Cewo Mamoyan)
Zimanzan-helbestvan-rojnameger
Endamê Yekîtîya rojmamegerên Rûssîyayê,
PEN-a kurd û ya Navnetewî

16. 10. 2008
Tambov/Rûssîya
kordamad.yahoo.com

**P.S.:**

Dema ev nameya êdî hatibû nivîsîn, agahî gihîştine me, ku di zindana li girava Îmralîyê li hember rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan êşkence pêkanîne û bêhurmetî dane xuyan, û tiştên weha jî ne hêjayî navê mirovahîyê ne û bêhurmetîyê ji şan û rûmeta wê ra tînin.

Ev kiryarana bêhurmetî û gunehkarî ne li dijî mirovahîyê!

Û dîsa tu deng ji rewşenbîrên tirk derneket!

Sed heyf û mixabin! Heyf, ku hun îro ji hesabê zarokên xwe dijîn, yên ku hê çavên xwe li ser vê cîhanê venekirine!

Wek ku tê xuyanê, di serî Tirkîyayê da karê kurdan bi organîzmek a bîolojîk ra heye, ya ku ji xêncî wêrankirinê, kuştin û talanê, tiştekî dinê jê nayê. Ew bingeha ketî û kirêt, a ku li ser wê Komara Tirkîyayê ava bûye, hê jî hebûna xwe didomîne, û, çiqas diçe, bêhtir hovane dibe û rûyê xwe yê barbar dide xuyan. Û îro hinek siyasetmederên tirk her tiştî dikin, ku di dîroka mirovayê da navê gelê wan bi tîpên reş bê nivîsarê.

Lê divê bê zanîûn: dê ji hîç kesekî ra jî li hev neyê, ku xwe ji vê rûreşîyê bişo.

Li vir mirov tenê gotineke gel bibêje: *"Mişk çiqas xwelîyê dikole, li sere xwe dike!"*

Wek ku tê xuyan, dewleta ku li ser hestu û xwîna gelan hatye avakirin, dema dîroka xwe ya here aloz û çarenûsî derbaz dibe…

Dimîne, ku mirov hêvî bike, ku kurdê jî tevr û bêran hildin, vê pêvajoyê, ya ku bê fitya dê pêk bê, zûtir bikin, ji bo ku vê carê jî ji meşa dîrokê der nemînin…

**K. M.  20.10.2008**

# DÊMOKRASÎ BI CUREYÊ TIRKÎYAYÊ[18]

*"...Û heya ku kurd di rewşeke*
*weha da ne, ev cîhana nivîşkan e,*
*bêexlaq û sûckar e, ew mehkûm e.*
*Kurd heya radeyekê encama*
*helwesta neyînî ya mirovahîyê ne,*
*û ji vê hêlê va – trjêdîya wê ne".*
**Abdullah Ocalan**

Ew pêk hat, çi ku divê pêk bihata. Ji ber ku di vê dewletê da, ya ku jêra Tirkîya tê gotin, tiştekî din nikaribû bibûya! Lewra ku evê dewletê hemû dijmirovayîya xwe, hemû hovîtî û paşverûtya xwe di belgeya xwe ya sereke da formûle kirye….

Û navê vê belgeyê jî „Ana Yasa" ye, ango, Destûra bingehîn!

Bi vê belgeyê, ên ku di Komara Tirkîyayê (KT) da dijîn, hemû tirk in, xêncî tirkan mafê gelên din nîne bi nasnameya xwe ya netewî bên naskirin, çand û zimanên wan qedexe ne, ew ji hemû mafan bêpar in. Û, eger yek rabe û doza van mafan bike, wan têrorîst nav dikin, û hemû hêz û derfetên dewletê tên bikaranîn, ji bo ku wan tune bikin.

Di vê dewletê da heya ji daxwazên aşîtîyê û dêmokrasîyê jî ditirsin, ji ber ku, eger ew daxwaz bên pejirandin, wê bê wateya guhartina wê sîstêmê, rakirina wan qedexeyan, ew jî wê bê wateya guhartina sîstêmê. Ji bo wê jî evê sîstêmê hebûna xwe bi Destûra bingehîn misoger kirye. Û her carê, dama pêla daxwaza aştîyê û dêmokrasîyê bilind dibe, sîstêm xalên Destûrê dide pêş.

Û ji ber vê jî, li hember bangên aşîtîyê yên rêberê gelê kurd û rêvebirên Tevgara Rizgarîxwaz a Netewî serokatîya KT bi xeterkirina rawşa birêz Abdullah Ocalan, êrîşên ser gel, bombebarankirina gund û şênîyên Kurdistanê û girtina Partîya Civaka Dêmokratîk (PCD/DTP) bersîv dan…

Gelê kurd li hember van li Kurdistanê û derveyî welêt rabûye serhildanan, ji ber ku baş tê digihîje, rêjma KT-ê derba mirinê digihîne wî…

Ev pêvajoyek e – pêvajoya xwezayî: *gelê kurd êdî gihîştye wê astê, ku di dema xwe da helwesta xwe li hember bûyeran dîyar dike…*

Em – hemûyê bibêjin: *„Ew tiştekî baş e!"* – Lê gelo têrê dike?

Îro hem ji devê siyasetmederên kurd, hem jî ji nev gel gotinên „Em kirinên rêjîma tirk şermezar dikin!" dertên.

Erê, me şermezar kir û yên dijberî me jî şerm kirin! Li dijî me sîstêmek heye. Mirovê van kesên vê sîstêmê yên bêşerm, bêhest û bêwijdan çi şermezar bike?

Ma gelo helwesteke weha dikare encameke erênî bide?...

Di nav pêwendîyên gelê kurd û rêjîma KT da têgînên, „Şerm", „Bêşermî" û „Şermezarkirin", „Dadî" û „Bêdadî", „Wijdan" û „Bêwijdanî" nikarin hebin, ji ber ku statûsên me cuda ne: ew dagirker in, em ew gel in, ê ku welatê wî hatye dagerkirin, ew serdest in, eme bindest in, ew celad in, em mirovên ber kuştinê ne...

Û em li hember van merivxurên devbixwîn sekinîne û dibêjin: *„Aştî, biratî!"*

Hinek dipirsin: *„Ma çawa dibe?!"*

Ma em kurd nizanin, kî li hember wan heye? Helbet dizanin... Me li ser çermê xwe dîtye, ka wan çawa em tune kirine, çawa wek gurên devbixwîn em veçirîne, em zîtol-zîtolî kirine, xwîna me veçinîne, welatê me talan û wêran kirine. Lê ji bo ku ev bêdadî û hovîtî

---

[18] Gotar di malpera http://www.mezopotamya.gen.tr da hatibûye weşandin.

rawestin, gelê me amade ye van hemûyan dayne hêlekê û doza aştîyê û biratîyê dike...

Lê hema rêjîma tirk bi çi bersîva gelê me dide?

Wê dewletê ji mêjva tfûyî rûyê cîhanê û mirovayê kirye. Hîç xema wê jî nîne, ji ber ku dizane di cîhanê da yên ku destê xwe li pişta wê dixin, hene. Ma, gotinên Hîtlêr ji bîra mirovayîyê neçûne? Va ne – gotinên wî: *„Binihêrin, Tirkîyayê sala 1915-an bi mîllîonan ermenî tunekirin, ma ew di bîra kê da mye?!“*

Û pêvajoya tevkjîya gelan di Tirkîyayê da îro jî didome!

… Îro ne tenê mirov, wisa jî Xwedê û Xweza li hember nemirovayîya rêjîma KT, hevkar û hevparên tevkujîyên wê bêzar mane…

Qanûn rawestîyane, dadwerî xitimî ye, rastîya mirovayê jî wek keçeke şermoke reng avîtye, sipîçirkî būye û xwe daye pey perda şermê (bixwîne: *bêşermîyê!*).

Pîredêya minê bigota: *„Xwedê çawa van temûl dike, Ax çawa van li ser xwe radigire!?“*

Belê, ew tişt, ên ku di Kurdistanê da li hember gelê kurd tên pêkanîn, di nav çarçoveya pîvanên heş û sewdayê mirov da cî nabin: roj di nava rojê da li ber çavê cîhanê, ya ku xwe şaristanî dihejmêre, netewekê (ya bi dehan mîllîonan!) înkar dikin, bi fîzîkî û wateyî dikujin û tune dikin, û ev cîhan bêdeng dimîne. Mirovên bi hêz ên vê cîhanê xwe li şûna ker û kor û lalan danîne.

Dema di cîhana gunehkar da gelê kurd trajêdîyê jîyan dike, ... mirovên bi hêz û hebûn ên vê cîhanê, ên ku ji bedbextîya gelan sûdê werdigirin, wek ku li dora wan her tişt normal e, trajêdîya mirovan nîne… Ewana wek miroivên xwedênas diçin ber dêr û mizgevtan, mûman vêdixin, dua û dirozgan dixwînin, xwe mirov, mirovhez û xwedênas didin xuyan...

Li vir gotinên helbestvanê ermenî yê nîveka sedsala XX Parûyr Sêvak tên bîra mirov:

*„...Hûn pifî hemû mûmên wan bikin,*
*Hemû şemdanên wan vêsînin hûn,*
*Find û çirayên wan vemirînin,*
*Ku ronahî bê!“*

*

*     *

Ev bêdadî û nemirovî, ya ku li hember gelê kurd tê pêkanîn, gihîştye asteke wisa, ku tu şirove û nirxandin, tewanbarî yan têgihîştinê napejirîne... Hemû pîvanên nirxên mirovahîyê li vir bêhêz û bê çare mane. Her tiştek li ber çavan e: hêzeke hov a nemirovî û cîhana bêwijdan û bêexlaq, ya ku ji van hemûyan sûdê werdigire, li holê ne...

Û evê hêzê netewek ji xwe ra krye armanc – wê înkar dike, hemû mafên wê qedexe û binpê dike, li hember wê siyaseta tevkujîyê dimeşîne, lê dema ew dest ber xwe hiltîne, ji bo xwe biparêze, wê gunehkar dibînin.

Mirov çawa dikare têbigihîje, pey ewqas tevlihevî, pêkanîna siyaseta înkar û tunekirinê ra serekwezîrê KT Erdoxan wek ewropîyan werdigire, benstûya ewropî davêje stûyê xwe û diçe – rastî rayedarên ewropî û amêrîkî tê, plaanên xwe yên êrîşên ser gelê kurd erê dike, destûra wan digire û vedigere welatê xwe. Û dest bi pêla êşkenceyan a nû dibe li hember rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan, tendurustî û jîyana wî dikeve xeterê, biryara girtina Partîya Civaka Dêmokratîk (PCD/DTP) tê dayîn.

Û piştî van bûyeran hinek rayedarên DYA û YE dibêjin, ku ew „karê Tirkîyayê yê hindurîn“ e.

Belê, hema wisa!

Balkêş e, çima di pirsa Yûgoslavîyê da wisa nedigotin? Eger wê demê pirsgirêkên dewleta fêdêral ne karê Yûgoslavîyayê yê hundurîn bûn (ew jî wê demê, dema ku di Komara Fêdêral a Yûgoslavîyayê da hemû netew syûbêktên dewleta fêdêral bûn, ango, sazîyên xwe yên dewletê hebûn), çawa dikare, ku tevkujîya gelê kurd karê hindurîn yê KT

be? Û ji bo wê jî Rêxistina Netewên Yekbûyî (RNY), eger ew bi rastî rêxistina hemû netewan e, divê hemû hêz û derfetên xwe bikar bîne, ji bo ku gelê kurd ji êrîşên rêjîma KT biparêze û tevkujîya wî rawestîne. Eger na, wê demê hebûna RNY ji bo çi ye? Eger ewê bibe hêmanekê ji bo ku dewletên gewre di bin sîwana wê da cîhanê jinûva di nav xwe da p'arvebikin, wê demê rasttir dibû, ku ew wek Rêxistina Dewletên Gewre û Zorbe bihata navkirin. Û hewce jî nedikir, ku di Tûzika wê da hatye nivîsîn:

**Rêxistina Netewên Yekbûyî van armancan dişopîne:**
**1. Aştî û ewlekarîya navnetewî biparêze…**
**2. Li ser bingeha rêzgirtina ji prênsîpa wekhevîyê û mafên gelan ên biryarkirina çarenûsa xwe (mafê xwebiryarkirinê) pêwendîyên dostane di navbera netewan da pêş bixe …**
(TÛZIK a RNY, Serê I: Armanc û prênsîp, Gotar a 1)

Balkêş e, eger ev armanc û prênsîpên wê rêxistina navnetewî ne, tiştên ku di KT da pêk tên, anegorî kîjan prênsîpên wê ne, û ew çawa wê temûl dike?

Û ji bilî vê, ma ne di bin sîwana vê rêxistinê da di demên cuda-cada da li ser pirsa mafên mirov û yên netewan ewqas qanûn û biryar hatine girtin: *Dêklaratsîona hemtomrî (giştî) a mafên mirov a RNY* (ya 10. 12. 1948), *Pakta (peyman) navnetewî ya di derbarê mafên welatîyê û sîyasî da* (ya 16. 12. 1966) û *Pakta navnetewî ya di derbarê mafên êkonomî (aborî), sotsîalî û çandî da* (ya 16. 12. 1966) li holê ne!

Û anegorî wan belgeyan mafê netewê yê bi xwe biryarkirina çarenûsa xwe (mafê xwebiryarkirinê) yek ji prênsîpên mafê gelan a navnetewî ye, yê ku ji hêla hemûyan va hatye naskirin. Ev maf di pêvejoya hilweşandina sîstêma kolonîal da hatye naskirin û di wê Dêklaratsîonê da hatiye pejirandin, ku serxwebûnê bidin welat û gelên kolonîal (rêzolyûtsîona №1514 XV ya Assamblêya Sereke ya RNY, 14.12.1960). Ew paşê ji hêla peymanên navnetewî û dêklaratsîonên RNY va jî hatye erêkirin û pejirandin.

Balkêş e, ev rêxistinên navnetewî li ku dinihêrin, ma gelo Kurdistan û gelê kurd nakevin ber statûsa kolonîalî?

Di pakta (peyman) navnetewî ya di derbarê mafên êkonomî, sosîalî û çandî û Peymana navnetewî ya di derbarê mafên welatîyê û siyasî da (ya 19. 12. 1966) hatye nivîsandin: *„Mafê hemû gelan heye, ji bo ku çarenûsa xwe bi xwe biryarbikin (mafê xwebiryarkirinê). Anegorî wî mafî ew di biryarkirina statûsa xwe ya sîyasî û misogerkirina pêşketina xwe ya aborî, sotsîalî û çandî da azad in... Hemû dewlet, ên ku beşdarî vê peymanê dibin... divê anegorî ferzên Tûzika RNY bi erênî li pêkanîna mafê xwebiryarkirinê binihêrin û ji wî mafî ra rêz bigirin."*

Lê di Dêklaratsîona di derbarê prênsîpên mafên navnetewî da (24. 10. 1970) tê gotin: *„Anegorî prênsîpa wekhevîyê û xwebiryarkirina gelan, ya ku ji hêla Tûzika RNY va hatye misogerkirin, hemû gel mafê xwe hene biryara statûsa xwe ya siyasî bidin û pêşvaçûna xwe ya aborî, sotsîalî û çandî pêk bînin, û divê her dewletek, anegorî ferzên Tûzika RNY, ji wî mafî ra rêz bigire".*

Di heman Dêklaratsîonê da her weha hatye nivîsandin, ku rêyên pêkanîna mafên xwebiryarkirinê dikare *„sazkirina dewleteke serbixwe û azad be, yan ew dikare bigihîje dewleteke din a serbixwe, an bi wê ra bibe yek, an statûseke şêwazekî din bi cî bîne".*

Û, eger ewqas rêxistinên navnetewî bi ewqas qanûn û biryarên xwe va di pirsa kurdî da bêhêz û bêçare dimînin, wê demê ji bo gelê kurd tu rêyeke dinê namîne, xêncî ku bi neçarî bi hêza xwe ya çekdarî xwe ji tunekirinê biparêze.

Wê demê xwînê pir bir'ije. Û ji bo wê kîyê bersîvê bibe?

Helbet ne tenê rêvbirîya KT û xwedîyên wan ên wîalî okînosê, lê wisa jî dê Rêxistina Netewên Yekbûyî û rêxistinên navnetewî yên dinê para xwe ya mezin di wî gunehî da hebin!

*

* *

Weha, serdema qaşo çareserkirina pirsgirêka kurdî bi şêwazê AKP-ê bi fîasko bi encam bû. Rûyê rêjîma tirk a rastîn careke dinl derket holê. Vê rêjîmê jî da xuyan, ku di pirsa kurdî da ew ji rêjîmên berî xwe cuda nabe. Ku heya destûra Komarê ya bingehîn vî welatî tenê yê tirkan bibîne û tu mafî ji bo gelê kurd nas neke, partîyên sîyasî yên vî welatî wê nanê xwe li ser dijberîya gelê kurd qazenc bikin û di vê dewletê da tu aştî û aramî nikarin hebin...

Em – kurd jî divê xwe bi tiştên demî têr nekin, divê hemû hêz û derfetên me ji bo guhartina vê rewşê bên bikaranîn. Li vir kurdên ku di nav partîyên Tirkîyayê yên dinê da cîyê xwe digirin, dikarin rola xwe ya erênî di çareserîya pirsgirêka kurdî da bilîzin, ji ber ku derba ku rêjîm digihîne netewa kurd, ew digihîje bingeh û dihatûya wan jî. Ji bilî vê, divê bê zanîn, ku heya, eger ew ne kurd bûna jî, deynekî wan ê mirovî heye, têgînên hûmanîzmê (mirovhezîyê) û mafê mirov di vê cîhanê da hê bêqîmet nebûne...

Di vê rewşê da rizgarîya gelê kurd tenê bi yekîtîya wî dikare pêk bê: tu parçeyekî gelê kurd û parçeyekî Kurdistanê dê nikaribin bêyî yên dinê rizgar bibin. Ev aksîoma ye, ya ku hewcê wê bi peytandinê nîne...

Û ji bilî wê kîjan kurd dibe, bila bibe û ew bi çi helwestê jî radibe bila rabe, divê em tiştekî bizanibin:

Birêz Abdullah Ocalan ji bo mafê me û dihatûya zarokên me yên îro di girtîgehê da ye!

Bi dehezaran girtîyên sîyasî jî ji bo wê di hebs û zîndanên dagerkeran da ne!

Partîya Civaka Dêmokratîk hema ji bo vê bûye hedefa êrîşan û hatye qedexekirin!

Gelê me, ji zarokên hevtsalî heya kal û pîrên hevtêsalî, ji bo vê li ser pêyan e!

Ewqas pakrewanên me ji bo vê çê bûne.

Em hemû li van nirxên xwe yên netewî xwedî derkevin!

**21. 12. 2009**

# JIYANA MIROVEKÎ, YA KU HEBÛNA NET'EWEKÊ JI NÛVA WATEDAR KIRYE![19]

… Îro mirov nikare warekî jîyana gelê kurd bibîne, yê ku bi nav û îdêayên rêberê netewî birêz Abdullah Ocalan şêwaz negirtibe!

Li ber çavan e, ku evî Mirovê Mezin heya dawîyê, bê hêvişandin, jîyana xwe dîyarî rizgarîya gelê xwe kirye, û jîyana xwe jî hema bi vê watedar kirye … Ev rastîyek e, ya ku heya dagerker û dijminên gelê kurd jî nikarin nebînin. Her dimîne, ku mirov ji bo pêşeroja gelê xwe ji vê jîyana Mezin dersan derîne.

Û ev Jîyana mînaka wê ye, ka divê mirov çawa bijî û bide jîyandin, û bi xwe jî ji bo mîlîonan mirovan bibe bawerî – bêyî cudayîya pêkahtîbûna wan a netewî!

Rêber Ocalan dîtina xwe li ser rewşa gelê kurd hê di destpêka lêgerînên xwe yên zanistî û şêwazgirtina bingehên bîrdozîya xwe da bi sîstêmî daye pêş, û weha tomar kirye:

*"…Û heya ku kurd di rewşeke weha da ne,* – ew dibêje, – *ev cîhana nivîşkan e, bêexlaq û sûckar e, ew mehkûm e.*

*Kurd heya radeyekê encama helwesta neyînî ya mirovahîyê ne, û ji vê hêlê va – trjêdîya wê ne".*

Û armanca jîyana xwe jî ewî anegorî vê dîtina xwe rasterê kirye – çi be bila bibe, divê ev bêdadî ji hole bê rakirin.

… Lêbelê, dive bê zanin, ku hema di destpêkê da jî Ocalan dizanibûye, ku bi carekê va, her tenê bi têkoşîneke çekdarî ev rewş nikare bê guhartin, ku ji bo vî gelî bîrdozîyeke nû, xwetêgihîştineke nû pêwîst dike! Û ji bo vê jî divê ew bikaribe dîroka xwe ji nû va watedar bike û ji wê dersan derîne, bi rêxistin bibe, yekîtîya xwe ava bike… Û ji bo vê yekê jî, pêwîst bû, bi zanistî rê û rêbazên pêkanîna wê armancê bihatana dîtin, û bi wan ev gela bihata birêxistin û tevger kirin…

Û, ya ku îro pêk hatye jî, encama vê ye – hemû destkevtîyên gelê kurd, ên bi vê bîrdozîyê tevgerkirî, berhemên karê Rêber Apo yên zanistî-lêgerînî, rêxistinî û tevgerî ne, wek rêberê neteweke … Û îro êdî siyaseta netewî, dîplomasî û têkoşîna gelê kurd a ji bo destanîna mafên xwe yên mirovî-netewî li ser bingeha vê bîrdozîyê hatine avakirin, û berhemên wê jî êdî li ber çavan in – hem di têkoşîna li dijî DAÎŞ-ê ya di Rojavayê Kurdisatanê û bakûr-rojhilatê Sûrîyayê da, hem jî di qada siyasî – di Bakûrê Kurdistanê da …

Lewra jî Azadîya Rêberê Netewî ji bo gelê kurd ewqas bi nirx û girîng e, lewra jî, ji bo tecrîda li ser wî bê rakirin, gelê kurd îro li ser pêyan e, bi çalakîyên xwe yên cihêreng doza azadîya Rêberê xwe dike, ji bo vê doze bi hezaran dot û lawên gelê kurd ên here hêja di nav liv û tevgerê da ne û qadên cuda yên cîhanê da çalakîyên cihêreng pê dînin.

Û, lewra jî, eger em îro ji bo van serkevtinan gelê xwe pîroz dikin, divê di sêrî da Rêberê Netewî birêz Ocalan pîroz bikin, û hemû serkevtinan ji bo 70-salîya vî Mirovê Mezin bikin dîyarî û pîrozbayî!

… Ji bo watedarkirina hebûna Rêber Apo, wek Kesayetîyeke Mezin, û bîrdozîya wî, ez parçeyekî ji pirtûka xwe ya dawîyê pêşkêşî bala xwendevanên hêja dikim. Fermo, berî ku bixwînin, bizanibin, ev encamên lêgerînên zanistî ne:

*"… ya balkêş jî ew e, ku, dema hinek di derbarê bîrûbawerîya zerdeştîyê û bîrdozîya Tevgera Rizgarîxwaz a Netewî da diaxivin, ewana hinek têgihîştinên xwe yên bîrûbawerîya zerdeştîyê bi îdêolojîya Abdullah Ocalan şirove dikin...*

[19] Di malpera www.amidakurd.org da hatye weşandin.

*Her çiqas, ew lêgerînên hinek kesên di vî warî da li ser bingeha wan hizir û têgehan pêk tên, ên ku di weşanên bi zimanên bîyanî da hene (ji ber ku, wergera kurdî ya wê peykera nivîskî – ya "Avêstayê" hê nîne), dîsa jî, ji hêla weşanê û şiroveyên giştî va, di wana da tiştên balkêş hene û ew hêjayî baldarîyê ne…*

*Her çi jî hebe, xudanên wan nivîsan ji çi hêlê va jî nêzîkî pirsê bibin, yek e, ew delîl bê guman e, ku di nava civakê da têgehên bingehîn ên bîrûbawerîya zerdeştîyê tên govtûgokirin, û gelek normên exlaqî-toreyî û naveroka nirxên giştî yên mirovahîyê di nava wê govekê da tên şirovekirin, û ev jî, êdî di derbarê gelek tiştî da dibêje…*

Lêbelê, dema mirov hinek *binaxeyên bawerîya zerdeştîyê* û *îdêolojîya Abdullah Ocalan* hemberî hev dike, û wana di nava govekekê da dinirxîne, dertê holê, ku:

– eger *Zerdeşt Pêxember* di dîroka mirovahîyê da cara yekem mafên wekehev ji bo mêr û jinê naskirye, lê *Abdullah Ocalan* ew bi zanistî ravekirye û bi praktîkî di jîyanê da pêk anîye; ew dibêje, eger mirov di derbarê azadîya gelekî da diaxive, wê demê, divê bizanibe, ku ew gel nikare azad be, eger nîvê wî gelî *(jin!)* bindest be û, wek endamên heman civakê, xwedî heman mafan nînbe; û îro hemû rêxistin, sazî, rêvebirî û komeleyên kurdan, ên ku *îdêolojîya Ocalan* dipejirînin, hemû jî hevserokên xwe hene – bi nûnertîya *jin* û *nêran* va; li rex *HPGê* wisa jî *Hêzên Jinan ên Parastina Gel (HJPG)* hene, û hemû parleşkerên wan fermanên xwe ji *Biryargeha Navendî* ya *HJPG* distînin û pêk tînin; jin li ser asta here bilind beşdarî pejirandina hemû biryarên girîng ên *siyasî, leşkerî, dîplomasî, çandî û darayî* dibin. Ango, di vê civakê da bi rastî prînsîpa wekhevîyê pêkan e.

– Zerdeşt Pêxember kedkarîyê pîroz dibîne û ewê digîhîne heya asta xwedayî – wek şêwazekî xizmeta *Xwedê* li ser erdê. Anegorî bîrûbawerîya wî, *cotkarî, xwedîkirina ajalan (rêncberî), avakarî* û her şêwazekî kar ê dinê, yê ku ji bo jîyana mirov xurtkirina hebûna derfetan misoger dike, ew erka pîroz a mirov e di cîhanê da; lêbelê, ji bo *Ocalan* şêwazê herî bilind ê karê mirov – ew xizmeta mirov e di hemû warên jîyana civakî da, li ku divê garantîya mafên wekehev û jîyaneke hêja ji bo hemûyan hebe, û pirsên êkolojîyê yek ji beşên girîng ên îdêolojîya wî ne…

– eger di cîhana rewanî da tê gotin, ku *Zerdeşt Pêxember* di heş û rewanê mirovan da hizira jihevcudakirina *Dilovanîyê* û *Zulmê* bi cî kirye û bang kirye, ku divê xwe li dilovanîyê bigirin û zulmê red bikin, wisa jî, eger pêwîst be, amade bin, li dijî zulmê têbikoşin – ew çi rengî dibe, bila bibe, lêbelê, anegorî têorîya *Ocalan* di mafên xwe da hemû gel û mirov divê wekehev bin, û, eger ew mafana tên binpêkirin, ew bi xwe şêwazekî zulmê ye, û, lewra jî, divê li dijî wê zulmê têbikoşin; ewî bi zanistî rê û rêbazên wê têkoşînê dîyar kirine û bi xwe jî rêberîyê lê dike…, lê têorîya wî ya *Konfêdêralîzma Dêmokratîk* hemû prênsîpên pêwendîyên civakî destnîşan dike, û, eger civak anegorî wan tevbigere, ewê bikaribe di nava aştî, aramî û ahengîyê da bijî. Û mînaka di jîyanê da pêkanîna wê sîstêmê jî îro *Rojavayê Kurdistanê* dide xuyan.

Li vira, dibe ku pirs derê hole: *"Ev mînahevîya helwest, têgihîştin û watedarkirina jîyana mirov ji ku tê?"*– Wek ku tê xuyanê, dijwar e mirov bikaribe bersîveke yekawa ji bo vê pirsê bibîne…Lêbelê, mirov dikare bibêje, ew, ku *Abdullah Ocalan* di dema xwe da hinek tişt di derbarê *zerdeştîyê* da xwendibin jî, ewê dê nikaribûya bandora xwe li ser têgihîştin û dîtinên wî yên gerdûnî bihişta, lewra ku, ya yekem, *Ocalan* wek têorêtîk û siyasetmeder li ser bingeha *sosîalîzma zanistî* pêk hatye, û, ya duyem, wê demê di wî welatê misulmanîyê da (Tirkîya) *zerdeştî* nikaribû di nava gel da ewqasî naskirî û pêkan bûya, ku di jîyana wî da cîyê xwe hebûya.

Li vira mirov tenê dikaribû bi bawer bigota, ku, her çiqas, piranîya *kurdan* îro misulman in, lê gelek deremên (êlêmênt) asa, norm û ferzên bawerîyên kevnar ên gelê kurd (*heya yên berî zerdeştîyê jî!*) di civaka kurdî da zêndî mane û tên parastin, û hema di wê civakê da jî *Ocalan* gihîştye, mezin bûye û wek kesayetîyeke têgihîştî pêk hatye. Û, wek ku tê xuyanê, evan mercana, wisa jî rewşa civakî û siyasî ya ku wê demê di Komara Tirkîyayê da serdest bûye, perwerdeya wî ya siyasetmederîyê, û bîra wî ya gênêtîkî, ji bo ku *têorîzan (theorist)* û *têkoşerekî* ji bo mafên gelan ê weke wî pêk bê, bûne bingeh…

Ev herdu kesayetîyên gewre *(Zerdeşt û Ocalan)* zarokên heman gelî yên serdemên cuda bûne. Û, anegorî wê jî, di serdemekê da (dewra VI a berî s.m.) *pêxemberekî gewre* pêk hatye, lê di ya dinê da (nîveka dûyem a dewra XX – destpka a XXI a s.m.) – *têorîzan, stratejîst û rêberekî gewre…*" (Ezîz î Cewo: "Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka "windabûyî"...)", Weşanên Aryen, s. 2018, rûpelên 104 – 107 – https://www.academia.edu/38211603/ZERDEŞT_ PÊXEMBER_RÛPELÊN_DÎROKA_WINDABÛYÎ_..._ )

Helbet, dîrokzan û lêgerînerên dihatûyê wê hê di derbarê jîyan û karê Rêber Abdullah Ocalan da lêgerînên xwe pêk bînin, nivîskar û helbestvanê jîyana wî Mirovê Mezin bikin mijara berhemên xwe yên wêjeyî, hunermendê stranên nû dîyarî wî bikin, lê îro ew di girtîgeha li girava Îmralîyê da di tecrîdeke nemirovî ya giran ra rûberû ye û di wê rewşê da bi berxwedaneke bêhempa hevtêsalîya xwe pêşbazî dike! Û di vê rewşê da jî, her çiqas ew di wan mercên nemirovî da ye, her çiqas dîwarek di navbera wî û gelê wî da hatye danîn, lê dîsa jî fikir û ramanên wî bi mîlîonan mirovan tevger dikin, ên ku bi lehengîyên bêhempa û nebînayî gav bi gav berbi Azadîya Mezin va dimeşin û her tiştî dikin, ku Rêberê Netewî rojekê berî rojekê di azadîyê da bibînin...

Û em jî îro bi vam hêvî û daxwezîyên Mezin beşdarî pîrozbahîyên hevtêsalîya Rêberê gelê xwe dibin!

**03. 04. 2019**
**Paytîgorsk/Rûsîya**

# KOMPLOYA NAVNETEWÎ Û DERSÊN WÊ!
## (Li şûna paşgotinê)

Hersal 9-ê cotmehê gelê kurd û dostên wî ji bo şermezarkirin destpêka komploya navnetewî ya li dijî rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan çalakîyên cihêreng pêk tînin. Wê rojê rêberê netewî xaka Rojhilata Navîn terikand. Ew gaveke neçarî bû. Lewra jî pêwîst bû, ku êrîş ji sînorên Sûrîyayê bihatana dûrxistin. Wê demê ji hêlekê va Tirkîyayê leşkerên xwe li ser sînorê Sûrîyayê berev kiribûn û tirs lê difirand, ku ewê dest li nav xaka wê dewleta sûvêrên werde, ji hêla dinê va NATO-yê li beravên Derya Sipî werzêşîyên leşkerî (tetbîqat) yên hêzên deryayî pêk tanîn.

Hêzên navnetewî, yên ku li pişt Tirkîyayê va sekinîbûn, bi serkêşîya rêvebirîya DYA ya wê demê, bi êrîşan tirs li Sûrîyayê difirandin, eger ew rêberê gelê kurd negire û radestî wan neke, dê li dijî wê dest bi tevgera leşkerî bikin ...

Ji wê demê va di dîroka gelê kurd da dest bi demajoyeke nû bû.

Ew demajo hem ji bo gelê kurd, hem ji bo dost û xêrxazên wî, hem jî ji bo xêrnexwazan bû wek ezmûnekê. Gelê kurd di nava xax û bendên giran ra derbaz bû û da xuyan, ku ew êdî ne gelê destpêka sedsala XX ye, ku ew li dora rêberê xwe civyaye û bûye yek, dilsozê wî ye û amade ye, heya dawîyê ji bo mafên xwe yên mirovî û netewî bi biryar têkoşîna xwe bidomîne.

Dewletên gewre careke dinê dan xuyan, ku tu hast û hizirên wan ên mirovî li hember gêlê kurd û çarenûsa wî nînin, ku ew, weke berê amade ne, çarenûsa trajîk a gelê kurd di nav xwe da bikin mijara bazirganîyê. Û evê yekê ewana bi şêwazê wê yê herî kirêt û xeter va di praktîkê da nîşanî cîhanê dan…

Lê tiştekî dinê jî li ber çavan bû: ji ber bi rêxistinî tevgerbûna gelê kurd û helwesta wî cîhanê dît, ku nikarin gelê kurd wisa hêsan bikin ser çokan, ku Rêberê netewî yê gelê kurd ne ji wan e, ku wî wisa hêsan bigirin, darda bikin, bi wê yekê Tevgera Netewî bê serî bikin û têk bibin. Lewra ku Abdullah Ocalan ne hema wisa rêberê tevgerekê ye, ewî ruh û rewanekî nû daye ber bêhna gelê xwe, ew vejîyandye, ji gora sedê salan rakirye, ruh û ramana wî bi îdêayên netewî xurt kirye û berbi têkoşînê va birye… Hîç hêzek jî dê nema bikaribe gelekî wisa rawestîne, heya, eger…

Û, her çiqas, hê jî hinek serîyên germ (ên serserî) di Tirkîyayê da hêvîya xwe didan ser wê *"egerê"*, her çiqas, li girava Îmralîyê şanoya dadgehê jî li dar xistin, û rêvebirîya Tirkîyayê, ev êdî cara çendan e, hewl da di kesê Rêberê netewî da ji hebaûna gelê kurd ra bibêje: *"Na!"*jî, lêbelê, ew li ber Rêberê netwî, wek Rastîya gelê kurd, bêzar man.

Û hem Tirkîyayê ev rastî dît, hem jî – cîhanê. Dewletên rojavayî dawîya dawîyê tê gihîştin, ku di pirsa rêberê gelê kurd ê netewî da desthilatên Tirkîyayê ew xapandine. Û di çavên civaka cîhanê da, û, ya here girîng, di heşê gelê tirk da guhartinên kardînal pêk hatin.

Û evan guhartinan di kurttirîn demê da şitilên xwe dan. Axavtina rêberê netewî di danişîna dadgehê da (têksta wê paşê di Tirkîyayê da di bin sernivîsa "Zivireke nû li ser rêya veguhartinên dêmokratîk" da bi pirtûkeke cuda hate weşandin!), a ku ji hêla siyasetmederan va paşê dê wek "Manîfêstoya komara dêmokratîk" bê navkirin. Û hema ev jî bû bingeha axavtina Samî Sêlçûkê serokê Dadgeha bilind a Tirkîyaê ya bi sernivîsa "Manîfêstoya komara dêmokratîk". Bi wê axavtina xwe serokê Dadgeha bilind a Tirkîyayê cara yekem di dîroka xwînrêj a Tirkîyayê da vekirî di derbarê nehûmanîya (nemirovhezî) destûra bingehîn a welatê xwe da daxwîyand û destnîşan kir, ku ew hîç bi pîvanekê jî ne anegorî qanûn û rêzikên navnetewî ye, ku ew mafên welatîyan binpê dike, dijdêmokratîk e û gelek-gelek tiştên dinê. Di rewşeke weha da serokê dadgehê pêşnîyar kir, ne ku divê guhartinan bikin Destûra bingehîn a îroyîn, lê divê destûreke nû, destûreke dêmokratîk bipejirînin...

Û hem di Tirkîyayê da, hem jî di cîhanê da êdî bi çavekî dinê li rastîya Tirkîyayê û Tevgera Azadîxwaz a Gelê Kurd nihêrîn.

Ev pêvejo dê bidome. Mirovên cuda dê gotina xwe bibêjin – dij û teref! Lê dengên wan mirovan, ên ku terefdarên pêvajoya dêmokratîkbûnê ne, roj bi roj zêdetir dibin. Û yên ku xwe li vê rêyê digirin jî, dizanin, ku ew rê rêberê gelê kurd Abdullah Ocalan pêşniyar kirye.

Zêdetirî 50 navdarên Tirkîyayê û yên welatên dinê bi daxwîyanîyekê piştgirîyê didin înîtsîtîvên rêberê netewî yê gelê kurd, û sibetirê rojnameya "Huriyet" li ser rûpelê xwe yê yekem wêneyên hinekên ji wan diweşîne û bi tîpên mezin dinivîse: "Îja çi ferq di navbera van û Ocalan da!"

Helbet rojname rast nabêje! Di navbera wan û Ocalan da ferqeke mezin heye – ferqeke pir mezin! Û ferqa here sereke jî ew e, ku Ocalan 25 salên dirêj têkoşyaye, çavên wan (û ne tenê yên wan!) li ser rastîya Tirkîyayê û pirsgirêka kurd vekirye, û ew jî, dawîya dawîyê evê rastîyê têgihîştine. Û, wek ku di nava gel da dibêjin, mala Xwedê ava, bila bibe, bila bi derengî be!

Mirov matma dibe, rojnameya "Huriyet" hîç bi nigê demê ra gav nade, ew bi malkambaxî (katastrofîk) paş va dimîne. Êdî jizûva dem e, dawîya dawîyê, ku ew çavên xwe veke û wan guhartinan bibîne, yên ku di mejûyê welatîyên Tirkîyayê da pêk hatine. Û dihatû jî ya van e, ne ku ya wan, ên ku di mejûyên xwe da fermanên barbar û celadan parastine...

Li ber çavan e, eger çapemenîya Tirkîyayê xwe li rêya rastîyê bigirta, dê bikaribûya roleke ne kên girîng bilîsta...

Tirkîyayê kîjan rêyê ji bo pêşkvaçûna xwe hilbujêre, gelo? Ewê bibe welatekî şaristanî û bi qanûnên dêmolrasîyê bijî, an wê wisa jî wek sîstêmeke xwînxur bimîne, ya ku her tenê nirxên mirovî red bike, yên ku şaristanîya mirovhayê di tevahîya dîroka xwe da sêwirandine? Ev jî bi piranî bi civaka Tirkîyayê va girêdayî ye. Helbet di vê dema ji bo Tirkîyayê ewqas girîng da wisa jî gelek tişt bi civaka cîahnê va girêdayî ye, û bi serekî jî bi wam dewletan va, yên ku bandora xwe li ser Tirkîyayê hene…

Dema mirov li cîhana me ya bêwijdan û bêdad dinihêre, dibîne, ku dewleteke weke Tirkîyayê (û ev bi serê xwe ne yek a tenê ye!) li hember mirovahîyê ewqas sûc kirine û îro jî pêk tîne, civaka cîhanê û bi taybet jî dewletên gewre li hember van kirên wê yên kirît bêdeng in...

Belê wisan e, lê wek ku di nav gel da tê gotin: *"Eger tu bi xwe li xwe xwedî dernekevî, heya birayê te jî dê nikaribe li te xwedî derkev!"...*

... Û dema mirov van rêzebûyerên dîrokî di nav govekekê da dinirxîne, ku dixweze ji cîhanê û kurdan ra di derbarê wê bêdadîyê da veblje, ya ku bi dîrokî li hemberî gelê kurd pêk hatye û îro jî didome, û bi baldarî li çavên wan binihêrya, ka...

Lêbelê, ji bo xatirê rastîyê, divê em – kurd jî, wek netew, li xwe mukur bên, ku ji bona wê bêdadîyê, ya ku bi dîrokî hatye serê me, çiqas dagirker û dewletên gewre sûcê xwe hene, ewqas jî em kurd xwedî sûc in! Belê, belê gunehê me ji yê wan kêmtir nîne. Divê em para xwe di vî gunehî da bibînin û wê watedar bikin, ji bu ku nivşên pêşerojê wan şaşîyan dubare nekin!

Lewra ku…

Mhatma Gandî di dema xwe da gotye: *"Ew, ku înglîzan Hindistan dagerkirine, ew ne ji hêza wan bûye, me bi xwe welatê xwe radestî wan kirye. Ew, ku îro jî înglîz di welatê me da ne, ne ji wê ye, ku ew ji me bi hêztir in û bi hêza xwe li vir dimînin. Na, ew em naxwazin, ku ew ji welatê me herin!"*

Ez dibêjim, ev gotinên Gandîyê Mezin îro bona me–kurdan jî wateya xwe hene!

Tiştê herî balkêş ew e, ku em dagerbûyîna welatê xwe û çarparçebûna wî îro jî dipejirînin. Ango, em dibin terefdarên statûkoparêzan û vê rewşê dipejirînin, a ku ji me ra dibêje: *"Tu bindest hatî cihanê û tuyê wisa jî ji vê cîhanê herî!"* – Em hê jî yekparebûna wan dewletan diparêzin, ên ku welatê me dagerkirine, ji ber ku em dizanin, ku dewletên gewre yên vê cîhanê rêyeke dinê ji bo me nehîştine… Û kesek tune, ku weke dînan devê xwe bike guhê vê cîhana bêdad, ketî û kirêt û biqîre: "Çira-a-a-a!!!"

Abdula Gûl, wezîrê karên derva yê Komara Tirkîyayê yê demekê, di dema xwe da gotibû, ku dema wan Mûsil dane, dane Îraqa yekpare.

Tuyê bibêjî herêma Mûsilê fazênda bavê wan bûye, û wan jî girtye-daye "Îraqa yekpare". Û kesek tune, ji wî ra bibêje: "Olan, kê maf daye we, ku hûn ser xak, mal û hebûna xelkê bazirganîyê bikin? Bi kîjan qanûn û zagonan hûn û xwedîyên we yên wî berî okyanosê çarenûsa gelan weke xwe sererast dikin?"

Ma di kîjan pirtûka pîroz da hatye nivîsandin, ku KT, Îran, Îraq, Sûrîya wê hebin û kurd jî dê bê maf û dadwerî di bin desthilatdarîya wan da bimînin? Çima, anegorî kîjan destûr, rêzikên wijdanî, yên rûmetê û…

Ew, ku cîhana "şaristanî" li hemberî Tevgera Azadîxwaz a Neteweke dibe yek, destûra Rêxistina Netewên Yekbûyî dide bin pêyê xwe, û alîkarî û piştgirîyê dide dagerkerên xwînxar, em tê digihîjin: bazirganî ye: tu – min, ez – te! Ew, ku ew hemû hêzên xwe yên dewletî dikin yek, Serokê wê Tevgerê digirin û didin destê dijmin, ewqasî jî mirov matmayî nake: bîyanî ne, çi bikî?! Van mirovan ji bo berjewendîyên xwe wijdanê xwe kirine berîya xwe, namûsa xwe ya mirovî dane bin pêyê xwe û di vê cîhanê da dimeşin. Lêbelê, tiştê ku li vira nakeve heşê mirovê normal ê ne nexweş, û naê pejirandin, ew e, ku di nav me da hê jî mirov hene, yên ku bi bêdengîya xwe wan kiran erê dikin…

Û li vir gotinên helbesta min a "Drozga rojê" tên ser zarê min:

*"…Ca me binhêrin –*
*me û vê rewşa lêp*[20]*:*
*dema li jorê l'rû me dikenin,*
*dema li jêrê l'rû me dikenin*
*û j'me ra dibên – hûne pir baş in,*
*lê hûn hûn nînin…,*
*hûn û birayên xwe*
*Ne yek in, zanin?...*

*Û tu nizanî bikenî,*
*yanê rûnîyî û j'xwe û*
*halan ra bêjî:*
*Ev rewşa me lêp,*
*ev der-dorên lêp*
*û ev dostîya lêp,*
*biratîya tune,*
*kortî-femkorîya hinekên nav me…"*

Nizanim, nizam, çi bibêjim...!

Hinek tişt hene, ku di heş û sewdayê mirov da cî nabin!

Ku rêvebirîya Almanîya fêdêral ji bo xatirê KT li ser kurdan da diçû (îro jî – dem bi dem...!), heya radeyekê dikeve heşê miroov: gênêralên wan hê di dema osmanîyan da şêwirmendîya artêşa tirk kirine. Û weke dewleta tirk (navê wê çi datînî, dayne!), dibe ku hinekî jî ji wê zêdetir, ji bo tevkujîya kurdan, ermenîyan, asorîyan û gelên dinê dewleta alman jî gunehkar e. Ji bilî wê, kevneşopîyên wan ên dîrokî jî hene… Dibe ku, piştî demek a dirêj hinek rêvebirên wan ên din êdî ji bo kirên peyhatîyên Fon Moltkê, Hîtlêr, Gêbêls û yên dinê lêborîna xwe ji kurdan bixwazin (wek ku îro diçin Îzrayêlê, li ber dîwarê peresgeha wan a kevnar çokvedidin û ji cihûdan lêborînê dixwazin!). Lê wê êdî tu feyda neke, wê dereng be… wê demê wê êdî Komara tirkan a bakûrê Almanîyayê hebe (Bakûrê Qibrisê tê bîra we?), rewşa kurdan jî wê hatibe guhartin, û wê êdî rêzikên din ji bo lîstika

[20] *Lêp – sexte, ne normal, falş.*

siyasî derketibin holê… Û li vir, yên ku wê di zirarê da bimînin jî, wê gelên kurd û alman bi xwe bin.

Ya Firansayê jî (çi dikarî bibêjî?!), cêribandina wê ya dîrokî heye, di nav du rojan da xwe dispêre hêzên Hîtlêr, demê li xwe dibihêre, heya ku…

Lê lîstikên siyasî yên rêvebirîyên Rûsîyayê û Amêrîkayê bi serekemîrê DAÎŞ-ê û di heman demê da serekkomarê Tirkîyaya faşîst Erdoxan ra – di encamê da tevkujîya kurdên Rojavayê Kurdistanê û gorîdana Efrînê pêk tên? Û bi "saya" serê rêvebirên van herdu dewêetên gewre Efrîn û efrînî hê jî di bin destê dagerkerên barbar da rehîne mane û dizêrin!

Rêvebirîya DYA di van listikên xwe yên kirêt da bêhtir pêşva diçe – ew ji bo girtin û radestkirina rêberên PKK bi mîllîonan dolaran soz dide, ku wan radestî Tirkîya faşîst bike, wek ku rêberê netewî Abullah Ocalan radest kirin!...

Bi gotinekê, wijdan û namûs di nav pêwendîyên dewletan da zêde wateya xwe nînin. Di nav pêwendîyên wan da hejmartin heye – hejmartina berjewendîyan a hişke-hola û zuha. Ji bo wê jî gelek caran berjewendîyên dewletê û yên gelê wê li hev nagirin. Lê ji bo her welatîyekî konkrêt ev katêgorîyana hê jî bi nirx in. Ya ku heya radeyekê dewletan ji sûcên mezintirîn jî paşva digire, hema ev bi xwe ye. An – na!..

Hema, eger kurdên li Ewropayê (û ne tenê ew!) benda wê bimînin, ka kengê wê gelên wan dewletan têbigihîjin, ewê bê wê wateyê, ku di navbera hebûn an tunebûna me da tu cudahî nîne …

Ew, ku hêzên serdest (DYA, Almanîya, Fransa û yên din) wisa vekirî dibêjin, ku opêratsîonên li dijî sazî, rêxistin û siyasetmederên kurdan ên li Ewropayê bi pilankirin û hevkarîya tirkan pêk hatine, êdî gelek tiştî ravedike… Û ev bûyarana nêrîna dewletan a fermî ya di derbarê têkoşîna dijî têrorê da serobinî hev dikin. Yên ku di vê derbarê da dibihên, – ew alman bin, tirk bin, amêrîkî, firansî yan hineke dinê bin, – bi xwezayî divê bizanibin, ka li vir wateya têrorê çi ya, ka di rastîya xwe da pisgirêka têrorê di ku da û di çi da ye. Eger gotina wan di derbarê wê têrorê da ye, ya ku dewleta tirk li dijî gelê kurd dimeşîne, berpirsyar û bersîvdarên wê li ber çavan in, û ew bi xwe jî ne ku tenê wan baş nas dikin, lê her weha bi wan ra di nava hevkarîyê da ne. Û yên ku têrora dewletê destek dikin û piştgirîyê didin wê jî, ew bi xwe ne. Ew baş dizanin, ku welatê kurdan destpêka sedsala XX bi destê pêşîyên wan hatye parçekirin û îro jî ew rewş ji hêla wan va tê parastin. Ew bi zorê dixwazin gelê kurd têrorîze û krîmînalîze bikin. Xwesteka wan a sereke jî hema ev e, ji bo ku paşê bibêjin – we dît!? Ji bo wê jî mafê tu kurdekî nîne, bê lîstikên van. Bêyî wê jî yên ku li dijî wan tiştên wisa pêk bînin, ewan bi destê xwe têra xwe amadekirine…

Tevirkolên[21] xwe ew bi xwe amade dikin!

Ji bo heman armancê jî biryara sêkrêtaryata Kontsêya Ewropayê ya di derbarê jinûva dadgehkirina pirsa bêqanûnî revandin û darazindina rêberê gelê kurd birêz Abdullah Ocalan derket holê. Û Komîtêya wezîran jî ew biryar erê kir. Ma ne, heya ji mirovên here tarî û dûrî siyaset û dadgerîyê ra jî zelal e, ku tu têkilîya sazîyeke rêvebirîya desthilata dewltan bi dadgehê û dadwerîyê ra nîne, ew jî Dadgeha mafên mirov a Ewropayê! Eger wisa be, êdî serbixwetîya dadgehê li ku dimîne? Ji bo çi gelan dixapînin? Û ya here sereke: ev tê wê wateyê, ku Ewropa (helbet, bi daxwez û fermana DYA) ji kurd û tirkan ra dibêje: *"Herin, hûn serbest in, hûn dikarin şerbikin, hev bikujin, emê jî çekên xwe birfoşin we û dewlemend bibin!"* – Wisa ye, tiştekî dinê nikare hebe…

Û li vir jî bersîva pirsa sereke ya "Ma, gelo yên ku şêr di navbera gelan da vêdixin û gurdikin, kî ne?" – dertê holê...

Hema yên ku çavê gelên van dewletan li ser van rastîyan vekin jî rewşenbîrên kurd bi xwe ne, yên ku li wan welatan dijîn. Û yên ku di rojên oxirmên giran da divê li rex gelê xwe bin jî, dîsa divê ew bi xwe bin.

---

[21] *Tevirkol – gorkenî, yên ku mezelan dikolin.*

Helbestvanê rûs ê destpêka sedsala XX Valêrî Bryûsov ji bo demên weha xweş gotye:

*“Dema bahoz e, û birûsk diteqe,*
*Helbestvan timê li rex gelê xwe ye!”*

Dewletên ku ji hêla *“parastina”* mafên tekekesan da pispor in, mafên gelan nabînin û binpê dikin. Ev jî siyasetek e! Ew mirov diparêzin, ji bo ku wî ji wî bi xwe dûrbixin, û hewl didin, kesayetîyên mankûrt (bêesil) biafirînin…

Di vê rewşê da tiştê ji gelê kurd tê xwestin, çi ye?

Divê em bi netewî bi çavekî rêalîst li cîhanê binihêrin. Yê ku nirxên xwe biparêze jî, yê ku azadîyê jî ji wî ra bîne, dîsa gelê kurd bi xwe ye.

Di dîrokê da hê tû hêz û dewletekê ji gelan ra azadî neanye, ewana her dikarin azadîyê ji gelan bistînin, û îro jî ewê erka xwe pêk tînin. Her gelek bi xwe azadîya xwe digihîne – bi xurtkirina yekîtîya netewî, bi tevgerkirina sazî û rêxistinên xwe yên sîyasî û civakî, bi pisporî rêvebirina karên xwe yên dîplomasîyê, bi pêşxistin û girseyîkirina ziman û çanda netewî... Lê ya serek, ji berê va hatye gotin, eger aşîtîyê dixazî, amadekarîya xwe ji bo şêr bike! Eger ev hemû hebin, wê alîkarî jî hebe, lewra ku yên alîkarîyê bidin, ewê ji bo berjewendîyên xwe yên pêşerojê bidin.

Û pêşeroja xwe jî dê gelê kurd bi xwe bigihîne – bi yekîtîya xwe ya netewî va, bi rêberîya netewî û hêza xwe siyasî va, bi parazvnên doza azadîyê va, bi dayîkên aşîtyê û ciwanên dilsoz va, bi wan zarokên biçûk va, yên ku tilîyên xwe wek nîşana V–serkevtinê hildidin jor û bi çavê xwe yên zelal li dihatûyê dinihêrin…

Û ji bo wê jî hîç kurdek divê tucar dagerbûna welatê xwe nepejirîne, ew divê herroj, dema çavên xwe vedike, ji xew hişyar dibe, divê wek dirozgekê, wek sondekê bi xwe ji xwe ra bibêje: *“Heya duh welatê min azad û serbixwe bûye. Îşev, dema ez di xewê da bûme, dagerkeran êrîş anîne ser welatê min, û divê em her tiştî bikin, ku wî ji welatê xwe raqetînin. Û Kurdistanê jî berbi azadîyê va biçe, lê ji bo azadî bê, her tenê mirovek têrê nake, û ew yek jî ez im!”*

Eger em bi netewî weha raman bikin, û her kurdek bi vê têgihîştinê ji xew rabe, dost jî, dijmin jî dê bi me ra hesab rûnîn, û roja Azadîyê wê nêzîk bibe…

# PÊVEK

## TÜRK AYDINRARINA AÇIK MEKTUP

*Değerli aydınlar!*

*Bugün Kuzey Kürdistan ve bütün Türkiye Cumhuriyeti'nde gündemde olan durum, vicdana ve insanlık onuruna sahip hiçbir insanın tarafsız ve sessiz kalmasına izin vermemelidir. Devletinizde yaşanan bu olay, doğrusu bir insanlık ayıbıdır—Kürt Halkına Kürdistan'da reva görülen bu adaletsizlik, bu devlet terörü insanlığın acımasızlığının en üst noktasıdır ve ilerde sadece siz Türk Aydınları için değil, kendini insan sayan herkes için de bir utanç olarak değerlendirilecektir. Türkiye Cumhuriyeti iktidarının Kürdistan'da yürüttüğü bu saldırı-operasyonlar, Kürtlere, onların aydın ve siyasetçilerine karşı geliştirilen kanlı soykırımla kolkola yürütülen bu beyaz soykırım, Kürt Halk Önderi sayın Abdullah Öcalan'a uygulanan insanlık dışı tecrid, en büyük suçları işgalcilerin tank ve panzerlerine taş atmak olan tutuklu çocuklara reva görülenler, açlık grevinde ölüme mahkum edilmeler, bütün bunlar insanlığa karşı işlenen suçlardır.*

*………………………………………………………………………………………*

*Doğrusu bu notlarla mektubumu sürdürmek isterdim ama dört sene evvel sizlere bir açık mektupdaha yazdığımı ve gönderdiğimi hatırladım… Ama o zamanlar internet imkanları bu kadar gelişmiş olmadığından, bu mektup sizlere ulaşamamıştı… Ayrıca, Türkiye'de bugün yaşananlar içerik olarak yine bu konular olduğundan ne de yazsam pek farketmeyeceğinden bu mektubu, bu vicdani çağrıyı hepinize gönderiyorum*

*Okuyun ve sessiz kalmayın!*

*12. 11. 2012*

Değerli bilimadamları, yazar, gazeteci, akademisyen, sanatçı ve kültür, sinema ve tiyatro emekçileri! Böyle bir mektubun belki çok daha önce yazılması gerekli idi ama kalemimi elime almamın nedeni, bugün biz Kürtlerin yurdu Kürdistan'da ve Türkiye'de gündemde olan bu son durumdur.

Eğer sizlere Kürt Halkı'nın iradesine karşı Türkiye Cumhuriyeti rejimi (rejimleri) tarafından yürütülmüş ve halen yürütülmekte olan bu kirli ve haksız savaşın sebeblerini anlatacaksam, yeniden Amerika konusunu açmayabilirim.

Başta söylemem gerekir ki, Kürt Halkı'nın çoğunluğu gibi ben de Türkiye rejimleri ve Türk Halkı'nın aynı şeyler olmadığının bilincindeyiz.. Ama yine de, insanlığın doğruları ve onuru adına insan kendinde cesaret bulmalı ve ülkesinin iktidarının günahlarındaki kendi payını da görmelidir. Örneğin, Alman Halkı'nda birçok vicdan ve insanlık onuruna sahip kişi kalkıp, Hitler yönetiminde yaşanan faşist rejim döneminde insanlığa karşı işlenen günahlarda Alman Halkı'nın da payının olduğunu söyleyebiliyorlar. Ve Almanya bu yüzden faşizm dönemi sonrası suçları kabul etmiş ve imkanları ölçüsünde faşist rejim yüzünden o savaşta zulüm ve baskı görenlerin kayıp ve zararlarının telafi etmiştir. Böyle insanlar, Hitler'in alınlarına çaldığı bu kara lekeyi, bir yere kadar silmeyi başarabilmişlerdir.

Ama bakınız, Türkiye'deki insanlık düşmanı, birbirinden faşist iktidarlar birbirlerinin yerlerini alırken Türk Halkı'ndan bir protesto veya kınama sesi bile çıkmıyor. Bu yüzden faşizm karşıtı bir hareket hakkında artık birşey söylemeyeceğiz.

Ve bu ülkede başka türlü de olamazdı zaten.

Diyeceksiniz ki “ neden, biz kimlerden daha kötüyüz ki?”

Hayır, sorun orada değil, yani hangi halk daha iyi veya daha kötü olayında değil! Türk Halkı ve diğer tüm Türkiye Cumhuriyeti halkları (Kürt, Arap, Fars, Rum, Ermeni, Asuri, Çerkez, Türkmen, ve diğerleri), "Türkiye sadece Türklerindir, bu vatanda yaşayan herkes Türktür, Türkçe dışındaki tüm diller yasaklıdır!" diyen bir anayasanın rehinesi durumundadırlar.

Bu durumda insanın, bu adaletsizlik ve haksızlık sebebiyle kendini, diğer halkların temsilcileri olan yurttaşlarından büyük görmemesi, onları yabancı olarak tanımlamaması ve milliyetçi egoizmden kör olmaması kaçınılmazdır. Bu egoizm halkı öyle bir psikolojiye ulaştırmıştır ki, yasaklı halklardan herhangi biri ana dilini kullanma hakkını talep ettiğinde, ve bu yüzden devlet güçleri onu tutukladığında, hapse attıklarında, işkence yaptıklarında, öldürdüklerinde ve kaybettirdiklerinde, Türk Halkı da onlara (devlete) alkış tutmaktadır Hadi, lütfen bu dünyaya söyleyin; Bu adaletsizlik ve saldırılardan kim kendini nasıl koruyabilecektir acaba ?..

Ve benden daha iyi bilebilirsiniz ki, Kürt Halkı da bu haksız ve vicdansız güç karşında mücadele etmek için, millet olarak kendini korumak, ayakta kalabilmek ve başkaldırmak amacıyla direnişler ortaya çıkarmıştır... Lakin her seferinde, ortak davranamama eksikliğinden, öndersizlikten ve içlerindeki çelişkilerden dolayı Kürtler ezilmişlerdir, ve bu güçler Kürt köylerini viran etmiş, Kürtleri katletmiş, onları evsiz, göçmen, sürgün ve sahipsiz statüde bırakmış, metropollerine ve diğer ülkelere dağılmalarına sebeb olmuş (asimile edilebilmeleri amacıyla) ve her seferinde "Bitirdik" demişlerdir. ..!

Ama bir tarihi gerçek vardır ve der ki:

- Ölmek istemeyen bir halkı hiçbir güç öldüremez!

Ve Kürt Halkı da artık XX. Yüzyılın başındaki halk değildir, artık önderlik ve milli bilinç hareketine sahiptir, kendini koruyacak kadar güce de sahiptir ve kurbanlık koyun olmamamak için de elinden gelen herşeyi de yapmaktadır…

Ve şayet birileri tekrardan bu halkı yoketmek amacı güdüyorlarsa, bu onların düşüncesiz oldukları, tarihi dinamikleri göremedikleri, ya da kendilerini ahmak veya kör olarak konumlandırdıkları ve kendi halklarını da kandırdıkları anlamına gelmektedir ya da … gerçekten delirmişlerdir.

Ama ne yazık ki görüldüğü kadarıyla bu ülkede bu insanlardan bazıları iktidardalar. Ve eğer öyleyse, irade, vicdan ve insanlık onuruna sahip olan ve bunları sayan insanlar da (ve böyleleri de bana gore Türk Halkı'nın içinde vardır!) bu inkar ve imha siyasetine, devlet terörü siyasetine karşı çıkmalıdırlar, ya da onlar da yarın XXI. Yüzyılın insanlık suçlularının dost ve ortakları olarak adlandırılacaklardır. Sadece Kürt Halkı için değil, kendi halkları için, halklarının geleceği için, içlerindeki insanlık cesaretini görseler ve Türk Halkı'nı da siyasetlerinin rehineleri haline getirmiş bu kara sevdalıların karşısına dikilseler olmaz mı acaba.? Her iki halkı birbirine bağlı tutan incecik bırakılmış ipin kopmaması, diyalog yolunun tıkanmaması ve halkların aralarındaki sorunları barış içerisinde çözebilmeleri için ve Türk çocuklarının gelecekte "ben Türküm" demekten utanmamaları için, iktidarların karşısında seslerini yükseltmek, onlara engel olmak ve iktidarların bu kötü uygulamalarını durdurmak zorundadırlar.

Türk Halkı'nın menfaatine olmayan, Kürt Halkı'na karşı yürütülen bu savaş, bazı iktidar sahiplerinin halkların kan üzerinden zenginleşmesine vesile olmaktadır ( En büyük ticaret savaştır sözü haklı bir sözdür). Bu yüzden Kürt Halkı'nın yokedilmesi politikası resmi bir politika haline gelmiştir... Ve bu resmi politika yüzbinlerce Kürdün yokedilmesine, binlercesinin köylerinin viran edilmesine, onbinin üzerinde siyasetçilerinin tutuklanmasına ve bugün zindanlarda çürümelerine, milyonlarcasının ata topraklarından sürülmelerine, yüzlerce aydının cenazeleri kaybedilerek katledilmesine sebeb olmuştur ve bütün bunlar sadece Kürtlerin "biz Kürt kalmak, Kürtçe konuşmak, Kürtçe şarkı söylemek ve Kürtçe'yi canlı tutmak istiyoruz" demeleridir …

Acaba neden iktidar sahiplerinin çocukları savaşa gitmiyor ve hayatları mahvolmuyor?! Savaşı alevlendiren bu iktidar sahiplerinden biri de Tansu Çiller idi. Şimdi o nerede ve diğerleri nerede?! Her biri, bu kirli savaş sayesinde edinmiş oldukları servetleriyle birlikte Amerika Birleşik Devletleri'nde (ABD'de) hayatlarını sürdürmekteler. Türkiye ve Türk Halkı'na onların hiçbir ihtiyacı yoktur. Bu savaş Türk ve Kürt halklarının savaşı değildir: Bir tarafta Ankara rejimi ve halkları yoketme, diğer tarafta ise halkın direniş gücü vardır.

Rejim Kürt halkı'nı yok etmek için herşeyi yapmakta, Kürt Halkı da (ki 25 milyonluk bir nüfusa sahiptir) ölmek istemiyor ve direniyor. Yalnız dışarda (başta ABD olmak üzere), iki halkı karşı karşıya getirmek ve bu mücadeleyi iki halkın savaşına dönüştürmek isteyen dış güçler vardır. İki halkın arasındaki anlaşmazlıkları bu güçler daha çok derinleştirmekte, bu halkları mahvetmekte, kendilerine bağlamakta ve egemenlikleri altına almaktadırlar. ABD varoluş tarihinden beridir, dış savaşlar ve ülkeleri yağmalamakla ayakta kalabilmiş ve büyümüştür.

Bakınız, rejim Kürt Halkı'na karşı devlet terörü politikasını sürdürdüğü, Kürdistan'ı viraneye çevirdiği, bir milleti yok ettiği zaman ne Batı'dan ne de ABD'den hiç bir ses çıkmıyor. Ama ne zaman ki Kürtler bunlara karşı durup, cevapladığı zaman Cumhuriyet rejimi ve okyanus ötesinden dostları hemen bağırmaya başlıyorlar.

Neden?

Lütfen dikkat ediniz, dünya üzerinde nerede faşist bir rejim, askeri bir ve gerici bir cunta varsa ABD bunların dost ve destekçisidir.

Usame bin Ladin'i kim hazırladı ve ortaya çıkardı, Saddam Hüseyin'î kim güçlendirdi, Sakaşvili gibilerinin rejimlerinin sırtını kim sıvazlıyor? Şüphesiz ABD! Ve onlara ne kazandırdı? Saddam'ın sonuna bakınız, Bin Ladin şimdi nerede, Sakaşvili ABD sayesinde Gürcistan'ın başına neler getirdi?

Eğer Bush ve ABD yönetimi gerçekten Türk Halkı'nın dostları olsalardı, Türk Ordusu'nun Zap mağlubiyetinin, HPG gerillalarının Oramar ve Bezele Karakolları baskınları ve diğer baskınlarından, Diyarbakır'daki polislere karşı yapılan eylemlerden sonra," Artık yeter,bu savaşı durdurmalı ve sorunu barışçı yollardan çözmelisiniz" demeliydi. Ama yok, Amerika Başkanı PKK'nin ABD, Irak ve Türkiye'nin düşmanı olduğunu açıkladı. Bu açıklamasıyla Bush, Türklere „Bakın, sakın ha bu savaşı durdurmayın!" demek istedi.

Neden, acaba HPG gerillaları hastanelere, okullara, sinema ve tiyatrolara mı saldırdı? Ya da 11 Eylül saldırısını mı düzenlemişlerdi? (Bilindiği gibi ABD derin devletinin bütün bunlarda parmağı vardır!)

Eğer o Türk gençleri kültür ve sanat elçileri, diplomat, işçi, tüccar veya turist olarak Kürdistan'a gitmiş olsalardı ve sadece bir Kürt bile onları incitseydi, o zaman hepimiz bunu kınardık...Ama onlar yıkmak ve öldürmek için oraya gittiler.! Onlar savaşa gitti.! Ve savaşta da, halk deyimiyle pilav dağıtmazlar. Eğer bazıları çocuklarının ölmemesini istiyorlarsa, onlar, devletin kendi çocuklarını silah ve ateşleriyle beraber, başkalarının yurduna, onların kadın, çocuk ve yaşlılarını öldürmeye göndermesine izin vermesinler. Devlet bunun için onları gönderiyor ve Kürtler de bu zulüm karşısında kendilerini koruyorlar.

Kürdistan'ın tarihi statüsü ortadadır – O işgal edilmiş ve egemenlik altına alınmış bir ülkedir ve Türk askeri de sadece ölüm, viran ve terörü beraberinde getiren bir işgal gücüdür.

Ve eğer bu savaşta Türk askerleri de ölüyorsa bundan Türkiye Devleti sorumludur. Kürtler sadece Birleşmiş Milletler'in ve diğer uluslarası anlaşmaların kendilerine tanımış olduğu meşru haklarını savunuyorlar,

Değerli arkadaşlar, Türkiye Cumhuriyetini yıkılmaktan ve parçalanmaktan koruyacak olanlar bizzat sizlersiniz.! Atalarımız " Acı bir gerçek binlerce tatlı yalandan daha tatlıdır " demişlerdir. Bu savaşın gerçek yüzü, kara yüzü Türk Halkı'na

gösterilmelidir. Bu savaşın bir an önce durdurulması için gereken her şeyi yapacağınıza dair size olan umut ve inancımız tamdır. … Bu değerli ve onurlu görevde oynayacağınız rolünüz çok önemlidir.

Bu onurlu rolünüzü istemek ve bu rolü oynamak için çabalamanız da insanlık için çok önemlidir.

Halkların umudu ve isteği barıştadır.

Ve umut da derler ki en son ölür.

-Ülkenize ve her birinizin evine barış gelsin!
-Kürt Halkı'na ve Kürdistan'a özgürlük ve barış gelsin!
-Tüm dünyaya barış ve huzur gelsin!

Korda Mad
(Azîz ê Cewo Mamoyan)
Dilbilimci-Şair-Gazeteci
Rusya Gazeteciler Birliği ve Kürt ve Uluslararası PEN üyesi

16. 10. 2008
Tambov/Rusya
kordamad.yahoo.com

Dipnot:

Bu mektup yazıldıktan sonra, İmralı adası'nda Kürt Halk Önderi Abdullah Öcalan'a işkence ve saygısızlık yapıldığını duyduk ve bu tip şeyler insanlık adına utanç verici , onun isim ve onuruna hürmetsizliktir.

Bu saygısız ve günahkar uygulama insanlık dışı değil midir?

Ve yine Türk aydınlarından ses çıkmamıştır!

Yüzlerce kez yazık! Yazık ki sizler gözlerini bu dünyaya henüz açmış çocuklarınız için yaşıyorsunuz!

Görüldüğü kadarıyla, Türkiye'de Kürtlerin başı, viran etmek, öldürmek ve talan etmekten başka birşeye yaramayan biyolojik bir organizmayla beladadır.. Türkiye Cumhuriyeti'nde hayat bulan bu düşkün ve kirli anlayış hala varlığını sürdürmekte, gittikçe azmakta ve barbar yüzünü göstermektedir. Ve bugün bazı Türk siyasetçileri, insanlık tarihinde Türk Halkı'nın isminin kara harflerle yazılması için ellerinden gelen herşeyi yapmaktadırlar.

Ama bilinmelidir ki: Hiçkimse bu kara lekeden muaf olamaz.

Burada insan sadece tek bir şey söyleyebilir: "Fare toprağı ne kadar kazarsa, o kadar üzerine döker".

Görüldüğü kadarıyla, halkların kemikleri ve kanları üzerine kurulan devlet, karmaşık ve alnına yazılmış tarihini yaşamaktadır…

Umulan görüntü odur ki, Kürtler, eşitliklerini sağlayabilecekleri bu süreçte kazma ve küreklerini ellerine alıp, süreci hızlandırıp bu sefer de tarihi sürecin dışında kalmasınlar…

**K. M. 20.10.2008**

# XUDANÊ PIRTÛKÊ – JÎYAN Û BERHEMÊN WÎ

Ezîz ê Cewo Mamoyan – 23ê berfanbara sala 1949an li Ermenîstana Sovêtî di gundê Pampa Kurdan (Niha – Sîpan) da di malbeta mamostayê kurd ê navdar Cewo ê Emer ê Mamo da ji dêya xwe bûye.

Sala 1973-an wî xwendina xwe di Fakûltêta rojhilatzanîyê ya Zanîngeha Yêrêvanê da biriye sêrî. Peyra di dibistanan da mamostatîya zimanên kurdî û ermenî kirye, berpisîyarê beşê xwendinê yê dibistana navîn û serwêrê (dîrêktor) dibistanê bûye. Ji sala 1983an heya 1993-an di Hukumeta Ermenîstana Sovêtî da kar kirye. Salên 1990-1991ê di Zanîngeha ser navê Davît Anhaxt da dersên zimanê kurdî dane. Ji sala 1983an û vir va di warê çapemenîyê da wek professional kar dike. Sala 1993an heya 1994an rêdaktorê sereke yê rojnameya "Botan" a Yekîtîya nivîskarên kurd bûye (Yêrêvan – bi zimanê ermenî). Havîna sala 1994-an cîguhêzî bajarê Moskovayê bûye. Li vir ji sala 1995an heya 1998an rêdaktorê sereke yê rojnameya kurdî ya "Axîna Welat" a bi zimanên kurdî û rûsî bûye. Endamê yekîtîya rojnemegerên Yekîtîya Sovêtê û Ermenîstanê bûye, îro jî endamê Yekîtîya rojnamegerên Rûsîyayê û Navenda PENa kurd û PENa navnetewî ye. Ji sala 1995an heya 2004an endamê rêvebirîya Yekîtîya navnetewî ya rêxistinên kurd ên civakî (Yekîtî) bûye. Ji sala 1999an heya 2008an endamê Kongrêya Netewî ya Kurdistanê (KNK) bûye. Salên 1999 – 2001 endamê Desteya rêvebir a KNKê û serokê Komîtêya perwerde, zanist, hûner û çandê ya Kongrê bûye.

Salên 2002 – 2004an serokê Şêwira Otonomî ya Netewî–Çandî ya Kurdên Fêdêratsîona Rûsîyayê bûye.

Di cîhana wêjeyê û rojnamevanîyê da bi nasnavê wêjeyî yê Korda Mad wek helbestvan, rojnameger û şîroveger tê naskirin. Helbest, gotar, şiroveyên wî bi navên Ezîz ê Cewo, Azîz Mamoyan û Korda Mad hatine binnûskirin. Nivîsên wî di çapemenîya Ermenîstanê, Rûsîyayê, Kurdistanê, Ewropayê û welatên din da bi zimanên kurdî, ermenî, rûsî, tirkî û zimanên dinê hatine weşandin.

Salên nodî yên sedsala XX helbestên wî di almanaxa şaxê nivîskarên kurd ê Ermenîstanê "Bihara Teze" da û li ser rûpelên rojnameya "Rya Teze" ronayî dibînin. Helbest, gotar û şiroveyên wî wisa jî di Radîoyayê Yêrêvanê da hatine weşandin. Sala 1998an di Moskovayê da berevoka helbestên wî ya "Karwanên Bêxewîyê" ronayî dîtye.

Hê ji dema xwendkarîyê va ewî dest ji pisporîya xwe ya zanîngehî nekişandye. Hê jî bê rawestan lêgerînên xwe yên zanistî di wareê zimanzanîya giştî û zimanê kurdî da didomîne.

Sala 2007an pirtûka wî ya zanistî–lêgerînî bi sernivîsa "Taybetmendîyên Rêzimanî yên Navdêr û Bingehên Destpêkî yên Mak-zimanê Hindewropî di Kurdî da" ji hêla Weşanxaneya Zanîngeha dewletê ya Sankt-Pêtêrbûrgê va bi zimanên rûsî û bi pêvekên kurdî û înglîzî va hatiye weşandin. Sala 2017an pirtûka wî ya "Êzdîtî: divê mirov rastîya wê li ku bigere" ji hêla weşanên J&J va li Amedê hatye weşandin.

Zêdetirî pênc salan wî beşê dersên kurdî li ser rûpelên rojnameya "Axîna Welat", paşê li ser rûpelên rojnameya "Kurdistana Azad" meşandine. Gotarên wî li ser rûpelên rojname, kovar û malperên kurdî hatine û tên weşandin ("Azadîya Welat", "Axîna Welat", "Kurdistana Azad", "Zend", "W", "Pênûsa Nû", "Roza", "AmîdaKurd", "Pena Kurd", "Xendan", "Mezopotamya", "KurdPrêss" û yên dinê).

Salên nodî yên sedsala XX ew bi gotarên zanistî yên li ser pirsên rêzimana kurdî û zimanzanîyê beşdarî konfêransên rojhilatzanan bûye (yên ku ji hêla Akadêmîa zanistê ya Ermenîstanê va dihatin lidarxistin). Peyra wisa jî konfêransên navnetewî hebûne. Salên 2004, 2005 û 2010an beşdarî konferansên navnetewî yên li ser pirsgirêkên zimanê kurdî bûye (Amed); sala 2012an beşdarî Kongrêssa Zanistî ya Kurdî a Cîhanî ya 2em bûye (Hewlêr). Û gotarên wî yên wan konfêransan jî hatine weşandin.

Sala 2018-an ji hêla weşanên “Aryen” va (Ankara) pirtûka mamosta Ezîz ê Cewo ya “Zerdeşt Pêxember (Rûpelên dîroka “windabûy” ...)” hatye weşandin. Lê sala 2020-î ev pirtûka di Moskovayê da ji hêla weşanên «Перо» (“Pênûs”) va bi zimanê rûsî hatye weşandin. Weşana vê pirtûkê ya rûsî bi dana û agahîyên dîrokî yên nû va hatye xurtkirin û kurtenaveroka wê bi zimanê înglîzî di pêvekê da hatye danîn...

Di derbarê vê berhema mamosta da rêzek gotar, hevpeyvîn, şirove û nirxandinên zanistî bi zimanên kurdî, rûsî û tirkî hatine weşandin.

Mamosta karên xwe yên lêgerînî îrojî bê rawestan didomîne.

**Berevoka gotar, bîranîn, name, hevpeyvîn û nirxandinên bijarte.**

**Ezîz ê Cewo:**

## “Abdullah Ocalan. Ramana azadîyê, gelê kurd û cîhan”.

**Sala 2023**

